

K T

Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DÎWANA MELA EHMEDÊ HEYDERÎ  
(METN Û LÊKOLÎN)

Önder BEYTER

10711007

Şêwirmend

Alk. Doç. Dr. Abdurrahman Adak

Mêrdîn 2013

Ez vê xebatê

îthafê bîranînên kalikê xwe

Kemal

ê ku piştevan û destegîrê min ê menewî ye

dikim

**JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ**

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Serok :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmza

.....

Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

## KURTE

### DÎWANA MELA EHMEDÊ HEYDERÎ (METN Û LEKOLÎN)

#### Önder Beyter

Mela Ehmedê Heyderî, di çaryeka dawîn a sedsala XIXan û nivê yekemîn ê sedsala XXan de jiyaye. Di van salan de edebiyata klasîk a kurdî êdî hêdî hêdî serencama xwe biriye serî. Di vê qonaxê de Heyderî, bi nûnertiyeke serkeftî ve bûye yek ji xelesa dawîn a edebiyata kurdî ya klasîk.

Ev xebata me ya bi navê *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî; Metn û Lêkolîn*, ji destpêkek û çar beşan pêk hatiye. Di beşa yekemîn de em bi dûr û dirêjî li ser jiyana wî û bi kurtî jî li ser berhemên wî yê xeynî dîwanê sekinîne. Di beşa duyemîn de jî em li ser kesayetiya wî ya edebî û taybetiyên zimanê dîwanê sekinîne. Herwiha, di beşa sisêyan de jî dîwan, ji aliyê şiklî ve hatiye veçirîn. Beşa çaran jî, ji metnê bitenkîd ê dîwanê yê ku bi berawirdkirina sê nusxeyan derketiye holê, pêk hatiye.

Di tîpguhezandina metnê dîwanê de, şûna tîpên erebî yê ku di elifbêya kurdî de cî nagrin, tîpên transkîripsiyonê yê navneteweyî hatine bikaranîn. Dîsan, bo cûdahiyên fonetîkî yê di navbera nusxeyan de, ji bo yekîtiya zimên û metnekî tîkûz, formekî hevpar hatiye bikaranîn.

Dîwana Heyderî ya ku dîwaneke murettab e, ji her aliyan ve gelek bihêz hatiye vehonandin. Herfên qafiyeya helbestan anegorî rêza elifbêyê hatine danîn. Erûz, bi awayekî serkeftî hatiye tetbîq kirin. Helbestên ku di seranserê dîwanê de cî girtine bi 15 qalibên jihev cûda yê 6 behrên erûzê ve hatine nivîsîn. Digel vê, dîwan ji aliyê cureyên nezmê ve jî dewlemend e û di dîwanê de bi tevahî 10 cureyên nezmê cî girtine. Herwiha, 3 cure qafiyê hatine bikaranîn; mucerred, muqeyyed û murdef. Ji redfên 60 helbestan 40 heb bi kurdî, 15 heb bi erebî û 5 heb jî bi farisî hatine nivîsîn.

Di rêstina helbestan de rewanî û zimanekî vekirî hatiye tercih kirin. Di dîwanê de digel bêjeyên erebî û farisî, peyvên tirkî jî gelek hatine bikaranîn. Di bêjeyên farisî yê ku di

dîwanê de hatine bikaranîn de, bêtir bêjeyên ku nêzikî kurdî an jî yên ku bi kurdî re hevpar in, hatine tercih kirin.

Li seranserê dîwanê temaya ku derketiye pêş, hîcret û bêkesî ye. Hema hema di hemû helbestan de şikayet ji tenahî û bêkesiyê hatiye kirin. Çekên klasîk ên ku di şerên serdemên berê de hatine bikaranîn, di helbesta klasîk de herwekî nêrîn û awirên tûj ên dilberê hatine qebûl kirin. Anku, şaîran amûrên şer ên mîna tîr, sertîr, rimil, şûr û hwd. şibandine nêrîn, awir û bijangên dilberan. Lê belê, dema ku mirov bala xwe dide *Dîwana Heyderî*, mirov dibîne ku digel van çekên klasîk, çekên modern jî li van mezmûnan hatiye zêde kirin û bi vê rêyê ve kompozîsyoneke nû hatiye ava kirin.

Di nava kesayetên şaîr ên ku li ser Heyderî herî zêde tesîr ava kirine, herdu otorîteyên edebiyata kurdî ya klasîk; Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî ne. Tesîra Mela û Xanî him di *Dîwana Heyderî* de û him jî di *Munacata Heyderî* de bi zelalî xwe daye xuyan kirin. Di dîwanê de bo Melayê Cizîrî, rengdêra “Xoceyê Şehrê Cizîrê” hatiye bikaranîn. Dîsa, di helbesta 37an de navê “Mem û Zîn”ê û di helbesta 107an de jî tenê navê “Mem”î derbas bûne. Di *Munacata Heyderî* de bo Xanî, “Ehmed Efendiyê Xanî” hatiye bikaranîn. Lê belê, di tu derê dîwanê de qet em rastî navê Feqiyê Teyran nehatine.

## ÖZET

### MOLLA EHMEDÊ HEYDERÎ DİVANI (İNCELEME-METİN)

#### Önder Beyter

Mela Ehmedê Heyderî, XIX. yüzyılın son çeyreği ile XX. yüzyılın ilk yarısında yaşamıştır. Bu yıllarda, Klasik Kürt Edebiyatı, yavaş yavaş serencamını noktalamıştır. Bu dönemde Heyderî, başarılı bir temsiliyet ile Klasik Kürt Edebiyatı'nın son halkalarından birisi olmuştur.

Mela Ehmedê Heyderî Divanı ve İncelenmesi adlı bu çalışmamız, bir giriş ile dört bölümden oluşmuştur. Birinci bölümde, ayrıntılı bir şekilde hayatı üzerinde durularak eserleri tanıtılmıştır. İkinci bölümde, edebi kişiliği ve divanının dilsel özellikleri üzerinde durulmuştur. Üçüncü bölümde, divan, şekil bakımından etraflıca incelenmiştir. Dördüncü bölümde ise, farklı üç nüshanın karşılaştırılmasından oluşan, divanın tenkitli metni yer almıştır.

Divan metninin transkripsiyonunda, kürt alfabesinde karşılığı olmayan arap harfleri için, klasik metinlerin neşrinde kullanılan uluslararası transkripsiyon harfleri kullanılmıştır. Yine, dil birliği ve güçlü bir metin için nüshalar arasındaki fonetik farklar, ortak bir forma kavuşturulmuştur.

Muretteb bir divan olan *Heyderî Divanı*, her yönüyle güçlü bir şekilde ortaya konulmuştur. Kafiye harfleri alfabetik sıraya göre dizilmiştir. Şiirlerde aruz vezni başarılı bir şekilde tatbik edilmiştir. Divanda yer alan bütün şiirler aruzun 6 bahrinin farklı 15 kalıbıyla yazılmışlardır. Bununla birlikte, divan, nazım şekilleri bakımından da zengin olup, divanın bütününde toplamda farklı 10 nazım şekli yer almıştır. Mucerred, mukayyed ve murdef olmak üzere divanda 3 çeşit kafiye kullanılmıştır ve 60 şiirden 40'nin redifi kürtçe, 15'inin arapça ve 5'inin de farsçadır.

Şiirlerin inşasında, akıcılığın yanında açık bir dilin kullanılmasına da dikkat edilmiştir. Divanda Arapça ve Farsça kelimelerin yanısıra, yoğun bir şekilde Türkçe kelimelerin de

kullanıldığı görülmüştür. Farsça kelimeleri kullanmada, daha çok Kürtçe'ye yakın hatta, Kürtçe ile ortak kelimelerin tercih edildiği sonucuna varılmıştır.

Divanın bütününde öne çıkan tema göç, ayrılık ve yalnızlıktır. Hemen hemen bütün şiirlerde yalnızlıktan ve kimsesizlikten şikayet edilmiştir. *Klasik Şiirde*, geçmiş dönem savaşlarında kullanılan klasik savaş aletleri, sevgilinin 'keskin yan bakış'ları gibi kabul görmüştür. Yani, şairler kılıç, mızrak, ok, okun sivri çelik ucu vb. savaş aletlerini sevgilinin kirpi, gamze ve yan bakışlarına benzetmişlerdir. Fakat *Heyderi Divanı*na bakıldığında, zikredilen bu klasik savaş aletlerinin yanı sıra modern savaş aletlerinin de bu mazmunlara eklenmesi suretiyle yeni bir kompozisyonun yaratıldığı görülmüştür.

*Heyderiyi* en çok etkileyen şair şahsiyetler arasında, klasik kürt edebiyatının iki otoritesi Melayê Cizîrî ve Ehmedê Xanî olduğu görülmüştür. Melayê Cizîrî ve Ehmedê Xanî'in tesiri, hem *Heyderi Divanı*'nında hem de *Heyderi Munacatı*'nda açık bir şekilde fark edilmiştir. Divanda, Melayê Cizîrî için "Cizre Şehrinin Hocası" sıfatı kullanılmıştır. Yine, divanın 37. şiirinde "Mem ve Zin" in, 107. Şiirde ise yalnızca "Mem" in ismi geçmiştir. *Heyderi Munacatı*'nda Ehmedê Xanî için "Ahmed Xani Efendi" tabiri kullanılmıştır. Fakat divanın hiçbir yerinde Feqiyê Teyran' in ismine rastlanılmamıştır.

## SUMMARY

### MULLAH EHMEDEH HEYDERI'S DÎWAN (TEXT AND ANALYSING)

**Önder Beyter**

Mullah Ehmedê Heyderi lived in the last quarter of 19th century and the first half of the 20th century. In this years The Classical Kurdish Literature gradually concluded its cosequence. In this period Heyderi, with a succesful representation, became one of succesful representation of Classical Kurdish Literature's the last links in the chain.

Our study named Mullah Ehmedê Heyderi's Dîwan; Text and Analysing composed of one introduction and four chapters. In the first chapter, his studies are intruduced by laing gread stres on his life. In the second chapter, focused on his literary personality and linguistic features. In the third chapter, divan, is analized in detail in terms of form. In the fourth chapter, the crittical divan text that composed of the comparision of three different copies took place.

In the transcription of Divan Text, international transcription letters are used for the Arabic letters that do not have any equivalece in Kurdish alphabet. Nantheless, the language phonetic differences between the association and copies for a powerful text, a common form, has been acquired.

*Hayderi's Divan* which is a prepared divan was put forward in every aspect in a strong way. Rhyme letters are arranged in alphabetical order. The prosody measures were successfully applied in poetry. All the poems which are included in Divan are written in the pattern of prosody's six Naval's different 15 pattern. At the same time, Divan is also rich in poetic forms, and in whole Divan included a total of 10 different versification. Three kinds rhyme used in Divan such as Mucerred, mukayyed and murdef. Of 60 poems', redif of 40 is in Kurdish, 15 in Arabic and 5 in Persian.

In poetry, the prosody verse has been succesfully applied. In the construction of te poems, beside fluency a clear use of language has been noted out. In addition to Arabic



and Persian words, Turkish words also was extensively used. It was concluded that, in the usage of Persian words, mainly the words that are close to Kurdish language even the common words with Kurdish language were preferred.

Throughout the Divan prominent themes are migration, separation and loneliness. Almost in all the poems it has been complained of loneliness and desolation. In Classical poetry, the prior period instruments used in the classic war battles has been accepted as the lovers "sharp side of view". Namely, poets liken the instruments of war such as swords, spears, arrow, arrow's steel sharp tip, as the lover's hedgehog, dimple and side gaze. However when we look *Hayderi's Divan* as well as instruments referred in this classic battle a new composition was created by adding these modern warfare tools to mazmuns.

Among the poet figures who draws most influential on Hayderi, have been found to be two classical Kurdish literature authority, Ehmedê Xanî and Melayê Cizîrî. The influence of Ehmedê Xanî and Melayê Cizîrî has been clearly noticed both in *Heyderi's Divan* and *Heyderi's Munacat (yearning)*. In Divan the title "Teacher of the City of Cizre" has been used for Melayê Cizîrî. Again, in Divan's 37th poem he used the names "Mem and Zin" and in the 107th poem he used the name of "Mem". In *Heyderi's Munacat (yearning)* the phrase "The Master Ahmed Xani" has been used for Ehmedê Xanî. However, the name of Feqiyê Teyran has not been included anywhere in the Divan .

**NAVEROK**  
**DÎWANA MELA EHMEDE HEYDERÎ**  
**(METN Û LÊKOLÎN)**

	<b>Rûpel</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>IV</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>VI</b>
<b>SUMMARY</b> .....	<b>VIII</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>X</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>XIV</b>
<b>LÎSTEYA TABLO GRAFÎK Û PÊVEKAN</b> .....	<b>XVI</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>XVII</b>

DESTPÊK.....	1
1. REWŞA SIYASÎ YA SERDEMA KU HEYDERÎ TÊ DE JIYAYE.....	1
1.1. Dawiya Mîrnîşîniyên Kurdan.....	1
1.2. Serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî.....	2
1.3. Alayên Hemîdiye, Alayên Eşîretan yên Sîwariyên Sivik, Alayên Şemsedînovan.....	3
1.4. Şerê Cihanê yê Yekemîn.....	4
1.5. Serdema Salên Destpêkê yên Komara Tirkiyeyê yên ku Heyderî tê de Jiyaye.....	5
1.5.1. Serhildana Koçgiriye.....	5
1.5.2. Hîzbê Azadiya Kurdistanê (Azadî) û Serhildana Şêx Seîd.....	6
1.5.3. Xoybûn, Serhildana Agiriyê û Qetlîama Zîlanê.....	9

**BEŞA YEKEMÎN**

**JİYAN Û BERHEMÊN HEYDERÎ**

1. JIYANA HEYDERÎ.....	11
1.2. Nav û Mexlesa wî.....	12
1.3. Serdema Serhedê.....	16
1.3.1. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna wî.....	16
1.3.2. Malbata wî.....	16
1.3.3. Eşîreta wî.....	19
1.3.4. Perwerde û Pîşeya wî.....	21

1.4. Serdema Nisêbînê.....	23
1.4.1. Wefata wî.....	27
2. BERHEMÊN HEYDERÎ.....	28
2.1. Berhemên wî yên Edebî.....	28
2.1.1. Dîwan.....	28
2.2. Berhemên wî yên Dînî.....	28
2.2.1. Eqîdeya Îmanê.....	28
2.2.3. Munacata Heyderî.....	29
2.3. Berhemên wî yên Zanistî.....	30
2.3.1. Teqwîmname.....	30

## **BEŞA DUYEMÎN**

### **ZIMAN Û KESAYETIYA EDEBÎ YA HEYDERÎ**

1. ZIMANÊ WÎ.....	32
1.1. Taybetiyên Devoka Serhedê.....	34
1.2. Taybetiyên Devokên Deştê.....	35
1.3. Taybetiyên Devoka Botî û Hekkarî .....	36
1.4. Peyvên Kurdî yên Resen.....	37
1.5. Biwêjên ku di Dîwanê de Hatine Bikaranîn.....	39
1.6. Unsûrên Erebî, Farisî û Tirkî.....	41
1.6.1. Unsûrên Erebî.....	41
1.6.1.1. Îqtîbasên ji Ayet û Hedîsan.....	42
1.6.1.2. Biwêjên Erebî yên ku di Dîwanê de Hatine Bikaranîn.....	42
1.6.2. Unsûrên Farisî.....	42
1.6.3. Unsûrên Tirkî.....	43
2. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ.....	45
3. EDÎBÊN KU LI SER HEYDERÎ TESÎR KIRINE.....	50
3.1. Melayê Cizîrî.....	51
3.2. Ehmedê Xanî.....	54
3.3. Şêx Şemseddînê Exlatî.....	56

**BEŞA SÊYEMÎN**  
**JI ALIYÊ ŞIKLÎ VE VEKOLÎNA DÎWANÊ**

1. TAYBETYÊN ŞIKLÎ.....	57
1.1. Şiklê Tertîbê.....	57
1.1.1. Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan .....	57
1.2. Şikl û Cûreyên Nezmê.....	58
1.2.1. Qesîde.....	59
1.2.2. Xezel.....	60
1.2.3. Mustezad.....	61
1.2.4. Muselles.....	61
1.2.5. Murebbe <sup>ç</sup> .....	61
1.2.6. Muxemmes.....	62
1.2.7. Museddes.....	62
1.2.8. Mulemme <sup>ç</sup> .....	62
1.2.9. Terkîbê Bend.....	63
1.2.10. Tercî <sup>ç</sup> ê Bend.....	64
1.3. Wezn.....	65
1.3.1. Îmale.....	66
1.3.2. Med (Îmaleya Memdûde).....	67
1.3.3. Zîhaf.....	67
1.3.4. Wesl.....	68
1.4. Qafiye.....	69
1.4.1. Cûreyên Qafiyeyê.....	69
1.4.1.1. Qafiyeya Murdef.....	70
1.4.1.2. Qafiyeya Mucerred.....	71
1.4.1.3. Qafiyeya Muqeyyed.....	71
1.5. Redîf.....	71
1.5.1. Redîfên ku di Halê Qertafan de ne.....	72
1.5.2. Redîfên ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne.....	72
1.5.3. Redîfên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne.....	72

## BEŞA ÇAREMÎN

### METNÊ DÎWANÊ YÊ BITENKÎD

1. DANASÎNA DÎWANÊ Û NUSXEYÊN WÊ.....	75
1.1. Dîwana Heyderî.....	75
1.2. Nusxeyên Dîwanê.....	76
1.2.1. Nusxeya Muellîf.....	76
1.2.2. Nusxeya Mela Diyaeddîn Heyderî.....	78
1.2.3. Nusxeya Mele Mihemmedê Çewlikî.....	78
2. DÎ AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZA KU HATIYE ŞOPANDIN.....	79
3. METNÊ DÎWANÊ YÊ BITENKÎD.....	82
<b>ENCAM.....</b>	<b>228</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>229</b>
<b>PÊVEK.....</b>	<b>233</b>

## PÊŞGOTIN

Edebiyata kurdî ya klasîk, edebiyateke temendirêj e. Di pêvajoya serencama vê edebiyatê de gelek helbestvanan cî girtine û li pey xwe gelek berhem hîştine. Lê belê, ji ber ku saziyeke kurdan a ku xwedî li van berheman derkeve û bo sudwergirtina gel van berheman çap bike tine bûye, hin ji van berheman wenda bûne, hinek jî ji aliyê hin derdorên bimeqsed ve hatine talan û îmhakirin û hinek jî wan jî ketine destê qîmet nezanan. Berhemên ku ji van egerên neyînî xwe xelas kirine jî li benda lêkolîneran in.

Li Tirkîyeyê hê jî di zanîngeh û enstutiyên de xebatên akademîk li ser edebiyata klasîk a kurdî nehatine kirin. Bo ku di dîroka wêjeya kurdî de cihê wêjeya klasîk a kurdî bê tesbît kirin divê ewil berhemên ku di seheya vê edebiyatê de hatine afirandin bi çap û weşangeriyeke objektîf û akademîk ve bêne weşandin.

Bi vê temayulê ve me jî berê xwe daye seheya edebiyata klasîk a kurdî û danasîn û lêkolîna zanistî ya li ser dîwaneke ku heta niha di lîteratura kurdî de cî negirtiye me ji xwe re wekî mijar hilbijartîye. Ev dîwan, ya Mela Ehmedê Heyderî yê ku yek ji helbestvanê sedsala XXan e. Ewîl em li ser qonaxên jiyana û perwerdeya helbestvan sekinîne û dû re jî me bi berawirdkirina sê nusxeyan metnê bitenkîd ê dîwanê amade kiriye û bi rêbazên zanistî ve li ser dîwana ku heta niha tu xebatên zanistî li ser nehatine kirin, lêkolîn kiriye.

Xebata me ji çar beşan pêk hatiye. Beşa yekemîn li ser du binbeşan hatiye avakirin. Ewîl em li ser hemû qonaxên jiyana wî sekinîne. Di dewra Serhedê de me cî daye cihê jîdayîkbûn, malbat û eşîra wî û herwiha em li ser perwerde û jiyana wî ya li Nisêbînê jî sekinîne. Dû re me danasîna berhemên wî kiriye.

Beşa duyemîn jî ji kesayetiya helbestvan, zimanê dîwanê, kesayetiyan ku li ser wî tesîr kirine pêk hatiye. Pêşiyê em li ser kesayetiya wî ya edebî, ilmî û hunerî sekinîne û dû re me zimanê dîwanê ji gelek aliyên ve nirxandiye û pişt re jî em li ser kesên ku Heyderî di bin bandora wan de maye, sekinîne.

Di beşa sêyemîn de metnê ji aliyê şiklî ve hatiye vekolîn. Di vê beşê de em li ser “danasîna dîwanê û ya nusxeyên wê”, “şikl û cûreyên nezmê”, “wezn”, “qafîye” û “redîf”ê rawestiyane. Di vira de bo têgihêştin û sîdewergirtinê hin mijar bi tablo û

grafîkan ve jî hatine îfadekirin. Beşa çaremîn a xebata me jî ji metnê bitenkîd ê dîwanê pêk hatiye.

Bêguman ne ji alîkariya gelek kesan bûna ev tez dê tamam nebûya. Di serî de spasiya herî mezin mamoste û şewirmendê min ê hêja Dr. Abdurrahman Adak heq dike. Ji ber ku helbestvanekî mezin ê mîna Mela Ehmedê Heyderî bi min da naskirin û derfêta xebata li ser dîwana wî da min. Abdurrahman Adak, di pêvajoya amadekirin û nivîsandina tezê de him bi şewirmendiya xwe ya akademîk û him jî bi alîkariya xwe ya şexsî min ji kêmasî û tengasiyan xelas kir.

Dû re lazim e ku ez spasiya neviyê helbestvanê me Birêz Mela Diyaeddîn Heyderî bikim. Wî jî bi comerdî sûretê berhemên kalikê xwe yên ku di arşîva xwe ya taybet de veşartîye bi me re parve kir û bi eleqeyeke germ ve mazûvaniya me kir û hevnasîna me bi kekê xwe Şêx Ehmed Emînê Heyderî re kir. Bi vê minasebetê ve ez spasiyên xwe yên ji dil ên qasî tewecuha ji dil a wî pêşkeşî Şêx Ehmed dikim. Şêx Ehmed li medreseya xwe di derheqê jiyana û serpêhatiyên kalikê xwe de agahiyên devkî bi me re parve kir.

Ez ji bo mamosteyê xwe yê hêja Dr. Xeyrullah Acar re jî gelek spas dikim. Wî di nava hemû teşqeleyê wextê xwe yê teng de bo me wext veqetand û di xwendina unsûrên farisî yên di dîwanê de alîkariya me kir. Him di xwendina unsûrên erebî de alîkariya ku li min kir û him jî bo ku bû yek ji endamên juriya min û teza min xwend, ez ji Dr. Tahirhan Aydın re jî gelek spas dikim. Ez bo xalê xwe Nûrî Emre jî spasên ji dil dikim. Wî jî agahiyên xwe yên li ser binemal û eşîrên ku li Serhedê niştecih in bi me re parve kirin. Li vîra lazim e ku ez navê Rêbiwar Azad jî zîkir bikim. Ji ber ku wî, em bi meqaleya kurt a derbareyê Mela Ehmedê Heyderî ya ku di hejmarê 54an a Hawarê de çapbûye haydar kirin, em spasiya wî jî dikin.

Di dawiyê de ez spasiya malbata xwe û ya hemû heval û dostên ku li ser vê xebatê keda wan çêbûye, dikim.

Önder BEYTER

Mêrdîn 2013

## **LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN**

### **TABLO**

**Tablo 1:** Tabloya ku mezintirîn herdu konfederasyonên Serhedê nîşan dide, r. 19

**Tablo 2:** Tabloya ku rêz, hejmar û herfa qafiyeyê ya helbestan nîşan dide, r. 58

**Tablo 3:** Tabloya ku qalib û behrên erûzê yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn nîşan dide, r.65

**Tablo 4:** Tabloya ku digel cureya qafiyeyê redîfên xezel û qesîdeyan nîşan dide, r. 74

### **GRAFÎK**

**Grafîk 1:** Grafîka ku rêjeya bikaranîna mexlesan nîşan dide, r. 15

**Grafîk 2:** Grafîka ku rêjeya bikaranîna cureyên nezmê nîşan dide, r. 59

**Grafîk 3:** Grafîka ku di xezelan de, rêjeya bikaranîna behrên erûzê nîşan dide, r. 60

**Grafîk 4:** Grafîka ku rêjeya bikaranîna behrên erûzê nîşan dide, r. 66

**Grafîk 5:** Grafîka ku di xezel û qesîdeyan de bikaranîna cureyên qafiyeyê nîşan dide, r. 70

### **PÊVEK**

**Pêvek 1:** Gustîla ku navê Mela Ehmedê Heyderî li ser e, r. 233

**Pêvek 2:** Sûretê Mela Ehmedê Heyderî, r. 234

**Pêvek 3:** Helbesta 36emîn, r. 235

**Pêvek 4:** Helbesta 11emîn, r. 236

**Pêvek 5:** Rûpelek ji nusxeya muellîf, r. 237

**Pêvek 6:** Rûpelek ji teqwîmnameyê, r. 238

**Pêvek 7:** Rûpelek ji nusxeya muellîf, r. 239

**Pêvek 8:** Rûpelek ji teqwîmnameyê, r. 240

**Pêvek 9:** Rûpelek ji nusxeya muellîf, r. 241

**Pêvek 10:** Rûpelek ji teqwîmnameyê, r. 242



## KURTEBÊJE

amd.	:Amadekar
bnr.	:Binêrin
b.n.	:Berhema Navborî
c.	:Cild
ç.	:Çap
h.b.	:Heman berhem
h.m.	:Heman Meqale
hwd.	:Her wekî din
j.	:Jimare
m.	:Mirina wî/wê
r.	:Rûpel
wer.	:Werger
HAK	:Hîzbê Azadiya Kurdistanê
KPK	:Komeleya Pêşketina Kurdan
NM	:Nusxeya Muellîf
NMDH	:Nusxeya Mela Diyaeddîn Heyderî
NMMÇ	:Nusxeya Mela Mihemedê Çewlikî

## DESTPÊK

### 1. REWŞA SIYASÎ YA SERDEMA KU HEYDERÎ TÊ DE JIYAYE (1887-1937).

Mela Ehmedê Heyderî, di sala 1887an de ji dayîk bûye û di sala 1937an de jî wefat kiriye. Anku, Heyderî di wan salên ku me di vê beşê de rewşa wê ya siyasî daye de jiyaye. Ji bo ku mirov helbestvanekî/ê baş nasbike û ji huner û berhemên wî/ê rast û baş têbigihêje, divê mirov şert û mercên wan salên ku ew helbestvan tê de jiyaye bi awayekî bêalî bizanibe. Ji ber vê qasê, me di vê beşê de bi awayekî kronolojîk û bi kurtî digel eger û encamên xwe ve bûyer û rûdanên wan salên ku Heyderî tê de jiyana xwe derbas kiriye, destnîşan kirine.

Serdema ku Heyderî tê de jiyaye, yek ji awarte û xerabtirîn serdemeke kurdan e. Di vê serdemê de li welatê kurdan gelek pevçûn, şer, serhildan û têkçûn rû dane. Di van salên dijwar de ji bo rewşeke xerab çiqas eger divê, yek bi yek hemû hatine serê kurdan. Kurd rastî talan, surgun, girtîgeh, koç, xela û rastî kuştin û mirinê bixwe hatine.

#### 1.1. Dawiya Mîrnîşîniyên Kurdan

Dewleta Osmanî di serdema Mehmûdê Iiyem de dest bi polîtîkaya merkezîkirinê kiriye. Di vê çarçoweyê de Dewleta Osmanî yek bi yek dawî li mîrnîşîniyên kurd ên mîna Baban, Soran, Rewandûz, Behdînan, Hekarî, Mehmûdî, Botan û hwd. aniyê. “Mîrnîşîniyên dawî, ji aliyê Dewleta Osmanî ve bi plan û hêza leşkerî ve ji holê hatine rakirin.”<sup>1</sup> Li vira lazim e ku em behsa du mîrên bi hêz ên kurd bikin; Mîr Mihemedê Kor (Mîrê Gewre) û Mîr Bedirxan Beg. Ji ber ku van herdu mîran li hember vê polîtîkaya Osmanîyan gelekî berxwe dane û gihêştine hêzeke mezin. Lê belê, Mîr Mihemed di rêya vegeerê ya Kurdistanê de di sala 1835an de bi awayekî nehênî hatiye kuştin û di heman salê de jî birayê wî Resûl derbasî şûna wî bûye. Lê, di sala 1847an de dawî li vê mîrnîşîniyê hatiye.<sup>2</sup> Mîr Bedirxan Beg jî di sala 1847an de teslîm bûye û bi bal Gîrîtê ve hatiye sirgun kirin. Ev bûyer jî bûye dawiya mîrnîşîniya botan.<sup>3</sup> Lê belê, ji mîrnîşîniyên kurdan a ku herî dawiyê ji holê hatiye rakirin, Mîrnîşîniya Erdelanê ye ku sala wê 1865 e.<sup>4</sup>

Piştî mîrên kurdan, di desthelatdarî û otorîteyê de valahiyeke gelek mezin derketiye holê. Reqabeta serekiyê ya di nava eşîran de bi xwe re alozî û nediyariyeke

<sup>1</sup> Martin van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r. 200.

<sup>2</sup> Bruinessen, h.b., r. 270.

<sup>3</sup> Bruinessen, h.b., r. 277, 278.

<sup>4</sup> Abdurrahman Kassemli, *Özgürlük Mücadelesinde Kırk Yıl*, Koral Yayınları, İstanbul, 1992, r. 29.

mezin aniye. Axa û serekên piçûk ên ku xwe mezin dîtine ne guh dane hev û ne jî guh dane waliyên ku ji aliyê navendê ve hatine wezîfedar kirin. Di vê atmosferê de axa û serokê eşîrên ku nîsbeten bi hêz bûne dest bi zilm û talanbirina eşîrên din kirine. Herwiha, şerên di nava eşîran de bi xwe re hejmara dozên xwînê jî zêde kiriye. “Li deverên gundîşîniyan, têkbirina mîrnîşîniyên kevin û mîrekiyên nîvgirêdayî yên din ên Kurdistanê tenê bi xwe re xerabûna zagon û rêvebirinê aniye.”<sup>5</sup>

Di rewşeke wiha de aktorên nû derketine sehneyê û ew otorîteya vala dagirtine. Hetta, wê çaxê ew şêxên ku tenê otorîteyên dînî bûne, êdî bûne otorîteyên siyasî jî. Êdî, di çareserkirina hemû mişkule û astengiyan de çî serekên eşîran û çî jî kesên ji rêzê serî lê şêxan dane. Ev jî bûye egereke gurbûna nifûza şêxan. Piştî têkçûna mîran Dewleta Osmanî bi reformeke nû ya axê ve girseyeke mezin a axê li ser axa û şêxan tapî kiriye.<sup>6</sup> Vê jî otorîteya axa û şêxan bêtir pêjandiye. Heta, hin şêx û axayan bi rêya zewacê ve dereceya meşrûiyeta otorîteya xwe bilindtir kirine. Bo nimûne, Şêx Seîd Barzanî ji Hemawendiyan zewiciye û bi vê zewacê ve li devera Silêmanî û Kerkukê bandora xwe zêdetir kiriye.<sup>7</sup> Şêx Taha jî bi heman mebestê ve ji malbata Simko zewiciye.<sup>8</sup>

## 1.2. Serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî

Di salên 1877 û 1878an de di navbera Dewleta Osmanî û ya Rûs de şerekî mezin û giştî derketiye. Ji ber salên şerê dirêj xezîneya Dewleta Osmanî vala bûye û dewlet ji aliyê aboriyê ve ketiye tengasiyeke mezin. Dewletê, ji bo xezîneya ku vala bûye dabigire, rêjeya bacê zêde kiriye.<sup>9</sup> Di salên şer de ji ber ku mêr beşdarî şer bûne, çandiniya ku li ser milê mêran hatibûye kirin adeta gihêştiye dereceya rawestî. Di hengameya şer de gelek heywan jî telef bûne. Di rewşeke wiha de di nava gel de tinebûn û xelayê rû daye. Ji ber birçîbûn, xela û nexweşiyê gelek însan jî mirine.<sup>10</sup> Digel van rewşên neyînî dewletê jî bi zextê ve xwestibûye ku bacê berhev bike.

Di atmosfereke wiha de Şêx Ubeydullah, bi nameyan û bi bangeke giştî ve hemû kurd vexwendiyê serhildanê.<sup>11</sup> Piştî vê bangê Şêx Ubeydullah li Şemzînanê civîneke giştî li dar xistiye. Anegorî Averyanov, ji hemû deverên kurdan 5 heb şêx, 21 heb xelîfe,

<sup>5</sup> Dawid McDowal, *Modern Kürt Tarihi*, Doruk Yayıncılık, Ankara, 2004, r. 83.

<sup>6</sup> Bruinessen, h.b., r. 347.

<sup>7</sup> McDowal, h.b., r. 146.

<sup>8</sup> McDowal, h.b., r. 177.

<sup>9</sup> Celîl Celîl, *1880 Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması*, Pêrî yayınları, İstanbul, 1998, r. 49.

<sup>10</sup> Celîl, h.b., 55.

<sup>11</sup> Celîl, h.b., r.79.

42 heb mîrze, 68 heb jî beg beşdariya vê civînê kirine.<sup>12</sup> Piştî vê civînê biryara serhildanê hatiye pejirandin. Li ser vê biryarê Seyîd Evdilqadirê kurê Şêx Ubeydullah, di îlona 1880yan de serî hildaye. Di demeke kurt de serhildan gur bûye û bi beşdariya gelek nûnerên kurdan ve belayî gelek deveran bûye. Di destpêkê de hêza Seyîd Evdilqadir ji 20 hezar hesan pêk hatibûye. Lê belê, li ser bidestxistina xenîmet û talanbirina wan deverên ku ketine dest de mirovên ku di nava refên Seyîd Evdilqadir de bûne berê xwe dane malên xwe. Di nava hêza Seyîd Evdilqadir de tenê 1 500 kes mane.<sup>13</sup> Piştî ku serhildan ji aliyê artêşa navendî ya Îranê ve hatiye şikandin, Şêx Ubeydullah jî dîsa vegeyriyaye Şemzînanê. Lê, Dewleta Osmanî, di demeke nêz de ew û kurê wî Seyîd Evdilqadir ewil sirgunê Musulê û dû re jî sirgunê Mekkeyê kirine.<sup>14</sup> Şêx Ubeydullah di heman salê de li Mekkeyê wefat kiriye. Sirguniya Seyîd Evdilqadir jî bi îlana meşrûtiyetê ve xelas bûye û Seyîd Evdilqadir jî li Stenbolê bi cih bûye. Piştî ku Komara Tirkîyeyê ava bûye, di 23yê gulana 1925an de dadgeha îstîqlalê\* li ser hin xebat û faaliyetên kurdariyê Seyîd Evdilqadir û tevê çendîn rêhevalê wî mehkûmê îdamê kiriye. Biryara îdamê di 27ê gulana 1925an de hatiye înfaz kirin.<sup>15</sup>

### **1.3. Alayên Hemîdiye, Alayên Eşîretan yên Sîwariyên Sivik û Alayên Şemsedînovan**

Siltanê Osmaniyan Evdilhemîd, di sala 1881ê de bi navê *Alayên Evdilhemîd* ve yekîneyên sîwarî yên ne nîzamî ava kirine. Bi vê biryara xwe ve Evdilhemîd du tişt kiriye hedefa xwe. Yek jê; kontrolkirina kurdan e, ya din jî mînîmûzekirina tehdîda ermeniyan e.

Di sala 1908an de dema ku hikumeta îttîhad û teraqiyê rêvebirî ji Evdilhemîd sitendiye, tenê bi guhertina navê wê ve ev alay hiştine. Navê wanê nû jî bûye “alayên eşîretan.” Ev alayên ku qeweta xwe dîrekt ji navendê girtibûne li herêmê tu qanûn û zagon guhdarî nekirine, zilm û zordestiya kesên ji xwe zeîftir kirine. Hetta, li ermeniyan

---

<sup>12</sup> Ahmet Kahraman, *Kürt İsyancıları Tedib ve Tenkil*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2004, r. 131.

<sup>13</sup> McDowal, h.b., r. 89-91.

<sup>14</sup> Celîl, h.b., r.119.

\* Dadgehên Îstîqlalê (istiklal mahkemeleri), bo ji holêrakirina serhildêr û dijberên komara nû hatine avakirin. Bo ku dadgerekî/ê di van dadgehan de cî bigirta ne lazim bûye ku hîndekariya dadê wergirtibe û zagonan zanibe. Kesên ku di van dadgehan de wekî dadger cî girtine, zêdetirê wan parlementer, leşker an jî burokrat bûne. Bo agahiyên zêdetir li bn. ya Kahraman bnr.

<sup>15</sup> Kahraman, h.b., r. 137.

jî gelek eziyet kirine. “Di rastiye de beriya şerê cihanê yê yekemîn de kurd, tenê ne bi bânîzamîbûn û rêbirînê, lê belê bi eziyetên ku li ermeniyên kirine ve jî hatine rojevê.”<sup>16</sup>

Rusan, bo ku kurdên devera serhedê bi rê bixin û tevî nav refên xwe bikin bi rêya Şemsedînovan ve ketibûne nava hewldaneke mezin. Peywendiyên nîv-dîplomatîk ên di navbera Şemsedînov û Rusan gihêştîye dereceya avakirina du alayên kurd. Navê van herdu alayan jî “Alayên Şemsedînovan (Şamşadînovskî Polk)” bûne.<sup>17</sup>

Her dewleteke ku li ser axa kurdan hikum kiriye, anegorî berjewendiyên xwe “pênaseyeke kurd” daniye û anegorî vê pênaseyê jî rê daye pêşîya kurdan.

#### 1.4. Şerê Cihanê yê Yekemîn

Beriya şerê cihanê yê yekemîn di sala 1913an de li Bedlîsê “tevgereke piçûk” ji aliyê dewletê ve wekî serhildanekê hatiye qebûl kirin û li ser vê bûyerê Mele Selîmê Hîzanî bi hin hevalên xwe wekî sûcdar hatine qebûl kirin û cezayê îdamê ve hatine darizandin. Beriya şerê cihanê kesekî din ê ku serî hildaye Şêx Evdiselam Barzanî ye. Şêx Evdiselam di sala 1914an de ji aliyê Silêman Nazîfê waliyê Musulê (ew bixwe jî bi nijad kurd bû) ve hatiye girtin û dû re jî hatiye îdam kirin.<sup>18</sup>

Ji ber ku helbestvanê me Heyderî beşdariya şerê cihanê yê yekemîn kiriye, girîngiya vê dewreyê jî bo me zêde bûye. Heyderî, dora du salan tevî şerê bûye û li ser birîndarbûna xwe hatiye terxîs kirin û dîsa di vî şerê de birayekî xwe jî wenda kiriye. Helbet, vî şerê ne tenê bo helbestvanê me, ji bo hemû kurdan jî rojên xerab û malwêranî bi xwe re aniye.

Piştî şerê cihanê yê yekemîn, hema hema nexşeya hemû rojhilata naverast hatiye guhertin. Piştî vî şerê, şûna ku kurd bigehêjne azadiyê, welatê wan ji berê jî perçetir bûye. “Di vê wextê kurt de kurdan, derfêteke mezin a bo ku dewletekê ava bikin wenda kirine û di navbera sîstema dewletên nû yê ku di dewsa dewleta Osmanî û Kacaran de ava bûne de perçe bûne û ketine statûya kê-m-netew.”<sup>19</sup>

Li dû şerê cihanê, li ser mîrata Dewleta Osmanî, Komara Tirkiyayê ava bûye. Piştî avabûna komarê di demeke kurt de li hemû deverên cîmhûriyetê li ser kurdan qedexeyiyeke giştî hatiye danîn.

<sup>16</sup> McDowal, h.b., r. 103.

<sup>17</sup> Rohat Alakom, “Kürt-Rus İlişkileri Tarihinden Şemsedinov Kürtleri”, *Kürt Tarihi*, Sayı 1, İstanbul, 2012, r. 30-35.

<sup>18</sup> McDowal, h.b., r. 151-152.

<sup>19</sup> McDowal, h.b., r. 13.

## 1.5. Serdema Salên Destpêkê yên Komara Tirkiyeyê yên ku Heyderî tê de Jiyaye

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn Dewleta Osmanî, têkçûneke giştî wergirtiye. Dewletên mezin anegorî “hevpeymanên nehênî” yên ku di nav xwe de îmze kiribûne, axa Dewleta Osmanî di nav xwe de parve kirine û van dewletan yek bi yek dest bi dagirkirina herêmên ku para wan ketibûne, kirine. Di vê hengameyê de, li hember hikûmeta stenbolê li anadoluyê himûmeteke nû avabûna xwe îlan kiriye. Hikûmeta nû ya ku li Enqereyê ava bûye, meşrûiyeta hebûna xwe li ser qelbsbûna îradeya hikûmeta stenbolê ava kiriye. Şûnde, hikûmeta enqereyê li hember hemû hêzên dagirker ên ku axa Dewleta Osmanî dorpêç kirine, dest bi şer kiriye. Di vê navberê de dewletên mezin jî li Sewrê hikûmeta stenbolê bo hevpeymanê îqna kiriye û di 20ê tebaxa 1920an de Peymana Sewrê îmze kirine. Ji maddeyên sewrê yên ku kurd û kurdistanê eleqedar dikin madeya 62, 63 û 64emîn in. Anegorî van maddeyan di nav salekî de kurd dê peyderpey bigehêştina azadiyê. “Lê belê, ji bo hikûmeta enqereyê Peymana Sewrê, beriya ku hibira wê ziha bibe hatibû bêhukim kirin.”<sup>20</sup>

### 1.5.1. Serhildana Koçgiriye

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn li stenbolê *Komeleya Pêşketina Kurdan (KPK)* ava bûye. Di nava damezirînerên komeleyê de kurdên elewî yên mîna serokê eşîra koçgirî Mistefa Beg û kurê xwe Elîşan Beg û Nûrî Dêrsimî yê ku kurê axayekî bûye, cî girtine. Bernameya vê komeleyê, bo “dayîna mafên kurdan” û “tesbîtkirina sitatûya kurdistanê” xebata bêyî çek bûye. Elîşan Beg û Nûrî Dêrsimî li ser van helwestan li deverên cûda yên Dêrsimê nûnertiyên vê komeleyê vekirine û dest bi xebatên polîtîk kirine. Lê belê, rojavayê Dêrsimê li derveyî sînorê kurdistanê ku dê anegorî Peymana Sewrê damezirîya, maye. Di 20ê çiriya paşîna 1920an de hêzên di kontrola Elîşan Beg de serî li hember hikûmeta enqereyê hildane. Serhildêran daxwazên xwe wiha rêz kirine: (i) Ji aliyê hikûmeta enqereyê ve jî qebûlkirina otonomiya kurdan a ku jixwe ji aliyê hikûmeta stenbolê ve hatiye qebûl kirin; (ii) Berdana girtiyên kurd ên ku di girtîgehên Xarpêt, Meletî, Sêwas û Erzincanê de ne; (iii) Banglêkirina veşerê bo peywirdarên tirk ên ku li deverên kurdan peywirdar in; (iv) Ji Koçgiriye vekişîna hemû hêzên tirk.<sup>21</sup> Lê belê, di van rojan de hikûmeta enqereyê di tengasiyeke mezin de bûye. Li rojhelatê bi ermeniyên re û li rojavayê jî bi yewnaniyan re di nava şer de bûye. Ji ber vê tengasiyê

<sup>20</sup> McDowal, h.b., r. 197.

<sup>21</sup> McDowal, h.b., r. 257.

hikûmeta enqereyê li hember daxwazên Koçgirîyê ketibûye bêdengiyê. Bêdengiya hikûmeta enqereyê bi biharê re cihê xwe daye operasyona li ser Koçgirîyê.

Di demeke kurt de serhildan hatiye şikestin. Serokê serhildêran piştgiriya ku ji kurdên elewî yên mayî û kurdên sunî hêvî kiribûne, nedîtine. Hetta, gelek deverên din ên kurdan jî bi vê serhildanê qet nehisiyabûne.

### **1.5.2. Hîzbê Azadiya Kurdistanê (Azadî) û Serhildana Şêx Seîd**

Li ser Peymana Agirbesta Mondorosê dewletên mezin, yek bi yek, dest bi dagirkirina axa osmaniyan kirine. Anku, hikûmeta enqereyê mecbûr maye ku di heman demê de di gelek eniyan de şer bike. Di sala 1919an de Mistefa Kemal, ji serokê eşîrên kurdan yên ku di sala 1916an de dema peywirdariya xwe ya li Diyarbekirê de hevûdin naskiribûne re name şandiyê. Di van nameyan de banga berxwedana giştî û hevpar kiriye. Hetta Mistefa Kemal, di îlona 1919an de wiha gotiye: “Heya ku mirovên xwedî rûmet û rêzdar hebûna xwe berdewam bikin, kurd û tirk dê li dora saziya xîlafetê bi birayetî bijîn û dê li hember dijminên hundurîn û derveyîn bibine birceke hesinî.”<sup>22</sup> Vê bangê cihê xwe dîtîye û gelek serekên kurdan bersiveke erênî dane vê bangê û hetta van serekan li enqereyê di avakirina meclîsa yekemîn de jî cî girtine. Di nava van serekan de digel serokê eşîran serekên dînî û çend kesên ku li mektebên eşîran de perwerde dîtine jî hebûne. Mistefa Kemal, di hengameya tehdîda hêzên dagirker de bi soz û we’den mîna “teslîmkirina mafên kurdan” û “bo kurdistanê otonomî” ve bi awayekî giştî piştgiriya kurdan bi dest xistiye. Lê belê, piştî berterefkirina hemû hêzên derveyîn vêca komara nû berê xwe daye kurdan.

Li ser têkçûna hêzên yewnaniyan ên li rojavayê anadoluyê, dewletên mezin ên mîna Fransa û Brîtanyayê li bajarê Lozanê bi hikûmeta enqereyê re Peymana Lozanê îmze kirine. Piştî ku komara nû hebûna xwe di asta cîhanî de daye qebûl kirin, vêca ew kesên ku xwe xwediyê komarê dîtine dest bi înkîlaban kirine. Meclîsa yekemîn girtine û meclîseke nû ava kirine. Di vê meclîsa nû de, kesên ku di meclîsa yekemîn de li ser navê kurdan polîtîka kiribûne bi giştî cihê xwe wenda kirine. Anku, komara nû piştî lozanê ruyê xwe yê rastîn ê derheqê kurdan de aşkere kiriye. Êdî, reddîyeya li ser kurdan bi awayekî nîzamî û sistematîk di hemû warê jîyanê de xwe nîşan daye.

---

<sup>22</sup> McDowal, h.b., r. 260.

Salên destpêkê yên Komara Tirkîyeyê bi awayekî awarte derbas bûne. Kesên ku hêz û qeweta dewletê kirine destê xwe, xwe wekî xwediyê dewletê dîtine û bi awayekî tîj û tund dest bi dijberiya ew kesên ku ji hebûna xwe re wekî tehdîd dîtine.

Ji sitûneke bingehîn a ku dewletê li ser reddiyeya wê, meşrûiyeta hebûna xwe ava kiriye, kurd in. Anku, di komara nû de xûyan bûye ku ciyê kurdan tine. Hebûna kurdan hatiye înkâr kirin û dewletê hewl daye ku hemû nîşaneyên ku îşaretê hebûna kurdan dikin ji holê rakin. “Axaftina bi kurdî”, “xwekirina cil û bergên kurdî”, “perwerdeya bi zimanê kurdî” û hwd. hemû hatine qedexe kirin. Bi destê dewletê kampanyayên mîna “Hemwelatî, bi tirkî biaxive! (Vatadaş Türkçe konuş!)” hatine meşandin. Hetta, di sûk û bazaran de ji ber ku kurdî axivîne ji kurdan re cezayê pereyê hatiye birîn.

Di heman salê de hin serekên kurd bo îstîqlala kurdistanê rêxistineke nû ava kirine. Navê vê rêxistinê jî *Hîzbê Azadiya Kurdistanê* (HAK) ye. Di nava damezirînerên HAKê de hin rêvebirên KPKyê jî hebûne. HAK di hezîrana 1923an de di civîneke li mala Xalid Begê Cibrî ya li Erziromê de ava bûye.<sup>23</sup> Di nava damezirînerên HAKê de van kesan cî girtibûne: Xalid Begê Cibrî, Yusif Zîya Beg (parlementerê Bedlîsê), Qasim\*, Huseyîn Paşayê Kor, Hecî Mûsayê Modanî, Fewzî Beg. Di nava rêvebirên nehênî yên HAKê de Şêx Seîd û Seyîd Evdilqadir jî hebûne.<sup>24</sup> Helwesta sereke ya bernameya HAKê ji aliyê Xalid Beg ve wiha hatiye diyar kirin: “Damezirandina Kurdistanê Azad”. Ji bo vê armancê jî rêvebiriya HAKê di civîna 1924an de biryara serhildanê ya ku dê gulana 1925an de bê destpêkirin, wergirtiye.<sup>25</sup>

Lê belê, di tebaxa 1924an de li devera Hekariyê Nestûriyan serî hildane. Bo şikandina vê serhildanê dewletê hêzeke leşkerî şandiye devera Hekariyê. Di nava vê hêza leşkerî de 4 heb efserên ku endamên HAKê bûne jî hebûne. Van endamên HAKê ji navenda rêxistinê telgraf wergirtine, lê peyama ku bo wan hatibûye şandin şaş fêm kirine. Li ser vê têgihêştina şaş van efseran li herêmê serhildan dane destpêkirin. Lê belê, ji tu eşîrên wê deverê piştgirî nedîtine û neçar mane revîne Iraqê. Li ser vê bûyerê jî dewletê dest bi girtina rivebirên HAKê yên ku jixwe ji berê de bi armanca wan haydar

---

<sup>23</sup> Kahraman, h.b., r. 63, 64.

\* Halid Begê Cibrî, Yusif Zîya Beg û Qasim Ataç (piştî *qanûna paşnavê* Qasim, paşnava “ataç” girtiye) hevalên hev ên polê yên ji mektebên eşîretan bûne. Di heman demê de Qasim Ataç bûrayê Halid Beg bûye. Lê, herçiqas sefên van kesan bişibine hevûdin jî, aqûbeta wan ewçend ne weke hevdu bûye. Qasim Ataç, him helwesta rêvebirên HAKê îxbarê dewletê kiriye û him jî di girtina Şêx Seîd de rola sereke leyistiye. Bo agahiyên zêdetir li bn. ya Kahraman bnr.

<sup>24</sup> Kahraman, h.b., r. 64.

<sup>25</sup> McDowal, h.b., r. 267.



bûne, kirine. Di vê pêlê de Halid Beg, Yusif Zîya Beg û Hecî Mûsayê Modanî hatine girtin û di nîsana 1925an de hatine îdam kirin (xeynî Hecî Mûsa).<sup>26</sup>Dewletê ev operasyon bi awayekî nehênî û tele tel domandiye. Wisa xûyan bûye ku êdî dor hatiye rêvebirên nehênî yên HAKê; Seîd Evdilqadir û Şêx Seîd. Dema ku Şêx Seîd ev rewş fêm kiriye, êdî li mala xwe nesekiniye û Xinis terikandiye û ketiye nava gel. Ji ber ku demsal zivistan bûye Şêx Seîd nikaribûye banga berxwedana giştî bike û ji bo vê helwestê jî benda biharê maye. Di vê navberê de jî gera xwe ya di nava gel de berdewam kiriye. Lê belê, di 8ê sibata 1925an de li Pîranê di navbera alîgirên Şêx Seîd û hin cendirmeyên ku li pey “qaçaxên qanûnê”<sup>27</sup> an jî “şeş heb qaçaxên leşkeriyê”<sup>28</sup> bûne de pevçûn derketiye. Di pevçûnê de çend cendirme hatine kuştin û yên mayîn jî dîl hatine girtin. “Dibe ku helwesta dewletê ya ji vê rûdanê, bo girtina Şêx Seîd afirandina hincetekî be.”<sup>29</sup>

Li ser vê bûyerê Şêx Seîd neçar maye ku beriya biharê banga raperfina giştî bide. Di demeke kurt de serhildan gur bûye û di heman hefteyê de Licê û Hênê ketine. Di hefteya yekemîn a adarê de Erxenî û li devera Mûşê jî Gimgim, Milazgir û Kop ketine. Di 7ê adara 1925an de Şêx Seîd bi hêzeke ku ji 5 hezar kesan pêkhatibûye ve Diyarbekir dorpêç kiriye. Lê belê, ev dorpêçkirin serneketiye û bêyî ku Diyarbekir bikeve hêzên teqwiye yên dewletê gihêştine û dorpêçkirin şikandine. Refên hêza Şêx Seîd belav bûne û Şêx Seîd jî ji girtinê filitiye. Lê belê, Şêx Seîd bi destê bûrayê xwe Qasim ve di 14ê nîsanê de teslîmê dewletê hatiye kirin.

Li ser serhildanê, dewletê jî tedbîrên gelek mezin sitendiye. Dewletê di 24ê sibatê de “rêvebirina awarte” îlan kiriye û dû re jî di 4ê adarê de îlana avakirina “dadgehên îstîqlalê” daye. Awayê xebata dadgehên îstîqlalê bi yasaya “teqrîr-î sikûn” ve meşrûiyet sitendiye. Şêx Seîd, bi 47 heb rêhevalên xwe ve di dadgeha îstîqlalê ya Diyarbekirê de hatine darizandin û di 29ê hezîranê de jî bi tevahî hatine îdam kirin.<sup>30</sup> Dewletê, çî ji kesên ku di serhildanê de derketine pêş, lê di şikandinê de ji mirinê filitîbûne û çî jî ji yên ku beşdariya serhildanê nekirine bi awayekî nîzamî, bi yasayên mîna “yasaya tenkîl û îskanê” ve berê wan dane bajarên rojavayê tirkîyeyê. Anegorî

---

<sup>26</sup> McDowal, h.b., r. 272.

<sup>27</sup> McDowal, h.b., r. 269.

<sup>28</sup> Kahraman, h.b., r. 85.

<sup>29</sup> McDowal, h.b., r. 270.

<sup>30</sup> Kahraman, h.b., r. 176.

reqamên fermî jî di pêvajoya şikandina serhildanê de ji 7 hezar 500 kesên ku hatine girtin jê 660 kes hatine îdam kirin.<sup>31</sup>

### 1.5.3. Xoybûn, Serhildana Agiriyê û Qetlîama Zilanê

Di sala 1922yan de dema ku hêzên hikûmeta enqereyê stenbol ji îngîlîzan wergirtine kesayetên kurdperwer ên ku ji bo îstîqlala kurdan xebat kiribûne, mecbûr mane ku tirkîyeyê biterikînin. Ji ber ku navê wan di nava “lîsteya qedexeyîyan” a ku ji aliyê hikûmeta enqereyê ve hatibûye îlan kirinê de hebûye. Li ser vê biryarê kesayetên kurdperwer berê xwe dane bajarên mîna parîs, tebrîz, qahîre, şam, heleb, bêrûd û hwd. Van kesayetên kurd, herçiqas ku serhildanên kurdan yek bi yek hatibine şikandin jî lê dîsan bawerîya xwe ya îstîqlala kurdan wenda nekiribûne.

Bê vê baweriyê ve kurdperwerên ku belayê serbajarên rojhelata naverast bûne, biryara avakirina rêxistineke nû dane. Bi vê armancê ve kesayetên mîna Memduh Selîm Beg, Şukru Sekban, Îhsan Nûrî, Haco Axa, Şerîf Paşa, Şêx Elî Rizayê kurê Şêx Seîd û biraderên Berdixanî; Celadet û Kamûran li bajarê Bîhamdun ê libnanê kongreyek civandine.<sup>32</sup> Di vê kongreyê de Rêxistina Xoybûnê hatiye ava kirin. Bo serokatiya rêxistinê jî Celadet Bedirxan hatiye hilbijartin. Bernameya Xoybûnê, “bêyî ku tu cudahiyên mîna bawerî, mezheb, eşîret, zarava û hwd. bixe navê hemû kurd dê li dora fikra “rizgariya kurdistanê” bêne civandin”, bûye. Biryareke din a Xoybûnê jî avakirina artêşeke modern bûye. Bo avakirina artêşekî jî gotine ku li ser tecrubeyên berê, artêşa ku dê bê ava kirin, dê hêza xwe ya eslî ji eşîran negre lê belê, dê bi awayekî nûjen bê organîze kirin.<sup>33</sup> Bi vê minasebetê ve Îhsan Nûriyê ku jixwe ji artêşa osmaniyan hatibûye, derxistine paşatiyê û serokatiya artêşê jî dane wî.

Di sala 1928an de li ser zextên tirkîyeyê, fransayê hemû faalîyetên xoybûnê yên li suriyeyê qedexe kiriye. Lê belê, di heman salê de jî, hêzên di serokatiya Îhsan Nûrî de li devera Agiriyê serî hildane. Jixwe beriya ku Îhsan Nûrî bigehêje Agiriyê, Îbrahîm Begê Celalî yê ku li ser biryara sirgûnê ya dewletê derketibûye û vekîşiyaye Çiyayê Agiriyê, hêzek berhev kiribûye.

Xeynî Îhsan Nûrî û Îbrahîm Beg qumandarên hêzên serhildêr ev bûne; Ji eşîra hesenan Ferzende Beg û Seyîdxan Beg, ji eşîra sipkî Xalis Beg, ji eşîra heyderan jî herdu kurên Huseyîn Paşa; Nadir û Mehmed Beg. Ji van serekên eşîran her yek li devera xwe li hember hikûmetê serî hildane û berxwedaneke mezin nîşan dane. Digel ku

<sup>31</sup> McDowal, h.b., r. 272.

<sup>32</sup> Kahraman, h.b., r. 213.

<sup>33</sup> McDowal, h.b., r. 281.

dewletê du caran sefer rakiriye ser serhildêran lê dîsan jî, serhildan neşikandiye. Nûçeyeke New York Timesê ya derheqê serhildanê de wiha ye, “Atatürk difikire ku eger şikandina serhildanê dirêj bibe, dê derbasê herêmê bibe û dê bixwe femandariya artêşê bike”.<sup>34</sup>

Di bihara 1930an de artêşa tirkîyeyê bi top, tank, balafirên şer û 100 hezar leşkeran ve dest bi êrişa giştî kiriye. Li ser vê operasyonê serhildan şikestiyê û kesên ku ji mirinê filitîne jî xwe sipartine Geliyên Zîlanê.

Kesên ku di geliyan de sitar bûne wisa bawer kirine ku dê destê dewletê negihêje geliyan û ewan jî dê ji mirinê xelas bibin. Hetta, kurdên ku beşdariya serhildanê nekiribûne, bi awayekî aşkere û bêtirs, li zozanên derdorê geliyan konên xwe vegirtibûne û bawer kirine ku dewlet dê têkildarê wan nebe.

Dema ku artêşa tirkîyeyê dest bi êrişa giştî kiriye, tirkên elcewaz û erdîşê jî xwe nivîsîne nav refên mîlîsan û ji ber ku ji herêmê beled bûne li pêşiya artêşê wezîfeya rehberiyê kirine. Hetta, di nava van mîlîsan de hin kurdên ku ji qetlîamê tirsiyane jî cî girtibûne.<sup>35</sup> Ev artêşa mezin û qebralix, bi çekên giran ve Geliyên Zîlanê dorçeper kirine û dest bi *gulebaranê* kirine. Di vê qetlîamê de ferqa serhildêr, jin-mêr, kal-pîr, ciwan-zarok-pitik nehatiye raçev kirin û ev kesan bi giştî bûne hedefa lûleyan. Rojnameya Cimhûriyetê ya niv-fermî ev herekat wiha terîf kiriye: “Paqîşkirinê dest pê kir / *temizlik başladı*, herba li vir bi şeweyekî mudhîş ve cereyan kiriye / *buradaki harp pek müthiş bir tarzda cereyan etmiş*, Geliyên Zîlanê heta dev re çije cesed bûne / *Zilan Deresi lebaleb cesetle dolmuştur*.”<sup>36</sup>

Hejmara teqez a kesên ku di vê komkujiyê de hatine kuştin, tu çaxî nehatiye zanîn û dê neyê zanîn jî. Lê, hin çavkaniyan, derheqê vê hejmarê de hejmarên ku ji hev nagirin dane. Anegorî hin çavkaniyan digel şikestina Agiriyê ve ev hejmar di navbera 48 û 60 hezarî de ye. Dîsan anegorî çapa 16ê fîrmeha 1930î ya Rojnameya Cumhuriyetê ev hejmar zêdetirî 15 hezaran e.<sup>37</sup> Dewletê bo ku kiryarên herêma qetlîamê neyê darizandin di sala 1931an de qanûnek (n. 1850) derxistiye.<sup>38</sup>

Mela Ehmedê Heyderî di nava şert û mercên ku me li jor dîmenek jê daye de jiyana xwe derbas kiriye. Heyderî di bin reddiyeyeke giştî de dîwana xwe bi kurdî nivîsiye û dîwana wî jî di nava tarîtiyan de ji çavan dûr gihêştîye roja me.

---

<sup>34</sup> Kahraman, h.b., r. 217.

<sup>35</sup> Sedat Ulugana, *Zilan Katliamı*, Weşanên Pêrî, Stenbol, 2012, r. 89, 90.

<sup>36</sup> Ulugana, h.b., r. 151.

<sup>37</sup> Ulugana, h.b., r. 151.

<sup>38</sup> McDowal, h.b., r. 285.

# BEŞA YEKEMÎN

## JİYAN Û BERHEMÊN HEYDERÎ

### 1. JIYANA HEYDERÎ

Dema ku em bala xwe didine jiyana Mela Ehmedê Heyderî, em dibînin ku Heyderî di çaryeka dawîn a sedsala XIXan û nivê yekemîn ê sedsala XXan de, jiyaye û li ser wefata wî re hê sed sal derbas nebûye. Herçiqas Heyderî, helbestvanekî serdema nû be jî, him di nav çavkaniyên Edebiyata Kurdî yên dawîn de û him jî, di nav seyda û meleyên navdar ên ku di nav tradîsyona medreseyên klasîk ên kurdan de ne, cî negirtiye. Anku, Heyderî digel ku bi berhemên xwe ve di lîteratûra kurdî de cî negirtiye, zêde nehatiye naskirin jî. Ji aliyekî din ve jî di heyama edebiyata klasîk a kurdan de, ji bilî çend îstîsnayan nivîsandina kitêbên bîyografîk ên derheqê helbestvanan de zêde berbelav nebûne. Ji ber van sedemên neyênî yên ku hatine destnîşankirin, derbareyê jiyana Heyderî de tu agahî û pêzanînên nivîskî nîn in. Herwiha, girseya mezin a pêzanînên me yên derbareyî vê beşê, devkî ne<sup>39</sup>.

Li vir xaleka din a ku lazim e em diyar bikin ew e ku helbestvanê me hê jî neketiye nava lîteratûra akademîk a kurdî. Ji ber vê çendê jî xebat û weşanên ku li ser hatine kirin gelek kêr in. Xebatên ku heta niha derheqê helbestvanê me û dîwana wî de hatine kirin ev in.

1. Meqaleya Selîm Hisênî ya ku bi navê “Mela Ehmed” e ya ku di hejmarê 54an a Hawarê de derketiye. Li vir jî em ê cî bidine vê nivîsa kurt a ku Heyderî û dîwana wî dide nasîn:

#### **Mela Ehmed**

“Şaîrek ji Heyderan e, di mihaciriya xwe de hatibû qeza Nisêbinê. Ji ber ku evîna welat û millet di dilê wî de şax dabû, êşek lê peyda bûbû û di vê nesaxiya xwe de dîwanek ji şî‘ran û qesîdan çêkiriye. Heye qedere (300-400) rûpelî. Niha jî ew dîwan a bi xetê destê wî, li cem kurê wî ye. Navê wî M. Emîn e. Ew jî li nahiya Amûdê li gundê Xelîl dersên şerîetê dixwîne. Ji ber ku di stûna klasîkan û ya şairan de navê wî min ne dît, û mîr jî dibêje van weşartiyên wiha divê hûn ji min

---

<sup>39</sup> Agahiyên devkî yên derheqê jiyannameya Heyderî ji malbata wî (herdu neviyên Heyderî; Şêx Ehmed Heyderî, Mela Diyaeddîn Heyderî) hatine wergirtin. 06. 01. 2012; 14:00.

re bidin naskirin. Lewra, me îro dest pê kir û wan peşkeşî mîrê mezin dikim ezbenî<sup>40</sup>.

Li dû vê nivîsa danasîner, helbesta yekemîn a Dîwana Heyderî cî digre. Anku, nivîsa danasîner û helbest, bi tevahî di nivê rûpela 4an de hatine bicîkirin. Girîngtirîn xaleka din a ku di vê nivîsa kurt de hatiye dayîn ew e ku xetên vê dîwanê yên Heyderî bixwe ne. Ev mijar, di beşa xwe de bi dorfirehî hatiye niqaşkirin.

2. Lêkolîna duyemîn a ku derheqê Heyderî hatiye kirin, meqaleya Dr. Abdurrahman Adak a ku bi navê “Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî” ye ku ev meqale di hejmarê 116an a Kovara Nûbiharê de derketiye.<sup>41</sup> Adak, di vê meqaleya xwe de li ser qonaxên jiyana Heyderî rawestiyaye, berhemên wî dane nasandin û li ser rola wî ya di tarîxa edebiyata kurdî de fikr û nêrînên xwe anîne zimên. Em dikarin bêjin ku ev nivîs tenha lêkolîna berfireh bû ku berî vê xebata me derheqê Heyderî de hatiye kirin û ji bo vê xebata me, bi taybet di babeta jiyana Heyderî de bû jêdereke sereke.

3. Çapa Dîwana Heyderî bi herfên erebî. Ev çap ji aliyê Mele Dîyadîn ve hatiye amadekirin û di sala 2012an de di nava weşanên Nûbiharê de hatiye çapkirin. Di pêvajoya amadekariya xebata me de ev çap hate kirin. Amadekar Mela Dîyadîn neviyê helbestvanê me ye û wî li ber nusxeya muellîf bi îmlaya erebî di bernameya wordê de metnê wê amade kiriye. Lê digel vê jî ev metin ne metnekî bi krîtîk e. Di destpêka vê çapê de nivîsa Abdurrahman Adak a ku di kovara Nûbiharê de wekî meqaleyekê hatibû çapkirin jî cî digire.

### 1.1. Nav û Mexlesa wî

Navê helbestvanê me Ehmed e. Hetta, navê şairê me yê berbelav Mela Ehmedê Heyderî ye. Ev nav jî, nîsbetê bal eşîra Heyderîyan e.

Mela Ehmedê Heyderî, mexlesa xwe ya ku di helbestên xwe de ji xwe re wekî nav hilbijartiye bi şeş şêwazan ve bikaraniye. Anku, tenê mexlesek bikarneaniye. Yek ji wan, navê wî yê rastîn e: *Ehmed*; ê duduyan nîsbet bi bal navê wî yê rastîn e: *Ehmedî*; yê sisêyan jî nîsbet bi bal navê eşîra wî ve: *Heyderî*; yê çaran bikaranîna van herdu navan a bihevre ye: *Ehmed Heyderî*; yê pêncan berevajiya mexlesa çaran e: *Heyderî Ehmed*; û yê şeşan jî, navê herêma ku lê hatiye dinyayê ye: *Serhedî*. Pêwist e ku em li

<sup>40</sup> Selîm Ş. M. Hisênî, “Mela Ehmed”, *Hawar*, j. 54, 15 Gulan 1943, r.4.

<sup>41</sup> Abdurrahman Adak, “Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî”, *Nûbihar*, c.15, j.116, 2011, r. 17-20.

vira eşkere bikin ku *Serhedî* di dîwana wî de di şewaza mexlesê de tenê carekê ku ew jî di helbesta 9an de ye, hatiye bikaranîn. Herçiqas, bo ku mirov navekî wekî mexles qebûl bike, divê çendîn caran hatibe bikaranîn jî lê belê dema ku mirov li ciyê vê peyvê dinêre, mirov dibîne ku him ji ber qafiyeya hundurîn û him jî, ji aliyê wateyê ve xwendina *Serhedî* wekî mexleseki, rasttir e.

Îro tu eşan ezyed î yad û muhacir Eħmed î  
Xweşke bi sewta **Serhedî** şî' rê di hingamê gerîb  
(9/13)

Li jêrê me cî daye hejmara bikaranîna mexlesan. Me ji bo her mexleseke çend mînakên ji dîwanê pêşkeş kiriye.

## 1. Eħmed

Ev mexles di seranserê dîwanê de 42 caran hatiye bikaranîn.

Nalîn hezar in Heyderî Mecnûnê Leylaya zer î  
**Eħmed** bi nalîn û girî têtin ji hicrê dil neşag  
(65/11)

Heyderî muştaqê dîdara te ye  
Harê çûn perwane 'ê şem' a te ye  
Şebr û taqet rohnîya 'eynê di min  
Te ji **Eħmed** merrişandin şef bi şef  
(67/9)

Bel mîne`d-derbî`n-neşabi`l-fîrquetî ya Heyderî  
To çûnên hemware mîayê bi ne' rê ejderê  
Sen de ya **Eħmed** içub sen hicretin fîncanleri  
Lew şev û rojan dibêjî el-fîraq û el-fîraq  
(72/8)

## 2. Eħmedî

Ev mexles di seranserê dîwanê de 19 caran hatiye bikaranîn.

Dilberê gâyet huner kir rim di endamê me werkir  
**Eħmedî** dil lê bi ker kir Heyderî rencûr dibit  
(12/13)

Heyderî îro Ğerîb e padîşahê sermedî  
Dil di 'işqê da nehîb e şadîman key **Eħmedî**  
Ser di bazarê 'ecîb e îş û rencê kes nedî  
Xakê ber payê hebîb e ruħfidê wî emcedî  
Teşne'ê cahê zenexdan im egişnî ya Ğeyaş  
(17/11)

Ateşê 'eşqê huner kir Heyderî sînesîper kir  
**Eħmedî** nalîn ji ber kir cerg û dilxûn mane fax  
(24/11)

### 3. Heyderî

Ev mexles di seranserê dîwanê de 62 caran hatiye bikaranîn.

Meyxaneyaya mey lê nebit reqşa def û ney lê nebit  
Dê **Heyderî** qey lê hebit ez tewbedar im el-Ġiyas  
(18/13)

Dêmsorgula lebkewşer î sîmgebgeb î qed<sup>‘</sup>er<sup>‘</sup>er î  
‘Işqek welê da **Heyderî** hemware bit ‘amek me xaz  
(41/11)

Şêrînzulalê şehdîwar xef **Heyderî** camek vexwar  
‘Işq û mehebbet bûn hezar xûrşîdmişalek bo me bes  
(43/11)

### 4. Ehmed Heyderî

Ev mexles di seranserê dîwanê de 8 caran hatiye bikaranîn.

Mislê te **Ehmed Heyderî** ka şehdê peygamê gerîb  
Neqşê seraser cewherî geş kir dilê ‘amê gerîb  
(9/1)

Werin da qenc bizanin hûn çi **Ehmed Heyderî**yim ez  
Bi şemşamê ferehefzûn çi peygam<sup>‘</sup>enberiyim ez  
(38/1)

Şem<sup>‘</sup>a te **Ehmed Heyderî** hîlbû di fanûsa zucac  
Qeşra te pîr kir enwerî fexendebad nî<sup>‘</sup>me<sup>`</sup>s-sirac  
Durra te dil lê muşterî xûrşîd ji şewqê bû wehac  
Lefzê ‘ebîr û ‘enberî cerhê te dîtî jê ‘îlac  
Gerq im di ava kewşerê rast û şîmal kafûr im ez  
(39/11)

### 5. Heyderî Ehmed

Ev mexles di seranserê dîwanê de 29 caran hatiye bikaranîn.

‘Işqê bi keffê ejderê şîmşîr û xiştê cewherê  
Axir telef kir **Heyderî Ehmed** gerîbê bêmedar  
(34/11)

Şekerguftarê serwa qed bi çeşm û ebrûyê eswed  
Feqîrê **Heyderî Ehmed** cinûnê kûh û sehra kir  
(35/11)


Ev reng e ‘işqê kir eşer sohtim wekî narê seqer  
Lew **Heyderî Ehmed** ji ber na’êt hesabê zehmeteş  
(49/11)

## 6. Serhedî

Ev mexles jî di seranserê dîwanê de tenê carekî hatiye bikaranîn.

Îro tu êşan ezyed î yad û muhacir Eħmed î  
Xweşke bi sewta **Serhedî** şî' rê di hingamê gerîb

(9/13)



**Grafîk 1:** Grafîka ku rêjeya bikaranîna mexlesan nîşan dide.

Beriya ku em vê mijarê biqedînin lazim e ku em çend xalên xusûsî yên derbareyê bikaranîna mexlesan de diyar bikin. Di helbesta klasîk de şaîr, nav an jî mexlesa xwe di beyt an jî bend a dawîn a helbestê de diyar dike. Lê belê, Heyderî digel bikaranîna bi vî şiklî, di cî ciyan de terzekî nû ceribandîye. Heyderî di hin helbestên xwe de mexlesa xwe di beyt an jî benda yekemîn de daye.

Bo nimûne:

Werin da qenc bizanin hûn çî **Eħmed Heyderî**yim ez  
Bi şemşamê ferehefzûn çî peygam' enberiyim ez  
(38/1)

Ger di heşrê **Heyderî Eħmed** bibîn Firdewsê 'al  
Bê te ey dêmşorgula bêçare bilbil ruh li bal  
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal  
(77/Benda mutekerrîr)

Xusûsiyeteke din a derbareyê bikaranîna mexlesên di dîwanê de ew e ku Heyderî, carna him di risteya yekemîn û him jî ya duyemîn a beyta dawîn a helbestê de mexlesên xwe bikaranîne.



Bo nimûne:

Berq û tîrêjên di te şohtin fu'adê **Heyderî**  
Dem bi dem bêhtir li cergê **Ehmedî** dijwar e dağ  
(66/11)

Belkî derman bit li cerhê **Heyderîyê** dilkebab  
Derd û dağê hicretê **Ehmed** dinalît jê muqîm  
(86/11)

### 1.3. Serdema Serhedê

#### 1.3.1. Salbûn û Cihê Jidayîkbûna wî

Mela Ehmedê Heyderî, di sala 1887an de li Dedelîyê ji dayîka xwe bûye. Dedelî, bajarokekî di navbera Erdîş û Patnosê de, lê bi Patnosê ve girêdayî ye. Navê wî bajarî ji aliyê M. Evdila Varlî ve bi çar şêwazan hatiye xwendin; Dadalu, Dedelî, Dardevî, Dardarlu.<sup>42</sup> Di sedsala 19an de Dedelî nahiye bûye û li ser vê nahiyeyê jî 60 gundên ku niha hin ji wan li ser Patnos û hin ji wan jî li ser Erdîşê ne, hebûne. Anku, nahiyeyeke gelek mezin bûye. Ji aliyekî din ve, li Dedelîyê digel Kurdên Sunnî û Êzîdî, Ermenî jî hebûne.<sup>43</sup>

#### 1.3.2. Malbata wî

Di derbareyê malbata Heyderî de pêzanînên me, bisînor in. Jixwe, derheqê qonaxa yekemîn a jiyana wî de xeynî navê bav û çendîn kalên wî hema hema tu agahiyên me, nîn in. Navê bavê wî, Salih e. Bi rêzê ve navê kalên wî jî wiha ne; Reşîd, Hemze, Elî û Îmadeddîn.<sup>44</sup>

Heyderî, di qonaxa duyemîn a jiyana xwe de, piştî ku koçî devera Nisêbînê kiriye û li ser mirina hevjîna xwe ya yekemîn, bi Sedîqa Xanim -a qîza Mele Eliyê Koçer ê ku beriya “koça mezin” li Milazgirê muderrîstî kiriye- re zewaca xwe ya duyemîn kiriye. Ji vê zewacê jî bi navê Hemîdeyê keçek û bi navê Mihemmed Emîn, Mihemmed Salih û Mihemmed Seîd sê kur çêbûne.

Dema ku Heyderî di sala 1937an de wefat kiriye kurê wî yê mezin Mihemmed Emîn hê jî 10 salî bûye. Diya Mihemmed Emîn Sedîqa Xanim di nava bêkesî, tenahî; tinebûn û tengasiyê de xwedî li wesiyeta mêrê xwe derketiye û digel bi fedakariyeye mezin ve kurê xwe Mihemmed Emîn daye ber xwendinê. Ji ber ku li Tirkîyeyê

<sup>42</sup> Mayévsriy V.T, *Kürt-Ermeni İlişkileri*, amd. Evdila Varlî, Weşanên Sîpan, Stenbol, 1997, r. 250.

<sup>43</sup> Mayévsriy V.T. h.b., r. 250, 251.

<sup>44</sup> Mela Ehmedê Heyderî, *Dîwana Heyderî*, amd. M. Ziyaeddîn Heyderî, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2012, r. 6.

qedexeyiyeke giştî li ser medrese û ilmên dînî hebûye, diya Mihemmed Emîn bo perwerdeya dînî berê kurê xwe daye Sûriyeyê. Mihemmed Emîn ewil li gundê Girbawî yê Qamişloyê, li cem Şêx Ebdillatîf Dalînî dest bi medreseyê kiriye.<sup>45</sup> Mihemmed Emînê Heyderî, zêdetirê salên perwerdeya xwe li medreseya Xeznewiyan a ku ji aliyê tesewwufê ve bavê wî bixwe jî ku girêdayî wan bûye, derbas kiriye û herwiha di qonaxa perwerdeya xwe de ji gelek alim û seydayan ders wergirtiye. Mihemmed Emîn di nava deh salan de di sala 1947an de îcazeta xwe ya ilmî ji Seyda Ebdurezaq Helêlî wergirtiye. Îcazeta xwe ya di warê tesewwufê de hinekî dereng, di sala 1967an de ji Şêx Elaedînê Xeznewî wergirtiye û di heman salê de jî li ser israra gundiyên Salika yê Farqînê li vî gundî bicih bûye. Herwiha Mihemmed Emîn heta salên 2000î li gelek gundan melatî kiriye. Lê belê, daxwaza wî her ew bûye ku mîrata ilmî ya bavê xwe bipêş bixe û medreseyekî ava bike. Li ser vê helwesta xwe di sala 2000î de li rohilatê Diyarbekirê li ser kîlometreya 15an a rêya Silfvayê dest bi înaşkirina “Güzel Camii ve Medresesi” kiriye. Emîn Heyderî bi vî hawî medreseya ava kiriye û li medreseya xwe *postnişîniya şextîyê* hilgirtiye. Lê, di bihara 2003yan de di 76 saliya xwe de wefat kiriye û tirbeya wî jî di nava medreseya ku wî bixwe ava kiriye de ye. Niha, peywira postnoşîniyê bi heman îhtîmam û peywirşînasiyê ve Şêx Ehmedê kurê Şêx Mihemmed Emînê Heyderî berdewam dike.

Şêx Mihemmed Emînê Heyderî li dû xwe gelek berhem hîştine:

1. Eqîda Îmanê
2. Mewlûda Nebî
3. Mewlûdu`n-Nebî
4. Werdu`l-Etfal
5. Dîwana Heyderî

Di nava berhemên wî de ya ku herî zêde hatiye nas kirin û berbelav bûye *Mewlûda Nebî* ye. Berhema wî ya *Mewlûda Nebî* li seranserê herêmê bi eleqeyeke germ tê xwendin.

Beriya ku em vê binbeşê biqedînin lazim e ku em behsa *Medhiyeya Xeznewî* ya ku Mela Ehmedê Heyderî nivîsiye, bikin. Wekî ku me berê jî diyar kiribû Mela Ehmedê Heyderî û malbata xwe ji aliyê tesewwufê ve bi Xeznewiyan ve girêdayîne. Mela Ehmedê Heyderî ji bo Şêx Ehmedê Xeznewî eleqeyeke mezin û mihebeteke germ nîşan kiribûye. Heyderî vê derûniyeta xwe bi medhiyeyekî ve daye der û ji bo şêxê xwe Şêx Ehmedê Xeznewî medhiyeyek nivîsiye. Vê medhiyeyê di nava *Dîwana Heyderî* de cî

---

<sup>45</sup> Heyderî, h.b., r. 7.

negirtiye. Şêx Mihemmed Emînê Heyderî bi heman derûniyetê ve sê beyt li medhiyeya ku bavê wî nivîsîbûye zêde kiriye û xistiye nava dîwana xwe.

Li jêrê jî me cî daye vê medhiyeyê:

Ellah nîgehdarê te bî ey tacidarê Xiznewî  
Perwerdigar yarê te bî ey şehriyarê Xiznewî

Ey dilbera şu'la beser herdem şîrîn û durxeber  
Ruh'im fida le'lê şeker şehde bibarî Xiznewî

Ruh û heyata min fida sîmayê nûrîn Ehmeda  
Xurşîd dîwarê şu'le da dar û diyarê Xiznewî

Xurşîd di dêma enwerî xala li dorê muşterî  
Emlak û însan û perî bûn tewbedarê Xiznewî

Xalmuşterî dêmenwerî mehtel'et e bûy'enberî  
Peyxam ji durra rehberê nûrên 'îzarê Xiznewî

'Enber fidayê kakila xeddeyn ji rengê sorgula  
Daxa di qelbê bilbila awir xumarê Xiznewî

Zanim tu qutbê es'ed î çeşma di iqlîma nedî  
Ey can feyazê sermedî da şehsuwarê Xiznewî

Bû qutb û xews û cayegîr berdan ji qewsan çende tîr  
Bê dil kirîn mîr û feqîr ev reng e karê Xiznewî

Cotek di ruxsarê sefîd şandin wekî pêt û perîd  
Anîn ji etrafa murîd re'dê biharê Xiznewî  
(Anîn ji şengalê yezîd berqa biharê Xiznewî)

Anîne rayê îns û can murşîd bi derbê sewlecan  
Kamil kirin qismê nezan şahê tebarê Xiznewî

Ev nav û dengê bê riya 'ilm û terîqa sofîya  
Noqtek ji nûrşîna ziya daket kenarê Xiznewî

Îlahî hindî talibîn mesrûr bike wan salimîn  
Elhemdu`l-lah hasidîn bûn şermisarê Xiznewî

Ez qenc dizanim serwerê meqbûl û meqsûd dilberê  
Kemter xulam e **Heyderî** dil tar û marê Xiznewî

Dil tar û marê **Ehmedim** bêşek ji herkes ez bed im  
Tûlê li dora merqed im min bêqerarê Xiznewî

Tûlê li hîzanê ez im kelbê derê zanê ez im  
Ê tim di zindanê ez im min hêvîdarê Xiznewî

Xwezya'm bidîta ey emîr nûra te ya bedra munîr  
Me'zûr bidêrin min qebîr min bêqerarê Xiznewî

Zanim tu şeyxek rehber î kubar û şîrîn esmer î  
Ey ruh û canê **Heyderî** ma dil di narê Xiznewî<sup>46</sup>

### 1.3.3. Eşîreta wî

Li devera Serhedê, hafizeya eşîrtiyê û întîsabên malbatî gelek zindî ne. Li vê deverê mirov navê eşîra xwe û hetta navê binemala ku jê tê dizanin.

Di beşa jiyannameya Mela Ehmedê Heyderî ya ku di nav Weşanên Nubiharê de çapbûye de, tê îddîakirin ku Heyderî ji bavikê Asiyan ê eşîra Heyderîyan e. Lê, dema ku em vê agahiyê bi beşên eşîr û binemalên ku li Serhedê niştecih in, didin berhev em dibînên ku hin çewtî rû didin. Li vira, ez ê listeya eşîrên konfedere yên li ser Konfederasyona Heyderî û Ademî ne bidim.\*

KONFEDERASYONA HEYDERÎ		KONFEDERASYONA ADEMÎ	
EŞÎR	Berjêrî	Asî	EŞÎR
	Birûkî	Bekirî	
	Celalî	Hecî Dêrî	
	Etmanekî	Hemoyî	
	Giravî	Hevêdî	
	Hemdikî	Îskî	
	Memanî	Kêrdizî	
	Merxurî	Mîrekî	
	Miloyî	Sorî	
	Pinaşî	Şemskî	
	Şêxesenî(Şêxhesenî)	Xelkî	
	Torin	Xeloyî	

**Tablo 1:** Tabloya ku mezintirîn herdu konfederasyonên Serhedê, nîşan dide.

Herwekî ku li vira jî zelal xuyan dike Eşîra Asî, ne li ser Heyderan lê belê, li ser Konfederasyona Ademî ye. Ji aliyekî din ve jî Abdurrahman Adak dibêje ku Mela Ehmedê Heyderî, ji Bavikê Asî ye.<sup>47</sup> Lê, herwekî ku li jor jî xuyan dike Asî, ne binemal lê belê, eşîreteke li ser Ademîyan ve konfedere ye. Lê belê, helbestvanê me jî di dîwana xwe de mexlesa *Heyderî* bikaraniye. Dema ku meriv van herdu agahiyan rûberî hevdu

<sup>46</sup> Heyderî, h.b., r. 284, 285, 286.

\* Tabloya ku me li ser eşîrên serhedê daye, ji lêkolînên me yên seheyê û agahiyên devkî pêk hatiye.

<sup>47</sup> Heyderî, h.b., r. 6.

dike, nakokî û çewtiyek rû dide. Ji ber ku konfederasyona Heyderî û eşîra Asî ji hev cûda ne. Wê çaxê pirseke wiha derdikeve holê: Mela Ehmedê Heyderî, ji kîjan eşîrê ye?

Me ev pirs, bi agahiyeke devkî ya ku me ji nebiyê helbestvanê me Mela Diyaeddîn wergirtiye ve bersivandiye.\* Anegorê vê agahiyê, Mela Ehmedê Heyderî, hê di ciwaniya xwe de bavê xwe wenda kiriye. Li ser wefata bavê wî jî apanên wî mafê weraset û miratê nedane wî. Li ser van bûyerên nexweş Heyderî jî yekcar guhê xwe daye dengê dilê xwe yê ku xwendin û tehsîla ilmê daxwaz kiriye. Bi van ramanan ve Heyderî hemû têkiliyên xwe ji apanên xwe qut kiriye û xwe gihandiye xalanên xwe. Xalanên wî jî, ji eşîra Heyderiyan bûne. Ji vir şûnde helbestvanê me, êdî xwe ne li ser Asiyan lê belê, li ser Heyderiyan hesabandiye. Jixwe, Mela Ehmedê Heyderî, di gelek cihên dîwana xwe de mexlesên wekî; Heyderî, Ehmed Heyderî û Heyderî Ehmed bikaraniye. Bi awayekî aşkere Heyderîbûna xwe diyar kiriye. Bo nimûne:

Werin da qenc bizanin hûn çî **Ehmed Heyderî**yim ez  
Bi şemşamê ferehefzûn çî peygam ‘enberiyim ez  
(38/1)

Pêwist e ku em li vira hinekî behsa Heyderiyan bikin. Heyderî, gelek mezin in û li Kurdistanê berbelav in. Digel hin deverên din ên Kurdistanê piranî li Serhedê niştecih in. Mihemed Emîn Zekî Beg, Heyderiyan wekî eşîretekî qebûl kiriye û gotiye ku Heyderî, mezintirîn eşîreke Kurd e û 30 hezar mal û koçer in. Di navbera Êrmiye û Mûşê de li hemî cihan, hene.<sup>48</sup> Mayévsriy jî mezinbûn û berbelavbûna Heyderiyan a li Serhedê, piştrast kiriye. Anegorî wî, di nav Alayên Hemîdiyan de hêza gewretirîn, Heyderî (Heyderanî) bûne. Li Serhedê tenê ji Heyderiyan 6 alay pêkhatine. Jê du alay li Bargiriyê, yek li Erdîşê û sisê jî li Elcewazê bûne. Dîsa sînorên vê eşîrê wiha kifşe kiriye: Ji bakûrê Behra Wanê hetta Rêze Çiyayên Eledaxê û li dora Çiyayê Tendûrekê rûdinin.<sup>49</sup> Disan, Kemal Süphandağ jî di berhema xwe de wiha behsa Heyderiyan kiriye.

“Ji 3 hezar 500 kes hêzên heyderiyan 4 alay pêkhatine. Beşek ji vê eşîretê, li nahiyeyên Patnos û Xamûr ên ku bi Sencaqa Beyazid a ku li ser bajarê Erzirûmê ve ye, rûdinin. Beşên din jî li Wanê niştecih in. Di nav eşîretan de eşîra mezitirîn û bihêztirîn ev eşîret e.”<sup>50</sup>

\* Mela Diyaeddîn jî ev agahî ji diya xwe bihîstiye. Anku, ev agahî bi awayekî devkî hatiye parastin.

<sup>48</sup> M. E. Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, wer. Ziya Avcî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, çapa yekemîn, 2002, r. 26.

<sup>49</sup> Mayévsriy V.T., h.b. r. 198, 199.

<sup>50</sup> Kemal Süphandağ, *Büyük Osmanlı Entrikası Hamidiye Alayları*, Weşanên Komal, Stenbol, 2006, r. 140.

Herçiqas, him M. E. Zekî Beg û him jî Mayévsriy, Heyderiyan wekî eşîrekî qebûl kiribin jî, niha Heyderanî ne eşîret lê belê, konfederasyonek e. Ev tespîta han a Mayévsriy bo sedsala 19an û ya M. E. Zekî Beg jî bo sedsala 20an e. Jixwe, di van sedsalan de hê jî Heyderanî –herwekî ku van herdu kesan diyarkirine– koçer bûne. Lê niha, hemû şaxên Heyderiyan ên li Serhedê niştecih bûne û her yek ji van şaxan gihêştine asta eşîretekî. Lewma, Heyderanî niha ne eşîret lê, konfederasyonek e. Ev şaxên ku gihêştine asta eşîrtiyê, me di tabloya 1ê de destnîşan kiribû.

#### 1.3.4. Perwerde û Pîşeya wî

Mela Ehmedê Heyderî, wekî hemû zarokên Kurdistaniyan, ewil li medreseyên derûdor dest bi perwerdeya xwe kiriye. Lê, em nizanin ka ev medreseyên derûdor kîjan in. Di vê êwrê de xaleke nediyar a din jî ew e ku ka gelo Heyderî, li cem bavê xwe perwerdehî dîtiye, an na? Ji ber ku li rojhelata nêzîk û ya navîn de, edetke sereke ew bû ku eger bavê wî/ê zarokê ya/ê ku nû dest bi perwerdeyê bikira, seyda an jî muderrîs bûya, wî/ê zarokê perwerdeya xwe ya pêşîn a bingehîn li cem bavê xwe distand. Lê belê, xeynî navê wî di derbareyê bavê wî de em xwediyê tu agahiyê nîn in. Li vira, derbareyê bavê Heyderî de em tenê dikarin vî bêjin: Qasî ku ji jiyannameya Heyderî xûyan dibe bavê wî kesekî şareza bûye. Herwiha, qîmeteke mezin daye perwerdeyê. Ji ber ku Heyderî şandiye Tebrîzê bo ku li dibistana hunerê de perwerdeyê bibîne. Ev jî diyardeyeke mezîn û girîng e ku bavê Heyderî kesekî xwedî hişmendî, fedakarî û herwiha ji aliyê aboriyê ve jî hetta dereceyekî dewlemend bûye.

Di nav medreseyên ku Heyderî lê perwerde dîtiye de tenê, Medreseya Şêx Şehabeddîn a li Hîzanê tê zanîn. Heyderî, perwerdeya xwe ya esasî li vê medreseyê wergirtiye. Ev medrese, li derûdor gelekî navdar bûye û gelek feqeyan bo perwerdeya xwe ev medrese tercîh kirine. Şêx Şehabeddîn kurê Şêx Nûr Mihemmed e û ew jî kurê Seyîd Sibxatullahê Erwasî ye.<sup>51</sup> Qasî ku endamên malbata Mela Ebdullahê Sergelya neqil kirine li vê medreseya navdar, bo demekê Mela Ehmedê Heyderî, Mela Ebdullahê Sergelya û Bedîûzzeman Seîdê Kurdî bi hev re perwerde dîtine. Li vê medreseyê, ji van hersê feqiyên mezkûr her yek di warekî de pêşketî û jêhatî bûye. Bedîûzzeman Seîdê Kurdî di ilmê tefsîrê de, Mela Ebdullahê Sergelya di ilmê tesewwufê de û Mela Ehmedê Heyderî jî di ilmê însa û erûzê de serkeftî bûne.<sup>52</sup> Helbet, dema ku mirov bala xwe dide Dîwana Heyderî, mirov dibîne ku ev îddîa di cî de ye. Ji ber ku Dîwana Heyderî ya muretteb, hema hema ji her aliyê ve mîna keke serkeftî ye.

<sup>51</sup> Heyderî, h.b., r. 6.

<sup>52</sup> Adak, hm., r. 17.

Êwra duyemîn a esasî ya perwerdeya Heyderî, bêşik perwerdeya wî ya li Tebrîzê ye. Anku, Heyderî bo perwerdeya xwe bigehîne serî an jî xeynî zanistên dînî, herwiha bo ku di hunerên destan de jî bibe pispor, berê xwe daye Îranê. Li Îranê çûye Dibistana Hunerê ya Tebrîzê. Dema ku em li jiyannameya wî dinêrin, em dibînin ku Heyderî, li vê dibistanê jî perwerdeyeke baş stendiye. Lê belê, xaleke din a tarî ya di qonaxa ewil a jiyana Heyderî de jî, dîroka çûyîna Îranê ye. Sala ku Heyderî çûye Îranê û herwiha ku beşdarî perwerdeya Dibistana Hunerê ya Tebrîzê bûye, nediyar e. Jixwe, di destê me de bawernameya ku Heyderî ji vê dibistanê wergirtiye jî, nîn e. Ev agahî û pêzanînên han ji layê endamên malbata Heyderî ve bi devkî hatine parastin. Lê belê, xeynî van agahyan, di destê me de delîleke ku çûyîna wî ya Îranê piştrast dike, heye. Ev jî gustîlek e ku navê rastîn ê helbestvanê li ser neqîşkirî ye.\* Ji aliyekî din ve jî li gorî endamên malbata Heyderî, Mela Ehmedê Heyderî sobeyên ku bixwe bikaraniye bi destên xwe çêkiriye. Ev jî delîleke din e ku Heyderî di warê hunerên destan de mahîr bûye.

Helbet, herçiqas ku Heyderî bo wergirtina perwerdehiya hunerên bedew û yên destan çûbe Tebrîzê jî lê belê, sûd û mefa ya vê çûyînê tenê bi aliyekî ve sînorkirî nemaye. Ji ber ku Heyderî li Îranê derfêta geryana bajarên qedîm û warê şairên gewre yên Îranî, dîtîye. Helbet, ev jî bandoreke erênî li ser bîr û hafizeya helbestvanê me kiriye. Bêşik, hema hema weke feqiyên hemû deverên Kurdistanê, Heyderî jî li medreseyan perwerdeya zimanê farisî dîtîye û herwiha, berhemên sereke yên edebiyata farisî xwendîye. Vêca, eger ku mirov biçe cî-war û welatê ew kesê ku meriv ji berê de berhemên wî xwendibe û mutelea kiribe helbet, mirov keys û feyzeke bêpayan ji wê çûyînê werdigire. Di vê çarçoweyê de ew bajar û deverên ku Heyderî lê geriyaye, bi tevahî nediyar in. A ku em dizanin jî ew e ku –bi qasî ku wî di dîwana xwe de behs kiriye– Heyderî, digel Tebrîzê çûye devera Hemawendîyan. Heyderî, di malika 5an a helbesta 19an a xwe de behsa van deverên mezkûr, kiriye.

Di semtê gurbetê bend im li Tewrîz û Hemawend\* im  
Birûska hîcretê jendim bi qîmê hel kirim Hêllac  
(19/5)

\* Bo gustîlê li pêveka yekemîn binêrin. Bnr. r. 237.

\* Kurdên ku di nav sînorên Dewleta Îranê de dijîn, bo Tebrîzê dibêjin: Tewrîz. Ö.B.

Hemawend jî, navê eşîreka mezin a Kurd e. Di navbera Kerkûk û Silêmanîyê de dijîn. M. E. Zekî Beg vê eşîrê wiha terfî dike: Eşîreteke gelekî aza, dirr û mîrxas e. Heta van salên dawiyê bi serhildanên xwe ve herdem Dewleta Osmanî û Îranê gelek tengzar û nerehet dikirin. Dîsa di heman kitêbê de beşên vê eşîrê wiha hatine rêzkirin: *Begzade, Reşewende, Remewende, Sefrewende, Sîtebeser, Gafiroşî û Pîryayî*. bnr. M. E. Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, wer. Ziya Avcî, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2002, r. 240.

Ji bo agahiyên zêdetir ên derbareyê eşîra Hemawendîyan bnr. Nejat Abdulla, *Împaratorluk Sınır ve Aşiret*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2009, r. 137-142.

Heyderî, xeynî ‘ilmên dînî û esmannasiyê, di warê hunerê de jî xwedî merîfet bûye. Di warê hunerên destan de amûrên ku çêkirîbûye navdar bûne. Lê belê, ev amûr negihêştine roja me. Li ser gustîla ku me di beşa pêvekê de destnîşan kiriye, navê Heyderî heye. Dibe ku wî bixwe navê xwe li ser gustîlê neqîşandiye. Ev jî diyardeyeke mahîrbûna wî ye. Dema ku em bala xwe didine dîwana wî, em dibînin ku dîwan, bi xetên bedew ve hatiye nivîsîn. Anku, xetên Heyderî jî baş bûne. Bi kurtî, Heyderî, him di warê ilmên dînî û him di warê esmannasiyê û him jî di warê hunerên destan û hunerên bedew de pispor bûye.

Dîsan, girîngtirîn xaleka din a çûyîna wî ya Îranê ew e ku Heyderî, derfêta axaftin û pratîzekirina zimanê farisî, dîtîye. Anku, zanebûna Heyderî ya zimanê farisî, wekî hin feqeyên ku beşdarî perwerdeya medreseyeke loqal û ji rêzê ye –yên ku zanebûna wan a farisî ku tenê ji xwendina *Bostan û Gulistanê* ve îbaret e– nîn e. Lê belê, em nizanin ka gelo Heyderî, bi tevahî çend salan li Îranê maye. Xala ku her zelal e ew e ku Heyderî di bikaranîna zimanê farisî de gelek jêhatî bûye. Dema ku meriv bala xwe dide dîwana wî, meriv dibîne ku farisiyeke serkeftî hatiye bikaranîn. Bikaranîna farisiyeke serkeftî dide nîşan ku Heyderî li Îranê demeke dirêj maye. Lê belê, digel ku li Îranê maye û farisiyeke baş zanîbûye jî, di dîwana wî de helbestên bi farisî kêman û tenê duheb cî digrin.

Qonaxa yekemîn a jiyana Heyderî, ji despêka perwerdeya wî hettanî sala 1914an a sala despêka şerê cîhanî yê yekemîn e. Ev qonax, salên tederîsata Heyderî ye. Anku, Heyderî hettanî sala 1914an a Dagirkirina Êrîs, perwerdeya xwe ya di warên cûrbecûr de kuta kiriye. Ev jî teqabulê 28 salîbûna Heyderî dike. Bi “koça mezin” a piştî dagirkirina Êrîs qonaxa duyemîn a jiyana Heyderî destpê kiriye. Heyderî, li dû şerê cîhanî yê yekem piştî ku li Nisêbînê bicîh bûye û hetanî sala 1937an a sala wefata xwe bi tevahî dora 20 salan li gundê mîna *Bawernê, Kelehê, Gwîrnê û Baqîsyân* ên Nisêbînê melatî kiriye. Anku, pîşeya wî melatî bûye.

#### **1.4. Serdema Nisêbînê**

Di sala 1914an de şerê cîhanî yê yekemîn destpêkîriye. Di demeke kurt de, gelek dewletên mezin ên cîhanî beşdariya vî şerî kirine. Bi vî hawî, di heman salê de ev şer, li Ewrûpa û Asyaya Piçûk berbelav bûye û bûye şerekî cîhanî.

Helbet, ji van hêzên navborî yên ku bi mijara me ve eleqedar in; Dewleta Osmanî û ya Rûs e. Lewre, li ser axa serhedê ev herdu hêz di nav cedelê de bûne. Lê, ji ber çarçoweya vê xebatê em li ser eger û encamên vî şerî nesekinîne. Lê belê, me



çarçoweyeke piçûk û aşkereker a ku rewşa niştecihên li serhedê ya ku hengan û piştî şerê cihanê diyar kiriye, daye. Jixwe, van salên şer wekî hemû niştecihên serhedê, li ser giyan û fikrên Heyderî bixwe jî bandoreke gelek mezin û hetta tesîreke neyênî ava kiriye.

Ji bo dahatûya dewleta xwe û berjewendiyên xwe yê neteweyî, ev dewletên mezkûr, wan gelên ku li ser axa serhedê bi hezaran salan bi hev re jiyaneke tesîs kirine, li gorî polîtîkayên xwe, rê dane pêşiya wan û ewan berdane hev. Di derheqê avakirina jiyanêke dostanî ya hezaran salan a di navbera kurd û ermeniyên de Seîdê Kurdî dibêje ku ji zemanê Nuh û vir de kurd û ermeniyên rêhevaltiya hev kirine.<sup>53</sup> Lê, em dibînin ku di çarçûka yekemîn a sedesala 20an de ev dostanî û têkiliyên mirovperwer, cihê xwe daye şer, kuştin û xwînretinê. Di 1ê Sermawêza 1914an de hêzên leşkerî yê Êrîs, dest bi dagirkirina “serheda dûr” kirine. Ev dagirkirin, di bihara 1916an de digehêje “serheda nêzîk” û di 3yê Adara 1916an de Bedlîs jî, dikeve nav sînorê axa ku hatiye dagirkirin.<sup>54</sup>

Dagirkirina Êrîs ya Herêma Serhedê, ji meha 11ê sala 1914an bigre hetanî meha 10an a 1917an domandiyê. Anku, axa ku ji aliyê hêzên Êrîs ve hatiye dagirkirin, bi tevahî 3 salan di bin kontrola wan de maye. Di vê heyamê de bi dorê ve, hema hema li hemû deverên serhedê şer û pevçûnên dijwar qewimîne û ji kurdên ku li van deveran jiyane; yê ku karibûne çek bikarbinin beşdarî şer bûne û yê mayî jî bi tevahî ber bi başûrê serhedê ve koçkirine. Girseyeke mezin a vê koçê jî berê xwe daye beriyê.<sup>55</sup> Lê belê, koçkirin jî bo wan nebûye xelasî. Hejmareke mezin a ku ber başûr ve koç kirine, hêj beriya ku bigehêjne cihê ku diçinê, di rê û dirban de ji ber nexweşî, birçîbûn û egerên cûrbecûr ve wefat kirine û yê ku xwe sipartine cihekî jî dîsan tu aramî nedîtine û li wan deveran perîşan bûne. Seîdê Kurdî jî qewimîna ew salên diltengî û trajîk piştrast kiriye û heft sal piştî vî şerî dema ku ew gihêştîye Wanê û derketiye ser kela bajêr û li Wanê temaşe kiriye; di derheqê vê babetê de wiha gotiye: “Beriya şer, ji gelek kesên ku li vira niştecihbûn, dost û hevalên min bûn. Hejmareke mezin a wan bi mihaciriyê ve mirine û yê din jî li xurbetê perîşan bûne”.<sup>56</sup>

Xala aşîkar a bêşik ew e ku di van salan de ev axa ku şer dîtîye, bi tevahî serûbinî, wêran û xopan bûye. Helbet, di vê pêvajoyê de tenê kurd zererdîde nebûne herwiha, ermeniyên jî gelek zererdîtine û derbe xwarine. Di vê çarçûveyê de Dewleta Osmanî, di 24ê nîsana 1915an de bi navê “Qanûna Tehcîrê” yasayek derxistîye û berê

<sup>53</sup> Bediüzzaman Said Nursî, *İçtimai Dersler, Münazarat*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2004, r. 108.

<sup>54</sup> Süleyman Kocabaş, *Kuzey'den Gelen Tehdit Tarihte Türk-Rus Mücadelesi*, İstanbul, 1989, r. 390-391.

<sup>55</sup> Martin van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r. 396.

<sup>56</sup> Bediüzzaman Said Nursî, *Lem`alar*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2001, r. 297.

erمنيyên ku li bajarên cihê cihê yên Anadolê de jiyane, dane derve. Dîsan, di vê êwrê de jî bi sedhezaran mirov jiyana xwe ji egerên cûda cûda ve ji dest dane û hetta hatine kuştin. Dîmena ku piştî şer derketiye pêş çavan, welatekî ku hatiye kawil kirin û mirovên ku hatine kuştin û perîşan û derbeder kirin e. Helbet, her kurdekî serhedî û erمنيyekî hetanî quncikê hucreyên xwe ev ezab û êş hîs kirine. Dîsan, lazim e ku em li vir behsa rewşa kurdên êzîdî yên ku li serhedê niştecih bûne, bikin. Helbet, êzdiyan jî, ji vî şerî wêraneker de para xwe stendine. Ew jî mecbûr mane ku ew axa ku ewan sipartine û ji wan re bûye welat biterikînin. Hetta, di terkê de jî xelasî nedîtine û rastî mirinê hatine. Firîda Hecî Cewarî di bîranînên xwe de wiha cî daye van rojên trajîk:

“Salên şerê cîhanê yê yekemîn, ewana\* dê, bav, kalik, pîrik ûnda dîkin û êtîmxanan da mezin dibin. Salên rev û bezê, kalikê min Îvo (bavê dayîka min) dimire. Gundiyên Êngûkê, mihacir dibin têne Ermenîstanê, diçine bajarê Êcmîazînê. Li wê derê ewana pê dihesin, wekî bona zarê kurde-êtîm Aştarakêda êtîmxane vebûye. Pîrka min Şaka Erebi, tevî 2-3 kûlfeta, tevî zara bi zor-cefakî têne Aştarakê, diçine wê êtîmxanê.”<sup>57</sup>

Xeynî çendîn kurdên êzdî yên Sovyetê wêjekarên kurdên ku derheqê van rojên teng de berhem dane tune ne. Bo nimûne, di nav hezaran rûpelên Kovara Hewarê de, di derheq van bûyerên dilsoj de tenê ev rêzikên Miço Milî cî digrin:

### **Serhedan**

Li Serhedan heye ceng  
Dengê lawan tev bi şeng

Ji kulîlkên renga reng  
Ne zil maye ne jî beng

Dil diêşe ji derdan  
Xwelî li me ey kurdan

Bigrî **Miço** tu bigrî  
Xerab bûye Serhedan<sup>58</sup>

Ji aliyekî din ve, me cî daye nivîseke din a ku vê rewşa karesatî eyan û beyan kiriye. Di binê vê nivîsa ku di Kovara Kurdistanê de belav bûye de, bi heman dilsojî û

---

\* Di risteya yekemîn de ew kesên ku bi “ewan” ve behsa wan hatine kirin, dê û bavê Firîda Hecî Cewarî ne.

<sup>57</sup> Firîda Hecî Cewarî, *Bîranînên Min*, Weşanxaneya Lîmûş, Yêrêvan, 2010, r. 11.

<sup>58</sup> Miço Milî, “Serhedan”, *Hawar*, j. 19, Avrêl, 1933, cild-1, r. 396.

derûniyetê ve li ser heman mijarê, helbesteke ku dîsan ji aliyê eynî kesî ve hatiye honandin, heye. Ev helbest û nivîs ji aliyê Ebdurrehman Nûrsîyê biraziyê Bedûzeman Seîdê Kurdî ve hatiye nivîsandin. Lê, di vira de em, tenê cî didin nivîsê.

### **Xîret Bikin Meyûs Nebin\***

Di vê herba umûmî de, ji herkesî xudanzeretir em in. Em perîşan, sergerdan bûn. Mal (û) milkên me ji destên me çûn. Digel wê qasê kes li me nabe xweyî û merhemeta kesî bi me nayê. Madem ku wiha ye divê em bi xwe li xwe bibine xweyî û di nav xwe de jî îttîhad bikin. Qet nebe, ji emsalê xwe paş ve nemînin. Melûmê we ye îro herkes ji bo milletê xwe dixebite. Lazim e em, ji xelqê zehfîr bixebitin, xîret bikin, da wekî çareyek (û) riyekê ji bo xwe bibînin. Divê em her yek xwe ji yê dî mezintir nezanin û em hemî Kurd lazim e bi hev re merbût bin ku tu kes û tu hîle me ji hev neke. Hingav, dê serfirazî bibûrînin û meqsûda me jî bi hewlillah dê hasil be.<sup>59</sup>

Vêca, di van salên dijwar de dema ku em bala xwe didine jiyana Heyderî, em dibînin ku Heyderî jî beşdariya şerê cîhanê yê yekemîn kiriye. Di vî şerî de birayekî Heyderî şehîd ketiye û Heyderî bixwe jî birîndar bûye. Li ser birîndarbûnê, Heyderî hatiye terhîskirin. Piştî ku hatiye terhîskirin, Heyderî berê xwe daye mala xwe lê belê, dema ku gihêştiye gund, tu kes nedîtiye. Wekî herkesî malbata Heyderî jî, ji ber dorpêçkirina Êris, barkirine. Şûnde, Heyderî jî xwe gihandiye qefileyekê û dest bi meşa koçkirinê kiriye. Li ser vê navberê û egerên neyênî ve hemû têkilî û peywendiyên Heyderî yên di navbera wî û ferdên malabata wî yên ku sax mane, qut bûne. Ev qutbûn û ji hev dûrmayîn hetta wefata wî dewam kiriye.<sup>60</sup> Anku, Heyderî dûmahîka jiyana xwe di tenahî û xurbetê de derbas kiriye û hetta dawiya emrê xwe ne eqrebayek û ne jî ferdekî/ê malbata xwe dîtiye. Em ê li jêrê jî cî bidin çendîn malikên Heyderiyên ku vê tenahî, dûrmayîn, bêkesî, xerîbî û xurbetiyê destnîşan dikin:

Rencûr û zer bûm bêhebîb bêhogir û yar û qerîb  
Ez mam di vê semtê gerîb nalîn ji min çû Serheda  
(4/12)

\* Ev deq, li gorî fonetîk û rastnivîsa Kurmanciya îroyîn, ji aliyê me ve hatiye sererastkirin.

<sup>59</sup> Ebdurrehman Nursi, “*Xîret Bikin Meyûs Nebin*”, amd. Ferhad Pîrbal, Govarî Kurdistan, Estenbol, 1919-1920, r. 93; Reşad Cûdî, *Ji biraziyê Bedûzzeman ji bo kurda peyama sedsalî: Xîret Bikin Meyûs Nebin*, <http://www.ilkehaber.com/haber/beduzzamanin-yegeninden-kurtlere-asirlik-mesaj-gayretli-olun,-umitsiz-olmayin-21348.htm> (27 Adar 2012).

<sup>60</sup> Abdurrahman Adak, “Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî”, *Nûbihar*, j.116, c.15, 2011, r. 18.

Ji ser ta pê birîndar im bi derba hîcretê îro  
Cunûn û bêhiş û har im ji kerba firqetê îro  
De'îf û jar û naçar im ji te'ba gurbetê îro  
Seyyahê sîneşedpar im bi herba muhbetê îro  
Bi mişlê gestiyê mar im ji şewqa qameta purtab  
(11/2)

Vê hîcretê ez zer kirim tîgê firaqê ker kirim  
'Işqê tijî xencer kirim derkarê zer im el-Ġiyas  
(18/2)

Dağan ji narê firqetê tîran ji qewsê hîcretê  
Top û tîfingê gurbetê yekser helandim şed hewar  
(34/6)

Bêmulk û mal û bê hebîb dêm şorgulê dil kir nehîb  
Bêmillîet û qewm û gerîb zer bû rewanê Heyderî  
(109/9)

#### **1.4.1. Wefata wî**

Heyderî, di sala 1937an de anku, di 50 saliya xwe de, li gundê Bawernê yê Nisêbînê çûye ber dilovaniya Xwedê û li wira medfûn e.

## 2. BERHEMÊN HEYDERÎ

Bi tevahî çar berhemên Heyderî hene. Ev berhem bi rêzê ev in;

1. Dîwan
2. Eqîdeya Îmanê
3. Munacata Heyderî
4. Teqwîmname

Meriv dikare van berheman anegorî naveroka xwe, kategorîze bike. Wê çaxê, dabeşiyêke wiha derdikeve holê: Berhmên edebî, yên dînî û yên zanistî. Cûrenûsa hersêyên pêşiyê nezm û ya teqwîmnameyê jî pexşan e.

### 2.1. Berhemên wî yên Edebî

#### 2.1.1. Dîwan

Ji bo dîwanê, di beşa *Danasîna Dîwanê û Nusxeyên wê* de agahiyên pêwist hatine dayîn.<sup>61</sup> Lewre, em ê li vir li ser dîwanê ranewestin.

### 2.2. Berhemên wî yên Dînî

#### 2.2.1. Eqîdeya Îmanê

Herwekî hemû seyda û alimên serdemên kilasîk, Heyderî jî bi navê *Eqîdeya Îmanê* menzûmêyêke ku di derbareyê şertên îslamê û rûknên îmanê de ye, nivîsiye.

Heyderî, ev berhema xwe di şiklê mesnewiyê de û bi wezna erûzê nivîsiye. Qalibê weznê jî “mefa‘ îlun\ mefa‘ îlun\ fe‘ îlun” a behra nesalim a hezê ye. Hejmara malikan bi tevahî 225 in. Di destê me de nusxeya orjînal a ku ji destê muellîf derketiye, tune. Tenê, nusxeya ku Seyîd Remezhan\* ji ber nusxeya muellîf îstînsax kiriye, heye. Ev nusxe di sala 1948an de hatiye îstînsax kirin.

Malika destpêkê ya *Eqîdeya Îmanê* wiha ye:

Ji ewwel hemdê bêhed bo Xuda bit  
Selamu`l-lah li ruhê Muştefa bit

Malika dawîn a *Eqîdeya Îmanê* jî wiha ye:

Ji bona Heyderî Ehedê bedkar  
Bixwînin fatîhek îxlaşê sê car

Ev berhem ji çar beşan pêk hatiye; destpêk, rûknên îslamê, rûknên îmanê û xatîme. Berhem, ji ber ku berhemeke dînî ye ewil bi besmeleyê şûnde jî bi hemdele û

---

<sup>61</sup> Bnr. r. 77.

\* Seyîd Remezhan, kurê Seyîd Silêman e. Feqiyê Şêx Ehmedê Xiznewî ye. Seyîd Remezhan li ser daxwaza şêxê xwe hin berhemên Mela Ehmedê Heyderî îstînsax kiriye. (Mela Dîyaeddîn Heyderî: 5. 1. 2013). Mela Ehmedê Heyderî jî, ji aliyê tesewûfê ve muntêsibê Şêx Ehmedê Xiznewî bûye.

salweyê ve destpêk hatiye kirin. Dîsan di destpêkê de pêxembertiya Hz. Mihemmed hatiye tesdîqkirin û bo mumînan jî xîtabeke wiha cî girtiye: “Bizane îslam bo te dîn e, di ser dîne te re dînek tunîn e.”

Beşa duyemîn jî wiha destpêkiriye: “Ruknê îslamê pênc in...” Di vê beşê de jî ev herpênc ruknên îslamê digel wate û şiroveyên xwe ve cî girtine.

Beşa sêyemîn jî bi hevoka, “Erkanê îmanê şeş in” ve destpêkiriye. Di vê beşê de jî şêwaza beşa duyemîn hatiye şopandin û yek bi yek erkanê îmanê hatine dayîn. Wateyên şertên îmanê bi dorfirehî hatine niqaşkirin.

Beşa dawîn jî bi van rêzikan ve diqede:

Ji ewwel ve ji bo ruhê Muhemmed  
Hebîbullah, Resulullahê es‘ed

Ji bona cem‘ê erwahê nebiyan  
Temam esfîya û hem weliyan

Digel eshab û etba‘ê di mahir  
Temamê al û ezvacê di tahir

Ji bo ruhê heçî qismê mihacir  
Digel her çi misilmanê di hazir

Ji bona Heyderî Ehmedê bedkar  
Bixwînin fatîhek îxlasê sê car

### 2.2.3. Munacata Heyderî

*Munacata* Heyderî, berhemeke menzûm e û bi şiklê mesnewiyê hatiye nivîsîn. Jixwe, Heyderî di dawiya munacatê de şiklê nezmê ya vê berhemê wiha diyar kiriye:

Felî`l-lahî hemd û sena bêqiyas  
Bi xeyr û şefa **mesnewî** bû xelaş  
(140)

Di destê me de du nusxeyên vê berhemê hene. Nusxeya yekemîn, nusxeya muellîf e anku, muellîf bixwe nivisiye. Ya duyemîn jî, nusxeya ku Seyîd Remezani ji ber nusxeya muellîf îstînsax kiriye, ye. Dîroka îstînsaxkirina vê berhemê jî 1948 e. *Munacat*, bi tevahî ji 140 beytan pêk hatiye. Herwiha, *Munacat* bi behra muteqarîb a nesalim “fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûl” ve hatiye nivîsîn.

*Munacata* Heyderî, bi hemd û sena, şukr û spasiyên ku bo Xwedê hatine kirin destpêkiriye. Dû re, yekîtî û mezinahiya Xwedê bi şêwazeke medh û pesinahî ve hatiye tesdîqkirin. Dîsan Heyderî, hawara xwe bi rêya ew kesên ku li jêr hatine dabeşkirin

gihandiye Xwedê. Wî ew kesên ku navê wan li jêr derbasbûne, bo xwe kiriye stargeh. Helbet, me li jêr nav û nîşanên hemû kesên ku di munacatê de hatine rêzkerin, nedaye.

### **Kesayetên Dînî**

Hemû pêxember, melaîketên mezin, çar xelîfe, Weysel Qeranî û Şehê Neqşebend.

### **Kesên Dîrokî**

Ristemê Zal.

### **Rojên Pîroz**

Eyd û Newroz. Hêjayê diyarkirinê ye ku Heyderî, Newroz weke rojeke pîroz qebûl kiriye:

Bi hürmetê Îşhaq bi qedrê Cuneyd  
Bi hecc û zekat bi **nemrûz\*** û **eyd**  
(73)

### **Kesayetên Jin**

Madera Muhterem Hewa, Hacer û Sara.

### **Feylesof û Kesayetên Edebî**

Felatûn û Şemsê Tebrîzî. Dîsan lazime ku em vê xalê jî diyarbikin ku Heyderî bo xwe Eflatûn jî wekî spartgeh û stargeh hilbijartiyê. Ji vê aliyê ve jî xweser e.

### **Kesayetên Kurd**

Melayê Cizîrî û Ehmed Efendiyê Xanî.\*

### **Motîf û Lehengên Edebî**

Şêxê Sen'an û Keça Gurcî, Mem û Zîn, Ferhad û Şîrîn, Leyla û Mecnûn.

### **Şêxê Xwe**

Şêx Ehmedê Xiznewî.

## **2.3. Berhemên wî yên Zanistî**

### **2.3.1. Teqwîmname**

Dema ku em bala xwe didin tiradîsyona edebiyata klasîk, em dibînin ku li ser vê babetê kêma kesan berhemeke bi vî reng û cûreyê dane. Ji vê aliyê ve jî ev berhem, taybet û xweser e.

---

\* Lazim e ku ev peyv *newroz* be. Lê belê, ji ber ku di nusxeya muellîf de ev peyv wek **نمروز** hatiye nivîsîn, em jî li metnê sadiq man û me neguherand.

\* Tabîra “Ehmed Efendiyê Xanî” ya Heyderî bi xwe ye.

*Teqwîmnameya* Heyderî, ji 18,5 wereqan pêk hatiye. Ev jî beramberê 37 rûpelan e. Di destê me de nusxeyek tenê heye û ew jî ya ku ji destê muellîf derketiye bixwe ye. Anku, ev nusxe ya orjînal e û qet nehatiye zêdekirin. Ev nusxe jî, li cem nebiyê helbestvanê me Mela Diyaeddîn, di bin parastinê de ye.

Herdu rûpelên destpêkê yê *Teqwîmnameyê*, di derbareyê vê berhemê de agahiyên aşkerekê di nav xwe de dihewînin. Rûpela yekemîn, bi tirkîya osmanî û rûpela duyemîn û herwiha tevahiya berhemê bi erebî hatiye nivîsîn. Di rûpela yekemîn û duyemîn de hatiye diyarkirin ku ev salname, salnameyeke bi 12 heywanî ye. Herwiha, di destpêka rûpela yekemîn de jî dîsan, navê van heywanan bi rêzê ve hatiye nivîsîn. Ji aliyekî din ve jî, di rûpela ku bi tirkîya osmanî ve hatiye nivîsîn de, sedemên nivîsandina vê berhemê wiha hatiye destnîşankirin: “Bo tertîb û neşra weqtên şer‘î ya ku girîngtirîn meseleyeke îslamî ye û dîsa bo xîzmeta *şerîeta xerra* (şerîeta ronak) û bo mihebet û rehetiya birakên mumîn.” Di rûpela duyemîn de jî rêbaz û awayê bikaranîna vê salnameyê hatine diyarkirin.

Beriya ku em vê beşê biqedînên lazim e ku em behsa xaleka ku di tariyê de maye, bikin. Mele Mehmûdê Nebilî\* îddîa kiriye ku berhemeke din a xeynî van berhemên ku me li jor dane, heye. Ew jî, *Şerha Nehcul Enamê* ya Mele Xelîlê Sêrtê ye. Mele Mehmûd gotiye, *Şerha Nehcul Enamê* jî Seyîd Remezan îstînsax kiriye û min ev nusxe bi çavên xwe dîtiye. (Mela Diyaeddîn Heyderî: 5. 1. 2013). Lê belê, ev berhem wenda ye û hê jî nehatiye dîtin.

Wekî encamekê em dikarin bêjin ku Mela Ehmedê Heyderî, di pêvajoya tadrîsata xwe de perwerdeyê gelek baş sitendiye. Digel ilmên dînî, di esmannasiyê de jî gelek zîrek bûye. Jixwe, bi navê *Teqwîmnameyê* li ser esmannasiyê berhemek jî daye. Herwiha, bi navê *Munacat* û *Eqîdeya Îmanê* ve du berhem di qada zanistên dînî de daye. Bo zîrektiya wî ya di warê ilmên dînî de mirov dikare wez û şîretên wî, mînak bide. Li gor agahiyên devkî Heyderî, bi awayekî sistematîk û nîzamî, wez daye û bi van wezên xwe ve jî, li ser gelê herêmê tesîreke mezin ava kiriye û herwiha, ew kesên ku bo çareserkirina mişkule û pirsyarên xwe, serî li Heyderî dane, çarenûsa mişkule û pirsyarên xwe wergirtine.

---

\* Mele Mehmûdê Nebilî, feqiyê Mele Mihemed Emînê Heyderî yê kurê M. Ehmedê Heyderî ye.



# BEŞA DUYEMÎN

## ZIMAN Û KESAYETIYA EDEBÎ YA HEYDERÎ

### 1. ZIMANÊ WÎ

Xala yekemîn a ku lazim e em pêşiyê diyar bikin ew e ku zimanê dîwanê ji gelek aliyan ve pir bi hêz e. Jixwe, di beşa jiyannameya Heyderî de me diyar kiribû ku Heyderî di warê ziman de perwerdeyeke gelek baş sitendiye. Heyderî, zimanê kurdî, tirkî, erebî û farisî yên ku hema hema li erdnîgariya hemû rojhelata naverast de derbasdar in, baş zanibûye. Lê jêrê ev rewş bi mînanan ve hatiye zelalkirin.

Xala duyemîn a derbareyê zimanê dîwanê de jî, rehetî û asanbûna wê ye. Helbet, ev asanî ne di dereceya deqeke zargotinê û zimanê axaftinê de ye. Li gorî berhemên edebiyata klasîk, zimanê vê dîwanê bo têgihîştinê asan û siviktir e. Di seranserê dîwanê de, ravekên şêlû, girîft û dirêj zêde cî negirtine. Anku, zimanê dîwanê, di bin peyvên xerîb û dijwar ên ji van zimanên mezkûr de nehatiye fetisandin.

Bo nimûne:

Dil di zindana evînê mam esîr  
Bêkes û sergeşte û jar û feqîr  
Lê dibarin her seher mizraq û tîr  
Ah û nalêm ta bi 'uqbayê Xuda  
(3/11)

Bilbil û şalûl çi zanin qedrê gul  
Wan peristin gul ji gulzarê mecaz  
(40/5)

Hetta, di asteke wisa de ye ku di hinek cihan de ravek qet nehatine bikaranîn.

Bo Nimûne:

Merhemet eşla nebû bêmirwetê  
Bêsebeb şohtim di narek el-'iyaz  
(31/3)

Ewwel û axir me şahib her ew e  
Zahir û baîin ew e ew çaresaz  
(40/4)

Miṭrib û saqî werin îro bi cam û neyê  
Heyderî Eḥmed çi xweş rabû ji xabê gelet  
(60/11)

Herçiqas, di uslûba wî de bi tevahî ravekên dirêj tinebin jî lê, di cî ciyan de em rastî ravekên dirêj jî hatine.

✓ **Ravekên ku ji du peyvan pêk hatine:**

Dêma ji **rengê sorgulê** sîma û zuhrê nûr e lê  
Tîrek bixwe berda dilê sergeşte 'ê dîwane da  
(4/4)

Li min tîr û tîfing hatin şerabnîrê bi deng hatin  
**Cerîdê rengbireng** hatin **fu'adê min** kirin tarac  
(19/2)

Şam û seher gîryan im her ez nabim ferhan el-meded  
**Eşkê gewez** têtin bilez **Mewla'ê Yezdan** el-meded  
(26/1)

✓ **Ravekên ku ji sê peyvan pêk hatine:**

Dêma ji rengê sorgulê sîma û zuhrê nûr e lê  
Tîrek bixwe berda **dilê sergeşte'ê dîwane** da  
(4/4)

'Eksê husna dêmê enwer zîsena kir necmê exter  
**Qameta manendê 'er' er** canfîda me canfîda  
(5/2)

**Perwane'ê şem'a geş** im **dîwane'ê çeşmê reş** im  
Şam û seher zehmetkeş im taqetnedar im el-Ġiyaş  
(18/4)

✓ **Ravekên ku ji çar peyvan pêk hatine:**

'Eksê husna dêmê enwer zîsena kir necmê exter  
Qameta manendê 'er' er canfîda me canfîda  
(5/2)

Te bi wan xalê mu'enber **zulfê mişkên xeddê eħmer**  
Pir kirin mecnûn û ebter yek ji wan nalane va  
(6/5)

Bi **fincanek meya 'işqa te** dîn bû Heyderî Eħmed  
Çû mecnûnê zeman im lew bi min tê xendenê herkes  
(44/11)

Digel ku di dîwanê de bi kurdî re zimanên mîna tirkî, erebî û farisî (heta dereceyekî) hatibine bikaranîn jî lê, dîsan zimanê dîwanê girîft û hişk nebûye û rewaniya xwe wenda nekiriye. Cî ciyan, vê terzê, ahengeke baş ava kiriye û hêz daye vegotinê. Bo nimûne, di malikên jêr de herçar zimanên mezkûr di nav ahengekê de bihev re hatine bikaranîn.

**Gul** ji xarê hate der **reyhan** û **sinbil** şef bi şef  
**Bilbilan** girtin **selamlig baz** û **zağan** bêxeber  
(37/5)

**Manendê bilbil roj** û **şeb** ahan dikêşim ey 'eceb  
Dê ruhî bi derd im der teleb wan herdu **çavê surme** da  
(4/7)

Dêma **mu' enber** gulgul î xalê li xeddê filfil î  
**Tuncik** li enî meyyilî **necma** me kir **zengar û pas**  
(46/5)

**Dil** bir ji min hiş **berze** kir bêmurwetê **zulmek** we kir  
Îro li min rehmek nekir heqq e bipoşim **hizn û yas**  
(46/7)

Kurmanciya ku di dîwanê de hatiye bikaranîn, gelek dewlemend e. Dema ku meriv bala xwe dide dîwanê, meriv dibîne ku gelek devokên kurmanciya jor yêna mîna Botî, Hekarî û devoka Serhedê rengê xwe dane dîwanê. Di nav risteyên gelek helbestan de mirov, rastî hin taybetmendiyên van devokên cûrbecûr tê. Helbet, bikaranîna –çi kêma çî jî zêde– van devokan di nivîsê de qelebalixî nekiriye û yekitiya ziman xerab nekiriye. Cî ciyan, bi bikaranîna cûdahiyên van devokan ve adeta şair xwestiye ku em bizanin wî bixwe van devokan zanîbûye û hetta karîbûye di rêstina helbestan de jî cî bide wan. Herwekî, ku Ehmedê Xanî jî di *Mem û Zînê* de diyar kiriye ku berhema xwe bi sê devokên (Bohtî, Mehmedî û Silivî) ji hev cûda yêna kurmanciya jor ve nivîsiye.

**Bohtî û Mihemmedî û Silivî**  
Hin le' l û hinek ji zêr û zîvî<sup>62</sup>

Helbet, ev tercîha han a Heyderî, rê li pêşiya tevlihevî, qelebalixî, giriftî û hişkiya ziman venekiriye bereksê wê, bûye sedema afirandina berhemeke pirreng û yek aheng. Jixwe, ev terîch bo kurmancî rêyeke cewaztir e. Herwekî ku Prof. Kadri Yıldırım jî wiha gotiye: “Di nivîsandina *Mem û Zînê* de tercîha Ehmedê Xanî ya pirdevokiyê, bi mebesta nêzîkirina hev a van devokên navborî bixwe ye. Ev jî, şewazeke zanistî ye.”<sup>63</sup>

Di binbeşên jêr de me cî daye ferqên fonetîkî, bêjeyî yêna deverên cûda yêna ku di dîwanê de derbas bûne û herwiha bikaranînen taybetiyên devokan jî hatine tesbîtkirin.

### 1.1. Taybetiyên Devoka Serhedê\*

Xusûsiyeteke sereke ya devoka Serhedê ew e ku di gelek peyvan de dengê “w”yê nayê gotin. Hetta, di gelek ciyan de meriv dikare bêje ku ev deng qet tine. Bo nimûne: Ûsa (wisa), alat (welat), xaş (xweş), xarin (xwarin), çanî (çawanî) û hwd. Di

<sup>62</sup> Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. M. E. Bozarşlan, Gün Yayınları, Stenbol, 1968, r. 460.

<sup>63</sup> Kadri Yıldırım, *Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2010, r. 64.

\* **Serhed/Herêma Serhedê:** Ev herêma ku lê kurd dijîn, li bakûrê Kurdistanê cî digre. Serhed, bi wateyên mîna li dor sînoran, li ser sînoran an jî serê sînoran ve hatiye bikaranîn. Bnr. Rohat Alakom, “Serhed: Welatê ku roj lê hiltê”, *Nûbihar*, j.117., 2011, r. 5. Beriya belavbûna Sovyetê, sînorê hersê dewletan (Osmanî, Îran û Rûs) li herêma serhedê gihêjtine hev. Niha jî sînorên Tîrkiya, Îran û Ermenîstanê li vê herêmê digihêjtine hev. “Bajarên Qers, Agirî û Wan kakilê welatê serhedê pêk tînin” (Alakom: 6). Lê belê, divê ku Îdir jî digel van bajarên bê hesabandin. Herwiha, perçeyeka bajarên mîna Bedlîs, Mûş û Erzîromê jî dikevîne nava vê herêmê.

dîwana Heyderî de jî mînakên vê taybetiya devoka Serhedê peyda dibin. Bo nimûne, di van herdu malikên jêr de dengê “w”yê hatiye avêtin an jî nehatiye bikaranîn.

Saqiyê xemra helal î meytehûr î meytehûr  
‘ Aşiqan mişlê hîlal î her **dixazî** her **dixaz**  
(42/6)

Ev gedre kir ‘ işqa gedar qelb û kezeb anîne **xar**  
Lew tê bi dengê hey hewar herdem di zilzalê merîz  
(56/6)

Taybetiyeke din a devoka Serhedê, cîguherîna dengên “r-l”yê ne. Heyderî di vê benda jêrîn de di peyva “bira”yê de dengê “l”yê bi dengê “r”yê re guherandiye.

Bi nazî wan mu‘ enber kakulan şehke  
**Bira** şed te‘ ne bêne misk û gulavê  
Hezar rengê li qedd û qameta me ke

...  
(61/5)

Li vir peyva “bira” ne di wayeta “bira/birader” de lê, di wateya “bila”yê de hatiye bikaranîn.

Taybetiyeke din a devoka Serhedê jî, xistina dengê “n”yê ya qertafa pirjimariyê ye. Di vê beyta ku me li jêr daye de, di çarçoweya vê taybetiyê de peyva “rindan” bûye “rinda”.

Ji şeffeynan hezîn mame cunûn û fehmê winda me  
Esîrê mahê **rinda** me biraştim ‘eyn û lameynan  
(94/7)

Wekî encam, ev taybetiyên fonetîkî yên devera Serhedê ku di dîwana Heyderî de cî digrin, têkiliya wî ya bi devoka wî ya eslî (devoka Serhedê) re nîşan dide. Heyderî herçiqas ji herêma xwe dûr ketibe jî, ji devoka xwe dûr neketiye.

## 1.2. Taybetiyên Devokên Deştê\*

Piştî ku Heyderî li deştê bicih bûye, axaftina wî bi awayekî xwezayî ketiye bin bandora devoka deştê. Wekî nimûne, ji bêjeyên îtalîk ên di malikên jêr de “betilandin” di hemû devokên deştê de; bêjeya “wulo” jî li herêma Nisêbînê tê emilandin. Ev herdu bêje jî di kurmanciya Serhedê ya ku Heyderî lê ji dayik û mezin bûye de qet nayêne

---

\* Mebesta me ya ji *devokên deştê* kurmanciya kurdên ku li beriyê dijîn e. “Di nava gel de dema **beriyê** tê gotin Deşta Mêrdînê tê fêmkirin. Sînorên beriyeyê ji derdorên Kaniya Xezalan (Ceylanpınar) û Wêranşarê bigre hetanî îstîqameta Cizîra Nisêbînê dewam dike.” Bnr. Altan Tan, *Turabidin’den Berriyê’ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kùltürler*, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2011, r. 17. Herwiha, xeynî van bajarên navborî bajar û bajarokên kurdan ên ku di nava sînorê Dewleta Suriyeyê de mane jî dikevîne nava herêma beriyeyê.

bikaranîn. Li Serhedê li şûna “betilandin”ê “westandin” û li şûna “wulo” jî “wisa” tên bikaranîn. Jixwe, ev peyv li her deverê Kurdistanê dirûvên cuda digre. Bo nimûne, wisa, wulo, werê, waynê û hwd.

Destê reqîq cama ‘eqîq tûl û rehîq şahê şefîq  
Ka ey dilo şed gulgul û yarê **wulo** merdane xweş  
(50/8)  
Dağ û derdê Heyderî Eħmed di ber roja elest in  
Lew niha eħbab û hemser min bi qêran **beşilandin**  
(92/11)

### 1.3. Taybetiyên Devoka Botî û Hekarî\*

Di serdemên klasîk de, digel devoka botî, devoka hekarî û badînî rengên xwe zêdetir dane helbestê û em dikarin bêjin ku ev devokên han di edebiyata klasîk de bûne zimanê standart. Lê belê, dema ku em bala xwe didin dîwanê em dibînin ku Heyderî, dîwana xwe ne li gorî van devokan nivîsandiye. Helbet, em nikarin bêjin ku ev devokên mezkûr ji binî ve tine ne. Lê, dema ku meriv dîwana Heyderî berawurdê dîwanên klasîk bike, meriv ê bibîne ku bandora van devokan li ser wî gelek kêmbûye.

Lê digel ku Heyderî, dîwana xwe bereksê yên berî xwe, ne li gorî devoka Botî û Hekarî nivîsandibe jî dîsa xwe ji bandora wan bi tevahî xelas nekiriye. Bereteyên van devokan yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn, bi giştî di şêwazekî de ne. Bo nimûne; didem (25/9), qebûl ket (28/6), çikem (28/9), dikit (31/8), nakem (31/9), bikem (39/2), diken (39/3), dikem (39/8), raket (55/6) û hwd.

Me‘ dena nûr û şemalê menbe‘ a ħusn û cemalê  
Ez **didem** fikr û xiyalê bêniyaz meqbûl kerd  
(25/9)

Tê di xilwê da **dikit** teklîf li min  
Badeya zehr û zîrarek el-‘iyaz  
(31/8)

---

\* **Botan/Bohtan:** Mebesta me ya ji vê herêmê, sînorên Mîrektiya Botan e. Herçiqas, sînorên vê mîrektiyê anegorî serdeman guherî be jî, navenda herêmê her weke xwe maye û ew jî Cizîr e. Piştî Mîr Bedirxan, beriya ku mîrektî ji binî ve ji holê rabe, sînorên wê ji herêma ku di navbera ew bajarên ku hatine dayîn de maye, pêk hatiye (Bakûr: Bedlîs, Sêrt. Başûr: Behdînan. Rojhilat: Colemêrg. Rojava: Mêrdîn û Midyad). Bnr. Bruinessen, h.b., r. 278, 279.

**Hekarî:** Mebesta me ya ji vê deverê jî, sînorên Mîrektiya Hekarî an jî Bajarê Hekariyê ye. Dewleta Osmanî, piştî ku dawî li hemû mîrektiyên kurdan aniye şûnde, bi navê *Kurdistan* ve eyaletek daniye. Hekarî jî yek ji sencaxên Wilayeta Wanê bûye û Wilayeta Wanê jî girêdayê Eyaleta Kurdistanê bûye. Hekariya ku navenda wê Colemêrg bûye ji van bajarokan pêk hatiye: Elbak, Geve, Şemzînan, Mehmûdî, Nordûz, Xoşab, Beytüşebab, Îmadiye û Oremar. Bnr. *Kurdistanî Osmanî*, amd. Koma Xebatên Kurdî, bgst Yayınları, İstanbul, 2011, r. 256, 257.

Nimûneyeke girîng a din jî, qafiyeya helbesta 12an e. Bo qafiyeya vê helbestê Heyderî, bêjeya “dibit” hilibijartiye. Li jêr wekî mînak em ê cih bidin herdu beytên metle‘ û mexlesê yên vê helbestê:

Ger muqîm dilber perestî qeşrê dil me‘ mûr **dibit**  
 Şûşeya zahir direstî baîinî pir nûr **dibit**  
 (12/1)

Dilberê gayet huner kir rim di endamê me werkir  
 Eħmedî dil lê bi ker kir Heyderî rencûr **dibit**  
 (12/13)

Xeynî van, wekî mînak em dikarin li ser bêjeya “bête”yê jî bisekinin. Li şûna bêjeya “bête”yê li Serhedê bêjeya “were” û di hin devokên din de jî tenê “bê” tê bikaranîn. Anku, mirov dikare beyta li jêr wiha jî îfade bike: Ger zerreyek husna şepalê were/bê ser ruyê zemîn wê çaxê, cîhanê seraser bibe cenneta edn û neîm.

Zerreyek husna şepalê **bête** ser ruyê zemîn  
 Dê cîhan çêbit seraser Cennetu`l-‘Edn û Ne‘îm  
 (86/2)

#### 1.4. Peyvên Kurdî yên Resen

Di nivîsandina berhemekî de tercihkirina peyvên resen, hêz û qewetê dide vegotinê û him jî rê li pêşiya têkilheviya wateyan digre. Herwiha, di berhemekî de bikaranîna peyvên resen, diyardeyê girîng e ku helbestvan an jî nivîskar waqîfê wî zimanî ye. Di vê çarçoweyê de dema ku em bala xwe didin dîwana Heyderî, em dibînin ku Heyderî di dîwana xwe de hin peyvên resen ên kurdî bikaraniye. Bo nimûne; ala, têkil, mêj, çarsû,<sup>64</sup> sorrengîn, çaresaz, belek, şermesar,<sup>65</sup> zagon, nexasim, dojev.

Me î‘ lan kir bi mujdê reqş û tenbûr  
 Şeraba erguwanê camê ferfûr  
 Bi xortî min exîz kir textê feğfûr  
 Suleyman im bi **ala**’ê bişaret  
 (14/5)

Ya Heyderî ger şade î wer da biçin meyxane’ê  
**Têkil** binoşin bade’ê Eħmed bîla mey ‘umrî fat  
 (15/11)

Qişseta min pir dirêj e mes’ela ‘işqê ji **mêj** e  
 Lazim e şexşek bibêje hiş li ser min bû îrax  
 (24/7)

Nûra li rû ‘alem ez û her **çarisû** pir nûrî bû

<sup>64</sup> Çarsû an jî çarsî. Ev peyv, bêjeyê Îranî ye û hê jî li serhedê tê bikaranîn.

<sup>65</sup> Ev bêje jî, di kurmanciya modern de wekî *şermezar* tê bikaranîn.

Heft asîman kewn û mekan hetta bi wan hût û serîr	(36/5)
Bêhtir ji xûna erguwan eşkê di <b>şorrenî</b> bitin	(39/5a)
Ewwel û axir me şahib her ew e Zahir û baîin ew e ew <b>çaresaz</b>	(40/4)
Min dî li ber <b>Burca Belek</b> mil dane hev zulfê xelek Toq û hemayîl bûne yek weryan ji ber biskan gulav	(71/3)
Sed Qeyşer û Xaqan tamam durdaneya durrên peyam Girtin bi <b>zagon</b> û nîzam kuştin bi derbê xenceran	(91/6)
Xedengê firqeta yarê di gurbet da kirim yexsîr <b>Nexaşma</b> ateşê hicrê ‘ezabem kerde tale`l-llah	(95/11)
Serxoş im da `îm di şînê lew dikim ah û enînê Dûriya zâtê şêrînê hîrçeta çûn <b>doje</b> ye	(97/10)

Dîsan, Heyderî, ji bo ku vegotinê bihêztir bike, zêde zêde ji biwêjan sûd wergirtiye. Helbet, di edebiyata klasîk de, di rêstina helbestên bi hêz de biwêj û gotinên pêşiyên peywireke sereke lîstin e. Lê belê, bo ku mirov di helbestê de biwêj û gotinên pêşiyên bikarbîne, divê mirov baş hakimê wî zimanî be. Divê mirov bi awayekî baş digel derfêta vegotina peyv û biwêjan, cûdatiyên piçûk ên di navbera wateya ferhengî û biwêjî ya bêjeyan bizanibe. “Serketina şaîr jî, bêyî ku hewayeke ku mîna biheve hatibine dirûtin bide, bi bikaranîn û hewandina di cî de ya ew biwêj û gotinên pêşiyên ku jê sûd hatine wergirtin e.”<sup>66</sup>

<sup>66</sup> Yaşar Aydemir, *Behiştî Divanı: Behiştî, Hayatı, Şahsiyeti, Eserleri ve Divanının Tenkidli Metni*, MEB Yayınları, Ankara, 2000, r. 41.

## 1.5. Biwêjên ku di Dîwanê de Hatine Bikaranîn

Em ê li jêr biwêjên ku Heyderî di dîwana xwe de bikaranîne bidin:

sertaser vejandin (1/6c)	gêj bûn (15/4b)
tîr lê barîn (1/7a)	kul kir- (15/5b)
ji ser ta pê wekî nar bûn (1/7b)	xew lê heram bûn (15/7b)
peyapey xem barîn (1/9b)	ah kêşan- (15/9b)
can û mal telef bûn (1/9c)	helak bûn (16/2a)
dilkebab bûn (3/6a)	kuştîyê bêruh (17/1e)
der bi der geran- (3/7b)	serfiran- (17/3b)
dil kerkerî bûn (3/12b)	çengala evînê (17/3c)
çav lê bûn (4/5b)	mehû ket- (17/4b)
tîrêj vedan (5/4a)	keder kêşan (17/4d)
qîl û qal bûn (6/8a)	di xûnê de neqîşîn (17/5b)
dil talan birin (6/8b)	wek korê birişîn (17/5d)
ejderhayê heftserî (7/1b)	hiş lê zîr û zeber kir- (17/6b)
xezeb jê barîn (7/3b)	bêser û ber bûn (17/9c)
der bi der mayîn (7/10b)	subh û mesa (sibe û êvar) (17/9d)
dil revan- (8/12a)	can lê bêmar kir- (17/10a)
bejin zirav (9/11a)	dil lê sedpare kir- (17/10b)
dil jê bir- (9/11b)	derba pilingê (17/10c)
hiş belav kir- (9/11b)	renc lê taze kir- (17/10c)
sîne sedparî bûn (11/2d)	xakê ber pa (17/11d)
fîda kir- (11/5d)	dil tarûmar kir- (18/1a)
nar lê geş bûn (11/7a)	dil kul kir- (18/3a)
ji qeydan riha (azad) bûn (11/7e)	çêsmê reş (18/4a)
qêr dayîn (11/9b)	ser ta qedem (18/7a)
bêhn lê xistin (12/4a)	leyl û nehar (şev û roj) (18/8b)
dil lê hûr hûr kir- (12/5b)	qiyam rabûn (18/10a)
nûra Xuda (12/9a)	sîne amac kir- (19/1b)
zîr û zeber bûn (12/12b)	çav lê rê bûn (20/1b)
rim lê werkir- (12/13a)	nar lê har bûn (20/8a)
verê kir- (14/2d)	dûr û diraz (dûr û dirêj) (20/8b)
hewarê hat- (14/4b)	fîdayê xakê ber pa (21/8a)
	nûru`l- <sup>ç</sup> uyûn (ronahiya çavan) (21/9a)



ji hal xistin (22/7b)  
 eşk rêt- (24/1a)  
 dil lê pare pare bûn (24/3a)  
 sîne lê du şax bûn (24/4b)  
 dil qelaştin (24/6b)  
 huner kir- (24/11a)  
 sîne sîper kir- (24/11a)  
 dest û pa bûs kir- (25/5a)  
 bi der mayîn (26/3a)  
 ji hev xistin (26/7b)  
 dil du nîm kir- (26/12b)  
 şîret kir- (27/7b)  
 can telef bûn (27/11b)  
 saxera serşarî (28/5b)  
 sîne biraştin (28/11a)  
 lê rakir- (29/9b)  
 bêçeng û bal bûn (30/9b)  
 pişt û penah bûn (30/11a)  
 xewê de girtin (31/2a)  
 ser dayîn (31/5b)  
 can bi der dayîn (31/10a)  
 rahê firarê (rêya revê) (31/11b)  
 qafê ta qafê (32/5a)  
 dilnişter bûn (33/2a)  
 bêhiş kir- (33/3b)  
 dor avêtin (33/4a)  
 hunav li hev sohtin (34/2a)  
 te<sup>ç</sup> ne û minnet kir- (35/6b)  
 xerqê ateşê bûn (35/10a)  
 heft asîman (36/5a)  
 awir vedan (35/6a)  
 xwê lê werkir- (36/6b)  
 sîper girtin (36/8a)  
 sed aferîn (36/11b)  
 salam girtin (37/5b)  
 dilsengîn (39/5b)  
 bedra tamam (heyva çardeh  
 şevî) (39/7c)  
 rûreş kir- (39/8b)  
 geş kir- (39/8c)  
 îhsan kir- (39/10b)  
 ‘ umrê diraz (40/1a)  
 ‘ umrê ‘ ebes (41/ 8b)  
 ser ta pê helandin (44/7b)  
 damen bûs- (44/10b)  
 hiş berze kir- (46/7a)  
 hizn û yas poşandin (şîn  
 girtin) (46/7b)  
 per li perwanê belav kir-(47/9b)  
 cerhê kûr (48/1d)  
 hevdu fetilîn (48/4e)  
 bêzar bûn (48/7f)  
 tîrêj vedan (49/2a)  
 şêrîn zeban (49/4b)  
 fir kir- (49/8a)  
 roj hilatin (50/5a)  
 curm kir- (52/2b)  
 tofan lê rakir- (52/5a)  
 dest û pabend bûn (52/8a)  
 neşw û nema bûn (hêşîn  
 bûyîn) (53/1c)  
 qelbê selîm (53/5c)  
 ser û pa hûr kir- (54/10b)  
 weten girtin (56/2a)  
 qelb û kezeb anîne xwar (56/6a)  
 xûna ehmerî (xwîna gevezîn)  
 (58/9b)  
 herşêş cihat (61/3b)

ji bin helkir- (61/4a)	pê werkir- (77/1d)
ji çeng û per bûn (61/4ê)	dax lê sarkir- (77/7c)
xalî mayîn (61/5b)	bi ser de xwar kir- (77/7d)
lê wer kir- (61/7g)	bi der xistin (78/1a)
ji nutq û kalamê bûyîn (64/3c)	awir xezal (78/6b)
agir berdan dil (64/3d)	dest û pa lê şel bûn (81/12b)
gestiyê marê reş (64/9d)	pêda çûyîn (90/1b)
ji hev kir- (65/1b)	ustûxwar bûn (96/2b)
ser dayîn (65/7b)	çav lê bûn (96/5a)
meyl dan (69/9a)	candade bûn (96/6b)
xwê lê reşan- (70/13a)	dilsar kir- (100/3b)
mil dan hev (71/3a)	jê şuştin (104/5b)
ser û pa alav kir- (71/11b)	xakê qedem (110/1c)

## 1.6. Unsûrên Erebi, Farisî û Tirkî

Di tiradîsyona edebiyata klasîk de xusûsiyeteke sereke jî, pîrzimanîbûna dîwanan e. Helbestvanan, di dîwanên xwe yê ku tê de helbestên xwe berhev kiribûne de, cî dane hin helbestên ku bi zimanên biyanî yê ku xeynî zimanê dayîka wan bûye. Jixwe, ji aliyê ziman ve edebiyata klasîk di dereceyê bilind de di bin bandora zimanên erebî û farisî de bûye. Ji bo helbestvanekî kurd car caran tirkî jî li van zimanan zêde bûye. Bi vî hawî, dîwanên helbestvanên kurd ji aliyê ziman ve kompleks bûne. Lê belê, bikaranîna zimanên biyanî tenê ne li ser terzekî bûye. Carnan helbestvan temamê helbestekî bi zimanekî din ve nivîsiye û carnan jî di nav helbesteke xwe de tenê malikek an jî risteyek bi van zimanên din ve nivîsiye.

### 1.6.1. Unsûrên Erebi

Di dîwanê de piştî kurdî, zimanê ku ji aliyê rêjeyê ve herî zêde hatiye bikaranîn erebî ye. Erebi him ji aliyê bêjeyan û him jî, ji aliyê hevokan ve di dîwanê de gelek zêde cî girtiye. Heyderî, bi erebî him ji ayetan û him jî, ji hedîsan îktîbas kiriye. Hetta, carnan jî hin biwêjên erebî bikaraniye.

### 1.6.1.1. Îqtîbasên ji Ayet û Hedîsan

*Qul huwe`l-lahû ehed Ellahu`ş-şemed (79/3).*<sup>67</sup>

*Yaleytenî kuntu turab (85/3).*<sup>68</sup>

*Kiramî`l-Katibîn (88/3).*<sup>69</sup>

*Şîdrî`l-Munteha`ê (104/6).*<sup>70</sup>

*Lewlake lewlake (44/2).* Tu nebûyayî tu nebûyayî (Ya Muhemmed). Li gor hedîseke qudsî, Xweda wiha dibêje Hz. Pêxember: Tu nebûyayî tu nebûyayî ey hebîbê min! Min felek nediafirandin.

### 1.6.1.2. Biwêjên Erebi yên ku di Dîwanê de Hatine Bikaranîn.

Me li jêr hin biwêjên erebî yên ku Heyderî di dîwana xwe de bikaraniye, daye.

*qeydî`l-heyat (li ser heyatê ye/dijî) (106/11).*

*mecme`î`l-adab (Yê ku hemû edeban di xwe de dihewîne) (102/8).*

*xûna ehmerî (xwîna sor) (58/9b).*

*neşw û nema bûn (hêşîn bûyîn) (53/1c).*

*leyl û nehar (şev û roj) (18/8b).*

*nûru`l-`uyûn (ronahiya çavan) (21/9a).*

*bedra tamam (heyva çardeh şevî) (39/7c).*

*subh û mesa (sibe û êvar) (17/9d).*

### 1.6.2. Unsûrên Farisî

Di dîwanê de farisî zêde hatiye bikaranîn û dîsa di dîwanê de carnar nîv riste, carnar risteyek, carnar malikek û carcaran jî du malik peyhev bi farisî, hatine nivîsîn. Ji bilî van, di dîwanê de mulemmayek jî heye ku yek ji zimanê mulemmayê jî farisî ye.

Bo nimûne:

Carnar nîvê risteyê bi farisî ye.

Mişlê mabeynê rû-ebrûyan li **nezdê xod-nîhaz**\* (32/8b)

<sup>67</sup> Bêje: Ew Xuda ku yek e. Xuda, Samed e. Qur'an: 112/1-2.

<sup>68</sup> Xwezî ez ax bibûma! Qur'an: 77/40.

<sup>69</sup> Şiklê ku di Qur'an`ê de derbas dibe wiha ye: Kîramen katîbîn. Qur'an: 82/11.

<sup>70</sup> Nuqteya dawîn/dûrtirîn a asîman. Qur'an: 53/14.

\*Li cem xwe danî.

Carnan temamê risteyekî bi farisî ye.

Bêhebîb û yar û mûnis mam di nêv xelqê gerîb  
**Dilberem eşla negûyed ey cegerxûn çist hal\*** (78/5)

Carnan jî malikek bi giştî bi farisî ye.

**Te 'essuf mîkonem hergah kî abê gurbetê çun nîş**  
**Derûnim tar û mar kerde qedem manendî dale`l-llah\*** (95/2)

Xusûsiyeteke din a ûnsûrên farisî ew e ku Heyderî, nexasma peyvên farisî yên ku nêzikî kurdî ne hîlbijartîye. Hetta, ev peyv carnan bi kurdî ve hevpar in. Bo nimûne; *daxdar* [birîndar] (3/6b), *dîwanemerd* [mirovê dîn, mecnûn] (24/9a), *nezd* [nêzîk] (32/8b), *çarsû* [sûk, bazar] (36/5a), *pendar* [şîretdar] (41/5b), *zengar* [zeng-jeng] (46/5b), (96/1b), *zende* [zindî] (97/2b).

### 1.6.3. Unsûrên Tirkî

Taybetiyeke din a zimanê dîwanê, bikaranîn û pereşandina zimanê tirkî ya di nav helbestan de ye. Ev xusûs, di nav edebiyata klasîk a kurdî de berê jî hebûye. Digel Dîwana Mela, him di *Mem û Zînê* de û him jî di Dîwana Xanî de hinek peyvên tirkî hatine bikaranîn. Bo nimûne, hejmara peyvên tirkî yên di *Mem û Zînê* de bi tevahî dora 26 heban in.<sup>71</sup> Çi di edebiyata kurdî ya klasîk û çi jî di ya tirkî de rêjeya bikaranîna zimanê erebî û farisî di dereceyeke bilind de bûye. Bi gotineke din, bêyî van herdu zimanan, tu helbest nehatine nivîsîn. Bi vî rengî, Heyderî jî zimanê tirkî li van herdu zimanan zêde kiriye û bi heman şêwazê ve bikaraniye. Helbet, di vira de tesîra serhedîbûna wî jî heye. Ji ber ku li serhedê, di nav zimanê axaftinê de gelek peyvên tirkî jî hene. Ev peyvên han ên tirkî yên ku derbasî kurmanciya serhedê bûne, ji formên xwe yên eslî guherîne û ketine formeke nû a li gorî sentaks û gramera kurdî. Bo nimûne; *begemkirin*, *degêşkirin*, *qêmîşkirin*. Hetta, cî ciyan qertafên tirkî jî têne bikaranîn, wekî; (beg û axe)-*ler*. Ev taybetmendî di romanên Erebe Şemo de jî hene. Bo nimûne; *orta gund* (r. 83), *ordî* (r. 134), *beg axalera* (r. 103), *ale-balix* (r. 103), *êpêce* (epeyce) (r. 162).<sup>72</sup>

\* Dilbera min qet nabêje, ey cîgerxûn halê te çi ye?

\* Herwext ez teesuf dikim ku ava xurbetê wekî sitrî.

Dil û hinavê min tarûmar kiriye, bejna min jî weke “dal”ê ye(xwar e) wellah.

<sup>71</sup> Kadri Yıldırım, h.b., r. 64.

<sup>72</sup> Erebe Şemo, *Şivanê Kurmanca*, amd. Mustafa Aydoğan, Weşanxaneya Lîs, Stenbol, 2009.

Di malikên ku me li jêr dane de, Heyderî bi hosteyane peyvên tirkî di nava kurdî de bikaraniye.

Manendê bilbil roj û şeb ahan dikêşim ey ‘ eceb  
Dê ruh bi derd im der teşeb wan herdu çavê **surme** da  
(4/7)

Lazim e pîrê mubarek bezm û dîwan û tidarek  
Mes`elê helke bi carek hûn bidêrin lê **qulax**  
(24/8)

Qelbê neşax gulzar û bağ şem‘ û çirağ lê bûn **yesağ**  
Ma der qefes mişlê ceres feryadê pes can der se‘ îr  
(36/10)

Gul ji xarê hate der reyhan û sinbil şef bi şef  
Bilbilan girtin **selamliğ** baz û zağan bêxeber  
(37/5)

Kuştina min ger dixwazî bo te destûr e welê  
Tu bi destê xwe`y mubarek ‘ erq û **damarê** me *kes*  
(45/8)

Dêma mu‘ enber gulgul î xalê li xeddê filfil î  
Tuncik li enî meyyilî necma me kir **zengar** û **pas**  
(46/5)

Li jêrê jî me cî daye lîsteya peyvên tirkî yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn.

surme: 4/7b	damarê me kes: 45/8b
butûn (2): 10/9a, 26/4a	derîn (2): 45/9b, 69/6a
Şuluḥçî: 14/11c	pas: 46/5b
begleran (3): 15/3a, 27/7a, 39/1c	yas: 46/7b
kor (2): 17/5d, 67/8d	ses: 48/6d
ey dostîlarim: 18/11b	yoldaş: 52/5b
yeldizê: 19/9a	yaş: 52/6b
qulax: 24/8b	bêhaldaş: 52/8b
‘eynelî: 30/10b	qaş: 52/10b
qan: 34/10a	bal: 63/3b
yesağ/q (2): 36/10a, 72/3d	al: 64/6a
selamliḡ: 37/5b	sağ: 65/5b
beyramek: 41/6b	delî: 77/3c
gulyenaḡ: 42/5a, 65/8b	

## 2. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ

Girîngtirîn xala kesayetiya edebî ya Heyderî, di rêstina helbestan de hostabûna wî ye. Heyderî, di warê înaşyê de xwediyê teb‘ û cewhereke giranbiha bûye. Vêca Heyderî, ew cewhera ku tê de veşartî bûye, pijiqandiye û geş kiriye. Jixwe, dema ku meriv bala xwe dide dîwanê, meriv dibîne ku Heyderî, kesekî wisa ye ku kariye li ser hemû helwest û muradên xwe helbestan binivîsîne. Dîsan, kesekî xwedî îcad û xwediyê nezmeke bi husn û eda bûye. Heyderî jî, ev xal aniye zimên û hetta cî ciyan de pesnê xwe jî daye. Bo nimûne:

Ṭûṭiyê şêrînzaban im Eḡmedê şekkerdihan im  
Her seḡer şahê cihan im Ḥeyderî mêrane va  
(6/11)

Ger ḡewwaş î durşinas î yar dinasî Ḥeyderî  
Eḡmedê ‘aş durr û elmas van di beḡreynê şerab  
(8/16)

Sîmsaḡer î meyenwer î Eskender î ya Ḥeyderî  
Nezma te dîn kamîl kirîn şed aferîn Eḡmed Emîr  
(36/11)

‘Eḡîd û Feylezûrxan im Siyeh Salarê zîşan im  
Li ser textê Suleyman im şehê deh kîşweriyim ez  
(38/4)

Ey Heyderiyê bêtebat nezmê te gotin deh luğat  
Sed qîl û qal û muşkîlat der şedrê Eħmed me' neyek  
(76/11)

Şed aferî ber nezmê tu ey ' aşiqê şeyda  
Ya Heyderî Eħmed li siraceynê du ebrû  
(103/11)

Dema ku meriv bala xwe dide jiyana hin şaîr an jî nivîskarên mezin ên ku gihêştine nasdariyeke netewî an jî cîhanî, meriv dibîne ku di qonaxeke jiyana wan de şikestineke mezin qewimiye. Ev şikestin bûye sebebê pijiqîna cewhera ku di xezîneya wan de veşartî bûye. Şûnde, ev pijiqîn gur û geş bûye û gihêştîye asta pisporî û hostayetiyeke bilind. Me bo vê xalê wekî nimûne Mewlana Celaleddînê Rûmî û Mestûre Xanim a Kurdistanî daye. Herwekî ku tê zanîn Mewlana, mesnewiya xwe ya ku li seranserê dinyayê tê naskirin û xwendin, li ser dûrketin û wendabûna Şemsê Tebrîzî nivîsiye. Êşa terka Şemsê Tebrîzî, îlhama berhemeke mezin a mîna Mesnewiyê daye Mewlana.\* Mestûre Kurdistanî jî, di lîteratûra kurdî de him weke dîroknaş û him jî weke helbestvaneke mezin tê zanîn.<sup>73</sup> Mirina Xusrew Xan ê hevserê Mestûre Kurdistanîyê, li ser wê tesîreke neyênî ava kiriye û bûye sebebê diltengiya wê. Mestûre Xanimê jî hawara xwe gihandiye helbestê û êşa xwe bi rêya helbestên ku nivîsiye ve daye der.<sup>74</sup> Li vir jî me cî daye çend risteyên Mestûre Xanimê yên ku wê li ser wefata hevserê xwe honandiye.

Xusrew wehar en, Xusrew wehar en  
Kor bam ce dîde fêslê wehar en  
Mewsîm cilûs gul gulzar en\*\*

---

\* Beriya ku Şemsê Tebrîzî biçê Qonyayê û Mewlana nas bike Mewlana, li bajarê Qonyayê him di nava civatê de û him jî di rîcalê hikûmetê de xwediyê payeyeke bilind bûye. Di heman demê de gelek wezîfe pêkanîbûye. Him sermuderrîs û him jî weîzekî ku bi sohbeta xwe ve qelebalixiyên girse anîbûye coşê, bûye. Hetta, bi sedan murîdên wî jî hebûne. Lê belê, piştî ku Şems naskiriye êdî, dev ji van hemû karên xwe berdaye û bi Şems re ketiye helwetê û xwe ji civatê û ji murîdên xwe dûr xistiye. Li ser vê rewşê him civat û him murîdên Mewlana gelek aciz bûne û car caran nerazîbûna xwe kifşe kirine. Li ser van nerazîbûnên giştî Şems jî macbûr maye ku wî diyarî biterikîne. Mewlana, piştî terka Şemsî, di nava deh salên dawîya jiyana xwe de mesnewiya ku ji dora 26 hezar beytan pêkhatiye, vehonandiye. Bnr. Adnan Karaismailoğlu, "Mevlana'nın Hayatı, Eserleri ve Sanatı", *Mevlana*, amd. Osman Horata, Adnan Karaismailoğlu, T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara, 2007, r. 49-51. Di derheqê vê babetê de Abdûlbakî Gölpinarlı dibêje ku: "Mewlana beriya ku Şems nas bike, sofiyekî zahid bû. Şems, hemû heyîna wî hilweşandiye û wî avêtiye alema îşq û cezbeyê. Eger ku Mewlana ev înkîlaba ruhî derbas nekiriba wê bibûya şêxekî ji rêzê û di şaîrtiyê de jî belkî navê wî qet nehata xwendin. Bnr. Abdûlbakî Gölpinarlı, *Mevlana Celaleddin*, İnkılab Kitabevi, İstanbul, 1959, r. 118.

<sup>73</sup> Abdurrahman Adak, "Erdelanlı Bir Kadın Saray Şairi", *Uluslar arası Kürt Kadın Kongresi*, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, 2011, r. 91

<sup>74</sup> Feqî Huseyn Sağnıç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002, r. 174.

\*\* Ey Xusrew! Bila çavên min kor bin ku tu ne li vir î, va demsal bihar e, çaxê vebûna gul û geşbûna gulzaran e.

Vêca ku em bala xwe didin jiyanname û dîwana heyderî, em dibînin ku ev şikestina ku me li jor terîf kiriye, bo Heyderî bi koça Nisêbînê ve rû daye. Heyderî, piştî şerekî cihanî yê ku li dû xwe wêranî û karesatî hiştiye, bi hêwiyên nû ve berê xwe daye devera Nisêbînê lê belê, ev der jê re nebûye sitargeheke germ. Li ser van şertên dijwar hemû peywendiyên Heyderî bi malbat û nasên wî re qut bûne. Niştecihên devera ku Heyderî nû lê bicih bûye jî, muemeleya biyanekî pê re kirine û ew wekî kesekî ji xwe qebûl nekirine. Helbet, van egeran êş û jan, tenahî û bêkesiya Heyderî zêdetir kiriye. Heyderî, di dîwana xwe de ev rewş wiha aniye ziman:

Bêmulk û mal û bêhebîb dêm şorgulê dil kir nehîb  
 Bêmillîet û qewm û gerîb zer bû rewanê Heyderî  
 (109/9)  
 Bêhebîb û yar û mûnis mam di nêv xelqê gerîb  
*Dilberem eşla negûyed ey cegerxûn çist hal\**  
 (78/5)

Herwiha, dema ku meriv bala xwe dide dîwana Heyderî, meriv dibîne ku li seranserê dîwanê temaya ku dertê pêş, hîcret û bêkesî ye. Heyderî hema hema di hemû helbestên xwe de şikayet ji tenahî û bêkesiyê kiriye. Hetta meriv dikare bêje ku li ser hîcretê adeta termînolojîyek ava kiriye. Li jêr jî me cî daye tabîrên Heyderî yên derbareyê hîcret û bêkesiyê:

**Hîcret:**

qewsê firq û hîcranê (1/7a)  
 hîcreta min ez gerandim der bi der (3/8b)  
 derba hîcretê (13/1a)  
 hîcra xedar (26/2a)  
 seyfê hîcretê (39/4a)  
 agirê hîcrê (48/1c)  
 hîcretîn fîncanlerî (72/8c)  
 beriya hîcretê (96/1a)

**Firqet:**

xiyala firqetê xwar im (1/2b)  
 semmê qatil firqet e (8/13a)

---

\* Dilbera min qet nabêje, ey cîgerxûn halê te çi ye?



fırqeta dūr (8/14a)  
narê fırqetê (8/14b)  
derba fırqetê (11/1b)  
kerba fırqetê (11/2b)  
birûska fırqetê (18/2b)  
xedengê fırqetê (52/11b)  
daxa fırqetê (54/9a)  
‘eynê (çav) fırqetê (64/6a)  
ah û nalê fırqetê (97/5a)

**Xurbet:**

semtê xurbetê (19/5a)  
hebsa xurbetê (20/10a)  
Top û tıfingê xurbetê (34/6b)  
erdê xurbetê (54/9a)  
xurbeta kerban (62/5b)  
abê xurbetê (95/2a)

**Xerîb:**

eqlamê xerîb (9/3b)  
ekrad û e‘ camê xerîb (9/4b)  
sebr û aramê xerîb (9/6b)  
mey û camê xerîb (9/7b)  
hor û gulendamê xerîb (9/10b)  
alamê (êş) xerîb (9/11b)  
sî‘ rê di hingamê xerîb (9/13b)  
xelqê xerîb (78/5a)

Di edebiyata klasîk a ku li seranserê rojhelata naverast di formekî hevpar de tesîs bûye de, mezmûn cî digrin. Mezmûn jî, gotinên bedewên bihuner û nukte ne.<sup>75</sup> Her mazmûnek, wateyeke xwe heye û anegorê wateya xwe ciyê ku lê tê bikaranîn cuda ye.

---

<sup>75</sup> İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2004, r. 298.

Helbet, hunermendî û hostatiya şaîr jî, di bikaranîna van mezmûnan de veşartî ye. Divê ku şaîr, bi şewazeke cuda û di kompozîsyoneke nû de van mezmûnan bikarbîne. Hetta ku şaîr, mezmûn û xeyalên resenên ku qet nehatibine emilandin bikarbîne, wê çaxê pisporiya xwe ya încayê bêtir dide qebûlkirin. Di vê çarçoweyê de, dema ku em bala xwe didin dîwana Heyderî, em dibînin ku wî, di helbestê de digel avakirina kompozîsyoneke nû û lihevhatî, mezmûnên nû jî bikaraniye. Mazmûnên resen ên ku me di dîwanê de tespît kirine, em dikarin wiha rêz bikin:

**Alamê xerîb** (êş û janên biyanî):

Le' lê şeker bejna zirav şewq û şu' a' nûr û tav  
 Dil bir ji min hiş kir belav kuştim bi **alamê gîrîb**  
 (9/11)

**Eşkê rengîn** (histir/rondik ên bireng):

Ger dipirsî **eşkê rengîn** cowê xûn in cowê xûn  
 Wer temaşa qelbê gemgîn dağ û gazê dağ û gaz  
 (42/8)

‘**Eynê firqetê** (çavê dûrmayînê):

Dem' ê alê erguwanî tèn ji ' **eynê firqetê**  
 (64/6a)

**Qelbê xav** (dilê negihayî yê ku negihîştîye kemalê):

Ûrêjin û tava cubhetê geş kir feşala qametê  
 Lew zalima bêmurwetê reş kir di kûrê **qelbê xav**  
 (71/9)

**Şeraba bextreşî** (Şeraba Bextreşiyê):

Yek yek ji min girtin xweşî sohtim firaqa ateşî  
 Da min **şeraba bextreşî** şubha ezel heq kaseyek  
 (76/7)

Çekên klasîk ên ku di şerên serdemên berê de hatine bikaranîn, di helbesta klasîk de herwekî nêrîn û awirên tûj ên dilberê hatine qebûl kirin. Anku, şaîran amûrên şer ên mîna tîr, sertîr, rimil, şûr û hwd. şibandine nêrîn, awir û bijangên dilberan. Lê belê, dema ku mirov bala xwe dide dîwana Heyderî, mirov dibîne ku digel van çekên klasîk wî, çekên modern jî li van mezmûnan zêde kiriye. Helbet, di helbestê de di bikaranîna navê çekên modern de tesîra beşdariya şerê cîhanî yê yekemîn ê Heyerî, heye. Ji vir jî xûyan dike ku Heyderî, demeke dirêj di nava şer de maye û te' lîmeke baş a çekan dîtiye. Heyderî, di dîwana xwe de ev navên han ên çekên modern bikaraniye:

### **Mawzer**

Li cergê min dibarin tîr ji qewsê firq û hîcranê  
Meraqa wuşletê kuştim ji ser ta pê wekî nar im  
Xedeng û **mawzer** saqî li min têtin ji qetlê ra  
(1/7c)

### **Tifing**

Te bi wê xişt û xedengê can li min bêmare kir  
Ber ji şindoqa **tifingê** dil li min şedpare kir  
Te bi wî derba pilingê rencê borî taze kir  
Ah ji destê şox û şengê Heyderî dîwane kir  
Bilbilê ‘ aşiq li wîrdan im egişnî ya Ğeyas  
(17/10b)

### **Çap**

Ji nû îro siyehçeşman gulendamanê gerden ‘ ac  
Hezar **çap** lê reşandin wan li min sîne kirin amac  
(19/1b)

Zehmetkeş im ekşer ziyan egleb ji derbê **çaplîyan**  
Derman di le‘ lê tuşîyan der qeşr û eywanê ferec  
(20/9a)

### **Şerabnîr**

Li min tîr û tifing hatin **şerabnîrê** bi deng hatin  
Cerîdê rengbireng hatin fu’adê min kirin tarac  
(19/2a)

### **Topê miftelê**

Şahê bi luţfa qulzemî hê jî di ber Qalû Bela  
Ev sextehalê mulzemî avêt derûnê cedwelê  
Mexşûş di nêva ‘ alemî da min şerabek Henzelê  
Îro di libsê matemî têtin me **topê miftelê**  
Loma mekin ey ademî uftade’ê mehcûr im ez  
(39/6d)

## **3. EDÎBÊN KU LI SER HEYDERÎ TESÎR KIRINE**

Wekî gelek kesan Heyderî jî, di bin tesîra herdu otorîteyên edebiyata klasîk a kurdî; Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî de maye. Di dîwana Heyderî de ev bandor berbiçav e. Helbet, Heyderî, xeynî van kesan, di bin bandora kesayetên din de jî maye. Li jêr, me hewl daye ku vê bandorê tespît bikin.

Vêca, wekî rêbaz me bandora heryekî di bin sê xalan de destnîşan kiriye.

- a) Nezîreyên ku Heyderî li ser helbestên wan nivîsiye.
- b) Behskirina navê wan.
- c) Wekhevî û şibihîna îbare û risteyan.

### 3.1. Melayê Cizîrî

Ewil, me bandora Melê ya li ser Heyderî kolaye. Dema ku meriv bala xwe dide dîwana Heyderî, meriv dibîne ku tesîra Mela ya li ser Heyderî, bi her hawî li ber çavan e. Di seranserê dîwanê de bandora sereke ya Cizîrî ye. Qasî ku ji dîwana Heyderî xûyan dike wî, dîwana Mela gelek xwendiyê û bi Mela re adeta bûye hemhal.

a) Nezîreyên ku Heyderî, li ser helbestên Cizîrî nivîsîne ev in:

1. Nezîreya ku li ser redîfa *kir*'ê hatiye nivîsîn. Heyderî, bi redîfa *kir*'ê ve li ser du helbestên Cizîrî yên ku dû hev in, nezîre nivîsiye. Ev nezîre, bi helbesta Melê ya ewil re hemredîf; bi ya duyemîn re jî, him hemredîf û him jî hemwezn e.

#### Melayê Cizîrî:

Ah ji destê wê sirê ji meyê hewale **kir**  
Her çî li min kirî Mela camê meya dusale **kir**  
(27/1)

Derê meyxaneyê 'îşqê seher 'arif ziyaret **kir**  
Bi abê çêşm û xûnê dil wudu' best û teheret **kir**  
(28/1)

#### Heyderî:

Bi dêmê gulgulê îro li min mehbubê dil şa **kir**  
Bi şewtê bilbilê îro me 'alem dîn û şeyda **kir**  
(35/1)

2. Nezîreya ku li ser redîfa *ez*'ê hatiye nivîsîn. Herdu beytên ku li jêrê beramberê hev hatine dayîn, hemredîf in.

#### Melayê Cizîrî:

Tûr im û bi dil peyrewê Mûsayim **ez**  
Ateşperes û Tûrê tecellayim **ez**  
(31/1)

#### Heyderî:

Gulîstanê gulê ter lê cîdala bilbilan her lê  
Peyapey şohtin şer lê welê Eskenderiyim **ez**  
(38/6)

3. Nezîreya ku li ser redîfa *bes*'ê hatiye nivîsîn. Ev nezîre jî, bi xezela Melê re hemredîf e.

#### Melayê Cizîrî:

Dil yek e dê 'îşqi yek bit 'aşiqan yek yarî **bes**  
Qible dê yek bit qulûban dilberek dildarî **bes**  
(36/1)

**Heyderî:**

Ya Heyderî ger ‘ aşiq î husn û cemalek bo me **bes**  
Xaliş di ‘ işqê şadiq î ebr û hîlalek bo me **bes**  
(43/1)

4. Nezîreya ku li ser redîfa *ebrû*’yê hatiye nivîsîn. Di dîwana Cizîrî de bi redîfa *ebrûyê* ve du xezel hene.

**Melayê Cizîrî:**

Me lew fincan li ser dest e ku mehtaba hîlal **ebrû**  
Numayin min di mîr’atê meya safa zelal **ebrû**  
(70/1)

**Heyderî:**

Tîrê di gedar in ji kemaneynê du **ebrû**  
Hemwar e dibarin ji hilaleynê du **ebrû**  
(103/1)

5. Nezîreya ku li ser redîfa *lebaleb*’ê hatiye nivîsîn. Me li jêr, malika metle‘ ya herdu xezelan digel hev daye.

**Melayê Cizîrî:**

Lîllahîhemd ji yarê me di dest cam e **lebaleb**  
Ji lebê noşî peyapey di dil îlhame **lebaleb**  
(7/1)

**Heyderî:**

Nûra te girtî yekser rûwê cîhan **lebaleb**  
Heft asîman beraber  or û cînan **lebaleb**  
(10/1)

b) Heyderî, di dîwana xwe de tenê di ciyekî de rasterast behsa Mela kiriye. Di qesîdeya xwe ya di rêza 98an de Heyderî, Mela wekî Xoceyê Şehrê Cizîrê binav kiriye.

Qeys û Ferhadê Şêrîn î Hafîzê Şîrazî yan  
**Xoce’ê Şehrê Cizîrê** mestê zercamê te ne  
(98/9)

c) Dema em ji aliyê îbare û risteyên nêzî hev li bandora Mela binêrin, xala ku zêdetirîn bala mirov dikşîne îbareya “Ela ya eyyuhe`s-saqî” ye. Çawa ku Melayê Cizîrî, di risteya çaremîn a despêka dîwana xwe de ev îbare wiha: *Ela ya eyyuhe`s-saqî* edîr ke’sen wenawîlha (1/1d),<sup>76</sup> bikaranîye, bi vî rengî, Heyderî jî bi vê îbareyê ve dest bi dîwana xwe kiriye.

**Ela ya eyyuhe`s-saqî** ji zatê te ricakar im  
Werin camek meya baqî ji hicrê mest û gemdar im

<sup>76</sup> Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1987, r. 25.

Melûl im bi qeder saqî mufferreḥ bim bi camê ra  
(1/1)

Dîsan, mirov dikare şibihînên din, wiha rêz bike:

**Melayê Cizîrî:**

**Ey şehînsahê mu‘ ezzem** heq nîgehdarê te bî  
Sûreê “Înna fetehna” dor û madarê te bî<sup>77</sup>

**Heyderî:**

**Ey şehînsahê mu‘ ezzem** Heyderî bewwab î tu  
Bêkes û pabeste pir ğem ma di nêv girdab î tu  
(102/1)

**Melayê Cizîrî:**

Zulfên mu‘ enber kakulîn biskên siyah reng sinbilîn  
Ta ta bi dav dav **fitilîn** çîn çîn bi mestî silsilîn  
Dayî nesîn têk meyyilîn wê qest e xala **filfilîn**  
Ebleq ji qudret **xemmilîn** wê buxçeyê gul **kemmilîn**  
Tê ‘ indelîb û bilbilîn roj hate burca sinbilîn  
Xeflet me dî lew **xecilîn** mehrûm û mehcûr dilkul î  
Mecrûhê tîrê qizil î rehme ke pur sohtî **dil î**  
Vê perdeyê carek hilîn bavê nîqaba zulmetê

**Heyderî:**

Bag û bostanê biharê **kemilîn**  
Şêv û lêmûnê li darê ‘ eddilîn  
Têk bi beybûn û reyḥanan xemilîn  
‘ Indek û şoşin di ber da şitilîn  
Bazî û qumrî li hevdu **fetilîn**  
Ser ta ser ‘ alem bi keyfê heşşilîn  
Em bi xwe uftade’ê cenga **dil î**  
Lew niha mehrûm ji zewqê **xecilîn**  
(48/4)

**Melayê Cizîrî:**

**Peyweste** du ebrû li me mehbûbê kişandin  
Sed gezme peyapey li ez ê xeste reşandin  
(65/1)

**Heyderî:**

**Peyweste** lebaleb dil ji ğem sînebirîn im ey kehfê feqîran  
We ez heşretê çeşmanê to hemware hezîn im her lehze û her an  
(93/1)

<sup>77</sup> Mela Ahmedê Cizîrî, *Dîwan*, wer. Osman Tunç, Weşanên Nûbihar, ç. 2., Stenbol, 2009, r. 158.  
1a kehfê] kehf û NMMÇ.

Wekî encam, bi qasî ku me tesbît kiriye, digel îbareyên wekhev Heyderî, li ser 5 helbestên Melayê Cizîrî nezîre nivîsandiye. Ev jî dide nîşan ku ka Heyderî, çiqas di bin bandora Melê de maye.

### 3.2. Ehmedê Xanî

Li vir jî, em ê li bandora Xanî ya li ser Heyderî bigerin. Dema ku meriv bala xwe dide dîwanê meriv dibîne ku Heyderî, dîrekt navê Mela zîkir kiriye. Berevajiyê vê rewşê Heyderî, di tu derê dîwana xwe de navê Xanî zîkir nekiriye. Lê belê, di helbesta 37an a dîwanê de navê *Mem û Zînê* û di helbesta 107an de jî tenê navê *Mem* zîkir kiriye. Dema ku mirov bi giştî li dîwanê dinêre, mirov dibîne ku –herçiqas wekî bandora Cizîrî ne be jî– bandora Xanî jî xûyan dike. Hebûna navê *Mem û Zînê* ya di dîwanê de tena serê xwe vê îddîayê piştrast dike.

Ciyên ku navê *Mem û Zînê* derbas dibin:

Muħbeta gul hate ser qelbê **Mem** û Ferhad û Qeys  
Mişlê bilbil malnebûn el-qîşşe ser dan bêxeber  
(37/3)

Manendê **Mem** û bedħal û sergeşte 'ê **Zîn** î  
(107/3ê)

Helbet, xeynî navê *Mem û Zînê*, hin diyardeyên din ên ku îşaretê vê bandorê dikin, hene. Bo nimûne:

#### Xanî:

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dilberê  
Cennetê pê çî bikem pêwerbîkem xakisterê<sup>78</sup>  
(40/malika mutekerrîr)

#### Heyderî:

Ger di heşrê Heyderî Ehmed bibîn Firdewsê ' al  
Bê te ey dêmşorgula bêçare bilbil ruħ li bal  
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal  
(77/bend a wesiteyê)

#### Heyderî:

Yeqîn e min dil û bê mahîsîma 'ê di ' uqba 'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala ' edn û me 'wa 'ê me navê  
(107/malika wesiteyê)

Herçiqas, lefzên van bend û malikên li jor, ji hev cûda bin jî, fikr û ramana ku tê parastin yek e. Anku, cenneta ku dilber tê de nebe, him ji layê Xanî û him jî, ji layê Heyderî ve tê terikandin.

<sup>78</sup> Ebdullah M. Varlı. *Dîwan û Gobîdeyê Ehmedê Xanî yêd Mayîn*, Weşanxaneyê Sîpan, Stenbol, 2004, r. 103.

Dîsan Heyderî, li ser helbesta Xanî ya ku redifa wê *ez e*, bi heman redifê ve nezîre nivîsiye.

**Xanî:**

Her dinalim şeb û royan meger Eyûb **im ez**  
 Hêstiran her vedimalim meger Ye<sup>c</sup>qûb **im ez**<sup>79</sup>  
 (50/1)

Seydê cengala serê zulfa şeha şebaz **im ez**  
 Mestê cama <sup>c</sup>îşweya şehnazî nazik naz **im ez**<sup>80</sup>  
 (51/1)

**Heyderî:**

Werin da qenc bizanin hûn çi Ehed Heyderî**im ez**  
 Bi şemşamê ferehefzûn çi peygam<sup>c</sup> enberî**im ez**  
 (38/1)

Li jêr jî me, xezela bi qafiyeya “c”yê ya Cizîrî, Xanî û Heyderî berawurdê hev kiriye. Ev xezel jî nîşan didin ku bandora şaîran ya digel hev, her zindî bûye.

**Xezela bi Qafiyaya c’yê**

	<b>M. Cizîrî</b>	<b>Xanî</b>	<b>Heyderî</b>
1a	...zucac	.....tarac	..... <sup>c</sup> ac
1b	...mîzac	...emwac	...amac
2b	... <sup>c</sup> îlac	...emwac	...tarac
3b	...rewac	...mî <sup>c</sup> rac	...zerrîntac
4b	...dac	...zucac	...bac
5b	...sîrac	...tac	...Hellac
6b	... <sup>c</sup> ac	... <sup>c</sup> îlac	...emwac
7b	...tac	...bac	...ne <sup>c</sup> lac
8b	...bac	...zucac	...dîbac
9b	...xerac	...armanc	...wehhac
10b	... <sup>c</sup> ucac	... <sup>c</sup> ucac	... <sup>c</sup> îlac
11b	...zucac	.....	...muhtac
12b	.....	.....	...ezwac
13	.....	.....	...mewwac

<sup>79</sup> Varlî, h.b., r. 126.

<sup>80</sup> Varlî, h.b., r. 128.



### 3.3. Şêx Semseddînê Exlatî

Herçiqas bandoreke aşîkar a Şêx Şemseddînê Exlatî li ser helbestvanê me xuya nake jî, em dixwazin li vir balê bikişînin ser helbesteke Heyderî ku bi qafiyeya helbesteke Exlatî re hevbeşîya wê heye. Qafiyeya helbesta Heyderî ku peyva “hû” ye, wekî peyva dawî ya qafiyeya helbesta Exlatî ye. Li jêr em dê ji van her du helbestan cih bidin çendîn malikan. Di van malikan nêzîkahiya hinek peyv û îfadeyan jî balê dikêşîne.

**Exlatî:**<sup>81</sup>

**Bejt 1:**

Ez ku mestê meyê ‘îşq im te ne na ha ya hû

Misr û Bexdad û Dimeşq im te ne na ha ya hû

**Bejt 3:**

Gelekî cerge kebab im bêxew û mest û xerab im

Saqî û xemr û şerab im te ne na ha ya hû

**Bejt 4:**

‘Aşiq û beng im û kas im melek û cinn im û nas im

Xeyrî wî kes dî nenas im te ne na ha ya hû

**Heyderî:**

Hû bikêşe Heyderiya cewherê ‘ezman e hû

Dem bi dem cehr û cefiya seyqelê qelban e hû

(104/1)

Dilber û husn û cemalek mehşifet serwa feşalek

Saqî yû şêrîn peyalek xeste ’ê Loqman e hû

(104/7)

‘Erd û ‘ezman ab û xak in îns û cin teyr û simak in

Ger ne ew bit ev hilak in muhye ’ê mewtan e hû

(104/3)

---

<sup>81</sup> Ji bo helbestê tevî bnr. Şêx Semseddînê Exlatî. *Dîdarê Yar (Dîwana Ş. Ş. Qutbê Exlatî yê Brîfkanî)*, amd. Zahid Birîfkanî, Dezgey Çap û Belawkirdnewey Aras, Hewlêr, 2002, r. 257.

## BEŞA SÊYEMÎN

### JI ALİYÊ ŞIKLÎ VE VEKOLÎNA DÎWANÊ

Di vê beşê de em, ji aliyê şikl û ahengê yên mîna wezn, qafiyê, redîf û erûzê ve li ser dîwana Heyderî rawestiyane. Di van mijaran de bi piranî me ji berhemên mîna “Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye” ya M. A. Yekta Saraç, “Örneklerle Türk Şiir Bilgisi” ya Cem Dilçin, “Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü” ya İskender Pala “Berawirdiyeka Kêşnasî di Navbera Erûza Kurdî û Farisî” ya Helîma Xurşîd Ebulla sûd wergirtiye.

#### 1. TAYBETIYÊN ŞIKLÎ

##### 1. 1. Şiklê Tertîbê

Nusxeya muellif, dîwaneke bi tertîb e. Anku, helbestên ku tê de cî girtine bi awayekî nîzamî li gorî rêza elifbêyê hatine rêzkirin. Heyderî, bi hemû herfên ku di elifbêya erebî de cî digrin helbest nivisiye. Lê, bi herfên kurdî yên ku ne di elifbêya erebî de cî digrin, tenê bi tîpa ف (v)yê ve du helbest nivisiye. Bi herfên **p, ç, j** û gyê ve helbest nenivisiye.

##### 1. 1. 1. Rêz, Hejmar û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan

Li jêr me, helbestên ku di dîwanê de cî girtine; (i) ji aliyê herfa qafiyeyê, (ii) hejmara helbestên ku bi heman qafiyeyê ve hatine nivîsîn û (iii) rêza helbestan ve kategorîze kiriye.

Herfa Qafiyeyê	Hejmara Helbestan	Rêza Helbestan a di Dîwanê de
ا – a	3	4, 5, 6
ب – b	5	7, 8, 9, 10, 11
ت – t	5	12, 13, 14, 15, 16
ث – s	2	17, 18
ج – c	2	19, 20
ح – h	2	21, 22
خ – x	2	23, 24
د – d	6	25, 26, 27, 28, 29, 30
ذ – z	2	31, 32
ر – r	5	33, 34, 35, 36, 37


ز – z	5	38, 39, 40, 41, 42
س – s	5	43, 44, 45, 46, 47
ش – ş	5	48, 49, 50, 51, 52
ص – ş	2	53, 54
ض – d	3	55, 56, 57
ط – t	2	58, 59 (wenda ye), 60
ظ – z	2	61, 62
ع – ‘	2	63, 64
غ – g	2	65, 66
ف – f	3	67, 68, 69
ف – v	2	70, 71
ق – q	2	72, 73
ك – k	3	74, 75, 76
ل – l	4	77, 78, 79, 80(wenda ye), 81
م – m	6	82, 83, 84, 85, 86, 87
ن – n	7	88, 89, 90, 91, 92, 93, 94
ه – h	5	95, 96, 97, 98, 99
و – w	5	100, 101, 102, 103, 104
لا – la	2	105, 106
ى – y	4	107, 108, 109, 110

**Tablo 2:** Tabloya ku rêz, hejmar û herfa qafiyeyê ya helbestan nîşan dide.

Dema ku mirov bala xwe didê, mirov dibîne ku Heyderî bi heft helbestan ve herî zêde bi herfa **n**(ن)yê ve helbest nivisiye. Li dû “n”yê herfên ku herî zêde hatine bikaranîn, bi şeş helbestan ve herfên “d” û ya “m”yê ne. Herfên ku herî kêr hatine bikaranîn; “s”, “c”, “h”, “z”, “ş”, “t”, “z”, “‘”, “g”, “v”, “q”, “l” ne, û hejmara bikaranîna wan jî dudu ne.

## 1.2. Şikl û Cureyên Nezmê

Di vê binbeşê de jî em ê li ser cureyên nezmê yên ku Heyderî di dîwana xwe de emilandiye bisekinin. Cureyên nezmê yên ku di dîwanê de cî digrin; ne nîzamî lê belê, bi awayekî têkel in. Cureyên nezmê û hejmara wan wiha ne: 1 muselles, 5 Murebbe’, 65 xezel, 24 qesîde, 3 muxemmes, 3 terkîbê bend, 3 museddes, 1 mulemme’, 3 terci’ê bend, 1 mustezad. Hejmara bikaranîna cureyên nezmê di girafîka jêr de jî diyar e. Herwiha, şair di deh cureyên nezmê de helbest nivîsiye û cureya ku derdikeve pêş jî bi 65 helbestan ve xezel e. Helbestvan, ji aliyê dewlemendiya cureyên nezmê ve serkeftî ye.



**Grafîk 2:** Grafîka ku rêjeya bikaranîna cureyên nezmê nîşan dide.

### 1.2.1. Qesîde

Qesîde, navê wê şiklê nezmê ye ku beyta wî ya destpêkê di nava xwe de û yên mayîn jî bi beyta yekemîn ve bi qafiyê ne û hejmara asayî ya beytên qesîdeyê 15 in û divê hemû beytên qesîdeyê bi heman weznê ve hatibine nivîsîn.<sup>82</sup>

Di dîwanê de şiklê nezmê yê ku di rêza duyemîn de herî zêde hatiye bikaranîn bi 24 heban ve qesîde ye. Anku, ji dû xezelê ve şiklê ku herî zêde hatiye bikaranîn qesîde ye. Dîsa, li jêrê tevahiya qesîdeyên ku dîwanê de cî girtine hatine nîşandan.

Rêza Qesîdeyê ya di Dîwanê de	Hejmara Malikan
32	9
23, 30, 31, 35, 36, 38, 40, 42, 44, 45, 50, 58, 62, 69, 78, 84, 86, 90, 98, 104, 109	11
18, 23, 26,	13


<sup>82</sup> M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, 3F Yayınevi, İstanbul, 2007, r. 21.

### 1.2.2. Xezel

Xezel, ew girîngtirîn şiklê nezmê ye ku di helbesta klasîk a hemû rojhelata naverast de, herî zêde hatiye bikaranîn. Xezel, navê wê şiklê nezmê ye ku beyta wê ya destpêkê di nava xwe de û yên mayîn jî bi beyta yekemîn ve bi qafiye ne û hejmara asayî ya beytên xezelekê 5 in.<sup>83</sup>

Herwekî edebiyata klasîk a hemû rojhelata naverast de bikaranîna xezelê, di Dîwana Heyderî de jî şiklê sereke ye. Wekî ku me li jorê jî diyar kiribû, Heyderî bi tevahî 65 xezel nivîsiye. Weznên ku xezel pê hatine nivîsîn, teqabulê hemû cureyên weznên ku di seranserê dîwanê de hatine bikaranîn, dike.

Me li jêr cî daye rêjeya bikaranîna behrên erûzê yên ku xezel pê hatine nivîsîn.



**Grafîk 3:** Grafîka ku di xezelan de, rêjeya bikaranîna behrên erûzê nîşan dide.

Herwiha, hejmara malikên xezelekî, di navbera 5-15an de ne. Dema ku em bala xwe didin Dîwana Heyderî em dibînin ku tevahiya hejmara malikên xezelên ku di dîwanê de cî girtine, beramberê vê qaidê ne. Anku, hejmara malikên xezelan ên ku di dîwanê de cî girtine, di navbera 9-16an de ne. Bi awayekî zelaltir, ev xusûs di tabloya jêr de xûyan dike.

<sup>83</sup> Saraç, h.b., r. 47.

Rêza Xezelê ya di Dîwanê de	Hejmara Malikan
32, 105	9
5, 6, 10, 15, 16, 20, 21, 22, 24, 25, 27, 28, 29, 33, 34, 37, 41, 43, 46, 47, 49, 51, 52, 54, 56, 57, 60, 63, 65, 66, 68, 71, 73, 74, 75, 76, 82, 83, 85, 87, 89, 91, 92, 94, 96, 97, 99, 100, 101, 102, 103, 106, 108,	11
81, 95	12
4, 7, 9, 12, 13, 19, 70	13
8	16

Wekî encam, ji 65 xezelên ku di dîwanê de cî girtine 53 xezel ji 11 malikan pêk hatine. Wekheviya hejmara malikên xezelan, diyardeyeke girîng a sistematîkbûna Heyderî ye.

### 1.2.3. Mustezad

Mustezad, ew şiklê nezmê ye ku ji xezelan tê çêkirin û yek ji risteyên wê dirêj û yek jî kurt e. Mustezad bi hin weznên kifşe ve têne nivîsîn.<sup>84</sup> Di dîwanê de tenê mustezadek heye û ew jî di rêza 93yan de cî digre. Ev mustezad bi qalibê “mef’ûlu / mefa’îlun / mefa’îlun / fe’ûlun / mef’ûlu / fe’ûlun” a behra hezecê ve hatiye nivîsîn. Hejmara beytên vê mustezadê 11 in.

### 1.2.4. Muselles

Wateya eslî ya bêjeya musellesê sisê kirin an jî ew tiştê ku bi sêgoşe ye. Wekî têgeheke wêjeyê muselles, navê ew şiklê nezmê ye ku ji sê risteyan pêk tê.<sup>85</sup> Di dîwanê de tenê musellesek heye. Ev muselles jî helbesta despêkê ya dîwanê ye û bi behra hezecê ve hatiye nivîsîn. Hejmara bendên helbestê 11 in.

### 1.2.5. Murebbe’

Wateya eslî ya bêjeya murebbe’ê çar kirin an jî ew tiştê ku bi çargoşe ye. Wekî têgeheke wêjeyê murebbe’ navê ew şiklê nezmê ye ku ji çar risteyan pêk tê.<sup>86</sup> Di dîwanê de bi tevahî pênc murebbe’ hene û bi behrên remel û hezecê ve hatine nivîsîn.

<sup>84</sup> Saraç, h.b., r. 68.

<sup>85</sup> Saraç, h.b., r. 107.

<sup>86</sup> Saraç, h.b., r. 111.

Li jêrê jî me cî daye rêz û hejmara murebbe<sup>ç</sup> ên ku di dîwanê de cî girtine.

Rêza Murebbe <sup>ç</sup> ê ya di Dîwanê de	Hejmara Bendan
3	12
14	11
55	11
67	9
80	9

### 1.2.6. Muxemmes

Muxemmes, ew menzûme ye ku her bendê wê ji 5 risteyan pêk tê.<sup>87</sup> Di dîwanê de ji muxemmesê, tenê sê helbest cî digrin. Muxemmesa di rêza 39an muxemmesa mutekerrîr e. Weznê van hersê muxemmesan jî, ji hev cûda ne û bi rêzê ve bi behra hezec, remel û recezê ve hatine nivîsîn.

Lê jêrê jî me cî daye rêz û hejmara muxemmesên ku di dîwanê de cî girtine.

Rêza Muxemmesê ya di Dîwanê de	Hejmara Bendan
11	11
17	11
39	11

### 1.2.7. Museddes

Museddes, ew menzûme ye ku her bendê wê ji 6 risteyan pêk tê.<sup>88</sup> Di dîwanê de bi cureya museddesê sê helbest hene. Ev hersê helbest jî, bi qalibê “fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilun” yê behra remelê ve hatine nivîsîn.

Lê jêrê jî me cî daye rêz û hejmara museddesên ku di dîwanê de cî girtine.

Rêza Museddesê ya di Dîwanê de	Hejmara Bendan
64	9
79	7
88	7

### 1.2.8. Mulemme<sup>ç</sup>

Mulemme<sup>ç</sup>, ew menzûme ye ku bi çendîn zimanan ve hatiye gotin.<sup>89</sup> Ji vê cureyê jî di dîwanê de tenê helbestek heye û ew jî di rêza 72yan de cî digre. Ev mulemme<sup>ç</sup> bi qalibê “fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilun”ê behra remelê ve hatiye

<sup>87</sup> Saraç, h.b., r. 124.

<sup>88</sup> Saraç, h.b., r. 135.

<sup>89</sup> Ferit Develioğlu, *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitabevi, Ankara, 2003, r. 859.

nivîsîn û ji heşt malikan pêk hatiye. Heyderî, her risteyeke vê mulemmê<sup>c</sup> ê bi zimanekî cuda ve rêstiyê. Di mulemmê<sup>c</sup> ê de bi rêzê zimanên erebî, farisî, tirkî û kurdî hatine bikaranîn.

<b>Riste</b>	<b>Ziman</b>
Yekem	Erebî
Duyem	Farisî
Sêyem	Tirkî
Çarem	Kurdî (Kurmancî)

### 1.2.9. Terkîbê Bend

Terkîbê bend, ew cureya nezmê ye ku bi kêmayî ji 3 bendan û bi gelemperî jî, ji 6 an jî 10 bendan pêk tê. Di hemû bendan de heman weznê tê şopandin. Taybetmendiyeke din a terkîbê bendê jî, her malikeke wasitê di nav xwe de bi qafiyê ye û bi malikên wasitê din re jî dijqafiyê ye.<sup>90</sup>

Ji vê cureyê jî di dîwanê de tenê sê helbestan cî girtine. Terkîbê benda di rêza 48an de, ji heft bendan pêk hatiye û her bend di nava xwe de bi qafiyê ne û qafiyeya malikên wasitê jî wiha ye: ab ab ab... Anku, risteya yekem a hemû malikên wasitê di nav xwe de û risteya duyem jî di nava xwe de bi qafiyê ne. Wezna vê helbestê remel e. Hejmara tefileyên bend û malikên wasitê jî, ji hev nagire. Bend ji sê tefileyên, malikên wasitê jî, ji çar tefileyên pêk hatine.

Gotinên ku me bo qafiyeya helbesta di rêza 48an de gotin bo terkîbê benda di rêza 53yan de jî derbasdar e. Lê belê, wezna vê helbestê ji du behran pêk tê; hezec, recez. Digel ku hejmara tefileyên qasî hev e jî (4 tefîle).

Emilandina wezna terkîbê benda di rêza 61ê de jî wek ya 48an e. Lê belê, tenê behr ji hev cihê ne; behra 48an remel e û ya 61ê jî hezec e. Qafiyeya malikên wasitê yê vê helbestê wek ya 48an e. Lê, qafiyeya bendan ji yê din cihê ye: ab ab ...

Li jêrê jî me cî daye rêz û hejmara terkîbê bendên ku di dîwanê de cî girtine.

<b>Rêza Terkîbê Benda di Dîwanê de</b>	<b>Hejmara Bendan</b>	<b>Hejmara Risteya Bendan</b>
48	7	8
53	7	6
61	7	8

<sup>90</sup> Saraç, h.b., r. 177.



### 1.2.10. Tercî'ê Bend

Ew cureya nezmê ye ku ji çendîn bendên biqafiye pêk tê. Di dawiya van bendan de jî ew malikên hemqafiye yên ku têne dûbarekirin hene. Cûdatiya di navbera terkîbê bend û tercî'ê bendê tenê ew e ku malikên wasiteyê di tercî'ê bendê de têne dûbarekirin.<sup>91</sup>

Di dîwanê de sê tercî'ê bend hene û bi behra remel û recezê ve hatine nivîsîn. Tercî'ê benda di rêza 77an de ji çendîn aliyan taybet e. Risteyên ku peywira wasiteyê pêktînin ne beyt in; bendên sê risteyî ne. Wezna bendan û bendên wasiteyê jî ne wek hev in. Wezna bendên eslî recez û ya bendên wasiteyê jî remel e. Bendên wasiteyê di nava xwe de hemqafiye ne. Qafiyeya bendan jî wiha ye: aaaax, bbbbx, ccccx...

Tercî'ê benda di rêza 107an de jî, ji aliyê şiklî ve ne wek ên din e. Wezna bend û malikên wasiteyê ji hev cihê ne; remel û hezec in. Hemû malikên wasiteyê hemqafiye ne û qafiyeya bendan jî wiha ye: xxxxxx, aaaaxx, bbbbx...

Tercî'ê benda di rêza 110an de jî, ji hêla şiklî ve naşibe yên din. Wezn û qafiyeya bend û bendên wasiteyê (wasiteya vê manzûmeyê jî ne beyt, lê bend e) wek hev e.

Li jêrê jî me cî daye rêz û hejmara tercî'ê bendên ku di dîwanê de cî girtine.

Rêza Tercî'ê Benda di Dîwanê de	Hejmara Bendan	Hejmara Risteya Bendan
77	7	5
107	7	6
110	Ji benda yekem şûnde helbest wenda ye.	6

Wekî encam, dîwan ji aliyê şiklî ve pirreng û serkeftî ye. Şiklê ku zêdetirîn hatiye bikaranîn, bi 65 menzûmeyan ve xezel e. Dû re bi 24 menzûmeyan ve şiklê ku herî zêde hatiye bikaranîn qesîde ye. Şiklên ku herî kêr hatine bikaranîn bi rêzê ve ev in; muselles, mulemme' û mustezad. Bi heryekê van şiklan tenê menzûmeyek hatiye nivîsîn.

<sup>91</sup> Saraç, h.b., r. 189.

### 1.3. Wezn


107 menzûmeyên ku di dîwanê de cî digrin, bi 6 cure behrên erûzê ve hatine nivîsîn. Ji aliyekî din ve jî, di seranserê dîwanê de 15 qalibên cûda yên ku di van behrên mezkûr de dihewin, hatine bikaranîn. Ji behra hezecê 7 qalib, ji behra remelê 4 qalib û ji behrên recez, muserîh, muzarî û besîtê jî heryek qalibek hatiye bikaranîn. Ev taybetiyên ku me di vîra de behs kirine, di tabloya jêr de zelaltir xûya dikin.

	BEHR	QALIB	HEJMARA BIKARANÎNÊ		
			Hejmara Helbestan	Yekûna Behran	
1	Remel	1	fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun	10	47
		2	fe'ilatun / fe'ilatun / fe'ilatun / fe'ilatun	2	
		3	fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun	30	
		4	fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun	6	
2	Recez	1	mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun	30	30
3	Hezec	1	mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun	19	29
		2	mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun / fe'ûlun	1	
		3	mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun	1	
		4	mefa'ilun / mefa'ilun / fe'ûlun	3	
		5	mef'ûlu / mefa'ilun / mef'ûlu / mefa'ilun	1	
		6	mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun	3	
		7	mef'ûlu / mefa'ilun / mefa'ilun / fe'ûlun	1	
4	Muserîh	1	mustef'ilun / fe'ûlun / mustef'ilun / fe'ûlun	2	2
5	Muzarî	1	mef'ûlu / fa'ilatun / mef'ûlu / fa'ilatun	2	2
6	Besît	1	mustef'ilun / fa'ilun / mustef'ilun / fa'ilun	1	1

**Tablo 3:** Tabloya ku qalib û behrên erûzê yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn, nişan dide.

Herwekî ku di grafîka 4emîn de jî xûyan dike, di nava 6 behrên erûzê yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn de behrên ku dertêne pêş; remel, recez û hezec in. Di rêza yekemîn de bi %44an ve behra remelê, di rêza duyemîn de, bi %27an ve behra recezê û di rêza sêyemîn de jî, bi %24an ve behra hezecê cî digre.

Wekî ku di tabloya jor de jî aşkere diyar bûye, di seranserê dîwanê de sê qalibên ku di sê behrên cûda de cî digrin, sereke ne; bi 30 helbestan ve qaliba “*mustef'ilun / mustef'ilun / mustef'ilun*” a behra recezê, bi 30 helbestan ve qaliba “*fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun*” a behra remelê û bi 19 helbestan ve jî qaliba “*mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun*” a behra hezecê.



**Grafîk 4:** Grafîka ku rêjeya bikaranîna behrên erûzê nîşan dide.

Heyderî, di bikaranîna erûzê de gelek serkeftî ye. Jixwe, tetbîqkirina erûzê li ser metnên Kurmancî asan e û ji aliyê taybetiyên zimên ve jî lê tê. Xeynî vê xalê, em dibînin ku ji aliyê wezna erûzê ve mînakên serkeftî ji Xanî şûn de di edebiyata klasîk a kurdî de derketine holê.

Herçiqas me li jorê got ku Heyderî wezna erûzê bi hosteyane bikaraniye jî lê, em dibînin ku hin kêmasiyên ku ji aliyê rexnegîrên edebiyatê ve mezûr tînin, di helbestên Heyderî de cî ciyan dertêne pêşiya me. Ew jî îmale, med, zîhaf û wesl in.

### 1.3.1. Îmale

Îmale, dirêjxwendina dengdêreke kurt a di hundurê bêjeyekê de ye. Bi gotineke din, di erûzê de kêteyêke vekirî ku wekî kêteyêke girtî bê hesabandin wê çaxê îmale derdikeve holê.<sup>92</sup> Di dîwanê de ji ber ku erûz bi awayekî serkeftî hatiye bikaranîn, mînakên îmaleyê jî kêman in.

Bo nimûne:

Ger te meşleb cah û menşeb bûs û gebgeb dil birin  
Secde bîne xoş hilîne mişlê şeyx ‘eynê şerab  
(8/15)

Le’l û cewahîr tê hene durrê newahir tê hene  
Rengê şorgul pir tê hene behrê ji eqlamê gerîr  
(9/3)

Ba’ê evînê kar bitin narê li ‘aşiq har bitin  
Dûr û diraz e sar bitin bêhukmê baranê ferec  
(20/8)

Dil bû du ker pir bûn keder mame bi der nîn e meqer  
Durdane û xweşçare û zuxrîme û can el-meded  
(26/3)

<sup>92</sup> Saraç, h.b., r. 210.

### 1.3.2. Med (Îmaleya Memdûde)

Wateya eslî ya medê dirêjkirin an jî kişandin e. Lê, di erûzê de med, dirêjxwendina hinekî zêdetir a kîteyên hevedudanî\* ye.<sup>93</sup>

Ger muqîm dilber perestî qeşrê dil me‘ **mûr** dibit  
Şûşeya zahir direstî baîninî pir **nûr** dibit  
(12/1)

Şahê di ber roja elest tîgê şehînsahê vebest  
‘ Amê bi kamê **purest** xanserwer e ew şeng û şox  
(23/3)

### 1.3.3. Zîhaf

Wateya eslî ya zîhafê, dûrxistina ji eslê xwe ye. Lê, di erûzê de zîhaf, kurtkirin an jî kurtxwendina kîteyan e ku di rastiyê de dirêj in.<sup>94</sup> Dema ku meriv bi awayekî giştî li dîwana Heyderî mêze bike meriv dibîne ku şair gelek caran sêrî li “zîhaf”ê nedaye. Lê belê, di dîwanê de meriv cî ciyan rastî “zîhaf”ê jî tê.

Em dikarin zîhafê jî, di nav xwe de parveyê sê beşan bikin.

1. Xwendin û nirxandina dengdêrên dirêj wekî kurt û kîteyên girtî jî wekî yên vekirî. Ev cure zîhaf, nirx û payeya edebî û hunerî ya metnê dadixîne.

“ê”

Kaze kaz im der niyaz im her dixwazim ya Ğeyaş  
Qeddê ‘er‘er xeddê eħmer hem di keffeynê şerab  
(8/5)

Qafê ta Qafê **tê** şewqa nûrê ħennan bû furû‘  
Zatê efxem bû ji ‘amî ra penah û hem melaz  
(32/5)

“î”

Dilkebîb im ħal‘ ecîb im bêtebîb im saqiya  
Ey siracim wa ‘îlac im zerf û cameynê şerab  
(8/10)

Nûra te girtî yekser rûwê **cîhan** lebaleb  
Heft **asîman** beraber ħor û **cînan** lebaleb  
(10/1)

“û”

Xûrşîdeniya Heyderî dêm xawer e ew şeng **û** şox  
Nûra dilê min muşterî qed‘er‘er e ew şeng **û** şox  
(23/1)

Biskê ‘ebîr qedda ħerîr şahê şehîr kuştim bi şîr  
Yexsîr im ez min nîn e kes Şiddîq **û** ‘Uşman el-meded  
(26/5)

\* Di erûzê de kîteya hevedudanî: Kîteyên ku dawiya wan ji du dengên dengdar pêk tên wekî “mest”, “jeng”, “eşq” an jî piştî dengdêrekî dirêj, hatina yek an jî du dengên dengdar wekî “dost” û “yar”.

<sup>93</sup> Saraç, h.b., r. 211.

<sup>94</sup> Saraç, h.b., r. 215.

2. Nexwendina bi med a cîhên ku lazim e ku bi med bê xwendin. Ev cure zîhaf, wekî ya yekemîn kêmasiyeke mezin nayê hesabandin.

Ṭalibê ḥusn û cemalê lê dide bêhna wişalê  
**Meyl** dide xemra peyalê bêhiş û mexmûr dibit  
(12/4)

Li min tîr û **tifing** hatin şerabnîrê bi deng hatin  
Cerîdê **rengbireng** hatin fu 'adê min kirin tarac  
(19/2)

Dil bir bîla gewga û **ceng** ' işqê bi şimşîr û xedeng  
Rakir li min Rom û **Fireng** bedhal kirim beyne`l-`ebîd  
(29/9)

3. Şûna kîteyên vekirî de bikaranîna kîteyên girtî.

Le`l û cewahîr tê hene durrê newahir tê hene  
Rengê **şorgul** pir tê hene behrê ji eqlamê gerîr  
(9/3)

Şam û seher gîryan **im** her ez nabim ferhan el-meded  
Eşkê gewez têtin bilez mewla`ê Yezdan el-meded  
(26/1)

**Şemla** Ṭûrê Sînayê ji rûxsarê şekerxayê  
Qemerweş pertewek dayê penah û `ewnê Mûsa kir  
(35/5)

#### 1.3.4. Wesl

Wateya bêjeyî ya weslê bihevekirin e lê, di erûzê de peyveke ku dawiya wî bi tîpeke dengdar ve qediyabe ji ber pêdiviya weznê bi peyveke ku bi dengdêrekî ve destpêdike tê girêdan û bi vî hawî dengê dengdar û yê dengdêr bi hev re têne xwendin.<sup>95</sup>

Bo nimûne:

Ṭalibê ḥusn û cemalê lê dide bêhna wişalê  
Meyl dide xemra peyalê bêhiş û mexmûr dibit  
(12/4)

Dil tijî tîr û cerîd **im** her divê herba şedîd **im**  
Ger telefbim ez şehîd **im** ew bixwe megfûr dibit  
(12/9)

Di semtê gurbetê bend **im** li Tewrîz û Hemawend **im**  
Birûska hîcretê jendim bi qîmê hel kirim Hëllac  
(19/5)

<sup>95</sup> Saraç, h.b., r. 208.

Meħpûs û bendim mah û sal rencûr û meħzûn û melal  
 Tenxeste û dil nale nal jar û perîşanê ferec  
 (20/2)

Di hin cihan de bo ku peyv bikeve qalibê weznê, ji ew peyvên Erebi yên bi şedde herfek tê xistin.

Bo nimûne:

Şorgula bagê ne'îm î dêmdura 'enberşemîm î  
 Ger tu Loqmanê Hekîm î mexzenê derdan e va  
 (6/4)

Top û tîfîngê ber ji nar mecruħ kirim ah û hewar  
 Girtim bi xef cergê me xwar bazê li ser destê şeyad  
 (27/4)

Şem'a te Eħmed Heyderî hîlbû di fanûsa zucac  
 Qeşra te pir kir enwerî ferxendebad nî'me`s-sirac  
 Durra te dil lê muşterî xûrşîd ji şewqê bû wehac  
 Lefzê 'ebîr û 'enberî cerhê te dîtin jê 'îlac  
 Gerq im di ava kewşerê rast û şîmal kafûr im ez  
 (39/11)

Weşfê zehra'ê te zanî dur ji 'ummanê deranî  
 Xef bike razê nihanî ta bi uxra'ê bipirs  
 (47/3)


#### 1.4. QAFIYE

Qafiye, herî kêr li dawîya du risteyan de dûbarekirina dangan e. Bêjeyên ku di xwe de dûbarekirina van dangan dihewînin, divê an bixwe an jî wateya wan cûda be. Peywireke din a qafiyeyê jî ew e ku di helbestê de ahengê ava dike.<sup>96</sup>

##### 1.4.1. Cureyên Qafiyeyê

Di dîwanê de bi tevahî sê cure qafiye hatine bikaranîn. Evan jî; murdef, mucerred û muqeyyed in. Ji 65 xezelên ku di dîwanê de ne; 40 heb ji wan murdef, 20 heb mucerred û 5 heb jî muqeyyed in. Dîsan, ji 24 qesîdeyan jî 18 heb murdef û 6 heb jî mucerred in.

<sup>96</sup> Saraç, h.b., r. 257.



**Grafîk 5:** Grafîka ku di xezel û qesîdeyan de bikaranîna cureyên qafiyeyê nîşan dide.

#### 1.4.1.1. Qafiyeya Murdef

Qafiyeya murdef, ew qafiyeyê ye ku di xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne. Herfên rîdfê jî “*elîf, waw, yê*” ne. Divê yek ji herfên îlletê bêyî ku herekeyek stendibe, beriya herfa rewiye û di qafiyeyê de bê dúbarekirin.<sup>97</sup> Wekî; “...cîhan / ...nîşan”, “...zarîf / ...latîf” û hwd.

##### Nimûne:

Wirdan hilavêtin hîcab dîsan li mêrgan bû bihar  
Şed gulgul û reqş û ribab zağan li bağan kir şikar  
(34/1)

Îro ji hûsna dilberê meynoşî min mexmûr im ez  
Şurbek ji rengê kewşerê xef da me lew me’ mûr im ez  
Îhsan bi min kir beglerê ser ta qedem pir nûr im ez  
Îkram ji destê serwerê menşûrî da meşhûr im ez  
Mişkên meta’ê ‘enberî îzhar bikim ma’ mûr im ez  
(39/1)

Xusrewê menşûr di destê serfirazê serfiraz  
Hêj di ber roja elestê şahê bazê şahê baz  
(42/1)

Ĝema ‘işqa hebîba min ji nû bêmar kirim îro  
Firaqa mehcebîna min ji kerban bar kirim îro  
(100/1)

<sup>97</sup> Saraç, h.b., r. 270, 271.

### 1.4.1.2. Qafiyeya Mucerred

Qafiyeya ku tenê bi dúbarekirina herfa rewiye pêk tê qafiyeya mucerred e.<sup>98</sup>

Wekî; "...gul / ...bilbil", "...ser / ...seher" û hwd.

#### Nimûne:

Xûrşîdeniya **Heyderî** dêmxawer e ew şeng û şox  
Nûra dilê min muşterî qed'er'er e ew şeng û şox  
(23/1)

Îro seher min dî mahên qametek 'er'er  
Dewra qemerê min dî her goşekî şed ejder  
(33/1)

Derya'ê 'işqê hate xoş dîsa ji nû bû mewc û **kef**  
'Aşiq ji nageh bir ji hûş durdaneya fincan şedef  
(68/1)

### 1.4.1.3. Qafiyeya Muqeyyed

Qafiyeya muqeyyed, di menzûmeyekê de xeynê herfên rîdfê (*elif, waw û yê*) beriya herfa rewiye, bi dúbarekirina herfên hemcîns ên ku bêhereke ne pêk tê.<sup>99</sup> Weki; "...derd / ...merd", "...seng / ...jeng", "...behr / ...şehr" û hwd.

#### Nimûne:

Firyad ji qewsê hicretê barîn li min narên xedeng  
Şed ah ji destê firqetê yekser kirim wêranereng  
(74/1)

Heyata **Heyderî Ehed** bi qurban bit di dareynan  
Ji bo wan kakulê eswed du ebrû çeşm û wirdeynan  
(94/1)

Tîrê di gedar in ji kemaneynê du ebrû  
Hemwar e dibarin ji hilaleynê du ebrû  
(103/1)

Wekî encam, di dîwanê de cûreyên qafiyeyê yên ku herî zêde hatine bikaranîn bi rêzê ve ev in; qafiyeya murdef, qafiyeya mucerred û qafiyeya muqeyyed.

## 1.5. Redîf

Redîf, ew qertaf, qertaf û bêje yan jî kombêje, an jî tenê bêje yan kombêjeyên ku li ser şewazekî di dawiya riste an jî malikan de tene dúbarekirin e. Redîfên bi vî awayî yên ku di xezel û qesîdeyên ku di dîwanê de cî girtine, li jêrê hatine lîste kirin.

<sup>98</sup> Saraç, h.b., r. 267.

<sup>99</sup> Saraç, h.b., r. 269, 271, 272.



### 1.5.1. Redîfên ku di Halê Qertafan de ne

-kir: 35	-in: 92
-ek: 75	-im: 93
-yek: 76	-an: 94
-bûm: 82	-e`l-llah: 95
-im: 84	-me: 96
-im: 85	-ye: 97
-an: 89	-e: 99
-in: 90	-ê: 108
-an: 91	

### 1.5.2. Redîfên ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne

-e va: 6	-ê mehgeş: 51
-ê şerab: 8	-ê merîz: 56
-ê gerîb: 9	-ê gelet: 60
-e zat: 13	-ê Ya Heffaz: 62
-ê te bit: 16	-ê şem <sup>ç</sup> : 63
-im el-Ġiyaş: 18	-e dağ: 66
-ê ferec: 20	-in roj û şev: 70
-e ew şeng û şox: 23	-ek da dilê <sup>ç</sup> aşiq: 73
-el-meded: 26	-ê dil em: 83
-i bad: 28	-ê te ne: 98
-e Eħmed: 30	-est î o: 101
-el- <sup>ç</sup> iyaz: 31	-î tu: 102
-yim ez: 38	-ê du ebrû: 103
-ê herkes: 44	-e hû: 104
-ê me kes: 45	-an merheba ehlen: 106
-ê bipirs: 47	-ê Heyderî: 109
-e xweş: 50	

### 1.5.3. Redîfên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne

canfida me canfida: 5	bo me bes: 43
lebaleb: 10	kirim mexşûs: 54
dibit: 12	<sup>ç</sup> ariz: 57
bêxeber: 37	xettaş: 58
me xaz: 41	kirim îro: 100

Ji 89 helbestên di dîwanê de 60 heb helbestan de redîf hatiye bikaranîn. Ji van redîfan 40 heb bi kurdî, 15 heb bi erebî û 5 heb jî bi farisî ne. Ji van redîfan 17 redîf di halê qertafan, 33 redîf di halê qetaf û bêje an kombêjeyan û 10 heb jî di halê bêje an jî kombêjeyan de hatine bikaranîn.

Me li jêr cî daye tabloyeke ku him cureya qafiyeyê ya helbestan û him jî helbestên ku bi redîf in diyar dike.

<b>XEZEL</b>			
<b>Jimareya Helbestê</b>	<b>Cureya Qfiiyeyê</b>	<b>Jimareya Helbestê</b>	<b>Cureya Qfiiyeyê</b>
4	Mucerred	60	Murdefa bi Mureddif
5	Murdefa bi Mureddif	63	Murdefa bi Mureddif
6	Murdefa bi Mureddif	65	Murdef
7	Mucerred	66	Murdefa bi Mureddif
8	Muqeyyeda Bi Mureddif	68	Mucerred
9	Murdefa bi Mureddif	70	Murdefa bi Mureddif
10	Murdefa bi Mureddif	71	Murdef
12	Murdefa bi Mureddif	73	Murdefa bi Mureddif
13	Murdefa bi Mureddif	74	Muqeyyed
15	Murdef	75	Murdefa bi Mureddif
16	Murdefa bi Mureddif	76	Mucerreda bi Mureddif
19	Murdef	81	Mucerred
20	Murdefa bi Mureddif	82	Mucerred bi Mureddif
21	Murdef	83	Mucerreda bi Mureddif
22	Murdef	85	Mucerreda bi Mureddif
24	Murdef	87	Muredf
25	Mucerred	89	Mucerreda bi Mureddif
27	Murdef	91	Mucerreda bi Mureddif
28	Murdefa bi Mureddif	92	Muqeyyeda bi Mureddif
29	Murdef	93	Murdefa bi Mureddif
33	Mucerred	94	Muqeyyeda bi Mureddif
34	Murdef	95	Murdefa bi Mureddif
37	Murdefa bi Mureddif	96	Mucerreda bi Mureddif
41	Murdefa bi Mureddif	97	Mucerreda bi Mureddif
43	Murdefa bi Mureddif	99	Mucerreda bi Mureddif
46	Murdef	100	Murdefa bi Mureddif
47	Mucerreda bi Mureddif	101	Murdefa bi Mureddif
49	Mucerred	102	Murdefa bi Mureddif
51	Mucerreda bi Mureddif	103	Muqeyyeda bi Mureddif
52	Murdef	105	Mucerred
54	Murdefa bi Mureddif	106	Murdefa bi Mureddif
56	Murdefa bi Mureddif	108	Mucerreda bi Mureddif
57	Murdefa bi Mureddif		

<b>QESÎDE</b>			
<b>Jimareya Helbestê</b>	<b>Cureya Qfiyeyê</b>	<b>Jimareya Helbestê</b>	<b>Cureya Qfiyeyê</b>
18	Murdefa bi Mureddef	45	Murdefa bi Mureddef
23	Mucerred a bi Mureddef	50	Murdefa bi Mureddef
26	Murdefa bi Mureddef	58	Mucerreda bi Mureddef
30	Murdefa bi Mureddef	62	Murdefa bi Mureddef
31	Murdefa bi Mureddef	69	Murdef
32	Murdef	78	Murdef
35	Mucerreda bi Mureddef	84	Murdefa bi Mureddef
36	Murdef	86	Murdef
38	Mucerreda bi Mureddef	90	Mucerreda bi Mureddef
40	Murdef	98	Murdefa bi Mureddef
42	Murdef	104	Murdefa bi Mureddef
44	Mucerreda bi Mureddef	109	Murdefa bi Mureddef

**Tablo 4:** Tabloya ku digel cureya qafiyeyê redifên xezel û qesîdeyan nîşan dide.

# BEŞA ÇAREMÎN

## METNÊ DÎWANÊ YÊ BITENKÎD

### 1. DANASÎNA DÎWANÊ Û NUSXEYÊN WÊ

#### 1. 1. Dîwana Heyderî

Di kevneşopiya edebiyata klasîk de pêşkeşkirina dîwanekî bo deshelatdarekî çî herêmî û çî jî giştî, bûye wek adetekî ji rêzê. Anku, her şairî dîwana xwe diyariyê an jî pêşkeşê reveberê bihêztirînê dewra xwe kiriye. Bi vê rêyê ve helbestvanan xwestine ku têkiliyeke baş di navbera xwe û deshelatdaran de daynin. Bi vî hawî jî helbet, van deshelatdarên bi hêz; şabaş, culûs û îhsan dane şairan. Hetta, ev îhsan car caran bûye wek dayîna rêça salane ya zevîyekî an jî deverekî. Bo nimûne, Zafî yê ku yek ji şairê edebiyata klasîk a tirkî ye, bo qesîdeyê xwe ya ku bo padîşahî nivisiye, 2 hezar aqçe wergirtiye.<sup>100</sup> Dîsa, di heman pirtûkê de em, dikarin listeya şairên ku şabaş wergirtine, bibînin.<sup>101</sup> Carna jî bo ku şabaşekî zêde bistînin hin şairan, ew deshelatdarên ku berhema xwe pêşkeşî wî kirine, bi rêya pesn û senayan di dîwanê de bicih kirine lê belê, di erd û asîmanan de bicih nekirine. Ji aliyekî din ve jî têkiliya di navbera hunerkar û patronê xwe, bûye egerekî sereke yê belavbûna şohreta van herdu aliyan. Anku, şairek bi berhema xwe, bi pesn û senaya xwe ya bo patronê xwe ve him rê li pêşiya belavbûna nav û dengê vî deshelatdarê mezkûr vekiriye û him jî bi vê minasebetê ve bixwe gihêştîye şohretê. Di derbareyê vê babetê de Halil İnalçık wiha dibêje:

“Di dewra Silêmanê Muhteşem de eger, çanda klasîk a Osmaniyan berhemeke hunerî ya giranbiha dabe, di vira de payeyeke mezin a vê Siltanî yê xwedî bîr û fêhmeke bilind e, heye. Hetta, em dikarin bêjin ku kalîteya berhemeke çî hunerî û çî jî zanistî û şohreta hunerkarî, gelek caran Siltan kifşe dîke.”<sup>102</sup>

Lê di vira de em dibînin ku di nava vê tiradîsyonê de Heyderî, bo xwe hamiyek nedîtiye an jî nexwestiye ku bo xwe patronekî hilbijêre. Bi gotineke din, a teqez ew e ku Heyderî dîwana xwe pêşkeşî rêvebirekî nekiriye. Herçiqas, di destê me de dîbaceya dîwanê tune be jî –ji ber ku şairan di dîbaceya dîwanê de bi awayekî aşkere berhema

<sup>100</sup> Halil İnalçık, *Şair ve Patron*, Weşanên Doğubati, Ankara, 2010, r. 74.

<sup>101</sup> İnalçık, h.b., r. 72-73.

<sup>102</sup> İnalçık, h.b., r. 15.

xwe pêşkeşî kesekî kirine— em bi asanî dikarin pişt vê îddîaya xwe bisekinin. Ji ber ku Heyderî di tu helbestên xwe de pesna deshelatdarekî serdema xwe nedaye. Helbet, sedemên nebûna hamiyekî gelek in. Dema ku meriv bala xwe dide şert û egerên wê serdemê meriv dibîne ku bo helbestvanekî Kurd dîtina hamiyekî ewçend ne asan bûye. Salên şer, dagirkirin, têkçûn-têkbirin û koçkirinê anku, salên heyîn û mayînê in. Jixwe, di nava van şert û mercan de dîtina patronekî li aliyekî, nivîsandina bi Kurdî bixwe qedexe û dijwar e. Nebûna hamiyekî, yek ji egerên nenasîn û bêhaydariya Heyderî û berhemên wî ya di Lîteratûra Kurdî de ye.

Wekî ku me li jor jî behs kir, di nusxeya eslîn a dîwanê ya di destê me de dîbace nîn e. Jixwe, çendîn rûpelên ewil ên dîwanê hatine texrîb kirin, ji ber vê çendê jî eger Heyderî bo dîwanê dîbaceyek nivîsîbe jî, ji ber van sedemên destnîşankirî di destê me de nîn e. Lê, dibe ku qet nenivîsîbe jî.

## **1. 2. Nusxeyên Dîwanê**

Dîwana Heyderî heta niha nehatiye çapkirin. Lewre nusxeyên dîwanê yên di destê me de tev destxet in. Me heta niha sê nusxeyên wê tesbît kirine û li jêr jî me cî daye van nusxeyan.

### **1. 2. 1. Nusxeya Muellîf**

**Nusxe:** Orjînal-resen.

**Nivîskêr/Xettat:** Mela Ehmedê Heyderî

**Dîroka nivîsê:** ?

**Hejmara rûpelan:** 129

**Hejmara helbestan:** 110

**Hejmara beytan:** 1464

**Hejmara risteyan a di rûpelekê de:** 12

**Qeda rûpelê:** 18x24 cm.

**Destpêka Berhemê:**

Durdaneyê xûrşîd mîşal min dil di ‘eşqê yeğme da  
Ebr û hîlala çavgezal dê rûh fida kim ez geda

**Dawiya Berhemê:**

Ey mehê xûrşîd sena durra ji kenza qudretê  
Rohniya ‘erç û sema wîrda li bagê cennetê  
Merhemet ey rehnuma firyad ji destê firqetê

---

1a xurşîd] şêrîn NMDH.

1a dil di ‘eşqê] dil ji ‘eşqê NMDH.

Ev nusxe, ji 129 rûpelan pêk hatiye. Lê belê, hem ji serî û hem jî ji dawiyê hin rûpel hatine texrîb kirin. Ji ber vê texrîbatê çendîn helbestên ji despêkê û ji dawiyê wenda ne. Bi rêzê ve helbestên ku wenda ne ev in: Helbestên 1emîn, 2yemîn, 3yemîn; 59emîn û 80yemîn. Bi vî awayî, hejmara helbestên wenda yên berbiçav dibin pênc. Hejmara helbesta dawîn a di vê nusxeyê de ya 110emîn e. Herwekî ku me li jor jî diyar kiribû, ji ber ku çendîn rûpelên dawîn ên dîwanê wenda ne, helbesta 110emîn di nîvî de maye. Ev jî tê wê wateyê ku em nizanin ka piştî vê helbestê çend helbest hene. Lê, di derbareyê hejmara helbestan de mirov dikare texmîneke wiha bike. Hejmara helbestên wenda yên ji despêkê sisê ne. Eger ku texrîbata serî û dawiyê dor hev be, wê çaxê hejmara helbestan bi tevahî digehêje 113-114an. Ev hejmar jî, teqabûlê hejmara sûretên Qur'anê dike. Dibe ku şaîr xwestibe, hejmara helbestên dîwana wî qasî hejmara sûretên Qur'anê be. Lewre, temayulên bi vî rengî ji helbestvanên klasîk û yên mutesewwuf tê hêvî kirin.

Ji aliyekî din ve, li gor helbestên berdest, dîwan ji 1464 beytan pêk tê. Bi gelemperî di rûpelekî de helbestek cî digre. Hejmara rêzên di rûpelekî de bi piranî 12 rêz in û car caran jî ev hejmar digehêje 13, 14 û 15an. Bo nimûne, li pêveka 3 û 4an binêrin.

Ev nusxe, li cem neviyê helbestvanê me Mela Diyaeddîn Heyderî di bin parastinê de ye.

Nivîser/mustensîx û sala nivîsandina nusxeyê bi awayekî teqez ne diyar e. Lê, bi ihtîmaleke mezin ev nusxe ji aliyê Mela Ehmedê Heyderî bixwe ve hatiye nivîsîn. Ji ber du berete/delîlên ku me li jêr diyar kirine, xetên vê nusxeyê yên Heyderî bixwe ne.

1. Xetên vê nusxeyê û yên *Teqwîmnameyê* kêr zêde dişibine hevûdu. *Teqwîmnameya* ku di destê me de ye, bi teqez tê zanîn ku Heyderî bixwe nivîsiye. Me *teqwîmname* û nusxeya muellîf ya *Dîwana Heyderî* da berhev û bi rêya danberheva çendîn tîpên nêr em gihîştine wê encamê ku ev nusxe jî, Heyderî bixwe nivîsiye. Bo nimûneya xetê herdu berhemên ku me berawirdê hevdu kiriye, li pêveka 5-6-7-8-9 û 10an binêrin.

2. Li gorî rîwayetên devkî, ev nusxe di nava kitêbên Heyderî yên ku piştî mirina wî ji layê hevjîna wî Sedîqa Xanimê ve hatine parastin de bûye. Ev jî ihtîmala nivîsandina vê nusxeyê ji aliyê Heyderî bixwe zêde dike.

Ji ber van sedeman em vê nusxeyê wekî nusxeya eslî ya muellîf qebûl dikin. Em ji vê yekê dikarin bigihin vê encamê jî ku ev nusxe herî dereng di sala wefata Heyderî de (1937) hatiye nivîsandin.

### **1. 2. 2. Nusxeya Mela Diyaeddîn Heyderî**

Ev nusxe ji aliyê neviyê helbestvanê me, Mela Diyaeddîn Heyderî ve di sala 1992yan de bi rêya îstînsaxê ve hatiye nivîsîn. Mustensîx Mela Diyaeddîn Heyderî ev nusxe, ji ber nusxeya muellîf ve îstînsax kiriye. Ev nusxe jî di arşîva xusûsî ya Mela Diyaeddîn de ye.

**Mustensîx:** Mela Ehmedê Heyderî

**Dîroka îstînsaxkirinê:** 1992

**Qeda rûpelê:** 21x29 cm

**Destpêka berhemê:**

Ela ya eyyuhe`s-saqî ji zatê te ricakar im  
Werin camek meya baqî ji hicrê mest û gemdar im  
Melûl im bi qeder saqî mufferreh bim bi camê ra

**Dawiya berhemê:**

Ey mehê xûrşîd sena durra ji kenza qudretê  
Rohniya ‘ erd û sema wirda li bagê cennetê  
Merhemet ey rehnûma firyad ji destê firqetê

### **1. 2. 3. Nusxeya Mela Mihemmedê Çewlikî**

Ev nusxe jî, ji aliyê Mela Mihemmedê Çewlikî ve di sala 1994an de hatiye nivîsîn. Mela Mihemmedê Çewlikî îcazeta xwe ji kurê Heyderî, Mela Mihemmed Emînê Heyderî wergirtiye. Mela Mihemmedê Çewlikî jî ev nusxe ji ber nusxeya muellîf îstînsax kiriye. Ev nusxe jî di arşîva xusûsî ya Mela Diyaeddîn de ye.

**Mustensîx:** Mela Mihemmedê Çewlikî

**Dîroka îstînsaxkirinê:** 1994

**Qeda rûpelê:** 21x29 cm

**Destpêka berhemê:**

Durdaneyê xûrşîd mîsal min dil di ‘ eşqê yegme da  
Ebr û hîlala çavgezal dê rûh fidakim ez geda

**Dawiya berhemê:**

Ey mehê xûrşîd sena durra ji kenza qudretê  
Rohniya ‘ erd û sema wirda li bagê cennetê  
Merhemet ey rehnûma firyad ji destê firqetê

---

1a xurşîd] şêrîn NMDH.  
1a dil di ‘ eşqê] dil ji ‘ eşqê NMDH.

## 2. DI AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZA KU HATIYE ŞOPANDIN

Li jêrê em dê xal bi xal cih bidin rêbaza ku di amadekirina metnê bitenkîd de me şopandiye.

1. Ji ber ku nusxeya muellîf di nava hersê nusxeyan de ya herî dirust û tam bû, me ji bo damezrandina metnê bitenkîd ew kire bingeh. Lê digel wê jî me carna di hinek peyvan de formên nusxeyên dî tercîh kirin.

2. Piştî ku me metnê xwe yê dirust saz kir, îcar me cûdahiyên nusxeyên din di jêrenotan de nîşan dan. Ji bo navê her nusxeyekê jî me sembolek/kurtasiyek tercîh kir. Ev jî wiha ne: NM (Nusxeya Muellîf), NMDH (Nusxeya Mela Diyaeddîn Heyderî), NMMÇ (Nusxeya Mela Mihemedê Çewlikî).

3. Di latînzekirina metnê orjînal yê kurdo-erebîk de, ji bo tîpên ku di elifbêya kurdî ya latînî de cî nagrin, me elifbêya transkrîpsiyonê ya navnetewî ya ku di weşendina berhemên bitenkîd ên zanistî de têne bikaranîn, tercîh kir.

### Elîfbêya Transkrîpsiyonê

ء	: ʾ
ث	: Ṡṣ
ح	: Ḥḥ
ذ	: ḌḌ
ص	: Ṣṣ
ض	: ḌḌ
ط	: Ṭṭ
ظ	: ḌḌ
ع	: ʿ
غ	: Ğğ

4. Di nusxeya muellîf ya *Dîwana Heyderî* de him bo rûpelan û him jî bo helbestan jimare hatine dayîn. Lê belê, di xebata xwe de me jî, di îqtîbasên ji beyt û bendên dîwanê de, tenê jimareya helbest û beyt an jî bendan kifşe kiriye. Ji ber ku pêwîst nebû me, rûpelên wereqan diyar nekiriye. Bo nimûne:

ʿEgîd û Feylezûrxan im Siyeh Salarê zîşan im

Li ser textê Suleyman im şehê deh kîşweriyim ez

(38/4)



Di vira de reqema 38an jimareya helbestê û reqema 4an jî jimareya beytê nişan dide.

5. Di amadekirina metnê de, digel ku di nusxeyên destxet de nehatibûn nivîsandin jî, me wezna her helbestekê danî pêşiya wê û behra wê weznê jî destnîşan kir.

6. Ji bo nîşandana rêza malikên helbestan, me di her helbestekê de reqema 1ê danî milê çepê yê malika yekem û piştê serê her pênc malikan me reqema ku beramberî rêza wan malikan tê danî .

7. Muellîf di nusxeya eslî de ya ku bi xetê xwe nivîsandiye, li jora her rûpelekê hejmara wê rûpelê nivîsandiye û sistema wereqan bikar neaniye. Me jî li gorî terciha muellîf di metnê latînîzekirî de, jimareya rûpelan li pêşiya risteya destpêkê ya her rûpelekî nîşan daye. Bo nimûne **r. 6, r. 7.** û hwd. (Di rûpela 65an a dîwanê de, muellîf bi şaşitî hejmara 65an li pey hev, daye du rûpelan. Ji ber vê şaşitîyê jî ji rûpela 65an şûnde jimareya rûpelan şiqitiye. Me jî wek vê şaşitîyê, jimareya rûpelê neşiqitandiye û rasterast dewam kiriye).

8. Di nivîsîna hin peyvên de nusxe ji hev nagrin. Anku, heman bêje di nusxeyan de ji hev cudatir hatiye nivîsîn. Bo nimûne: Bêjeya “bilbil”ê di nusxeya muellîf de wekî “bilbil”, lê di herdu nusxeyên din ên dîwanê de jî wekî “bulbul” hatiye nivîsîn. Ji ber ku rasttir e, me jî di nivîsîna metnê dîwanê de forma nusxeya muellîf tercih kir. Bêjeyên din ên ku me tesbît kirin ev in:

<b>NM</b>	<b>NMDH, NMMÇ</b>
‘işq	‘eşq
‘indellîb	‘endelîb
serxweş	serxoş
qulzem	qelzem

9. Nusxeya muellîf de, hin bêjeyên Farisî bo ku li weznê were, kîteya wan a duduyan hatiye vekirin. Bo nomûne: Bêjeya Farisî ya **derdmend** wekî **derdimend** hatiye nivîsîn. Me jî, herfa *i*’yê ya ku kîteyê vedike, di nav bêjeyê de îtalîk nivîsiye. Bêjeyên bi vî rengî yên ku me tespît kirine ev in:

karizar (33/10), çarisû (36-5), şermisar (88\6), xundîkar (99/4), derdimend (48/1).

10. Herwekî ku tê zanîn, bilêvkirina peyvên mîna mîsal, hîlal, nîhad û hwd. li gorî dever û herêman, diguhere. Bo nimûne: Hin dever, kîteya yekemîn ya bêjeya *mîsalê* bi awayekî dirêj: mî-; hin dever jî bi awayekî kurt: mi-, bilêv dikin. Anku, hinek

dibêjin *mîsal*, hinek jî dibêjin *misal*. Lê belê, bo yekîtiya ziman me jî, di hemû peyvên bi vî rengî de, tenê formê dirêj tercîh kiriye.

**11.** Ayet, hedîs an jî îbare û beytên erebî, farisî û tirkî yên ku di dîwanê de derbas dibin, me bi şêweya îtalîk nivisîne û di jêrenotan de jî me cî daye wergerên wan ên kurdî.

### 3. METNÊ DÎWANÊ YÊ BITENKÎD

#### 1.\*

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun

Hezec · ---- / · ---- / · ---- / · ----

- 1 Ela ya eyyuhe`s-saqî ji zatê te ricakar im  
Werin camek meya baqî ji hicrê mest û gëmdar im  
Melûl im bi qeder saqî mufferreh bim bi camê ra

Murada min ji destê te şerab û badeya gulgûn  
Belê weqtê seher îro xiyala firqetê xwar im  
Gerîb im pirkeder saqî binoşim ez bi fecrê ra

Binoşim badeya şafi ji bêhuşî wekî wa bim  
Gewwaşê qulzema ' işqê ji yaqûtan xeberdar im  
Welekîn bêxeber saqî muşewweş bûm bi derbê ra

Gewwaşê qulzema kûr im di behran de me dî durrek  
Nehên min taqeta weslê ji kerban dilbirîndar im  
Belê şam û seher saqî bi feryad im ji şewqê ra

- 5 Ji ' eşqê mest û sukran im ji hengamê elest im ez  
Me noşî badeya meylê hetta îro wuha zar im  
Hezîn im rengê zer saqî ji van tîrê di cergê ra

Dil û cergê me bûn atêş ji şewqa mehêsîma 'ê  
Dişojim şûbhê perwanê cenahe cem' ê dîdar im  
Vejend im serteser saqî berê şal dat û man hê ra

Li cergê min dibarin tîr ji qewsê firq û hîcranê  
Meraqa wuşletê kuştim ji ser ta pê wekî nar im  
Xedeng û mawzer saqî li min têtin ji qetlê ra

---

\* Ev helbest, di NM û NMMÇyê de nîn e, di NMDHyê de cî digre.

Bi fikra sûreta gulgûn di behrê gemnîhan im ez  
Wekî bilbil bi efğan im meh û salan dilefkar im  
Eman ey lebşeker saqî nema taqet ji şebrê ra

Wekî bilbil bi gemdarê gulîstan min li bîr in her  
Peyapey gem dibarin dane dane zêde gedar im  
We fehmê qedneşer saqî telef bû can û mal vê ra

10 Ji hîcrê vê demê dîn im gelo pîrê mêvan kanê  
Bipirsim hal û esraran çî resm e 'îşqê dildarim  
Bibînim ez eger saqî didim rûh ez bi mujdê ra

Hezîne firqetê **Ehmed** dinalit mişlê goyîne  
Ji destê muhbet û 'îşqê muqîmê eşkê xûnbar im  
Werin rûh û qemer saqî peyala **Heyderî** jê ra

2.\*

3.\*\*

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - . - - / - . - - / - . -

1 .....û duşed selamhayê Xuda\*\*\*  
Ber cenabê an şekerxanê Xuda  
Misk û 'enber xoş bibarin li qedê  
Em mu'etter bin bi balayê Xuda

Ey Xuda tu melce'ê min şahê min  
Serwerê min rehberê min mahê min  
Mefxerê min her di weqt û gahê min  
Şahê baz û çeşmê şehlayê Xuda

---

9b gedar im] gedar im NM, NMDH.

\* Helbesta rêza 2yemîn, di tu nusxeyê de tune ye.

\*\* Ev helbest jî, ne di NM û ne jî di NMMÇyê de, nîn e. Di NMDHyê de cî digre.

\*\*\* Peyva destpêkê ya risteyê nîn e.

Misk û xal e xoşfîşal e çavgezal  
Şox û şengê şems û rengê pircemal  
Xeddê al e qedd û qamet bêmîşal  
Xal û nîşan necm û zehrayê Xuda

Xal ‘ ebîr û şadenûra dilpezîr  
Bêqusûr e wird û cûra tevherîr  
Mah û xûrşîd in di ruxsarê munîr  
Nar û nûrê Tûrê Sîna ’ê Xuda

5 Bêmîşal e bejn û bala ‘ er‘ er e  
Dêm çî şorgul xal û mişkên xawer e  
Çeşmê şor e cismê nazik enwer e  
Ziyneta Firdewsê xedrayê Xuda

Ez ji ‘ işqê dilkebab im suxtehal  
Dağidar im bêqerar im mah û sal  
Hesreta min wuşleta nûra zelal  
Muntezîr mame bi fermayê Xuda

Mah û salan bêsukûn im bêmefer  
Hîcreta min ez gerandim der bi der  
Can li min zor kir ev ê rencê di ger  
Şubhê Mecnûn im di şehrayê Xuda

Min ji zâtê wê divabû wuşletek  
Yan bi ‘ eynê eşkê rengîn rû ’yetek  
Axirê berda dilê min hîrqetek  
Narê hesret şohtî îm‘ a ’ê Xuda

10 Abê zemzem kewşer û ‘ eynu`l-heyat  
Hôr û gîlmana ji nûrê lebnebat  
Navê min bêwuşla durra nûra zât  
Min bi şehda nav bi mewlayê Xuda

**r. 6**

Dil di zindana evînê mam esîr

Bêkes û sergeşte û jar û feqîr  
Lê dibarin her seher mizraq û tîr  
Ah û nalêm ta bi ‘ uqbayê Xuda

Mubtelayê bènawa ye **Heyderî**  
Dermendê **Ehmedê** dil kerkerî  
Weşlê dilber hem şeraba şagerî  
Her li bîr e nûrê yumnayê Xuda

#### 4.

mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1 Durdaneya xûrşîd mîşal min dil di ‘ eşqê yeğme da  
Ebr û hîlala çavgezal dê ruħ fida kim ez geda

Dê ruħ fîdakim ez niha ħusn û cemala bêbiha  
Îcadi bûn jê nûriha şewqê li dunya ’ê veda

Şewq û şema‘ a qametê nûr û senaya cibhetê  
Bû încilaya zulmetê nûrun ‘ ela nûr şu‘ le da

Dêma ji rengê sorgulê sîma û zuhrê nûr e lê  
Tîrek bixwe berda dilê sergeşte ’ê dîwane da

5 Sergeşte û dîwaneyim uftade ’ê dilteşneyim  
Min çav li îkrama teyim ey lebşeker şêrînseda

‘ Eşqê li min sohtî fu ’ad pence di cergêda nîhad  
Bilbilmîşal im bêmurad min ruħ di vê rê her we da

Manendê bilbil roj û şeb ahan dikêşim ey ‘ eceb  
Dê ruħ bi derd im der teleb wan herdu çavê surme da

---

1a xurşîd] şêrîn NMDH.

1a dil di ‘ eşqê] dil ji ‘ eşqê NMDH.

2a cemala] cemalek NMDH.

4a zuhrê] zuhre NMDH.

4b dilê] milê NMDH.

Min dî li min hatî bihar geş bû li bilbil lalezar  
Xweş kir li min cerhê gedar şorgul di gulzarê me da

Ya eyyuhe`s-saqî werîn weqtê seher fecra berîn  
Camek ji xemra enwerîn da em bikin keyf û eda

**r. 7**

10 Da em bikin zewq û şefa mişrib werin saz û defa  
‘Umrê me borî esefa axir bi min wuslek neda

Mişrib werin çeng û keman ejdersifet mêhtim geman  
Bes xefke saqî el-eman xemrê di fîncana xwe da

Rencûr û zer bûm bêhebîb bêhogir û yar û qerîb  
Ez mam di vê semtê gerîb nalîn ji min çû Serhedda

Ey **Heyderîyê** dilkebîb perwane’ê şem’a hebîb  
Xemrê binoş hilgir şelîb ger sadiqî ya **Ehmeda**

## 5.

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun

Remel - · - - - / - · - - - / - · - - - / - · - - -

1 Menbe‘a husn û cemalê canfîda me canfîda  
Esmerê şêrînfesalê canfîda me canfîda

‘Eksê husna dêmê enwer zîsena kir necmê exter  
Qameta manendê ‘er‘er canfîda me canfîda

Qameta manendê xûşîd rast û çep keywan û nahîd  
Dane’ê ‘enber ‘etarîd canfîda me canfîda

Xalê ‘enber dane dane zuhreweş fîrêj vedane  
Dêmsureyya lê ‘eyan e canfîda me canfîda

---

8b xweş] xoş NMDH.

4a zuhreweş] zuhrereş NMDH, zehrereş NMMÇ.

5 Dêmsureyya cismê nûr e qedd û qamet wirdê cûr e  
Qafê ta qafê surûr e canfîda me canfîda

Qafê ta qafê nişat e şox û şeng e lebnebat e  
Dilberek şêrînsifet e canfîda me canfîda

Nûrê zat e gul' îzar e zulfê mişkên çavxumar e  
Weşfê husnê bêşumar e canfîda me canfîda

Şahê husn û wafir îkram rind û mehbûb û dilaram  
Şehdê guftar û gulendam canfîda me canfîda

Wird û alal misk û 'enber sinbil û reyhan û mawer  
Tên tewafa xakê ber der canfîda me canfîda

#### r. 8

10 Tên tewafa asîtanê îns û emlak cawîdanê  
Hor û gilmanê cînanê canfîda me canfîda

Xusrewê **Ehmed** benî yî bejn û bala enwerî yî  
Nar û nûrê **Heyderî** yî canfîda me canfîda

#### 6.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - - -

1 Ger tu şem' î bes nîhan be eşkê xûn perwane va

Wer tu 'Îsa yî 'eyan be faniyê bêcane va

Serteser nûr û şemal î mehşifet ebr û hîlal î

Saqiyê xemra helal î teşne'ê wêrane va

Saqiyê xemra tehûr î merhema êşa şudûr î

Ger tu nazikwirdê cûr î bilbilê mestane va

---

7a 'îzar] 'îzar NMDH.

10a Tên tewafa asîtanê] dî tewafa asinan NMMÇ.

10a cawîdanê] harîdanê NMDH, NMMÇ.



Şorgula bağê ne'îm î dêmdura 'enberşemîm î  
Ger tu Loqmanê Hekîm î mexzenê derdane va

5 Te bi wan xalê mu'enber zulfê mişkên xeddê eħmer  
Pir kirin mecnûn û ebter yek ji wan nalane va

Rewneqa rûwê zemîn î ħoriya xûrşîdcebîn î  
Nûrê der 'eynê yeqîn î 'aşiqê dîwane va

Afeta 'işqa te xan im bir ji min ruħ û rewanim  
Mişlê Ferhadê zeman im şohtiyê sukranê va

Mah û salan ez dinalim bêkes û pir qîl û qal im  
Hem ji ber ħubba te lal im dil ji min talane va

Ez ji ber ħubba te dêşim her evê cewrê dikêşim  
Qişseta 'işqê çî bêjim mestê sergerdane va

10 Tu li min hûş û ħeyat î şebr û aram û tebat î  
Ĥorîçesm î lebnebat î tûtîyê gemxane va

Tûtîyê şêrînzaban im **Eħmedê** şekkerdihan im  
Her seħer şahê cihan im **Ĥeyderî** mêrane va

## 7.

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun

Recez --- · -- / --- · -- / --- · -- / --- · --

### r. 9

1 Ĥafiz Xuda bit **Ĥeyderî** vê de' wê da rabî edeb  
Wek ejdeha'ê heftserî mêhtin li te cerg û kezeb

Mêhtin li te cerg û kebed bêmîrweta mekkar û bed

6a Rewneqa rûwê zemîn î ] rewşarê Sitî Zîn î NMMÇ.

10a Tu li min hûş û ħeyat î] tu li min her şev heyat î NMMÇ.

1b mêhtin li te cerg û kezeb] mêhtin li te ħubb NMMÇ, nehate xwendin NM.

Hîştîm di bin hûkmê esed ahan dikêşim roj û şeb

Bêmirwet û mekkar e ew ‘eyyar e û geddar e ew  
Pir afet û serşar e ew daîm dibarit jê geđeb

Nuħûseya teb‘ etxirab meğrûr kirin pir şêx û şebab  
Bûn lahiqê cewr û ‘îtab nalîn ji ber Şam û Heleb

- 5 Pir sahirî xistin ji rê kuştin bi derba xencerê  
Şohtin di narê mecmerê na’ête fikrê heqçeleb

Îro di destan ram î tu mexmûr û mestê cam î tu  
Rengfaniyê şed‘ am î tu ruħê te nîn e ey ‘ eceb

Vê zalimê girtî esîr ger ‘ aqil î rabî bi şîr  
Perwerdîgar e destegîr settar e hem feyyaz e Reb

Rabî bi şîmşîr û tifeng ya ne‘ re û lêdan û ceng  
Her lehze ‘ê şed qêr û deng bêhuccet û beħş û sebeb

Herdem bidî şed muħnetê şed îş û renc û zeħmetê  
Ha jê hebe bêmurwetê rakir li te Tirk û ‘ Ereb

- 10 Rabûn li te Rom û Şemer<sup>103</sup> hatin bi mizraq û teber  
Meqşed bimînî derbider bêgazî yû de‘ w û teleb

Bêgazî yû han û meded pabeste ‘ê qeyd û kemed  
Dilqetre ‘ê xûn lê çeked tenxeste ‘ê hemwar e teb

---

5b heqçeleb] çevçeleb NMMÇ.

11b Dilqetre ‘ê xûn lê çeked tenxeste ‘ê hemwar e teb] Dilqetre ‘ê xun lê ceger tenxeste ‘ê hewar e teb NMMÇ.

<sup>103</sup> Şemer an jî Şammar: Eşîreke mezin a Ereban e. Li bakûrê Sûriyayê rûdinin û wekî eşîreke gelek dijar û şervan tê naskirin. Li ser vê axa ku me wekî niştocihê Eşîra Şemer da naskirin herwiha, eşîreke gewre ya Kurdan jî cih digre. Ev eşîr jî, Eşîra Milan e. Ji ber xusûsiyeta xwe ya şerkerî ve Eşîra Şemer bi Eşîra Milan re herwext di nava nakokî û şeran de bûye. Di pevçûn û şerên li ser mera û çêregehan de gelek caran heywan û ajalên hev talan kirine. Bnr. Eyüp Kıran, *Kürt Milan Aşîret Konfederasyonu*, Elma Yayınları, Stenbol, 2003, r. 107-120.

Şehhar û mekkara şeci' ev me' dena fi' lê şeni'  
Şexşê di emrê wî mûtfi' wafir ziyan e şedceleb

Ĝafil mebe jê pîsa le 'îm ger talibê li xuld û ne' îm  
Cuz emr û fermana hekîm ya **Ehmeda mek`şayi leb**<sup>104</sup>

## 8.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa' ilun

Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . -

### r. 10

- 1 ' Işq û muhbet keyf û lezzet der peyaleynê şerab  
Meyl û ulfet weşl û nî' met der zucaceynê şerab

Qutb û ewtad şeyxê îrşad Qeys û Ferhad hafizî  
Meqşedê dil bûne haşil wan bi hazeynê şerab

Lew du zergeş camê dilgeş şerbeta xweş dil divêt  
Zexminak e da şifake ' en hilakeynî şerab<sup>105</sup>

Zexmidar im bêqerar im pir neçar im el-eman  
Eflêtûn im rehnumûn im qurretu`l- 'eynê<sup>106</sup> şerab

- 5 Kazekaz im der niyaz im her dixwazim ya Ğeyaş  
Qeddê ' er' er xeddê eħmer hem di keffeynê şerab

*Fate ' umrî da' e fikrî şa' e şî' rî der teleb*

*Mînke murwet cûd û ħurmet heb lî ke`seyne şerab*<sup>107</sup>

Her şehergah ey şehînşah ah û şed ah tîn ji min  
*Kun tereħħum ba tebessum hat bîla ğeynê şerab*<sup>108</sup>

---

6b bîla ğeynê şerab] bîla 'eynê şerab NMDH.

<sup>104</sup> Devê xwe veneke.

<sup>105</sup> Ji helakên şerabê.

<sup>106</sup> Ronahiya çav.

<sup>107</sup> Ji derveyî daxwaza min 'emrê min bi dawî bû, fikrên min telef bûn, helbestên min di nav xelqê de belamelayî bûn. Camêrî û ħurmet ji te ye, emr bike du qedehên şerabê.

Ger ji le<sup>c</sup> lan abê heywan qelbê buryan hey neket  
Ey şeha *men yesqînî* <sup>c</sup>en<sup>109</sup> <sup>c</sup>eyn û lameynê şerab

Dil bi derd im rengê zerd im yademerde im bêkes im  
Çûn gerîb im dil kebîb im nûrê çeşmeynê şerab

10 Dilkebîb im hal<sup>c</sup> ecîb im bêtebîb im saqiya  
Ey siracim wa <sup>c</sup>îlac im zerf û cameynê şerab

Mişlê bilbil meylê şorgul meqşeda dil bade ye  
*Mîzened*<sup>110</sup> her lehze <sup>'</sup>ê şed ne<sup>c</sup> re <sup>'</sup>ê *eynê şerab*<sup>111</sup>

Ruh dema dî pir hebandî dil revandî bir ji min  
Lew diyar in bêşumar in tîr ji qewseynê şerab

Ru <sup>'</sup>yeta gul merhema dil semmê qatil firqet e  
Zulfê tarî şondê barî kamê kewneynê şerab

Zulfê deycûr dane <sup>'</sup>ê hûr firqeta dûr kuştim ez  
Narê firqet nûrê weşlet *qurb û bu<sup>c</sup> deynê şerab*<sup>112</sup>

### r. 11

15 Ger te metleb cah û menşeb bûs û gebgeb dil birin  
Secde bîne xoş hilîne mişlê şeyx <sup>c</sup>eynê şerab

Ger gewwaş î durşinas î yar dinasî **Heyderî**  
**Ehmedê** <sup>c</sup>aş durr û elmas van di beħreynê şerab

---

<sup>108</sup> Digel tebessumê rehmê bike, bêyî şerabê hat.

<sup>109</sup> Kê/î şerabê bi min bide vexwarin.

11a Mişlê bilbil meylê şorgul] mişlê şorgul meylê bilbil NMMÇ.

14a Zulfê deycûr] narê deycûr NMMÇ.

<sup>110</sup> Lê dixe

<sup>111</sup> Şerab li ku ye?

<sup>112</sup> Nêzîk û dûriyên şerabê

9.

mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1 Mislê te **Ehmed Heyderî** ka şehdê peygamê gerîb

Neqşê seraser cewherî geş kir dilê ‘amê gerîb

Neqşê mucewher serteser yaqût û lû’lû’ fetl û ger

I‘ rab û cezmê zer li ser rakir ji i‘ damê gerîb

Le‘ l û cewahîr tê hene durrê newahir tê hene

Rengê şorgul pir tê hene behrê ji eqlamê gerîb

Baxê binefş û şorgulan miftahê di destê bilbilan

Jê çêdikin şed gulgulan Ekrad û e‘ camê gerîb

5 Bazar û beşê dilberan rindan û nazik esmeran

Mehbûb û kakul‘ enberan xweş bûn bi şemşamê gerîb

Dilber bi şî‘ rê ra nebit qanûn bi reqşê ra nebit

Nalên bi fecrê ra nebit ka şebr û aramê gerîb

Gerçî mudamê dilkul im nalende mişlê bilbil im

Û gem lê peyapey nazil im meqşed mey û camê gerîb

Ahîn û nalê ‘aşiqan fikr û xeyalê şadiqan

Meşhûr e halê sabiqan meţleb dilaramê gerîb

Madem tu talibwuslet î bişkên peyala lezzetê

Bi se‘ y û cehd û zehmetê nîn e yeqîn kamê gerîb

10 Bi weşlê dildarê helîm le‘ lê şekerbarê kerîm

Çibkim bi Firdews û Ne‘ îm hor û gulendamê gerîb

**r. 12**

Le‘ lê şeker bejna zirav şewq û şu‘ a‘ nûr û tav

Dil bir ji min hiş kir belav kuştim bi alamê gerîb

Ev derd û alamê li min nakin tu çare îns û cin  
‘Îsa û Loqmanê di min yek ‘eyn û du lamê gerîb

Îro tu êşan ezyed î yad û muhacir **Ehmed** î  
Xweşke bi sewta **Serhedî** şî‘ rê di hingamê gerîb

### 10.

mustef‘ ilun / fe‘ ûlun / mustef‘ ilun / fe‘ ûlun  
Munserîh --- / · --- / --- / · ---  
mef‘ ûlu / fa‘ ilatun / mef‘ ûlu / fa‘ ilatun  
Muzarî‘ --- / · --- / --- / · ---

- 1 Nûra te girtî yekser rûwê cîhan lebaleb  
Heft asîman beraber hor û cînan lebaleb

Cîsmê te nûra ‘elîm ey nûrê ‘enberşemîm  
Weşfê te ey muzeffer *seb‘ u`l-meşan\** lebaleb

Meddahê nûra zelal padişahê Zu`l-celal  
Emlak û cînn û beşer qelb û zeban lebaleb

Zatê te ey mufexxem ‘eynî şîfa`ê elem  
Hîlm î tu ey dilawer behrê ‘umman lebaleb

- 5 Mahê mubarek wucûdehsenê xelqê wedûd  
*Eynî`l-heyat*<sup>113</sup> û kewşer le‘ lê leban lebaleb

Mohra zemîn û eflak şahê serîrê lewlaq  
Pir bûn gulam û kemter sultân û xan lebaleb

---

12a çare] cara NMMÇ.

\* Heft a ku tê dúbarekirin, Qur’an: 15/87. Bo sûreta Fatîhayê ji tê gotin.

\*\* Çav horî, Qur’an: 44/54, 52/20, 56/22. (Di Qur’anê de heman babet bi çendîn şêwazan ve hatiye gotin: Horiyên çavmezin, horiyên çavxezal, hevjinên çavbedew...)

10a Şubh û mesa dinalim] buxûr û misk û nal im NMMÇ, nehate xwendin NM.

<sup>113</sup> Ava heyatê, ava kewserê

Însan û cin ji weşfan nakin beyan du herfan  
Mawerd û misk û ‘enber zulf û nîşan lebaleb

Nûr û sena’ê xûrşîd mah û suheyl û nahîd  
‘Eksên ji dêmenwer her asîman lebaleb

Meşreq û meğreb butûn cennat û *hûru`l-‘uyûn* \*\*  
‘Işqa du le‘lê şeker reqş û keman lebaleb

10 Şubh û mesa dinalim pir gem û pir xiyal im  
‘Işqê kirim mukedder dil ji geman lebaleb

### r. 13

Lîlahî hemdê bêhed ka şem‘ê zatê **Ehmed**  
Têne li **Heyderî** her tîrê ziyar lebaleb

### 11.

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1 Dil û cergê me bûn talan nizamim ez çi bûn esbab  
Bi derba firqetê bû yan di de‘wa muhbeta gîrdab  
Di gîrdabê meh û salan bi gerdan im wekî dolab  
Ji çeşmê min gelek caran dibarin qetre’ê xûnab  
Çi derman e gelî yaran çi şîret ya *ulu`l-elbab*<sup>114</sup>

Ji ser ta pê birîndar im bi derba hîcretê îro  
Cunûn û bêhiş û har im ji kerba firqetê îro  
De‘îf û jar û naçar im ji te‘ba gurbetê îro  
Seyyahê sîneşedpar im bi herba muhbetê îro  
Bi mişlê gestiyê mar im ji şewqa qameta purtab

Ji şewqa şemsê rengê ez şeb û rojê bi nalîn im  
Ji ‘eşqa şox û şengê ez seher manendê goyîn im

---

<sup>114</sup> Yê xwedî hiş û ‘eqil.

2b Cunûn û bêhiş û har im] cunûn û bêhiş û yar im NMMÇ.

Bi çengala çelengê ez di keffê baz û şahîn im  
Evî halê we rengê ez heta kengê biborînim  
Li min pir bû derengî ez gerîb im bêkes û eşhab

Werin da em xwe pêk bînin bihar e weqtê gulzaran  
Derê gulzarê bişkênin bibînin gulşenê yaran  
Hemî reyhan û nesrîn in teferrucgahê gemdaran  
Şerab û saqerê bînin dewakin dilbirîndaran  
Gulê nazik biçirpînin *serî en eyyûhe`l-ehbab*<sup>115</sup>

**r. 14**

- 5 Du narik şorgulê yengî cîhan yekser mu‘ etter kir  
Muselsel zulfê şebrengî qemer bînûr û kemter kir  
Xeyala qameta şengî dil û cergê me kerker kir  
Heyata ‘ aşiqê bengî fîda’ê gerdena zer kir  
Di nêv ‘ amê kirim dengî şebê yelda kirim bêxab

Li seţhê mah û xûrşîdan muselsel zulfê peywest in  
Suheyl û necm û nahîdan ji xûrşîdê ziya xwestin  
Tewaf û zezem û ‘ îdan ji le‘ lan ev qedir best in  
Şehê xaqan û Cîmşîdan ji şewqê em hemî mest in  
Ji qafê ta bi qafê man di nûra cubhetta mehtab

Ji nûra cubhetta beyda ‘ ecêb narek li min geş bû  
Ji nageh ez kirim şeyda derûnê min ji ber reş bû  
Çi afet bû li min peyda helandim ev çî ateş bû  
Ku saqî saqerek mey da seher dil pê muşewweş bû  
Riha bûm ez ji nêv qeyda bi ‘ *ewnê fatîhi`l-ebwab*<sup>116</sup>

Riha bûm ez ji zîndanê li deştê me wekî mecnûn

---

<sup>115</sup> Zû bikin! Gelî dostan.

5a Du narik] du nazik NMDH.

5c dil û cergê me kerker kir] dil û cergê me kir kerker NMMÇ.

6b Suheyl û necm û nahîdan] suheyl û necm û nahîd in NMMÇ.

7e nêv] nav NMMÇ.

8e Muşewweş bûn li meydanê] meşa şerîn li meydanê NMMÇ.

<sup>116</sup> Bi alikariya ew kesê ku deriyê zehmetiyan vedike ve.



Dikêşim ah û efğanê bi cewlan im wekî gerdûn  
Ji firqê yan ji hicranê gelo em rengê eşfer bûn  
Xebîrê nuktedan kanê beyanke macera mehzûn  
Muşewweş bûn li meydanê ji qêrê min çi şeyx û şab

Neçar mame di vê rê da nizanîm re 'y û tedbîran  
Şeb û rojê di hebsê da bi serxoşî didim qêran  
Muqîm im ez di zecrê da di hukmê pence 'ê şêran  
Di weqt û halê şugrê da evê derdê kirim wêran  
Mirada min di xelwê da ji le' lan şerbeta eşhab

**r. 15**

- 10 Mirada min li meyxanê ji destê saqiyê şêrîn  
Meya şafî di fincanê mufferreh kir dilê gemgîn  
Bibînim ez li dîwanê şu' a' a gebgeba sîmîn  
Bibim bendê derêzanê ji ' işq û muhbeta narîn  
Hero carek bi punhanî vexûne koke 'ê bewwab

Ji le' leynê şekerrîzan zulala kewşerî têtin  
Dilaram û dilawêzan şeraba enwerî rêhtin  
Bi kamê dil seherxîzan bi qelbê muşterî dîtin  
Xedengê fitneengîzan li canê **Heyderî** têtin  
Bihar borî ji payîzan ela ya **Ehmeda** deryab

**12.\***

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . . -

- 1 Ger muqîm dilber perestî qeşrê dil me' mûr dibit  
Şûşeya zahir direstî baţînî pir nûr dibit

Baţînê dil bête ramî radibit ' eynî zulamî  
Mest û peyweste gulam î kakulê deycûr dibit

---

2b Mest û peyweste gulam î] mest û pey? û sergulam î NMDH.

\* Ev helbest, di NM' yê de cîh nagre.

Dil eger da'îm gulam bit nale û zarî mudam bit  
Bade û saqî meram bit cam di dest ferfûr dibit

Ṭalibê ḥusn û cemalê lê dide bêhna wişalê  
Meyl dide xemra peyalê bêhiş û mexmûr dibit

- 5 Bêhiş û da'îm di şîn im mişlê Ferhadê Şêrîn im  
Wird û alalan dibînim dil li min hûrhûr dibit

Can li dil canan dibîne ḥor û gulman û zerîn e  
Zehr û sîma 'enberîn e çeşm û ebrû ḥor dibit

Meclîsa nûra şemed lê ḥorê tenzîla Eḥmed lê  
Tîr û şimşîr û kemed lê hûyê hay mewfûr dibit

**r. 16**

Dil tijî tîr û cerîd im her divê ḥerba şedîd im  
Ger telefbim ez şehîd im ew bixwe megfûr dibit

Ew bixwe xûrşîdsena ye serteser nûra Xuda ye  
Pertew û şewqek vedaye her teref menşûr dibit

- 10 Xusrewê awir Ḥusam e serwerê Rustem gulam e  
Mehşîfet lû'lû'peyam e cabirê meksûr dibit

Mehşîfet nûr lê belav e gulşena şoşin di nav e  
Meylê bilbil yek silav e lew li nik mezkûr dibit

Gulşenê ḥacib li ber bî şorgula berqe' li ser bî  
Bilbilê zîr û zeber bî 'indelîb 'eşfûr dibit

Dilberê ḡayet huner kir rim di endamê me werkir  
**Eḥmedî** dil lê bi ker kir **Ḥeyderî** rencûr dibit

---

7b Tîr û şimşîr û kemed lê hûyê hay] tîr û şimşîr û kemed lê hûdê hay NMDH.  
11a nav] dav NMDH.

### 13.

fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . . -

- 1 **H̄eyderî** îro bi derba h̄icretê ḡemgîn e zat  
Mest û sergerdanê herba esmerek şêrîn e zat

Esmerek şêrînşifat e dilberek nûrîn e qed  
Serteser şaf û zelal e rehberek bêkîn e zat

Serteser nûr û şu<sup>ˆ</sup>a<sup>ˆ</sup> e ziyneta erd û sema  
Rewneqa bagê biharê sorgul û nesrîn e zat

Sorgulê nazik ji dêmê xweş mu<sup>ˆ</sup>etter kir cîhan  
Nîn e destûra tewafê bilbilan ahîn e zat

- 5 Bilbilê ḡemgîn ji h̄icrê ger muşerref bit bi gul  
Dê ji nû taze ciwan bit <sup>ˆ</sup>aşiqê dîrîn e zat

#### r. 17

Şerbeta le<sup>ˆ</sup>lê şekerrîz nûrê qendîla *illa*<sup>117</sup>  
Şohtî perwane di awaz çerxê gerdan dîn e zat

Me<sup>ˆ</sup>dena husn û cemalê hêj di ber Qalû Belê  
Esmerê tûr û şehîşahê teber zerrîn e zat

Hêj di ber roja elest şahê fexende û bûd  
Dî di mîr<sup>ˆ</sup>ata heyata hê du ten sîmîn e zat

Zulf û cubhet bûn ziya û zulmeta roj û şevan

---

2a Esmerek şêrînşifat e] esmerek şêrîn e şifat NMMÇ.

<sup>117</sup> Kelîmeya Tewhîdê (La îlahe îlla`l-lah) ji du hevokan pêk tê. “La îlahe”, nefy; “îlla`l-lah” jî îspat e. Tewhîda rastîn, bi gotina “La îlahe îlla`l-lah” ve mumkin e. Di tesewwufê de peyrev, beriya ku nebêje “La” nagihêje “îlla” yê. Anku, înkâr neke nagihêje îqarê. Bnr. Bilgin, r. 275.

6b Şohtî perwane di awaz çerxê gerdan dîn e zat] ger ji mî<sup>ˆ</sup>rac bi şev çû çerxê gerdan dîne zat NMMÇ.

7a hêj di ber Qalû Belê] hêj di ber Qalû Belayê NMMÇ.

7b Esmerê] nehate xwendin NM.

8b hê du ten] hê dibin NMDH, NMMÇ.

.....çêbû sena lêkin şevan tarî ne zât\*

10 Şosin û reyhan li mêrgan girtine reqş û sema  
Badenoş ‘ezîmcivat in şa‘îran qêrîn e zât

Cahilê nadan dibêje **Heyderî** xemrê dinoş  
Ew nizanin macerayê cahilan naşîn e zât

Zahidê gafil çî zanit rah û resmê ‘aşiqan  
Sofiyê cahil eger loman bikit xamîn e zât

Min bi xef pirsî ji ‘arif gotî ya **Ehmed** binoş  
Saqiya îhsanke yek saşer sazgîn e zât

#### 14.

mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun

Hezec · - - - / · - - - / · - -

1 Eya saqî werîn îro peyalê  
Şukur min dî di tuğra’ê bişaret  
Şehînsah im bi umîda wişalê  
Ji le‘leynê şekerxa’ê bişaret

Şehînsah û cîhangîr im bi kamê  
Di hingamê seher min dî di namê  
Xetek zîba ji kafûra peyamê  
Verê kir mahîsîma’ê bişaret

#### r. 18

Di bezma bilbilan îro neşat e  
Li bagê şorgulan zewq û sumat e  
Ribab û ‘ûd û qanûn û civat e  
Çî şahî bû li dunya’ê bişaret

---

\* Peyva despêkê ya risteyê nehate xwendin.  
3a bezma] bejna NMMÇ.  
3b sumat] suman NMMÇ.

Çi şahî bû li mêrg û murguzarê  
Hezar û 'indelîb hatin hewarê  
Şeda'ê bilbilan çû 'erşê barê  
Ji qêrînê def û na'ê bişaret

- 5 Me î' lan kir bi mujdê reqş û tenbûr  
Şeraba erguwanê camê ferfûr  
Bi xortî min exîz kir textê feğfûr  
Suleyman im bi ala'ê bişaret

Suleyman im bi qanûn û serîr im  
Di semt û kîşwerê Çînê emîr im  
Di 'işqê da bi menşûrê mudîr im  
Ji destê peyk û lala'ê bişaret

Ji destê qaşidê durra nîhanî  
Giha min ev wezîfa cawîdanî  
Muşewweş bû dilê Mecnûnê şanî  
Ji 'işqa dî ji Leyla'ê bişaret

Ji 'işqa bejn û bala canfeza'ê  
Wekî perwane'ê mest im di ta'ê  
Bi bêhuşî diçim şewqa çira'ê  
Cîgersojim bi gewga'ê bişaret

Bi dilsojî dikim fikr û miçalê  
Dixwazim ez tecellaya cemalê  
Di xelwê da temennaya wişalê  
Fîdakim rûh li ber pa'ê bişaret

**r. 19**

- 10 Muţala zulf û xalan ez helandim  
Bi yexsîrî li dunya'ê gerandim

---

5b camê ferfûr] mame ferfûr NMMÇ.

8a canfeza'ê] canfîda'ê NMDH, canfîrarê NMMÇ.

8c çira'ê] sema'ê NMMÇ.

Şeyyah û salikê rahê murad im  
Feqîr û menzerê ma'ê bişaret

Ji etrafan dibarin tîr bilaşed  
Bi qeşda gesh û talanê ji **Ehmed**  
Şuluşçi ne li mabeynê şekerxend  
Heyata **Heyderî** ba'ê bişaret

### 15.

mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

- 1 Îro ji destê muhbetê dîsa li min nîn e tebat  
Yexsîr kirim mehcibhetê pabeste'ê *xeyre`l-heyat*<sup>118</sup>

Yexsîr kirim dêmenwerî nûrqameta ez muşterî  
Mûyek ji seşhê xawerî nadim bi 'îd û 'erefat

Bi bejn û bala dilberan bezm û civata begleran  
Çibkim bi qeşr û penceran hór û cînanê 'aliyat

Dêşorgula Bagê Îrem pir kir li min derd û elem  
Şubh û mesa qêran didem gêj bûn ji ber sîtteyn cîhat

- 5 Gêj bûn ji qêrînê di min teyr û mela'îk îns û cin  
Kul kir cîger dil bir ji min rengesmerê şêrînsîfat

Dil bû di 'işqê da nehîb serxoş kirim husna hebîb  
Geş kir li min narek 'ecîb xistim ji nuşq û îltîfat

Na'êt ji min nuşq û kelam dûr bûn ji min kam û meram  
Şevtariyan xew bû heram zehmetkeş im nîne necat

---

1b pabeste'ê xeyre`l-heyat] pabestî mam di nêv heyat NMDH.

<sup>118</sup>Bi xêrtirîna/ê heyatê.

Zehmetkeş im nîne mefer ‘ eşqê li min dil bêxeber  
Nageh kirim zîr û zeber weryan ji min çeng û qenat\*

**r. 20**

Weşyan per û çengê di min efğan û ney dengê di min  
Têtin heta kengê ji min ahan bikêşim şed luğat

10 Ah û fiğan û nale nal têtin ji firqa zor riğal  
Jar û de‘ îf im wek hîlal ‘ işqê li min kir ev xelat

Ya **Heyderî** ger şade î wer da biçin meyxane’ê  
Têkil binoşin bade’ê **Ehmed** *bîla mey* ‘umrî fat<sup>119</sup>

### 16.

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . -

1 **Heyderî** ey mahîsîma mest û sukranê te bit  
‘ Aşiqê dil bû du nîma canfîda canê te bit

‘ Aşiqê şadiq di nîranê firaqê bit hîlak  
Her bi hûbba te gerîb û qelb û buryanê te bit

Qelbê mehzûn tîr ji qewsê te bibarin lê muqîm  
Mah û sal dîwane’ê derbê durexşanê te bit

‘ Er‘ er û serwa gulamî wedd û reftarê te bin  
Bilbilê şorgul hebên yegma û talanê te bit

5 Dil eger bête ‘ ezabê şubh û şaman şed celeb  
Bêdilê sergeşte û ‘ ehde dê fermanê te bit

---

8b Nageh] nake’ NMDH.

8b weryan] weşyan NMDH.

11a ger şade î] şadiq î NMDH.

\* Ev malik, di NMMÇyê de tune ye.

<sup>119</sup> Bêyî meyê ‘ emrê min derbas bû, çû.

5a bête] bîne NMMÇ.

Muħbeta îsmê mubarek bête her qelb û zeban  
Cismê nûr mehfûz bitin der ħifzê Yezdanê te bit

Ser ta ser kewn û mekan çêbit di emrê te muĥî<sup>ç</sup>  
Qeyşerê Romî digel Xaqanî derbanê te bit

ç Arizê xûşîdsena bû ateşî Mûsa li Tûr  
Cumle zerratê cîhan yekser duç axwanê te bit

Berqeçê rake bi mînnet hey bitin qelbê remîm  
Kuştiyê bêruhê heta kengê di zindanê te bit

**r. 21**

10 Carekî perdê hilîne da tecella bit li min  
Dil hemîşe mest û mahê berqê keywanê te bit

Şoħbeta leç lê şekerrîz meclîsa nûra zelal  
Ger muşerref kî bi van **Eħmed** kerem şanê te bit

### 17.

façilatun / façilatun / façilatun / façilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

1 Min li dil mizraq û tîr îro dibarin ya Ğeyas  
Ez di damê bûm esîr şeyyad hezar in ya Ğeyas  
Baz û şahîne di mêr cergê me xwarin ya Ğeyas  
Şubħ û şaman bang û qêr min bêşumar in ya Ğeyas  
Kuştiyê bêruh li meydan im *egîşnî* ya Ğeyas<sup>120</sup>

Min nema îsmê heyatê faniyê sihsale me  
Nam û nîşanê tebatê qeç nema dîwane me  
Saçeta badê şeba tê pir ah û nale me

---

<sup>9b</sup> Kuştiyê bêruhê heta kengê di zindanê te bit] bêruhê û kuştiyê cesedê kengê di zindanê te bit NMMÇ.  
<sup>120</sup> Were alikariya min, ey hewar!

\* Ev bend, di NMMÇyê de tune ye.



Çi dema reqş û sema tê serxweş û wêrane me  
Canfida 'ê şehdê xendan im eğişnî ya Ğeyas

Leşkerê endamşêrîn î girte bağê bêdilan  
Geh bi qeşda serfirînê tête reffê bilbilan  
Geh bi çengala evînê tête cenga dilkulan  
Geh li meydana qêrînê çêdiket şed gulgulan  
Gestiyê reşmarê rindan im eğişnî ya Ğeyas

**r. 22**

Ef' iyan cergê me mêhtin hêj serê rengesmerê  
Gaz û ateş lê verêhtin da mehû ket cegerê  
Ah û efgan ji me têtin çi ' Ezabê Seqerê  
Bêsilav şahê divêtin ez bikêşim kederê  
Dil bi derd im ling di qeydan im eğişnî ya Ğeyas\*

- 5 Dilberê derbek li dil da ez di cih da şewwişîm  
Nagîhan herbek li min da ez di xûnê neqqişîm  
Hesret û kerbek bi min da serteser pê herrişîm  
Ez ji fikrê qedbilinda wek korê birişîm  
Çeşmê gîryan ruh di zindan im eğişnî ya Ğeyas

Sîne 'ê min ker bi ker kir tîgê gerdensikenan  
Hiş li min zîr û zeber kir şahê şêrînsuxenan  
Hüb li min zehr û zerer kir mahê sîmînzûqenan  
Can li min rencûr û zer kir xusrewê neyşekeran  
Beste 'ê qeyd û kemendan im eğişnî ya Ğeyas

Bilbilan nalîn û qêr in ' aşiq û dîwane ne  
Gul di gulşen da dibînin xar li dorê xilqe ne  
Qumriyan gulzar di bîr in mişlê min dil yeğme ne  
Hemserê min xişt û tîr in ev çi beş û made ne

---

2d serxweş û wêrane me] serxweşê sukrane me NMMÇ.

3d çêdiket] çêdiket NM, NMDH.

3e gestiyê] kuştîyê NMDH, NMMÇ.

6a tîgê] nivê NMDH, NMMÇ.

Pir bi vê halê nemîdan im eğişnî ya Ğeyas

Dilber im eşhed û billah qeddê nûr lebşeker e  
Talibê meqlûbê Ellah dilberê rengkeder e

**r. 23**

Qaşidê meqşûdê Billah bi xiyalê dilber e  
*Qed tewekkeltu 'ela`l-lahi*<sup>121</sup> min di vê rê sefer e  
Eb' edê hindî be' îdan im eğişnî ya Ğeyas\*

Şa' etek weşla te dilber bi Xuda'ê Layezel  
Kafe'ê mulkê Sîkender pê didim bêqîl û qal  
Te li min dil bêser û ber kir bi wan qewsê hîlal  
Wirdê min şubh û mesa her xemr û fîncan û peyal  
Her di vê renc û belê da nim eğişnî ya Ğeyas

10 Te bi wê xişt û xedengê can li min bêmare kir  
Ber ji şindoqa tifingê dil li min şedpare kir  
Te bi wî derba pilingê rencê borî taze kir  
Ah ji destê şox û şengê **Ĥeyderî** dîwane kir  
Bilbilê 'aşiq li wîdan im eğişnî ya Ğeyas

**Ĥeyderî** îro Ğerîb e padîşahê sermedî  
Dil di 'işqê da nehîb e şadîman key **EĤmedî**  
Ser di bazarê 'ecîb e iş û rencê kes nedî  
Xakê ber payê hebîb e ruĤfidê wî emcedî  
Teşne'ê cahê zenexdan im eğişnî ya Ğeyas

---

8c dilber e] li ber e NM.

<sup>121</sup> Min tewekkulê Xwedê kiriye, min baweriya xwe bi Xwedê aniye. Qur'an: 11/56.

\* Ev bend, di NMMÇyê de, nîn e.

11e cahê zenexdan im] cahê rencûdan im NMDH.

18.

mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun

Recez --- / --- / --- / ---

- 1 Îro bi derba hîcretê dil tarûmar im el-Ġiyas  
Şohtim birûska firqetê perwerdigar im el-Ġiyas

Vê hîcretê ez zer kirim tîgê firaqê ker kirim  
‘Işqê tijî xencer kirim derkarê zar im el-Ġiyas

**r. 24**

Daîm ji ‘işqê dilkul im perwane’ê şem‘ a gul im  
Her sa‘etek şed gulgul im amirzîkar im el-Ġiyas

Perwane’ê şem‘ a geş im dîwane’ê çeşmê reş im  
Şam û seher zehmetkeş im taqetnedar im el-Ġiyas

- 5 Taqet ji min bir qametê dil bir bi şewka muhbetê  
Bêdil di erdê gurbetê hîştim nikarim el-Ġiyas

Bêdil kirim kakulşeban rindan û sîmîngebgeban  
Rencûrê nîşankewkeban ez bêqîrar im el-Ġiyas

Ser ta qedem rencûr im ez nalîn û kalîn kor im ez  
Sergeşte’ê rêdûr im ez bêdost û yar im el-Ġiyas

Bêdost û yar im ez neçar wek bilbilê feşla bihar  
Bêsekne’ê leyl û nehar nalîn hezar im el-Ġiyas

Bêsekne û bêrahet im da’îm di zecr û zehmet im  
Mêhrûm ji keyf û lezzet im ev renege kar im el-Ġiyas

2a tîgê] di vê NMMÇ.

5a dil bir bi şewka muhbetê] dil bi şewka muhbetê NMMÇ.

6a bêdil] bi dil NMMÇ.

10 Nageh li min rabû qiyam barîn li min tîr û husam  
Weşyan ji hev ‘erq û ‘izam ‘eşqê vexwarim el-Ġiyas\*

Barîn li min tîr û teber top û tifingê mawêzer  
Kuştim bîlasuc û zerer ey dostîlarim el-Ġiyas

Kuştim bi wan cerhê di kûr saqî ji bo navê gefûr  
Îhsanke yek cama tîhûr jar û neçar im el-Ġiyas

Meyxaneyaya mey lê nebit reqşa def û ney lê nebit  
Dê **Heyderî** qey lê hebit ez tewbedar im el-Ġiyas

### 19.\*\*

mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun  
Hezec · - - - - / · - - - - / · - - - - / · - - - -

1 Ji nû îro siyehçeşman gulendamanê gerden ‘ac  
Hezar çap lê reşandin wan li min sîne kirin amac  
**r. 25**

Li min tîr û tifing hatin şerabnîrê bi deng hatin  
Cerîdê rengbireng hatin fu’adê min kirin tarac

Kirim manendê yexsîran bi deng û ne‘re û qêran  
Bi derbê xişt û şimşîran şekerxendanê zerrîntac

Bi şimşîran şekerxa‘ê ji min dil bir bi gewga’ê  
Leţîf û çeşmê şehla’ê di ğurbet da vegirtim bac

5 Di semtê ğurbetê bend im li Tewrîz û Hemawend im  
Birûska hîcretê jendim bi qîmê hel kirim Hëllac

---

10a Nageh li min rabû qiyam] Nageh li min zar û meqam NMDH.

11b ey dostîlarim] ey dost û yar im NMDH.

12a Kuştim ewan cerhê di kûr] kuştim bi wan cerhê di kûr NMDH, kuştim îro bê tîrê kor NMMÇ.

\* Ev malik, di NMMÇyê de tune ye.

\*\* Ev xezel, di NMMÇyê de tune ye.

Bi qîmê dame zecrê da helandim ez di vê rê da  
Gerîq hîştîm di behrê da li min dijwarî bûn emwac

Li qetla min çi serbest in çi Fêris şahê serdest in  
Li rast û çep kemerbest in zirav kir ez kirim ne' lac\*

Li dêmê rast û çep xal in du nazik şorgulê al in  
Ji nûrê qedd û eşkal in li bejnê eflas û dîbac

Li bedrê yeldizê nûr in di Serra zulfê deycûr in  
Sena û şu' leya Tûr in sîraca ' amê kir wehhac

10 Siyehzulfan li meydanê vebest im birme zindanê  
Ji geyrê xemr û fincanê li vê derdê nehên 'îlac

Li meydanê kirim serxoş bi cohtê ebrûwanê reş  
Li xemr û badeya dilgeş bi dilsojî kirim muhtac

Bi dilsozî mehê rindan kirim medhûş û sergerdan  
Bi şimşîrê şehê merdan li min dil bû hezar ezwac

Birûska **Heyderî** da dil dinalit şubhetê bilbil  
Gerîq e **Ehmedê** bédil di behra qulzema mewwac

## 20.

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 26

1 'Eşqê vegirtim ez bi şîr ya ze`l-kerem kanê ferec  
Bestim di zindanê esîr min çav li rê hanê ferec

Mehpûs û bend im mah û sal rencûr û mehzûn û melal

---

\* Ev riste, ji *li rast û çep* şunde, di nusxeya muellîf de nehate xwendin.  
12b ezwac] emwac NMDH.  
2a Mehþûs] mehbûs NMMC.

Tenxeste û dil nalenal jar û perîşanê ferec

Nalîn peyapey tèn ji min ah û heyahey tèn ji min

Mişlê def û ney tèn ji min nîn e li meydanê ferec

Fikr û xiyalan best im ez kerb û mişalan gestim ez

Lew bêkes û bindest im ez bênam û nîşanê ferec

5 E' za li min bûn pare par ' işqê dil û cergê me xwar

Lebteşneyim ya Kirdîgar qitrek ji ' ummanê ferec

' Işqê kirim mest û nezan dîwane 'ê rûyê cîhan

Nageh li min bûne nîhan Îran û Tîranê ferec

Endam di nar im roj û şev tîr lê dibarin şef bi şef

E' za hemî weryan ji hev heyhat e dermanê ferec

Ba 'ê evînê karî bitin narê li ' aşiq har bitin

Dûr û diraz e sar bitin bêhukmê baranê ferec

Zehmetkeş im ekşer ziyan egleb ji derbê çaplîyan

Derman di le' lê tuşîyan der qeşr û eywanê ferec

10 Îro di hebsa gurbetê ez dê bikêşim zehmetê

Hetta bibînim furşetê rûnê li ser banê ferec

Canşohtiyê dil kerker î bêdil di destê ejder î

Şebrê bikêşe **Heyderî** bişkên derê banê ferec

---

4a gestim] kuştim NMMÇ.

9b Derman] derdan NMMÇ.

21.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

r. 27

- 1 Te li min qelb û ceger şohtin di hingamê şebağ  
Her li min tîr û teber têtin digel şîr û rimağ
- Bes ji wan qewsan li dil de tîr û sertîrê ji nar  
Te di vê narê biraştim nîn e îmdad û necağ
- Berqe'ê rake ji xûrşîdê tecellî bit li min  
Da durexşan û sena çêkin li dil cezlwişağ
- Sa'etek weşla te billah bû li min kerbek mezin  
Beske teṭwîla fîraqê *fate 'umrî ruḥî raḥ*<sup>122</sup>
- 5 Ah ji ber narê fîraqê dilkul û lebteşne yim  
*Fe 'esqînî ke 'sen bi ikramîk 'enî`l-xemrî`l-mubağ*<sup>123</sup>
- Ateşê 'eşqa te dijwar bû li min mişlê seqer  
Şubhê perwanê şem'a te li min şohtî cunağ
- Dûriya zâtê te çêkir qed li min manendê dal  
Têk li min zindan û hebs in beyt û eywan û şurağ
- Canê şêrînim fîda'ê xakê ber payê te bit  
Qalibê bêruḥ bibit pejmurde'ê kûh û beṭağ
- Min nevê ev zindeganê bête *ey nûru`l-'uyûn*<sup>124</sup>  
Ta bi kengê ateşî bit qelbê derwêşê şeyağ

---

1b şîr] şîr NMDH, NMMÇ.

<sup>122</sup> 'Emr û ruhê min, çû.

<sup>123</sup> Ji wê xemra mubah bo qenciya xwe qedehekê bide min.

<sup>124</sup> Ey nûra çavan.

10 Girtiyê hebsa gerîb im gurbetê derbeste kir  
*Îftehî`l-babe`eleyye mîttu hîcren ya Fetah<sup>125</sup>*

Nûrê çeşmê **Heyderî** piştî `ewnê **Ehmedî**  
Yûsifê Ye` qûb gulamê menbe`ê husn û melah

**22.**

mustef` ilun / mustef` ilun / mustef` ilun / mustef` ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

**r. 28**

1 `Enber li ser belgê gulan *nî`me`l-mubarek benz û riş<sup>126</sup>*  
Reyhan li dora filfilan min dî di gulzarê şehîh

Min dî li bedrê sunbilîn reyhan li dorê silsilîn  
Nîşan ji miskê kamilîn çibkim ji enfasê mesîh

Xalkewkebê zuhra cebîn nûr û senaya Tûrê Sîn  
Bû hucceta Mûsa yeqîn berqek ji ruxsarê şebîh

Nûra du `alem bûdi ram yumna mehê lu`lu` peyam  
Bû gulşen û berd û selam *naren`ela nûrun melîh<sup>127</sup>*

5 Ellah ji ber rakir hîcab geş bû li `amî affîtab  
Şewqê li min dil kir kebab kuştim bi guftarê feşîh

Kuştim bi şed ah û keser sohtim wekî narê seqer  
Tîran bi xef helkir ceger mişlê xedengê mîr bedîh

Mişlê Suheyli dî şemal qedşorgula bagê cemal  
`Eşqê ji mêj xistim ji hal îro kirim fîdya zebîh

<sup>125</sup> Ey Ew kesê ku deriyan vedike! Ji min re derî veke, ji dûrmayînê ez mirim.

<sup>126</sup> Çiqas bêhn û wecheke wê ye mubarek û xweş, heye.

<sup>127</sup> Agir li ser bû nûreke xweşik.

11b Yûsifê] Yûsufê NMDH.

2b çibkim] çêkim NMMÇ.

3a nûr û senaya Tûrê Sîn] nûra senaya Tûrê Sîn NMMÇ.

6b cîger] ceger NM.

7a zî şemal] dî şemal NM, NMMÇ.



Îro ji nû nûrqametê tîr dane qewsê muhbetê  
Hazar bi qeşda garetê ‘ilm û xeber da min şerîh

Qelbê me garetkir hebîb bêdil kirim jar û gerîb  
Hê jî ji min nabit reqîb merdûd û mel‘ ûnê qebîh

10 ‘Eşqê di Semtê Serhedê sohtî li pey firqet medê  
Şubh û mesa lew **Ehmedê** mecrûh li meydanê yeşîh

Tîran ji qewsê dilberê sertîr ji narên ekşerê  
Ser dane cergê **Heyderî** cerhan dizîn xûnab û qîh

### 23.

mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 29

1 Xûrşîdeniya **Heyderî** dêmxawer e ew şeng û şox  
Nûra dilê min muşterî qed‘er‘er e ew şeng û şox

Qametelif e dêmgul e xal‘enber e reşkakul e  
Şahê bi hukmê ‘adil e şed kîşwer e ew şeng û şox

Şahê di ber roja elest tîgê şehînsahê vebest  
‘Amê bi kamê purest xanserwer e ew şeng û şox

Mehcubhet e gebgeb ji zîv *abi`l-heyat*<sup>128</sup> in herdu lêv  
Şehd û nebat in her di nêv neyşeker e ew şeng û şox

5 Sîma û zehrê bêbedel şafî ji nûra *lem yezel*<sup>129</sup>  
Xweş kir bi min beyt û gezal xedeher e ew şeng û şox

---

9b hê jî] hêvî NMDH, NMMÇ.

<sup>128</sup> Ava heyatê

<sup>129</sup> Hunersazê rastîn; Xuda

Zulfê li dora cubhetê zewq û şemîm a cennetê  
‘Er‘ er ğulamê qametê gerdenzer e ew şeng û şox

Gerdenzer e kakulşeb e bedra mudewwer ğebğeb e  
Rûşems û nişankewkeb e bûy‘ enber e ew şeng û şox

Xal û xeţên bûy‘ enberîn reyhan û şorgul hemserîn  
Le‘ lê zûlalê kewşerîn rengesmer e ew şeng û şox

Şox û şêrîn e her deman rakir li min axirzeman  
‘Işqê biraştım el-eman xweşdilber e ew şeng û şox

10 Rindê ji nik nabit cuda ħubba dilê mîr û geda  
Lew serteser nûra Xuda‘ê Ekber e ew şeng û şox

Nûra Xuda‘ê Sermedî mahê beşer mişleş nedî  
Îman û dînê **Eĥmedî** lebkewşer e ew şeng û şox

#### 24.

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun  
Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · - -

#### r. 30

1 Zahirê hîcrê li min da ez kirim wêraneçax  
Baţînê ‘işqê li dil da lew dirêjim eşkê nax

Çeşmê min da ‘îm bi xûn in lê ji ber ‘işqa derûn in  
Dem bi dem nalînfeszûn in pîşe‘ê dil bû şurax

Dil li min bû pare pare bilbil im gul nadî yare  
Mîn nema şebr û qırar e lew ji min tèn ox û wax

Bilbilê medhûş û mest im bêdilê cama elest im

---

11a mişleş] mişleş NMMÇ.  
3b ox û wax] ax û wax NMDH.

Şohtiyê şorgulperest im sîne 'ê min bû du şax

- 5 Muħbetê sîne hedef kir dil bi şimşîran telef kir  
Min ji ber ah û esef kir pir ji min çêbûne xax

Min gelek ah û keser tên her seher tîr û teber tên  
Dil qelaştin xwê li ser tên qişseta min bû firax

Qişseta min pir dirêj e mes'ela 'işqê ji mêj e  
Lazim e şexşek bibêje hiş li ser min bû îrax

Lazim e pîrê mubarek bezm û dîwan û tidarek  
Mes'elê helke bi carek hûn bidêrin lê qulax

Ez gerîb im dil bi derd im 'aşiq û dîwanemerid im  
Lew hezîn im rengizerd im jar û xeste bêqonax

- 10 Ah û nalên bêşumar in roj bi roj zêde hezar in  
Tîr li cergê min dibarin mewzî'ê wan ma sûrax

Ateşê 'eşqê huner kir **Heyderî** sîne sîper kir  
**Ehmedî** nalîn ji ber kir cerg û dilxûn mane fax

## 25.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun

Remel - . - - / - . - - - / - . - - - / - . - - -

### r. 31

- 1 Narê 'işq û muħbetê şohtî li min qelb û kebed  
Îş û rencê ğurbetê kuştim nikarim *el-meded*<sup>130</sup>

Dilkulê tîr a hebîb im bêdewa û bêtebîb im

---

8a tédarek] tedarek NMDH.

8b bidêrin] bidin NMMÇ.

1a Narê 'işq û muħbetê şohtî li min] narê 'eşqa muħbetê şohtin li min NMMÇ.

<sup>130</sup> Ey hawar!

‘Aşiq im wellah gerîb im lew dinalim bê‘eded

‘Aşiqê dêmê bi xal im bilbilê wirdê di al im

Ṭalibê cama wişal im mest û mexmûr im bi derd

Bêhiş û mexmûr û dîn im hem ji hicrê dilbirîn im

Dê ji ku Loqman vejînim xweşke van cerhê di bed

5 Dê ji ku ‘Îsa peyakim dest û pa bûs û ricakim

Derdê mexfî lê ‘eyan kim pê dewakim derdimend

Derd û alamê evînê hate ser wec‘a birînê

Ateşê ‘işqa şêrînê ez kirim dîwanemer

Mehşifet şêringulamê find û fanûsa zulamê

Piştî ez girtim bi damê dame ber pencê esed

Dame ber cohtê xedengan xişt û çokan û tîfing

Dê bisojit min ji çengan şu‘leya nûra şemed

Me‘dena nûr û şemalê menbe‘a husn û cemalê

Ez didem fikr û xiyalê bêniyaz meqbûl kerd

10 Çeşm û ebr û zulf û xal in qedd û qamet xeddê al in

Têk ji nûra Zu`l-Celal in bêmîşal şêrîn e qed

Serxoşê çeşmê xumar im **Ehmedê** diltarêmar im

Fırqeta ehbab û yar im **Heyderî** gemgîn *koned*<sup>131</sup>

---

9a Me‘dena nûr û şemalê] me‘dena nûra şemalê NMMÇ.

<sup>131</sup> Xemgîn dike

26.

mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

r. 32

- 1 Şam û seher gîryan im her ez nabim ferhan el-meded  
Eşkê gewez têtin bilez Mewla 'ê Yezdan el-meded

Hicra gedar girtim di nar leyl û nehar sohtim sitar  
'Işqê bi xem dil kir 'edem heyîyê keremkan el-meded

Dil bû du ker pir bûn keder mame bi der nîn e meqer  
Durdane û xweşçare û zuxrîme û can el-meded

Gerçî bitûn kul bû derûn *dem' i`l-' uyûn*<sup>132</sup> têtin çoxûn  
Her meţlebê zulfê şebê cem' a nebiyan el-meded

- 5 Biskê 'ebîr qedda herîr şahê şehîr kuştim bi şîr  
Yexsîr im ez min nîn e kes Şiddîq û 'Uşman el-meded

'Işqê 'ecêb dil kir kebîb jar û gerîb mam bêtebîb  
Dad û mefer zatê 'Umer ey şahê merdan el-meded

Hicrê bi gef can kir telef 'işqê bi xef xistim ji hev  
Nalîn ji ma çûne sema al û şehaban el-meded

Vê gurbetê bêrahetê sohtim qetê her sa' etê  
Sed wayêwey tên mişlê ney ya Gewşê Geylan el-meded

Xalkewkeb î sîmgebgeb î min meţlebî roj û şeb î  
Firyadê min Weysî`l-Qeren meşhûrê Şen'an el-meded

- 10 Uftadeyim bêçareyim pejmurdeyim pir naleyim

---

3a bi] be NMDH, NMMÇ.

<sup>132</sup> Xûna çavan.

Wek bilbilê dêmê gul î hindî weliyan el-meded

Bedra tamam şirînkêlam lebrîz e cam qeşd û meram

‘ Ehda Elest ev rene best dil çû ji destan el-meded

Qêrê di min însan û cin agah kirin bi hâlê min

Berqê ji mîm dil kir du nîm Şulţan Selîm Xan el-meded

Jar û perîşan **Heyderî** renebtê î dil kerker î

Der sifrisin loman mekin ey cinn û însan el-meded

## 27.

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 33

1 Ellah bi narê firqetê sohtî li min cerg û fu’ad

Axir bi derba muhbetê kuştim gerîb û bêmurad

Axir li min dil bû kebîb nesrîn û alalê hebîb

Mehrûm ji kamê bêneşîb girtim di zindanê nîhad

Nesrîn û nûrên filfilan reyhan û bêhna şorgulan

‘ Amê li dû kamê dilan kuştin bi topê Xan Reşad

Top û tifingê ber ji nar mecruhê kirim ah û hewar

Girtim bi xef cergê me xwar bazê li ser destê şeyad

5 Bazê meha xûrşîdan î girtim bi pencê ahenî\*

Ser ta qedem kulkir tenî mehzûnê kirim *beyne`l-`ibad*<sup>133</sup>

---

12a bi hâlê min] bi hâlê li min NE, NMDH.

1a fu’ad] cesed NMMÇ.

4a ber ji nar] pirjimar NMMÇ.

6a begleran] beglera NMDH, NMMÇ.

\* Ev Malik, di NMMÇyê de tune ye.

<sup>133</sup> Mabeynê bendeyan.

Girtim hebîbê eşkera bestim di bezma beglera  
Kuştim bi derbê xencera hîştim *îla yewmi`l-me` ad*<sup>134</sup>

Hîştim di benda firqetê sohtim bi narê ğurbetê  
Îro li min kin şîretê aĝa û merdanê cewad

Aĝa û xoce nuktedan eqtab û ewtadê cîhan  
Nakin berê derdê nîhan meksûr bitin qelbê neşad

Dil bû ji `işqê pirkeder şorgul ji perdê hate der  
Hûr dane`ê `enber li ser pîroz bitin ferxendebad

10 Pîroz bitin ew xetî û xal hafîz Xuda bit mah û sal  
Tîran ji wan qewsê hîlal hûrhûr kirim mişlê rimad

Tîr dane qewsan şef bi şef rast û şimal hatin bi xef  
Da **Heyderî** can bit telef **Ehmed** bi derba Keyqubad

## 28.

fa`ilatun / fa`ilatun / fa`ilatun / fa`ilun  
Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

## r. 34

1 Leşkerê `işqê bi xişt û xencerê xûnbari bad  
`Aşiqê şadiq ji pişt û sîne sêşed pari bad

Şadiq im bîllah di `işqê *bî`l-ħeqîqet*<sup>135</sup> `aşiq im  
Gerçî hemmî tale dehren<sup>136</sup> sû`î ħal tîkrari bad

Firqetek şe`b û tewîl e hêviya weşlê hebit  
Gahê govend û nişat e gahê nalînkari bad

---

<sup>134</sup> Heta roja qiyametê.

1b sêşed] şêşed NM, NMMÇ, tê şed NMDH.

<sup>135</sup> Bi rastî

<sup>136</sup> Di seranserê salê de xemgîniya min, devam kir.

Der meyanê firq û weşlê pir mesa 'îl tê hene  
Lazim e şebr û tehemmil renc û hem pisyari bad

- 5 Ger ji husna dilberan mey hate bezma firşetê  
Bade 'ê derhal hilîne şagera serşari bad

'Aşiqê şadiq ku bête secde 'ê fetwa heye  
Şûşeya xemrê qebûl ket pişti lê zinnari bad

Mezhebê ' işqê durust e tê hebin zinnar û mey  
Mişlê karê Şeyxê Şen' an mişhefê dernari bad

Resm û esraran çi zanit zahidê zahirperest  
Serzenişha pir dikin piranî cahil hari bad

Her seher badê şeba têtin digel bêhna hebîb  
Dê çikem ba bûyê gul ' alem tijî enwari bad

- 10 Va di destê min ji gulzarê hebîban destegul  
Naçim ez seyr û temaşa behr û ber gulzari bad

Meş'ela ' işqê ku hîlbû **Ehmedî** sîne biraşt  
Lew nehên gâfil ji hubbê **Heyderî** bêdari bad

## 29.

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 35

- 1 Gerçî ji weşla dilberan mehrûm û bêbehr im be' îd  
Lekîn bi ne' tê begleran şah im di gulzarê mecîd

Şah im bi husna dilberê mah im ji şewqa xawerê  
Şurbek ji sîmîn şagerê da min bi keffeynê sefid

Merhem ji destê Eflaţûn hîna giha êşa derûn



Dîsan ji nû tîkrarî bûn cism û heyatê min cedîd

Cismê bi alam û derer her roj di hingamê seher

Bêsekn û aram û mefer tîr lê dibarin geh cerîd

- 5 Tîrê kevanê zergeş in sertîr zehr û ateş in  
Her sa'etek çar û şeş in ruh çû di vê herba şedîd

Can çû di cehda wesletê loman mekin ji vê qîşsetê

Ev reng e karê muhbetê cergê me bû xûn û sedîd

'Işqa me kir ev kar û kîn hetta me da dunya û dîn

Mînnet ku hûra mehcebîn gote me meqtûlê şehîd

Şekerdihana pîr cemal awirxumarê miskê xal

Yekser tewandim mişlê dal dil bir bi terfeynê hedîd

Dil bir bîla gewga û ceng 'işqê bi şimşîr û xedeng

Rakir li min Rom û Fireng bedhal kirim beyne`l-`ebîd

- 10 Bedhal kirim durdane`ê wek mes`ela perwane`ê  
Şohtim di vê gemxane`ê pur hemmû firyad û wehîd

Çendî heyên hûr û perî kerb û mîtala **Heyderî**

Bêşebehjênakin berî bêmuftiya **Ehmed** murîd

### 30.

mustef`ilun / fe`ûlun / mustef`ilun / fe`ûlun

Mubserîh --- / · --- / --- / · ---

mef`ûlu / fa`ilatun / mef`ûlu / fa`ilatun

Muzarîc --- / · --- / --- / · ---

### r. 36

- 1 Ger yarê **Heyderî** fikrê çî hal e **Ehmed**

6b bû] bûn NMDH, NMMÇ.

9b beyne`l-`ebîd] beyne`l-`îbad NMMÇ.

11b Bêşebeh] bêşubhe NMDH, NMMÇ.

Wer horê dêmzerî yî talibwişal e Eḩmed

Xweşke tu cerḩ û dağan ey şorgula li bağan  
Çun qeddê ‘er‘erî yî bilbilmîşal e Eḩmed

Çibkim bi ḩusnê rindan ey afitabê Yezdan  
Hetta tu ezbenî yî wafirmeyal e Eḩmed

ḩusna te çun nema bû xûrşîdê încîla bû  
Madame roj‘enî yî ‘aşîqşemal e Eḩmed

5 ‘Işqa te kir cîgerxûn bêseknê çerxê gerdûn  
Leb ‘eynî kewşerî yî can der zûlal e Eḩmed

Lebçeşmeya ḩeyatê nûrzatê ḩorşifatê  
Bûymisk û ‘enberî yî lew ruḩ li bal e Eḩmed

Kewn û mekan seraser geşbûn bi dêmê enwer  
Şewqa li muşterî yî rast û şîmal e Eḩmed

Durdaneya dilawêz û şubḩ û mesa şekerrîz  
Dil bir bi ce‘ferî yî pir qîl û qal e Eḩmed

Sergeşte‘ê gerîb im muḩnetkeşê ‘ecêb im  
Perwaneweş ketî yî bêçeng û bal e Eḩmed

10 Țop û tîfing dîbarin yemîn û hem yusar in  
Mecrûḩê ‘eynelî yî bêkam dinale Eḩmed

Ey nûrê çeşmê ‘alem pişt û penahê Adem  
Sulṫanê ḩaşimî yî derban û lal e Eḩmed

---

4a çûn] çû NMMÇ.

7a geşbûn] geşbûm NMMÇ.

**31.**

fa<sup>ç</sup>ilatun / fa<sup>ç</sup>ilatun / fa<sup>ç</sup>ilun

Remel - · - - / - · - - / - · -

**r. 37**

- 1 Nagîhanpêş e şikarek *el-<sup>ç</sup>iyaz*<sup>137</sup>  
Pir bi quwwet namîdarek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

Bêxeber girtim di xwabê zâlimî  
Gestim wek mexmûrî marek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

Merhemet eşla nebû bêmirwetê\*  
Bêsebeb şohtim di narek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

Dame ber cewr û <sup>ç</sup>îtabê bêguneh  
Min nema şebr û qerarek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

- 5 Dağê da cerhê di kûr xwê lê reşand  
Serteser êşam bi carek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

Dê ji vê zecrê xelaşbim ez gelo  
Lew ketim derkarê zarek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

Her seher têtin digel xoş û xurûş  
Dest bi şimşîrê xisarek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

Tê di xilwê da dikit teklîf li min  
Badeya zehr û zîrarek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

Ser didim billahî ez nakim qebûl  
Emr û nehyê namubarek *el-<sup>ç</sup>iyaz*

---

<sup>137</sup> Ya star!

\* Di NMyê de “ج” a ku di peyva “mirwet”ê de ye, ji bîrkirinê ve nehatiye nivîsîn.

8a dikit] diket NM, NMDH.

9a nakim] nakem NM.

10 Can di vê cengê bi der da **Heyderî**

Bû sebeb kîna gedarek el-‘iyaz

**Ehmedî** mecrûh bi tîra muhbetê

Dil nema rahê ferarek el-‘iyaz

**32.\***

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

**r. 38**

1 Ev çî horê nûrîendam bû te da ya Muste‘az

Mest û sergerdan û şeyda bûn ji husnê şed mu‘az

Ew mubarek husn û şûret şahê ‘alemgîrê heq

Nûrê eflak û zemîn sultânê şah û şahîzad

Hêj di ber *Qalû Bela*<sup>138</sup> der bû di kenza lem yezel

Gencê esrarê heqîqet dest bi seyfe ‘edl û daz

Sa‘eta durr hate meydanê ji ‘ummanê çeleb

Şewqê da kewn û mekan û cumle zerratê bûne şaz

5 Qafê ta Qafê tê şewqa nûrê hennan bû furû‘

Zatê efxem bû ji ‘amî ra penah û hem melaz

‘Erşê e‘la ku mu‘etter bû dê eqdamê şerîf

Tel‘eta ruxsarê xûrşîd bû di cennet îltîzaz

Badê rehmanî hilavêt berqe‘a gul bû zuhûr

Bilbilan derhal muşewweş bûn ji ‘işqê dildudaz

---

9b namubarek] nabekarek NM, NMDH.

11b dil] lê NMMÇ.

4a durr] dur NM.

\* Ev helbest, di NMMÇyê de tune ye.

<sup>138</sup> Gotin, belê (Tu rebbê me yî), el-A‘raf: 7/12.

.....  
 Mişlê mabeynê rû-ebrûyan li *nezdê xod-nîhaz*<sup>140</sup>  
 .....

### 33.

mef' ûlu / me fa' îlun / mef' ûlu / mefa' ilun

Hezec - - . / . - - - / - - . / . - - -

#### r. 39

1 Îro seher min dî mahên qametek 'er' er

Dewra qemerê min dî her goşekî şed ejder

Reşmarê sîmîn ser bûn dilmanendê nişter bûn

Têkil kederê min dî dil girtin kirin deh ker

Girtim ez perîhorê mey da min bi ferfûrê

Xemra şagerê min dî bêhiş dikirim bedter

Min noşî meya 'eşqê dor avête ser meşqê

Şewqa xawerî min dî da erd û sema yekser

5 Dara`yê xudancah im sulţanê sehergah im

Nazikbeşerê min dî nadim ez bi şed kîşwer

Bê`îsm û ser û ber bûm nageh ku muzeffar bûm

Hadirbeşerê min dî şorgul dane`ê 'enber

Şorgul ku şekerxab in bilbil bêkeder nabin

Şem'a fenerê min dî perwane kirin bêper

Şem'a me di dil îsa cerhê cegerê dîsa

<sup>139</sup> Ev riste û malika dawîn, nehatin xwendin.

<sup>140</sup> li cem xwe danî (di vir de nîhaz, bi wateya nîhadê ve hatiye bikaranîn. Ji xwe di farisî de carna d/z cî diguherînin. Wekî ostad/ostaz).

5a Dara`yê xudancah im] Dara xudancah im NMMÇ.

7b Şem'a fenerê] şem' û fenerê NMDH.

Bêhtir ji berê min dî pir nale kirim rengzer

Geh nalan û rencûr im geh dil şad û mesrûr im

Derba teberê min dî Rustemha dîkî ebter

10 ‘Işqê karizar geş kir ‘eqlê me muşewweş kir

Ne‘ra Teterî min dî sînem bû wekî mecmer

Şahid tu be ey **Ehmed** mişkên kakulê eswed

Kuştin **Heyderî** min dî bêşimşîr û bêxencer

### 34.

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 40

1 Wirdan hilavêtin hîcab dîsan li mêrgan bû bihar

Şed gulgul û reqş û ribab zağan li bağan kir şîkar

Zağan gerandin şeyd û dav bazan li hev şohtin hinav

Gulçîçekan girtin xûnav xweş bû li ‘amê lalezar

Xweş bûn hemî gulzar û rez alal xûya bûn terz bi terz

Hatin digel eşkê gewez bilbil bi şewtê meşhedwar

Qêr û şeda’ê şa‘iran hîlbû di bezma meyxoran

‘Aşîq bi tîrê awiran kuştin mehê zerrînguhar

5 Herkes giha qeşd û meram *subhane men yuhyî`l-‘îzam*<sup>141</sup>

Hîştîm digel narê gêram mest û hezîn û dağidar

Dağan ji narê firqetê tîran ji qewsê hîcretê

---

9b Rustemha] rûsemha NMMÇ.

9b dîkî] dîkî NM.

10a ‘Işqê karizar geş kir] ‘Işqê karizar kir NMMÇ.

3b meşhedwar] şehdîwar NMDH.

<sup>141</sup> Ew kesê ku hestîyan vedîjîne çiqas mezin e! Qur’an: 35/78.

Top û tifingê gurbetê yekser helandim şed hewar

Hicrê helandim wek risas ‘ eşqê kelandim bêqiyas

Loman mekin ey ‘ am û xaş şehde binoşim zehrê mar

Şehde bi min çêbit sefer şaf û selamet bim eger

‘ Ehd e tewaf kim xakê ber payê ji nûra kirdîgar

‘ Ehda me kir *Roja Elest*<sup>142</sup> îro me huccet va di dest

Gerçî cîger şehmarê gest hêvî xûya ye weşlê yar

10 Marê sîyeh girtim nîhan mêhtim nema min îsmê qan

‘ Işqê bi ser da nagîhan qelb û cîger şohtin di nar

‘ Işqê bi keffê ejderî şimşîr û xiştê cewherî

Axir telef kir **Heyderî Ehed** gerîbê bêmedar

### 35.

mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

### r. 41

1 Bi dêmê gulgulê îro li min mehbubê dil şa kir

Bi şewtê bilbilê îro me ‘ alem dîn û şeyda kir

Li rast û çep du xawerbûn reyhan û sunbilê ter bûn

Li burca şemsê kerker bûn dil û fehmê me yeğma kir

Şu‘ a‘ a xawerê hîlbû dema pîr nûr û kamil bû

Yeşîn daba li ber dil bû ku ev tofan li min rakir

<sup>142</sup> Dema ku Xwedê, ruhên ku afirandiyê re dipirse: *Elestû bî rebbî kum* (Ma Ez ne rebbê we me?) Ruhên ku hatine afirandin jî wiha bersiv didin: *Bela şehîdna*, (belê em şahid in-Tu rebbê me yî), Qur’an: 7/172.

9b Gerçî cîger şehmarê gest hêvî xûya ye weşlê yar] Gerçî cîger şehmarê mest hêvî xudayan weşlê yar NMMÇ.

11b bêmedar] bêmeded NMMÇ.

3a pîr] bir NMMÇ.

Sena da ‘erd û ‘ezmanî wekî berqe‘ ji ber anî  
Şemalek şaf û nûranî li Kûhê Tûrê Sîna kir

- 5 Şemla Tûrê Sînayê ji rûxsarê şekerxayê  
Qemerweş pertewek dayê penah û ‘ewnê Mûsa kir

Qemerweş refî‘ kir zulmet mu‘enber kakul û cubhet  
Hezaran te‘ne û minnet li enfasê di ‘Îsa kir

Di fezla kakulê tarî peya bû ayeta barî  
Ji ‘eksa husnê dîdarê li nahîd û sureyya kir

Bi husna bejn û balayê sîmenbûy û dilarayê  
Kirim deryayê gewgâyê ji min dil girt windakir

Ji min dil bir bi çengalê enîmeh muşterîxalê  
Şewata min di vê halê seraser zîr û bala kir

- 10 Seraser gerqê atêş bûm ji hîcrê mest û serxweş bûm  
Bi de‘wa muhbetê geş bûm şukur esfel mu‘ella kir

Şekerguftarê serwa qed bi çeşm û ebrûyê eswed  
Feqîrê **Heyderî Ehed** cinûnê kûh û sehra kir

### 36.

mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 42

- 1 Yarê bi kef dil bir bi xef gem şef bi şef lêkir bi şîr  
Şehzade ye nûrşade ye durdane ye kanê nezîr

Dêmxawer e xedeher e lebkewşer e gerdenser e

Neyqamet e mehcubhet e rojtel‘e‘ e kakul‘ebîr

---

8b derya ’ê] deryayê NM.



Kakulreş e şêrînmeş e ʔebʻ etxweş e ʻ eşqateş e  
Ew dilberê qedʻ erʻ erê rengesmerê qamethêrîr

Qametgul e xweşʻ adil e pirfađil e dađa dil e  
Ew rehnûmûn eswedʻ uyûn ʔerfeynê çûn şimşîr û tîr

5 Nûra li rû ʻ alem ez û her çarîsû pir nûrî bû  
Heft asîman kewn û mekan ʔetta bi wan ʔût û serîr

Xûba cîhan awir vedan dil bir ʻ eyan min go heman  
Kerker bike xwê werbike rengzer bike qenc bit esîr

ʻ Işqek hebe zîneğme be pîrnale be dilyeğme be  
Bêser birîn çeng û qêrîn nabit yeqîn dengê kebîr

Min ev cîger mişlê sîper girtî li ber tîr û teber  
Her lehzekî der lewnekî neʻ ran dikêşim mişlê şîr

Ĥusn û cemal nûra zelal pejmurdeħal lê bit meyal  
Kanê tebat şebr û ʔeyat çeşmê furat qelbê kesîr

10 Qelbê neşax gulzar û bağ şemʻ û çirağ lê bûn yesağ  
Ma der qefes mişlê ceres feryadê pes can der seʻ îr

Sîmsağer î meyenwer î Eskender î ya **Ĥeyderî**  
Nezma te dîn kamil kirîn şed aferîn **EĤmed** Emîr

---

4a dađa dil e] dağ da dil e NMMÇ.

6a dil bir] dilber NMMÇ.

10a lê bûn yesağ] lê bûn sağ NMMÇ.

37.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

r. 43

- 1 Ger ji gul bin destegul gulban ji destan bêxeber

Bilbilê 'aşiq bi şed dil tête ber can bêxeber

Mey ji destê meyfuroşan bête rex baqê gulan

Bilbilê bête hewarê şad û xendan bêxeber

Muħbeta gul hate ser qelbê Mem û Ferhad û Qeys

Mişlê bilbil mal nebûn el-qişse ser dan bêxeber

Şoşinan girtin sema geşbûn li eṭrafê gulan

Rewneqek çêbû 'ecêb bilbil li bağan bêxeber

- 5 Gul ji xarê hate der reyhan û sinbil şef bi şef

Bilbilan girtin selamlig baz û zağan bêxeber

Mêrg û çîmanê biharê tê hene gul bêşumar

Lê gula bilbil hebandî gul li ber man bêxeber

Nuqte 'ê 'enber li belgê gul belav bûn kom bi kom

Her yekê de tîr li bilbil mişlê baran bêxeber

Mişlê baranê reşandin gulxedengê ateşê

Ah û nalê bilbilan da çerxê gerdan bêxeber

Çerxê gerdûn dewr û gerdan ji muħbet û 'işqa gul e

Bêmeqer manendê bilbil şubh û şaman bêxeber

- 10 Ziyet û xemla gulê bû meş'ela perwane 'ê

Çengê der ateş hebandin bilbilê yan bêxeber

---

3b mal] man NMMÇ.

10b çengê] cengê NMMÇ.

Ruĥfîda bit **Ĥeyderî** bo ŝorgula ŝorgulġulam  
**Eĥmedê** bilbilmîŝal dil da bi talan bêxeber

**38.**

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

**r. 44**

1 Werin da qenc bizanin hûn çî **Eĥmed Ĥeyderî**yim ez

Bi ŝeŝamê fereĥefzûn çî peyġam' enberiyim ez

Peyamê misk û Mawerdê di fincanê Semerqendê

Ji destê min go ya werdê dibê mîr muŝteriyim ez

Di fincanê me hin xiŝt in ' ebîr û mawerê kiŝt in

Civata muŝterî kuŝtin ' egîdê kerkeriyim ez

' Egîd û Feylezûrxan im Siyeh Salarê zîŝan im

Li ser textê Suleyman im ŝehê deh kîŝweriyim ez

5 Ŝehê xaqan û feġfûr in di sunduscamê mestûr in

Di gulzarê me mewfûr in gulîstan enweriyim ez

Gulîstanê gulê ter lê cîdala bilbilan her lê

Peyapey ŝohtin ŝer lê welê Eskenderiyim ez

Welê kenza me me' mûr e belê der qulzema kûr e

Ne mechûl e ne meĥcûr e ġewaŝê ejderiyim ez

Bi ġewwaŝî me dur anî di nêva ŝoĥbetê danî

Wa îro qenc bi min zanî çî murŝîd ' ebqeriyim ez

Çî muŝkîl ŝe' b û dijwar e bi zahir batinê nar e

---

11b dil da bi talan bêxeber] dil bi talan bêxeber NMDH, NMMÇ.

3a ' ebîr û mawerê kiŝt in] : ' ebîr û mawerdê kuŝtin NMMÇ.

4a Feylezûrxan] Felyezûrxan NMMÇ.

Gelo şah`m xeberdar e qetîlek bêseriyim ez

- 10 Qetîlek bêkesim îro zelîlek erxes im îro  
Feqîrek emles im îro ji hîcrê dilkeriyim ez

Bi derba hîcretê har im bi mişlê cemreyek nar im  
Mudamê bende`ê yar im çi Qitmîr ber deriyim ez

### 39.

mustef` ilun / mustef` ilun / mustef` ilun / mustef` ilun  
Recez - - . - - / - - . - - / - - . - - / - - . - -

### r. 45

- 1 Îro ji hûsna dilberê meynoşî min mexmûr im ez  
Şurbek ji rengên kewşerê xef da me lew me` mûr im ez  
Îhsan bi min kir beglerê ser ta qedem pir nûr im ez  
Îkram ji destê serwerê menşûrî da meşhûr im ez  
Mişkên meta` ê `enberî îzhar bikim ma` mûr im ez

Îzhar bikim van şorgulan şam û seher bêsekne bim  
`Etra `ebîr û filfilan têkil bikim dilşade bim  
Jê hîlbikim pir meş` elan perşohtiyê perwane bim  
Xemlê ji çeşm û kakulan pê werbikim şed we` de bim  
Dehker bikim cerg û dilan ev reng e qîşset kûr im ez

Ev reng e karê dilberan tîran li qewsan bardiken  
Çûn qehreman û qeyşeran top û tifingan kardiken  
Her dem ji burc û penceran yek yek li `aşiq sardiken  
Em bûn ji çeng û şehperan gedra me pir bîsyar diken  
Da`îm di zecra esmeran dilxeste û rencûr im ez

### r. 46

Dil dê ji seyfê hîcretê derbek dinalit jê muqîm

---

11b çi] çû NM.

2b rengên] rengê NMDH.

2b bikim] bikem NM.

3d çeng] ceng NMMÇ.

3d bîsyar] pîsyar NMMÇ, niyar NMDH.

Tîrek ji qewsê muhbetê lêket di cihda bû du nîm  
Destê hekîman lê netê wêran dîkin nuqtaselîm  
Girtim di semtê gurbetê dêmsorgula ‘enbersemîm  
Bêhtir ji resm û ‘adetê sohtim ji ateş dûr im ez

- 5 Bêhtir ji xûna erguwan eşkê di şorregîn bitin  
Rehmet li te nabit nihan mehbûb ku dilsengîn bitin  
‘Aşiq digel derdê giran me‘ şûq qedşengîn bitin  
Meylek bi xef lê bit ‘eyan derxûr e derhal dîn bitin  
Mînet ku şahê dilberan mehzûn li nik mezbûr im ez

Şahê bi lufta qulzemî hê jî di ber Qalû Bela  
Ev sextehalê mulzemî avêt derûnê cedwelê  
Mexşûş di nêva ‘alemî da min şerabek Henzelê  
Îro di libsê matemî têtin me topê miftelê  
Loma mekin ey ademî uftade’ê mehcûr im ez

Loma mekin ey xaş û ‘am ev derdekî bêlome ye  
‘Aşiq qebûl in xemr û cam belkî li nik fetwa heyê  
Kewkeb digel bedra tamam ma şebçirağ lê hewce ye  
Zehra li şemsê girt meqam zulmet firî bêşubhe ye

**r. 47**

Mîn jî ji şewqê dîn meram Çîn serwerê Feğfûr im ez

Feğfûrşifat im her seher derbê li Qeyşer xweş dikem  
Destek bi tîr û yek teber mel‘ ûn reqîb rûreş dikem  
Şeşa mugennê bîne der fikrê çî nezmê geş dikem  
Saqî digel xemrê tu wer cama me va zergeş dikem  
Rustem dikim zîr û zeber mesrûr û hem mensûr im ez

Nişret ji ba xwe`y emîr şam û seher yarê te bit  
Hûsn û cemalek bênezîr der rû yû ruxsarê te bit  
Gîlman û horê tenherîr muştaqê didarê te bit

---

4c dîkin] dîken NM.

4d semtê] semta NMMÇ.

9a Nişret] Nuşret NMDH, NMMÇ.

Her bilbilê şorgul li bîr muhtacê gulzarê te bit  
‘Işqa te da min ev serîr meynûr û camferfûr im ez

- 10 Meyha te fîncana şedef ‘aşîq di hâlê gefletê  
Saqî ku îhsan kir bi xef hilbû şemala dewletê  
Şağer labaleb va di kef zahir dibînim şehdetê  
Şed şa‘irê lu’lu’ di dev gëmgîn dikim vê sa‘etê  
Şebzendedar im cem‘ê şev şem‘a şebê deycûr im ez

Şem‘a te **Ehmed Heyderî** hilbû di fanûsa zucac  
Qeşra te pir kir enwerî ferxendebad nî‘me`s-sirac  
Durra te dil lê muşterî xûrşîd ji şewqê bû wehac  
Lefzê ‘ebîr û ‘enberî cerhê te dîtin jê ‘ilac

**r. 48**

Gerq im di ava kewşerê rast û şîmal kafûr im ez

**40.**

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun  
Remel - . - - / - . - - / - . - -

- 1 Ger li te şebrek hebit ‘umrê diraz  
Dê muzeffer bî bi kamê serfiraz

Bêxîlaf şe‘b û seqîl û zehmet e  
Wafir îkram e feyazê bêniyaz

Qulzema eltafê lebrîz e mudan  
Cûd û îhsan bêşumar e jê bixaz

Ewwel û axir me şahîb her ew e  
Zahir û baîtin ew e ew çaresaz

- 5 Bilbil û şalûl çi zanin qedrê gul

---

9c dîdarê] dîdara NMMÇ.  
9d bîr] ber NMMÇ.

Wan peristin gul ji gulzarê mecaz

Ber bide bagê heqîqet ‘ aşiqê  
Ruħfîdake şorgula hemwar e yaz

Bilbilê gul gul bibêje mah û sal  
Dêmgula nazik delala dilnewaz

Dane ’ê ‘ enber li nesrîn û gulan  
Qeyd û zencîrên di lingê teyrê baz

Zulf û xalê dilberan mişkîn bitin  
Her seher bêtin li ‘ aşiq nar û gaz

10 Wer temaşa şoşinan çêbû bihar  
‘ Indelîb hatin hewarê zag û qaz

**Heyderî** wer da biçin meyxane ’ê  
Şed emanet **Ehmeda** bê keşfê raz

#### 41.\*

mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun

Recez - - - - / - - . - / - - - - / - - - -

#### r. 49

1 Ey dil ji van cerhê di kûr zînar tu aramek me xaz  
Wer xemr û fîncana tîhûr eşlen ji bil camek me xaz

Camek ji wê xemra helal mehbûb bi wê qedda şepal  
Carek bi xef çêbit wişal rind û dilaramek me xaz

Rind û hebîbê lebşeker dêşorgulê zêrrînkemer  
Peyweste bit husna li ser bêhtir şîrîn kamek me xaz

---

\* Ev helbest, di NMMÇyê de tune ye.

11b Ehmeda] Ehmedê NMDH, NMMÇ.  
2b rind] rêz NMDH.

Bêhtir ji bêhna şorgulan ‘enber di nêva filfilan  
Ka Eflaṭûnê bilbilan Loqman û îkramek me xaz

- 5 Loqman û Eflaṭûn hezar zanim li te nakin tucar  
Cuz herdu le‘ lê şehdîbar pendar û peygamek me xaz

Ev pend e ku pîrê muğan wafir bitin ah û fîğan  
Eşkê ji rengê erġuwan govend û beyramek me xaz

Reqşa mehê geş lê hebin ḥor û perîweş lê hebin  
Zercamê bêgeş lê hebin xweştir tu aramek me xaz

Xoştir mebîne lezzetê çêtir ji weqtê wuşletê  
Hilbit şemala şoḥbetê ‘umrê ‘ebes namek me xaz

‘Umrê me zayî‘ çû ‘ebes bêgem neborî yek nefes  
Ḥubba muqîmê bo te bes meyla seḥer şamek me xaz

- 10 Şam û seḥer wek bilbil î sergeşte û şed ġulgul î  
Zehmetkeşe‘ işqa gul î baqê gulendamek me xaz

Dêmşorgula lebkewşer î sîmgêbgêb î qed‘er‘er î  
‘Işqek welê da **Ḥeyderî** hemware bit ‘amek me xaz

#### 42.

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun  
Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . - -

#### r. 50

- 1 Xusrewê menşûr di destê serfirazê serfiraz  
Hêj di ber roja elestê şahê bazê şahê baz

Kenzê iḥsan û ‘eṭayê ey humayûn û huma  
Menbe‘a cûd û sexayê sînesazê sînesaz



Împîra tûrê kebîrê muhrîbanê muhrîban  
Qafê ta qafê şehîrê rimdirazê rimdiraz

Şahê gulzarê cemalê mehcebînê mehcebîn  
Tu bi wê şêrînfesalê dilnewazê dilnewaz

5 Lebzulala dur di navê gulyenağê gulyenağ  
Her seher têtin silavê tazeyazê tazeyaz

Saqiyê xemra helal î meytehûr î meytehûr  
‘Aşiqan mişlê hîlal î her dixazî her dixaz

Carekî perdê hilîne ey ‘ezîzê ey ‘ezîz  
Qelbê nalende bibîne gemrikazê gemrikaz

Ger dipirsî eşkê rengîn cowê xûn in cowê xûn  
Wer temaşa qelbê gemgîn dağ û gazê dağ û gaz

Agirê ‘işqê helandim şed hewar e şed hewar  
Başînî soht û qelandim nar û gazê nar û gaz

10 Berqê husa te eşer kir re‘ dîwarê re‘ dîwar  
Çunkî dil zîr û zeber kir bes mecazê bes mecaz

*El-mecaz zîddu`l-heqîqe*<sup>143</sup> **Heyderî** ya **Heyderî**

Lazim e îsm û weşîqe pir niyazê pir niyaz

---

5b tazeyazê tazeyaz] tazeyarê tazeyar NMMÇ.  
8b wer] der NMMÇ.

<sup>143</sup> Mecaz, berevajiyê heqîqetê ye.

10a re‘ dîwarê re‘ dîwar] re‘ dîdarê re‘ dîdar NMDH, NMMÇ.

43.

mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

r. 51

1 Ya **Heyderî** ger <sup>ç</sup> aşiq î husn û cemalek bo me bes

Xaliş di <sup>ç</sup> işqê şadiq î ebr û hîlalek bo me bes

Ebr û hîlalê mehcebîn sa<sup>ç</sup> et bi sa<sup>ç</sup> et her bibîn

Da pir bitin <sup>ç</sup> işq û evîn şox û şepalek bo me bes

Şoxa me hey xweşme<sup>ç</sup> de ye rûşems e nîşanzuhre ye

Me `yûs mebe hêvî heye awirgezalek bo me bes

Awir bi çeşmê muhbetê hadir dibînî lezzetê

Perwane `ê dewra te tê şem<sup>ç</sup> û şemalek bo me bes

5 Şem<sup>ç</sup> a me rewşen kir cîhan rewneq giha hór û cinan

Çendan bikey se<sup>ç</sup> ya nîhan nazik delalek bo me bes

Nazik dilawêz dilber in nîşan ji miska eşfed in

Awir bi mişlê xencer in <sup>ç</sup> er<sup>ç</sup> erfeşalek bo me bes

<sup>ç</sup> E<sup>ç</sup> erfeşalê şadenûr bañin ji min dil bir bi şûr

Çibkim bi şed wildan û hór kerb û mişalek bo me bes

Kerba evînê afet e berq û birûsk û hîrçet e

Şed qîl û qal û muhnet e fikr û xiyalek bo me bes

Fikrê çi ehsen tali<sup>ç</sup> im derya ye lutfê şani<sup>ç</sup> im

<sup>ç</sup> İşqa bi min da qani<sup>ç</sup> im zergeş peyalek bo me bes

5b Çendan bikey se<sup>ç</sup> ya nîhan] Çendan bikî se<sup>ç</sup> y û nîhan NMDH, Çendan bikî se<sup>ç</sup> ya nîhan NMMÇ.

6a eşfed in] eşfer in NMDH, eşfedan NMMÇ.

7a dil bir] dilber NMMÇ.

7b mişalek] mişalek NMDH.

10 Zerrînpeyala min di dest ‘ işqê dil û canê me gest  
Ehmed sera ye meyperest şêrînzulalek bo me bes

Şêrînzulalê şehdîwar xef Heyderî camek vexwar  
‘ İşq û mehebbet bûn hezar xûrşîdmişalek bo me bes

44.

mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

r. 52

1 Bi husnê ze`l-kerembarê tu dayê ehsenê herkes  
Di bin hukmê te kir carê melek cinn û benê herkes

Ji nûra bêbedel zatê eger çi ademê rengî  
Şehê lewlake lewlake<sup>144</sup> tu yî ey ezyenê herkes

Tu yî ew ze`l-cemal tawis te dî şûret di mir`atê  
Di ber Roja Elestê tu çirag û dîdenê herkes

Ji mîma te şefeq hîlbû sena da mah û xûrşîdan  
Munewwer bû cîhan têkel şîmal û eymenê herkes

5 Ji ‘erdê ta bi şedrê pertewa nûra te kir rewşen  
Re`îsê îns û canan şehriyar û gerzenê<sup>145</sup> herkes

Bi destê qudretê rabû ji dîdarê te çûn perde  
Ji şerma ‘ arizê gulgûn duşa bû gerdenê herkes

Ji re‘ dê duriya te dem bi dem tîr û durexşan tîn

---

1a kerembarê] kerembarê NMMÇ.  
3a tawis te dî] tawus tu dî NMDH, tawus tu wî NMMÇ.  
4b têkel] têkil NMMÇ.

<sup>144</sup> Tu nebûyayî tu nebûyayî (Ya Muhemmed). Li gor Hedîseke Qudsî, Xweda wiha dibêje Hz. Pêxember: Tu nebûyayî tu nebûyayî ey hebîbê min, Min felek nedîafirandin. Bnr. Celaleddîn es-Sûyûtî, *El-lealî`i`l-mesnû`a fi`l-ehadîsî`l-mewdû`a*, c.1, r. 272.

<sup>145</sup> Di nusxeya esasî de bo bêjeya “gerzen”ê bi tirkî haşiyeye kurt hatiye nivîsîn: Taca bi cewher.

Helandin ‘aşiqê şadiq ji ser ta pê tenê herkes

Çi mehbûb û şêrînzat î bi le‘ leynê şekerrîz î

Bi rindî şahê xûban î bi teb‘ et elyenê herkes

Dizanî ez gerîb im ef‘ iyê ‘ işqa te ez mêhtim

Hewar û ah û efğanê di min bû guftenê herkes

10 Keremke ey mehê ‘ alem xedenga muhbetê berde

Ji bêkamî û ruxzêrdê dibûsim damenê herkes

Bi fincanek meya ‘ işqa te dîn bû **Heyderî Ehemed**

Çû mecnûnê zeman im lew bi min tê xendenê herkes

#### 45.

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilun

Remel - · - - - / - · - - - / - · - - - / - · - -

#### r. 53

1 Şorgulê bilbil bi zat im bang û hewwarê me kes

Nîn e aram û tebat im derd û azarê me kes

Şadiq im wellah di qewl û gotinê ‘ ehda elest

Afeta hubbê helandim ruhê dernarê me kes

Va di destê min ji eşkê ergüwanê lalezar

Şef bi şef têtin temaşa resmê gulzarê me kes

Pertewa Nûra Hîcazî gâfilen dil bir ji min

Dê yeqîn bêdil telef bim nîn e gemdarê me kes

5 Badeya ‘ eşqê dinoşim her seher Xaqan im ez

Dilberim تنها ye Dara nîn e Şalarê me kes

---

8a mehbûb û] mehbûbê NMDH, NMMÇ.

1a bi zat im] bi zatê NMMÇ.

Min bi xef pirsî ji bilbil te çi meqlûb in digot  
Wird û nîsrîn in li ser wan miskê Tatarê me kes

Leyletu`l-qedr û tewaf im weşleta zatê gul e  
`Îd û nemrûzê di min rengef iyê tarî me kes

Kuştina min ger dixwazî bo te destûr e welê  
Tu bi destê xwe`y mubarek `erq û damarê me kes

Zahirî mirr û cefa ye lêkî bañin şehde tê  
Muşkil û dûr û derîn e ka xeberdarê me kes

10 Vê mu`emmayê çi zanin zahîd û şeyx û mela  
*Tele`e`l-bedru`eleyye*<sup>146</sup> ma di efkarê me kes

Bes mecazê berbide bagê heqîqet **Heyderî**  
Bêbedel *nî`me`l-meqam* ya **Ehmeda**<sup>147</sup> barê me kes

#### 46.

mustef`ilun / mustef`ilun / mustef`ilun / mustef`ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

#### r. 54

1 Min dî niha borî bi lez ew dilbera sundislîbas  
Dîsa ji nû hingavtim ez mexmûrkeja mişlê eyas

---

6a meqlûb in] meqlûbê NMMÇ.

6b Wird û nîsrîn] Wird û nesrîn NMDH.

<sup>146</sup> *Heyva çardeh şevî li ser min hilat*. Di derbareyê kî/ê, kengê ev îlahî an jî qesîde bikaraniye de çendîn rîwayet henin. Yek ji wan, di sala 622an de li ser gihêştina Medîneyê ya cenabê pêxember a bi rêhevalên xwe ve, ji layê mislimanên Medîneyê ve hatiye gotin. Û li gorê rîwayeteke din jî ev qesîde an îlahî, ji layê Şeyma ya xwîşka pêxember ve hatiye gotin. Bnr. Îbn Qeyyîm el-Cewziyye, *Za`du`l-me`ad fî hedyî xeyrî`l-`ibad*, Çapxaneyaya Muessesetu`r-rîsale, 1998, c.3, r. 10.

<sup>147</sup> Ey Ehmed! Te bêbedel meqameke çi xweş bidest xistiye.

1a sundislîbas] sunduslîbas NMDH.

1b mexmûrkeja] mehmûd kuja NMMÇ.

5c tuncik] tuncêk NMDH, NMMÇ.

9a zulmek] zulfek NMMÇ.

9a şohtin] şohtî NMDH.

Dîsan hebîba surperî meş kir bi qedda ‘er‘ erî  
Bûy a ji zulfê ‘enberî xweşbû kirim *beyne`l-unas*<sup>148</sup>

Xweşteb‘etê awir vedan kûk û guharan şu‘le dan  
Xalê sema wê danedan sohtim seraser bêqiyas

Sohtim bi wê husna tamam rengesmerê şêrînkalam  
Şem‘a me geşbû kir zulam cebren li min kir ev kiras

5 Dêma mu‘enber gulgul î xalê li xeddê filfil î  
Tuncik li enî meyyilî necma me kir zengar û pas

Cohtek esed min dî li pêş girtin dil û cergê bi êş  
Durdane ‘ê ku dil bikêş hilkir ji bin ‘erq û esas

Dil bir ji min hiş berze kir bêmurwetê zulumek we kir  
Îro li min rehmkî nekîr heqq e bipoşim hizn û yas

Heqq e ji rengê erguwan hêstir bibarin her zeman  
Şed ah ji zulma esmeran min dî ji wan *yewmu`l-Witas*<sup>149</sup>

Ev reng e kir zulumek li min cerg û hinav sohtin ji bin  
Firyad û efganê di min na ‘ête heddê bûn çiqas

10 Na ‘ête hedd û gayetê beş û beyana muhbetê  
Biskê li dora cubhetê halê me kir peygamê nas

Hora ku **Ehmed** muşterî kuştim bi derba ejderî  
Bêjin çi hal e **Heyderî** ey dosîtanê heqşînas

---

<sup>148</sup> Di mabeyna însanan de.

<sup>149</sup> Em nizanin ka di vira de şaîr, witas an jî roja witasê di çi wateyê de bikaraniye. Qasî ku me lêkolîn kir ve, bi navê Wittas, Wittasî, Wittasiyan an jî Wittasiyun ve xanedaneke ku di sedsala 15. û 16. de li Fas‘ê deshelatdar bûye, ye. Bnr. İslam Ansiklopedisi, MEB Devlet Kitapları, c.13, r. 234-235.

11b heqşînas] heqşenas NM, NMMÇ.

47.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . . -

r. 55

- 1 Ger tu gewwaşê çeleng î wer li derya 'ê bipirs  
Rustemê pir nam û deng î her li gewga 'ê bipirs

Berqe' û perdê hilîne deftera husnê bibîne  
Mes'ela ' işqê derîne weşfê zehra 'ê bipirs

Weşfê zehra 'ê te zanî dur ji ' ummanê deranî  
Xef bike razê nihanî ta bi uxra 'ê bipirs

Pir temenna û niyazî rutbeya ' alî dixwazî  
Ka heqîqet bêmecazî nûrê ecla 'ê bipirs

- 5 Hûsn û hûb bê hevdu nabin xişt û şimşîr û nîşab in  
Ra li ehwâlê me nabin çeşmê şehla 'ê bipirs

Çeşmê şehla husnê bêçûn em kirin mest û cîgerxûn  
Dem bi dem manendê Mecnûn her li Leyla 'ê bipirs

Dem bi dem şox û şepalê bîne ber 'eynê xiyalê  
Gerçî em dûr in ji wişalê xakê ber pa 'ê bipirs

Xakê pa 'ê şehdê xendan zulf û xalê le' lê qendan  
Xweş dikin şed iş û derdan mahêsîma 'ê bipirs

Mahê ' alem pir sena kir rû li şemsê încîla kir  
Per li perwanê belav kir ruhê der ta 'ê bipirs

- 10 Ruh e ew ' alem çû cism e cuzbe û nîne libis me

---

8b dikin] diken NM.

Şaf û bêkîn e bi ism e qedrê e' la'ê bipirs

Qedrê ma ' eşqê diraz e sîne'ê ' aşiqrikaz e

**Heyderî Eḥmed** bixwaze vê mu' emma'ê bipirs

**48.**

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

**r. 56**

Derdîmend im mustemend im ruwê zerd im dil bi êş

Ey mehê tam musnedê ' am min ji girdabê bikêş

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - -

- 1 **Eḥmedî** ey me bes e rencûr bike  
**Heyderî** bes pîrbela mehcûr bike  
Agirê hîcrê demek jê dûr bike  
Pîrs û teftîşek ji cerhê kûr bike  
Va di destan cam tijî kafûr bike  
Bêhiş û dîwane û mexmûr bike  
Can fîda'ê bejn û bala nûr bike  
Kemterîne çakeran mezbûr bike

Derdîmend im mustemend im berqe' û perdê hilîne

Da ku gëbgeb şems û kewkeb qeşd û meṭleb bîne pêş

- 2 Meqşeda qelbê melûl weşla gul e  
Roj û şev nalende mişlê bilbil e  
Her ji wec' a tîr û dağan kamil e  
Qeṭ nehên fayde ji Loqmanê kul e  
Her seher pejmurde û şed gulgul e  
Derdekî dijwar û şe' b û muşkil e

---

10b qedrê] qedra NMMÇ.

1g Kemterîne çakeran] Kemterîn û çakiran NMDH.



Gazin û loman mekin ‘ışqa dil e  
Sa‘etek şed derd û gem lê nazil e

Derdîmend im mustemend im sîne ‘ê buryan bibînî  
Baz û zendên le‘lîqend in hilkirin cergebirêş

**r. 57**

3      Bağ û bostanê te tazeşemer in  
Mêrg û çîmanê te hemware ter in  
Wird û alalê di te şohr û zer in  
Bilbil û bazan li ser qal û şer in  
Ṭalibê ḥusna te cinn û beşer in  
Ġaliba ḥor û perî lê digerin  
Awirê çeşmê te tîrê Teter in  
Em ji derdê te hemî lal û ker in

Derdîmend im mustemend im rehîmê kin serwa şêrîn  
Li esîran bes bi tîran ke bi şêran şeş û bêş

4      Bağ û bostanê biharê kemilîn  
Şêv û lêmûnê li darê ‘eddilîn  
Têk bi beybûn û reyḥanan xemilîn  
‘Indek û şoşin di ber da şitilîn  
Bazî û qumrî li hevdu fetilîn  
Ser ta ser ‘alem bi keyfê heşşilîn  
Em bi xwe uftade ‘ê cenga dil î  
Lew niha mehrûm ji zewqê xecilîn

Derdîmend im mustemend im ey şehê gewhernigîn  
Wer diyarê ah û zarê gestiyê marê ḥurîş

5      Tîr ji afaqan dibarin bê‘eded

---

3c wird] werd NMDH.

3c şor] şohr NM.

1b şeş û bêş] şeş û beş NMDH. [Malika weslê]

4b Şêv û lêmûnê] Şêf û lêmûnê NM.

4b ḥurîş] ḥerîş NMDH. [Malika weslê]

Miślê baranê li ser ‘eynê cesed  
Bêsebeb hûrhûr kirin qelb û kebed  
Mest û pabeste gerîb im bêmeded  
Can ji min ne‘re û qêrînê esed  
Lew ji min nalîn dibarin şed bi şed

**r. 58**

Mes’ela min pertewa nûra şemed  
Ĝafilên şohtim beraştim yed bi yed

Derdîmend im mustemend im unzurû ya samî‘în  
Ankî îsanest û zî can keyfe fi`n-narî ye‘îş<sup>150</sup>

6 ‘Işq û hûb herdu digel hev îsmek in  
‘Aşiq û me‘şûq bi can û cîsmek in  
Meyl û muhbet ew di reng û libsek in  
Şofiyê cahil şeda û ses mekin  
Nuktedanê ger hemî tîlsimek in  
Gotina bêhtir ji heddê bes mekin  
Ger ku mehbûb tozreşan ahestekin  
Dê li meydanê nerîman bestekin

Derdîmend im mustemend im pîşe’ê min bû enîn  
Eyyuhe`l-eḥbabu el-‘îşqu li min bûye dilêş<sup>151</sup>

7 Ef’iyye ‘îşqê hin û hin xwarim ez  
Bêkes û sewdaser û naçar im ez  
Miślê Ferhadê Şîrînê har im ez  
Pir di vê rê da niha gemdar im ez  
Ez nizanim xewn e yan bêdar im ez  
Yan xiyal e yan gelo hişyar im ez  
Saqiya şed el-eman bêzar im ez

---

5a afaqan] afatan NMDH.

6a ‘Işq û hûb herdu digel hev îsmek in] ‘Işq û mehbûb her digel hev îsmek in NMMÇ.

<sup>150</sup> Geli gudarani! Lê binêrin. Anku, ew kesê ku însan an jî xwedî can e dê çawa dia gir de bijî?

<sup>151</sup> Ey gelî yaran! Ev îşq li min bûye dilêş.

Canfîda 'ê wê qeda dildar im ez

Derdîmend im mustemend im hate lê ya nûre 'eyn  
Kaseya zerrîn meya rengîn *bi îkrama xîş*<sup>152</sup>

**49.**

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

**r. 59**

- 1 Ellah bi xakê payê an mehbûbê minnet kir li 'erş  
Hem şond e we`l-leylî bi wan zulfê sîyahxalê di reş

Xalan vedan tîrêjin û tav girtin ji qafê ta bi qaf  
'Îdan û se'y û hem tewaf mûyek ji seḥhê xawereş

Xawer ji şerqê tête der zehra digel şems û qemer  
Wirdê li bağan şor û zer 'eksên ji ḥusnê gerdenes

'Eksek ji ḥusnê bû 'eyan pertew giha kewn û mekan  
'Îsanefes şêrînzaban mêşên li pey şehdê lebeş

- 5 Şehdê kelameş ey 'eceb makes heyên mehrûmê leb  
Lami' ji nêv Hînda 'Ereb pir nûrî kir Hind û Hebeş

Dêmmehr e sîmîngêbgêb e naz û niyaz im her we be  
Ya Reb bi şewq û şu'le be hemware bit şem'a me geş

Hemware bit ḥusna li ser fincan ji destan bête der  
Min bit neşîb weqtê seher da bim geda 'ê ber dereş

---

7g dildar] dilwar NMMÇ.

<sup>152</sup> Bi îkrama xwe.

3b gerdenes] gerweneş NMMÇ.

4a pertew giha] pertewgeha NMDH.

Camê ji destan fir bikim finda perîşan kor bikim  
Ba herdu destan hilbikim reyhan û wîrdê gulşeneş

Wan wîrd û reyhanê li bal nîsrîn û alalê di al  
Min her li bîr in mah û sal dimrim ji 'îşq û muhbetes

10 'Îşqa hebîb xistim ji hev girtim bir û şohtim bi şev  
Encam û ehwâlê me ev renga dîkîr reftar û meş

Ev renga 'îşqê kir eşer şohtim wekî narê seqer  
Lew **Heyderî Ehemmed** ji ber na'êt hesabê zehmetes

### 50.

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 60

1 Hûsna digel şeyha ezel *lî qed kemel el-an*<sup>153</sup> e xweş  
Erđ û semawatu dema beynehuma ew can e xweş

*Hîna mîne`l-ğeybî ile`l-`eynî weşel*<sup>154</sup> ew bêbedel  
Cism û heyat sîttê cîhat dar û nebat pê mane xweş

Şewqek we da nûru`l-Huda mîr û gedaha`ê Xuda  
Çerxa dewar muhra diyar leyl û nehar dewran e xweş

Min dî bi 'eyn zehracebîn nî' me`l-emîn nûr bû yeqîn  
Şaf û zelal hûsn û cemal lêkin feşal însan e xweş

5 Gerçî şîfat însan e hat roj bû hilat hevteynê qat  
Hôr û cînan wildanê man der feyzê an xendan e xweş

Ew muhrîban şêrînzaban şekerdihan hatî bi wan

---

10b dîkîr] dîket NM.

<sup>153</sup> Niha ji bo min kemiliye.

<sup>154</sup> Dema ku ji xeybê gihêşte ber çavan.

Le' lê tenik qedda sivik xil' et jinik yezdan e xweş

Hatî bi şev fîncanşedef qerqef di kef da min bi xef  
Lew dest bi dest hişyar û mest min meyperest derman e xweş

Destê reqîq cama ' eqîq tûl û rehîq şahê şefîq  
Ka ey dilo şed gulgul û yarê wulo merdane xweş

Yarê ku ten nûrînbeden miska xeten sîmînzûqen  
Wirdê di şor xalan li dor zulfê di mor destan e xweş

10 Hê jî di ber qal û li ser lewhê ji zer ser meşq e wer  
Katib qelem kêşaye hem zuhra ye hem keywan e xweş

Lebkewşer e xalexter e wirda zer e serdefter e  
Lew **Heyderî** bû muşterî **Ehmed** kirî durdane xweş

### 51.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . -

### r. 61

1 Hêmdû lîllah **Heyderiya** wayêweylayê mehgeş  
Tali' û bextê sîyeh min dî di tuğrayê mehgeş

Keşfê esraran me kir îro bi tertîb û we edeb  
Ayeta lutfê me dî ihsan ji mewlayê mehgeş

Qulzema feyza ezel mewcek li zozanê me dî  
Şoşinan girtin sema reyhan li ber çayê mehgeş

Lame' a' işqê digel berqek li min da nagîhan  
Meş' elek îsa li dil ta zîr û balayê mehgeş

---

1a Hêmdû] Hêmdun NMDH.  
4a Lami' a] Lame' a NM.

5 Muftiya dîn û diyanet fitweya ‘ işqa me dî  
Dê biçim dêrê ji bo ‘ Îsaiyan tayê mehgeş

Cuzbeya ‘ eşqê li dil da şebr û aramê me çûn  
Lew diket coş û xûrûş hemwar e deryayê mehgeş

Şef bi şef têtin diborin durr û mircanê di min  
Hem ji bezma şa‘ iran dengê def û nayê mehgeş

Mujde bit îro li me xûrşîd ji bin ‘ ewran hilat  
Ta bida can û cesed nam û luqebhayê mehgeş

Min heye şox û şepalek her li burca sunbil e  
Erđ û ta seb‘ê semawatan bi leylayê mehgeş

10 Ma îro roj û şevan sekn û tebatek ma li min  
Agirê ‘ işqê biraştin cerg û îm‘ ayê mehgeş

Badeya ‘ işqê yeqîn zehra hilahil tê heye  
**Ehmedî** camek vexwar lew her di gëwğayê mehgeş

## 52.

mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

### r. 62

1 Te dîsa dil li min kul kir bi şewqa şorgula beşşaş  
Te selba fehm û ‘ aqil kir siyeh zulfan kirim dehhaş

Bi derbê çapliyan ey zâlimê îro te ez kuştim  
Libê curman dikey zulmê li vê teb‘ê dimînîm şaş

Ela bêmurweta bêdil te ‘ alem dîn û şeyda kir

---

8a bit] dibit NMMÇ.

9a sunbil e] sunleb e NMMÇ.

9b seb‘ê semawatan] seb‘ û semawatan NMDH, NMMÇ.

Perîşankakulan xefke te şohtin zahid û heşşaş

Dikem îro binoşim ez ji le'lan şagerek şehdab

Ditirsim ez ji telbîsa reqîbê mufîd û qellaş

5 Şepala min bi van nazan te tofanek li min rakir

Dizani' aşiqê uftadeyem bêhogir û yoldaş

Şev û rojê bi nalîn im ji te rehmk nebû peyda

Çi dilseng î di heqqê min dibînî sade xûnên yaş

Ji şewqa bazinê zendan guhar û şewk û xilxalan

Li min axirzeman rabû li semtê gurbetê bêsaş

Wekî Yûsuf di nêv Mişrê di hebsê dest û pabend im

Zuleyxaya zeman eşlen nekir pîrsek ji bêhaldaş

Gelo carek dibînim ez bi kamê dilmuzeffer bim

Bibûsim gerdena nazik biçirpînim gulê xeşxaş

10 Ji kê kim gazin û loman di xab û gîfletê girtim

Bi zulfê 'enberîn best im perîrenga meqewwesqaş

Fu'adê **Heyderî Ehed** xiyalê hîcretê mêhtin

Xedengê firqetê jendin hezar hemd û şena şabaş

### 53.\*

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

### r. 63

Ela ya Heyderiya serxweşê cama elest im ez

Di cama min hubab e qulzema mewwac e ya reqqaş

---

7b bêsaş] man saş NMMÇ.

\* Ev helbest, di dawiya NMMÇyê de cî digre.

mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun / mustef<sup>c</sup> ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

- 1 Xet<sup>t</sup>ê huma neqşê ezel neqqaşê kêşa pir şepal  
Berqe<sup>c</sup> hilatî bêbedel e<sup>c</sup> rab û cezman da şemal  
Menbe<sup>c</sup> ji kenza lem yezel neşw û nema bûn jê cemal  
Behra evînê bud<sup>c</sup> esel mezheb li<sup>c</sup> eşqê bûn kemal  
Lew<sup>c</sup> aşiqan fincan û mel xwestin li saqî bûn meyal  
Peyweste bûn bilbil gezel gotin li ser wirdê di al

Ji hûsna şoxê şengê zuhrerengê cam di dest im ez  
Bi dewran im çû sultân im di behra muhbetê gewwas

Behra evînê tête xoş badê şimal peyda dibit  
Qerqef di caman tê xurûş<sup>c</sup> aşiq ji nû şeyda dibit  
Hîna ku têtin noşe noş beste ji nêv qeyda dibit  
Ma qet dimêtin kes li hûş fehîm û<sup>c</sup> eqil winda dibit  
Zulfê mu<sup>c</sup> enber bûyê xoş şehde li ser qenda dibit  
Izhar mekey razê xemûş bêşûd e şebyelda dibit

Ji şewqa nûrê zatê horşifatê meyperest im ez  
Sîmenbûyê şekerxûyê qemerrûyê we *xaşe`l-xaş*<sup>155</sup>

Eflak û xûrşîd û qemer elbet ewan<sup>c</sup> işqek heyin  
Da`îm bi se<sup>c</sup> y û fetl û ger bêsekn û hem sergeşteyin  
Çavê<sup>c</sup> ezazîl bête der<sup>c</sup> eql û firaşet lê neyin  
Ma qey nezanî ev xeber kîbr û hesed bêfaydeyin  
Ger şadiqê şediqa te her baqî bitin şadiq weyin  
Wer<sup>c</sup> aşiqî<sup>c</sup> aşiq meger mişlê semek dermandeyin

---

1d bud<sup>c</sup> esel] bed<sup>c</sup> esel NMDH.

1d kemal] şemal NMDH.

2d dimêtin] dimînin NMDH

2ê mekey] meke NMDH.

2ê bêşûd e] bêsewde NMDH.

3c neyin] nebin NMMÇ.

3ê meger] megir NMDH.

<sup>155</sup> Resen, tekane.



Ji 'eşqa nûn û dalan zulf û xalan marê gestim ez  
Şeb û rojê di nêv dojê cîgersojê *mehî`l-eşxas*<sup>156</sup>

**r. 64**

Serwa ji bağê qudretê sîma û zehran tabîdan  
Meş kir bi 'ezma şohbetê 'alem di nêv enwarê man  
Wirdên ji nûrê şade tê bilbil hezar efğanê dan  
Em man di pêt û hîrquetê ey padîşahê el-eman  
Bêhtir ji hemlê quwwtê eşan di dilda girt mekan  
Şehmarê sethê cubhetê gestin rehê cerg û dilan

Ji vê cahê şefeqmahê bi dergahê nexwestim ez  
Siyehçeşmê di vê nezmê dil û fehmê me kir înaş

5 Ev 'eşq e resm û 'adet e têtin ji ezmanê qedîm  
Şehdab e noşîn şerbet e menbe' ji Yezdanê Hekîm  
Ferxende fezl û nî' met e xweşbûy diket qelbê selîm  
'Işqa ku narên elbet e 'aşiq dinalit jê muqîm  
Axir umîdê weşlet e lêkin digel şebr û 'ezîm  
Herdem bi te' b û zehmet e lew rengê zerd im dil du nîm

Cîgerparî dîlfikarî bi gemdarî noşistim ez  
Gulendamê bi bêkamê kirim damê gerandim 'aş

Bilbil bi qelbê gemzede geh geh nihanî geh bi deng  
Gul gul dibêje dil dide pêşî berê top û tifeng  
Lêkin çî fayde camîd e çîbkim ji bêcanê bi reng  
Husna mudamê ber bide herdem li bejna şox û şeng  
Şem' a te şafî şu' le da rewşen bitin Beğdad û Keng<sup>157</sup>  
Canê di cîsmê **Ehmed** e sîmgêbgebê awirxeng

<sup>156</sup> Mirovên ku dişibine heyvê.

4a sîma û] sîma 'ê NMDH.

4c dan] wan NMDH.

4d Em man di pêt û] Em man di destê NMDH.

6c bêcanê bi reng] canê bi reng NMMÇ.

6e keng] deng NMMÇ.

<sup>157</sup> Keng, li Îranê navê bajarokekî ye.

Şekerxendê seherzendê ji vê bendê ku hîştîm ez  
Bidim bazî li dil gâzî diket gazî dibî qeşşas

**r. 65**

‘Işqê ji ser hetta qedem êşand dil û canê di min  
Cîran û hemser bûn ‘edem yekser ji efğanê di min  
Deste bi deste bûn beqem wirdê li zozanê di min  
Pir bûn li min êş û elem nîn in çû Loqmanê di min  
Narê firaqê pêt û kem şohtî der û banê di min  
Hîştîm gêrb û dil bi gem bêdost û yaranê di min

Bi derdem gerçî herdem rûyê zerdem jar û mest im ez  
Nehin min tu ji geyrê û bi heqqê Sûre’ê Îxlas

**54.**

mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun / mefa‘ îlun

Hezec · - - - - / · - - - - / · - - - - / · - - - -

- 1 Felek dîsan te ez girtim ji ‘amê dûr kirim mexşûş  
Bi narê firqetê şohtim we nalîn kûr kirim mexşûş

Ji destê te zulum têtin ji cewra te cîgerxûn im  
Ji yar û hogiran zulma te ez mehcûr kirim mexşûş

Xiyala dûriya yaran helandim zahir û başin  
Xedenga hîcretê sergeşte û meksûr kirim mexşûş

Sirişkê bêkesî têtin ji rengê erguwan al in  
Li min pîrahenê nar e bayê rencûr kirim mexşûş

- 5 Muqîmê bêhiş û mest im nizanim nêkî yû sextî  
Enîn û êş û cerhê min bi derbê şûr kirim mexşûş

Ezel rûzînde neqqaşê ezel neqşê reqem kêşa  
Li rûyê cedwelê ev renga ez mezbûr kirim mexşûş

Ji qewsê muhbetê tîrek li qelbê gemzede wer bû

Bi wec' a wê xedengê bêrukûn meşhûr kirim mexşûş

Evîna dil bi yarê ra ji te 'sîratê bûm ateş  
Gerîb û canfida 'ê kakulê deycûr kirim mexşûş

**r. 66**

Bi dağa firqetê zer bûm li 'erdê gurbetê bêdil  
Meya ' işqa hebîbê gâfilen mexmûr kirim mexşûş

- 10 Muselel zulfê reyhanî li bedrê sîlsîlebest in  
Muqewwes ebrûyê tarî ser û pa hûr kirim mexşûş

Cemala mahîsîmayê şifakir **Heyderî Ehed**  
Ji emrazê mexûfe rehberê me' mûr kirim mexşûş

**55.**

mefa' îlun / mefa' îlun / fe' îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - -

- 1 Dilo rabe biçin seyra cîhanê  
Bikin geştê li ser dunya 'ê feyyaz  
Bizanin fikr û ehwâlê zemanê  
Bibînin qudretê Dara 'ê Feyyaz

Bi gîr na 'ê wuha em mest û gêj in  
Welî mexmûr û pabeste ji mêj in  
Peyala badeya şahir birêjin  
Bi seyyahê biçin şehra 'ê feyyaz

Dibînî her li me *şehren fe şehren*<sup>158</sup>

Diborin bêxeber *dehren fe dehren*<sup>159</sup>

Dizanî tête me *surren we cehren*<sup>160</sup>

Muheqqeq Qaşidê Dana 'ê Feyyaz

---

1b bikin] biken NM.

<sup>158</sup> Meh bi meh.

<sup>159</sup> Dem bi dem.

<sup>160</sup> Aşkera û nehênî.

Muħeqqeq tête me manendê şeyyad  
Di destan dê bibîn yexsîr û bêdad  
Divêtin lê ji min ra qût û hem zad  
Ji dunya 'ê heta ' uqba 'ê feyyaz

- 5 Di îro em perîşan û gerîb in  
Ji narê dûrî yû bu' dê kebîb in  
Merîzê pir hilak û bêtebîb in

**r. 67**

Ditirsim zehmet e ferda 'ê feyyaz

Ditirsim ejdeha bêtin di xabê  
Ji nageh bêmefer raket hîcabê  
Muħheyê bin digel redda cewabê  
Zelîl in em li ber lala 'ê feyyaz

Di vê dolab û girdaba bi xeşyet  
Me can da der bi gembazî û zehmet  
Şeqîlun hemluna<sup>161</sup> sa' et bi sa' et  
Be' îdun çerbuna<sup>162</sup> Mewla 'ê Feyyaz\*

Ji vê mekkareya sehhar û geddar  
Bikin hîcret biçin ber babê settar  
Bibûsin asîtan û dar û dîwar  
Fenakin ruħ di xîdmetha 'ê feyyaz

Ji ewwel ve medî zewq û şefayek  
Di axir hate endamê me tayek  
Divêtin bo me Loqman û dewayek  
Çirağa zulmeta uxra 'ê feyyaz

---

<sup>161</sup> Barê me giran e.

<sup>162</sup> Rêya me dûr e.

\* Ev çarriste, di NMMÇyê de tune ye.

4b bibîn] bibînin NMMÇ.

8b settar] sittar NM.

8d Fenakin] fenaken NM.

9a Ji ewwel ve] Ji ewwil ve NM.

10 Peyapey gem li min bêhed cema bûn

Bi sextî ' umr û dewranê m fena bûn

Dire 'sim şeybe 'ê beyda xuyabûn

Gerîq mame di nêv derya 'ê feyyaz

Xuşuşen ateşê ' işqê heraret

Gihande cerg û navê zîşeqawet

Bi zarê **Heyderî Ehemed** şikayet

Nihayet çû hetta ma 'wa 'ê feyyaz

### 56.

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r.68

1 Saqî bi yawer qerqefê îro nehên halê merîz

Sed te' ne dan dengê defê dîsa ji nû nalê merîz

Nalan di dil girtin weşen derd û bela pir bûn li ten

Rencîde kir 'eynê beden narê li ser balê merîz

Narê di nav cerg û dilan geş bû ji şewqa dêmgulan

Kî hel diket van muşkîlan şed qîl û şed qalê merîz

Muşkîl peyamek nadir e lêkin bi zahir agir e

Geh ga 'îb û geh hazîr e best e di nêv çalê merîz

5 Pabeste 'ê hebsa eşem manendê dalê puşti xem

'İşqê welê anî behem roj û meh û salê merîz

Ev gedre kir ' işqa gedar qelb û kezeb anîne xar

Lew tê bi dengê hey hewar herdem di zilzalê merîz

---

10a cema] cuma NMDH, NMMÇ.

2b balê] palê NMMÇ.

Şubha ezel neqqaşê heq îcade kir heftêm tebeq  
Pejmurde lêkin bêsefeq necma di îqbalê merîz

Necma sema 'ê ewwel e husna li dêmê kamil e  
Narê li ser tora dil e can da bi yek xalê merîz

Wan xedd û xalan kuştim ez bazan muqabil qîştim ez  
Bêruh li çolê hiştim ez ev reng e ehwâlê merîz

10 Ev reng e ehwâlê zebûn sergeşte 'ê eswed derûn  
Cerg û kezeb lê bûne xûn mehpûs di eglalê merîz

Ya Reb şeraba kewşerê bêtin ji hewzê gewherê  
Xweş kit li **Ehmed Heyderî** mecmû'ê eşkalê merîz

### 57.

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun

Hezec · ---- / · ---- / · ---- / · ----

### r. 69

1 Hilîne ey şehem perdê xuyabin bêhîcab ' ariz  
Munewwer bit ji rû 'erdê îla husnê meab ' ariz

Ji husnê zerreyek berde cîhan bit bazî yû şahî  
Ji şewqa zulf û xalan da bi gem bin şeyx û şab ' ariz

Ji ber husn û cemala te çeleb neqşê sema lêkir  
Şemala mehr û mahan da ji durda afîtab ' ariz

Zuyad û 'enbera meşhûr ji toza ber pêyê qencîn  
Exîz kir şorgulê lewnek ezanmisk û gulab ' ariz

---

10b mehpûs] mehbûs NMMC.

11b kit] ket NM.

3b durda] der da NMDH.

5 Ji nûra cem'ê endamê ji şewqa te revî zulmet  
Sena û nûrê kewneynê şehîrê mahîtab 'ariz

Tu heq û xûrşîdê kewneyn î heqîqet qebzeyek nûr î  
Muheqqeq dîn û îmanê *îla yewmi`l-hîsab*<sup>163</sup> 'ariz

*Emûtû fi hewake*<sup>164</sup> qed rica 'ê min ke Ya Hadî  
Teccela key cemalê ez bibînim bêniqab 'ariz

Gul û reyhan bibarin da bi kamê dil bi bûy im ez  
Fîdakim ruh û canan nûrê çeşmê bêxwab 'ariz

Dibînî ah û nalê min ji destê firqeta geddar  
Te kul kir sîne 'ê miskîn bi wan herdu nîşab 'ariz

10 Nîşabê ser ji ateş her seher têtin ji qewsê tu  
Seraser hilweşandim lew ze'îf im pir 'ezab 'ariz

Di nîranê fîraqê ma muxelled **Heyderî Ehed**  
Ji Serheddê Kemalê hate der hâlê xirab 'ariz

### 58.

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun  
Hezec ·---- / ·---- / ·---- / ·----

### r. 70

1 Bikêşe xettê reyhanî ji misk û 'enberî xetta  
Bi neqşê xwe tu ey Manî li textê Qeyserî xetta

Ji nezma te şeker têtin li teb'ê sîm û zer têtin  
Belê şam û seher têtin ji le' lê kewserî xetta

Ji wan le' lan 'eselbar in hezar noşîn meşelbar in

<sup>163</sup> Heta roja hesabê. Qur'an: 38/16-26-56, 40/27.

<sup>164</sup> Ez ji evîndariya te dimirim.

Ji fincanê te meybar in cîhan bû muşterî xetîat

Te fincan misk û mawerd e bi zerfa fiðdeya zerd e

Li goşê şohbetê berde tu şadiq rehber î xetîat

- 5 Tu bilbil mest û mexmûr î telebdarê gula cûr î  
Eger çî bî`l-beden<sup>165</sup> dûr î bi qelbê hemser î xetîat

Ji qelbê hemserê yarê bi dilsojî dikey carî

Gezelha`ê şekerwarê li bejna `er`er î xetîat

Ji bejna mahîsîma`ê şemalê girte dunya`ê

Li ber dergahê Dara`ê geda`ê kemter î xetîat

Geda`ê kemterîn î tu besa xizmetgûzîn î tu

Di bezma lebşêrîn î tu bi weşfê esmer î xetîat

Bi weşfê nûrê kewneyn î heyata cism û dareyn î

Dirêjî eşkê `eyneynî ji xûna eħmerî xetîat

- 10 Ji giryan eşkê xîzabê di vê dolab û gîrdabê

Ji ber `işqa şekerxabê di lewnê eşferî xetîat

Di lewn û halê şîgrê da weh serxweşê di `işqê da

Hetta îro di cuzbê da ma **Eħmed Heyderî** xetîat

## 59.\*

---

5a cûr] nûr NMMÇ.

<sup>165</sup> Bi beden.

6a dikey] dikî NMDH.

7b Dara`ê] dunya`ê NMMÇ.

8a Geda`ê kemterîn î tu] Geda`ê kemterî lê tu NMMÇ.

\* Helbesta di vê rêzê de wenda ye, di tu nusxeyan de, nîn e.



60.

mustef<sup>ç</sup> ilun / fa<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / fa<sup>ç</sup> ilun

Besît --- / --- / --- / ---

r.71

- 1 Sofiyê <sup>ç</sup> ezman çu şûr kanê di babê gelet  
Cam û şeraba *tehûr*<sup>166</sup> bîne cewabê gelet

Saqiyê şêrîn ezel camê bi canê me dî  
Şem<sup>ç</sup> a me geş bû furûgnabê di tabê gelet

Neqşê ku şubha ezel neqqaşê lêkir feşîh  
Geştê bi destê beşîr çêbû hîsabê gelet

Nûra du <sup>ç</sup> alempenah gote me Salar im ez  
Eşhed û bîllahî min gotê tu nabê gelet

- 5 Teşdîqê canan me kir tehqîq e em bûne yek  
Saqî peyalê werîn mes'ele ma bêgelet

Zahidê zahirperest nîst zî hal im xeber  
Gazin û loman diket pa di rikabê gelet

Mexmûr e ew bêbeşer pakîz û paqij ez im  
Secde li dêrê dibim naçim qubabê gelet

Pak û mubarek ew e mahî melahtnumûn  
Dabê bi rahê di dey dane'ê dabê gelet

Ew bû di Adem şefî Îblîsê lêkir hesed  
Hate zewalê kemal ma di <sup>ç</sup> îqabê gelet

<sup>166</sup> Ji bal ayeta 76/21 (*şeraben tehûr*)'an ve telmîh hatiye kirin. Di dawiya vê ayetê de wiha tê gotin:  
*Xwedayê wan, vexwarinên pur û paqij bi wan dide vexwarin.*

11a Di lewn û halê şîgrê da] di lewna halê şufrê da NMDH.

11b cuzbê] cezbê NMDH.

2a camê bi canê me dî] canê bi canê me da NMDH.

9a Ew bû di Adem] Ew dibû Adem NMMÇ.

10 Qelbê me da şehde 'ê şahê 'enasir ew e  
Hasidê bedbextî bedçûn e nîşabê gelet

Miṭrib û saqî werin îro bi cam û neyê  
**Heyderî Eḥmed** çî xweş rabû ji xabê gelet

**61.**

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun  
Hezec · ---- / · ---- / · ---- / · ----

**r.72**

Derê luṭfê li min bik şa gerîb im ey hebîb îro  
Meh û salan li wê ḥusn û cemalê bit Xuda ḥafiz

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun  
Hezec · ---- / · ---- / · ----

1 Ji wê ḥusn û cemalê ey şepalê min  
Sena dane felek ta rûyê dunyayê  
Ku berqe' jê hilañî ey delalê min  
Ziya 'ê zerreyek da Ṭûrê Sîna`yê  
Te Mûsa kir mu' ella xweşxîşalê min  
Ji nû Fir' ewnî bû punhan di deryayê  
Te 'eksek da bi Yûsuf mehmîşalê min  
Te kir zîr û zeber 'eqlê Zuleyxayê

Te yeğma kir bi îma 'ê dil û navê kebîb îro  
Tu mehtab î ez im mişlê hîlalê bit Xuda ḥafiz

Tu mehtab î belê xûrşîdcebîn î tu  
Bi qûrbana te bit perwane 'ê miskîn  
Ji ser ta pê şekerwarê şêrîn î tu  
Te bir ruḥ û rewanê şotiyê gemgîn  
Heqîqet rewneqa çerxa zemîn î tu

---

1f da bi Yûsuf] da Yûsuf NMMÇ.

Li ber rengê te çêbûn sorgul û nistrîn  
Li burca muşteriyê her dimînî tu  
Ji şewqê ma cîgerxûn ‘ aşiqê dirîn

Eşer kir narê ‘ işqê nagîhan şohtim ‘ ecêb îro  
‘ Ezabê hate der heddê kemalî bit Xuda hafîz

Li rast û çep hîlal û mehr û hem mah in  
Niha herşêş cîhat gerq in di şewqê da  
Hetta îro du mişqal rindiya şah in  
Bi dewranên di Firdews û di ‘ Ednê da  
Hezaran mîrze û paşa wişalxah in  
Gelek Mecnûn kirin berdan bi çolê da  
Muruwwetgûn gedayên em li dergah in  
Bi gemdarî te em hîştin di cuzbê da

### r.73

Gema ‘ işqê ji bin helkir dil û cergê gerîb îro  
Nema şebr û tebata sextehalî bit Xuda hafîz

Şemalê husnê tu şam û seher têtin  
Li qelbê serxweşî ‘ işqê dibit mucmer  
Digel coş û xurûşê pir huner têtin  
Ji wec‘ an çehre’ê ‘ aşiq dibit eşfer  
Ji qewsê malzirav tîrê tecer têtin  
Hewar e hey hewar em bûn ji çeng û per  
Ji bangîne di min cinn û beşer têtin  
Temaşa dag û derdê bêdilê ebter

Ji efganê di min bilbil hezar û ‘ indelîb îro  
Kirin nifret gulîstan mane xalî bit Xuda hafîz

5            Bi nazî wan mu‘ enber kakulan şehke  
              Bira şed te‘ ne bêne misk û gulavê

---

4b Nema şebr û tebata] Nema şebr û tebata min NMMÇ.  
4c xurûşê] xurûş û NMDH.

Hezar rengê li qedd û qameta me ke  
Li etrafan belavbit pertewa tavê  
Dipeyive ‘ aşiqê uftade agehke  
Ji ber xemla me gotî berqe‘ê bavê  
Ji ser hetta qedem hûrhûr û kerkerke  
Şehîdê çeşmê şehla bim mehruh navê

Bila bit qelb û fehmê ‘ aşiqê şeydanehîb îro  
Li semtê gurbetê bêhtir bi nalî bit Xuda hafîz

Keremke ey xudanê cubbe û tacê  
Ji wan qewsan nişabê muhbetê berde  
Muferehke dilê peyweste wek sacî  
Ji hicrê mest û medhûş giran derd e  
Bi weşlek şadimanke **Ehmedê** racî  
Bibînim bejn û balayê bîlaperde  
Bi kamê dil bi bûy im gerdena ‘ acî  
Şemîma te heqîqet misk û mawerd e

#### r.74

Murada min bibexşî da mukedder bit reqîb îro  
Li wê nûrînfesalê mah û salî bit Xuda hafîz

Ji afaqan li min tîr û teber barîn  
Ditirsim ruh telef kim ez di vê herbê  
Ji rengê ateşê sûzan xeber barîn  
Xudaya min nema taqet ji vê derbê  
Li dilda vê gedarê niştetek narîn  
Tu Ğeyyaş î riha ke min ji vê kerbê  
Tu Feyyaz î te cûd û merhemed karîn  
Ji behra rehmtê qitrek li min werbê

Giriyê **Heyderîyê** dilgiriye bêtebîb îro  
Şifakî zexmînakê cerg û balê bit Xuda hafîz

---

7b telef kim] telefkem NM.

7c Ji rengê ateşê sûzan xeber barîn] Ji rengê ateşsûzan xeber barîn NMMÇ.

7ê riha ke] riha key NM.

62.

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun

Hezec · - - - - / · - - - - / · - - - - / · - - - -

- 1 Reqîbê ra hejand herbek bi sur'et hatê Ya Heffaz  
Li min da gafilên derbek kirim zulmatê Ya Heffaz

Ji vê derbê bi nalîn im muqîmê mişlê gowîn im  
Sirişkê xûn dibarînim ji ber 'ahatê Ya Heffaz

Fu'adê min nîgehban e dibî lûfta te derman e  
Ku îhsana te 'umman e di her ewqatê Ya Heffaz

Ji îhsana te ey şah'm bi zarê zerreyek xah im  
Dexîlê babê Ellah im digel halatê Ya Heffaz

- 5 Li babê 'alemê geyban esîr im ez digel 'eyban  
Gerîb im gurbeta kerban kirim dehqatî Ya Heffaz

Digel 'eyban ricamend im li dergahê te pabend im  
Te go *la teqneû*<sup>167</sup> 'ebd`m Tu ekrem zat î Ya Heffaz

**r.75**

Di xeş û 'emd û nisyan im besa kerdem we mîdan im  
Belê tubtu poşîman im ji meknûnatê Ya Heffaz

Poşîman im dikim zarî bi dilsozî cîgerparî  
Keşîr e rehmata barî ji her zerratê Ya Heffaz

Dil û cergê mi bûn agir meraqê badê lê rakir  
Ku ceyhûn bête ser namir tu yê neccat î Ya Heffaz

- 10 Xudawenda bi çaha'ê me dilşa ke di 'uqba'ê

---

<sup>167</sup> Hêvî mebir. Qur'an: 39/53.

7a kerdem we mîdan im] kerdim we meydan im NMDH.  
9a cergê] ceger NMMC.

Bi weşla mahîsîma 'ê di bin rayatê Ya Heffaz

Bi weşla şahê nûrîn qed ji van derd û birînê bed  
Rihakî **Heyderî Ehed** ji vê afatê Ya Heffaz

**63.**

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1 Perwane 'ê wer şoşbetê ey ' aşiqê dîdarê şem'

Da bèn gerîqê nî' metê îro di nêv enwarê şem'

Îro li nik min şoşbet e ' ûd û ribab û dawet e

Da ez tecellakim li te camek meya serşarê şem'

Cama meya şem' a munîr heqq e muqîmî bit li bîr

Xweşram bitin bal û zehîr sergeş nebên derkarê şem'

Ser dane şeyx û ' abîdan dil dan bi sextê zahîdan

Bilbil tebat û xwabîdan der dîdenê gulzarê şem'

5 Şem' a digel cohtek hîlal ' alem kirin şewq û şemal

' Aşiq ku dî ' eynî cemal zerme' de bû gemdarê şem'

' Eynî cemala dilfirûz da min şeraba sînesûz

Lew ez diçirpînim henûz leymûn û şêv û narê şem'

**r.76**

Leymûn û şêvê xal li ser heryek di feđla yek hecer

Şefhaciyan bestîne her ' îdan dibûsin darê şem'

---

10a xudawenda] xudawendê NMDH, NMMÇ.

10a dilşa ke] dilşa key NM, NMMÇ.

3a heqq e] heqqet NMDH.

3b derkarê] dergahê NMMÇ.

7a Leymûn û şêvê xal li ser] Leymûn û şêv xalê li ser NMDH.

7b darê] dara NMMÇ.

Her meh ji Ke' ba enwerê teqbîl dikim Eswedberê  
Mînnet ji fedla daverê hacî kirim şehmarê şem'

Şehmar û zulfan kir xurûş ' eqreb li rex hatin bi coş  
Uftade key maned li hûş<sup>168</sup> peyweste ma xûnbarê şem'

10 Xûna ji rengê erġuwan têtin ji nav cerg û dilan  
Bestim bi mişkên kakulan şohtim bi ateşharê şem'

Zanim tu **Ehmed Heyderî** perwane 'ê bêşehperî  
Daîm ji ' işqa dilberê sergeşte û bêmarê şem'

#### 64.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa' ilun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . -

Merheba ya yewme 'îd ey şahiya xaş û 'ewam  
Min tenê beyne`l-' ebîd mehzûn bibîn barîne dem'

1 'Îd e îro min nebûsî xakê payê dilberê  
Şerbetek şafi nenoşî min ji Hewzê Kewşerê  
Vê meraqê bêxeber şohtim ji rengê mucmerê  
Da wuha zîr û zeber bim ta bi roja meşşerê  
Merheba ya yewme 'îd îro te manendê husam  
Sîne`ê min ker bi ker kir cû bi cû xûnîn e dem'

Şef bi şef têtin dibûsin xakê pa şêrînlebê  
Ez di narê bû' d û dûriyê disojim kezebê  
Min nema şebr û tebatek ne bi roj û ne şebê  
Dê bi qêran mubtelakim Hînd û Şam û Helebê  
Merheba ya yewme 'îd ey qedr û qîmet berdewam

<sup>168</sup> Kesê ketî, bi çî hawî dimîne ser xwe. Daçeka *li* ya ku di nav risteya Farisî de derbas bûye, me bi Kurdî xwend şûnde, ev wate derket holê.

10a xûna] xûnê NMMÇ.  
4d wuha] weha NMDH.

Şohtiyê bêçeng û bal im min ji rê dûrîne dem<sup>ç</sup>

r. 77

Her kesek çûn û gihêştin dîtina bedra tamam  
Ez tenê mehrûm û dûr im lew li min rabû qiyam  
Dûriya zatê hebîbê bir ji min nuqç û kelam  
Agirek berda dilê min yadî hîştim bêmeram  
Merheba ya yewme <sup>ç</sup>îd ey zînetî meşhûrê nam  
Hêstirê min xûn dibarin pir ji hed borîne dem<sup>ç</sup>

Hudhudê şêrîn tebî<sup>ç</sup> et ger tu qaşid bî ji min  
Dê biçî ta pêşî yarê min di vê <sup>ç</sup>îda mezin  
Her seher ba <sup>ç</sup>îzz û nazî <sup>ç</sup>îdîha tebrîkî kon<sup>169</sup>  
Bêje <sup>ç</sup>aşîq ah û nalê dûriyê helkir ji bin  
Merheba ya yewme <sup>ç</sup>îd ey şahê rewzanê humam  
Dîde <sup>ç</sup>ê giryar dibînî key ji wan fûrîne dem<sup>ç</sup>

- 5 *Nîst kes <sup>ç</sup>alim kî çeşmim eşkê xûnabî dirîz*  
Hem ji barê îştîyaqê dil ji min bir fehminîz  
*Leyse lîlqelbî sukûnun nîst yek cayê gurîz*  
*Şod wucûdim mest û mehzûn ta bi rûzê restexîz*  
*Merheba ya yewme <sup>ç</sup>îd <sup>ç</sup>alem be to şod îbtîsam*  
Lê ji çeşmê min ji rengê erguwan coyîne dem<sup>ç</sup> <sup>170</sup>

Dem<sup>ç</sup>ê alê erguwanî tîn ji <sup>ç</sup>eynê firqetê  
Bilbil`m şohtim nihanî şorgula qelbê me tê  
Destê berrûyem nihad`m pa di qeyda muhbetê

---

3a çûn û] çune NMDH

4b Dê biçî] Dê biçin NMDH.

7d Mujde dan ev resm e bû] Mujde dan resm e bû NMMÇ.

<sup>169</sup> <sup>ç</sup>Eydan pîroz bike.

<sup>170</sup> Kes tune ku bizanibe çavên min hêstirên xûnîn dirêje  
Ji barê îştîyaqê hem dil û hem jî fehm ji min bir  
Tine bo qelb teskîn û sikûnet, nîn e cîhekê revê  
Heta qiyametê wucûdê min mest û mehzûn bûye  
Merheba ya roja <sup>ç</sup>eydê alem bi te rûken/rûgeş bû  
Lê ji çavê min ji rengê gevezîn herikiye xwîn



Her murada min ji destan camê zergeş bade tê  
Merheba ya yewme ‘îd mehbûbê ‘alem bû di ram  
Lew ji ‘îşqa wê şehînsahê li xedrûyîn e dem‘

Gul ji gulzarê cemalê hate meydana şêrîn  
Bilbilan çûne tewafê qûmriyan dîtîn bi ‘eyîn

**r.78**

Min ji wê husn û cemalê ra hezaran aferîn  
Mujde dan ev resm e bû ‘îda semawat û zemîn  
Merheba ya yewme ‘îd ey xîl‘eta heq lîl‘enam  
Te li min îro telef kir dil ji mehcûrîn e dem‘

Zabe ka şem‘î fu‘adî fi hewake ya hebîb  
Înne lî qelbun merîdun ente Eflatûn tebîb  
Înnenî şexşun esîrun mîttû fi eydî`r-reqîb  
Hel lena minhu necatun we mîne`l-weşlî neşîb  
Merheba ya yewme ‘îd minke îla yewmî`l-qiyam<sup>171</sup>  
Derdimendek bêdewayem lew ne mestûrî ne dem‘

- 9 **Heyderî Ehmed** ji ‘îşqa te xirab û serxweş e  
Mest û mexmûrê ji şewqa te peyalek bêgeş e  
Sîne şod rencîde lêkin can di behra ateş e  
Pîşe bû nalîn û kalîn gestiyê marê reş e  
Merheba ya yewme ‘îd ya rohniya çavê gumam  
‘Aşîqê uftade elbet lê ji rencûrî ne dem‘

---

<sup>171</sup> Ey dilber! Mûma dilê min ji ber evîna te heliya  
Dilekî min ê nexweş heye, tu yî Eflatun û pijîjk  
Ez kesekî bende me, di destê reqîb de mirim  
Xelasiya me ji wê heye, gihêştin ji me re nesîb dibe?  
Merheba ji wê roja eyda ku heta qiyametê ku dê ji te bê.

65.

mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

- 1 Da dil dema berqa mecaz lêkir ji rengê damê dağ  
Yek yek ji hev kir îmtiyaz husna ezel nî<sup>ç</sup> me`l-çerağ

Rengayîna Eskenderî şikl û şema`il enwerî  
 Meyla me lê bû muşterî lew hate libsê zağê zağ  
 Serwa xeraman da evîn geh geh bi xenden geh girîn  
 Ta coyê xûn randin ji`çeyn xef dame yek şêrintufağ

*Gûyed bi xemra bûysîmen dê ruhî bistînem zi ten  
 Goftem çî mîxwahî zi men başed dîmağet kokî çağ<sup>172</sup>*

- 5 *Goftem tu mîxwahî rewan îmrozî mîgûyem`çeyan  
 Ferda nehên dadim nîhan cerhan dibînim çep û sağ<sup>173</sup>*

**r.79**

Ez de`çewedar im ta ebed lestu bi me`zûnin feqed<sup>174</sup>  
 Madame ruhî fi`l-cesed<sup>175</sup> hey bit li sînem nar û yağ

Narê li cergê kir eşer lew bilbil im wafirkeser  
 Yan ser didim ez bêxeber yan kamî distînem zî bağ

Dîsan ji wan qewsê di xem tîr dane cergê pir elem  
 Yekser ji nû dil kir`çedem eswed`uyunê gulyenağ

---

2a Eskenderî] Îskenderî NMDH.  
 2b libsê] lebsê NMDH.

<sup>172</sup> Bi xemra bêhnyasemîn dibêje ez ê ruhî bistînim ji ten  
 Min got, tu çî dixwazî ji min, mêjiyê te dibe kokî çax (Em negihêştine wateya *kokî çax`ê*)

<sup>173</sup> Min got, tu bi awayekî rewan dixwazî, îro ez eşkere dibêjim  
 Min bi dizî (veşartî) da, birînan dibînim li çep û rast

<sup>174</sup> Lê belê, ez ne bi destûr im.

<sup>175</sup> Heya ku giyanê min di laşê min de be.

Eswedguraban meş kirin sînem tijî ateş kirin  
Cerg û hinavêm reş kirin rencûr û zer bû rengê ag

10 Qerqef di camê zergeş in qef qef bi hukmê ateş in  
Lew em hilak û serxweş in nabin ji nalînê firag

Nalîn hezar in **Heyderî** Mecnûnê Leylaya zer î  
**Ehmed** bi nalîn û girî têtin ji hicrê dil neşag

### 66.

fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

1 Ah ji ber êşa birînê lê seraser nar e dağ  
Dil ji vê ˆ işq û evînê her seher tîkrar e dağ

Dağê da cerhê di kûr ˆ erˆ erqedê qametsîfaf  
Jan didet cerg û dilan hestî kirin şedpar e dağ

Serteser xaş û ˆ ewam gerqên di şewqa dêmdure  
Lê di heqqê min tenê xalkewkebê efkar e dağ

Ma ji eˆ za ˆ ê di min yek ma di halê şîhhetê  
*Çist in derdê giran gemgîn koned bîmare dağ*<sup>176</sup>

5 Belkî ev berq û birûsk têtin ji reˆ dê muhbetê  
Nazikê dil bir ji min awirxedeng dîdar e dağ

### r. 80

Gazin û loman mekin nalîn û kalînê di min  
Tên ji derba xencera serwa çeman reftar e dağ

Rojekî bêje şehînsah ey nesîmê seherê  
Ba selamha û duˆ ayan da nebên hemwar e dağ

---

1a nar e dağ] nar û dağ NMDH.

<sup>176</sup> Çi ye ev derdê giran, xemgîn dike nexweşiya dax kirî.

Weqtê ta weqtê duşed dan e qebûl in min li dil  
Îltîmasa me feqîran me 'ûte bazar e dağ

Xakê paya te dibûsin em di vê rê heyirîn  
Çendî efganan dikêşin her li me bêdar e dağ

10 Ey şehê serwa qedan Ellah nîgehdarê te bit  
Luţfeke şahî dixwazim pir li ser min har e dağ

Berq û tîrêjên di te şohtin fu 'adê **Heyderî**  
Dem bi dem bêhtir li cergê **Ehmedî** dijwar e dağ

### 67.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun  
Remel - . - - / - . - - / - . -

1 Te ji wan qewsê xwe şandin şef bi şef  
Tîr li cergê me reşandin şef bi şef  
Te beqem kir werd û nîsrînê di min  
Sosinê min te weşandin şef bi şef

Ka di destê min ji gulzarê te gul  
Tu dibînî sîne 'ê gemdar û kul  
Hêj bi ser van bang û qêrînê di min  
Esedan dil fehişandin şef bi şef

Bilbil im wellah me destegul divê  
Wirdê banan mirwetek kamil divê  
Her seher ahîn û nalînê di min  
Cinn û însan şewişandin şef bi şef

### r. 81

Gerçî zahir şûretê însan im ez  
Lêki baţin şohtiyê bêcan im ez  
Wer çî har in eşkê rengînê di min  
Çep û rast im neqqişandin şef bi şef

5 Qameta serwên dema min têtê bîr  
Mişlê baranê dibarin dağ û tîr  
Pir gedar in dağê narînê di min  
‘Erq û hestê herrişandin şef bi şef

Çeşmê şehlan canderanê ez beden  
Mest û pejmurde û wêran maye ten  
Baz û şahînê te cerginê di min  
Be gulaban vekişandin şef bi şef

Ez bi derba te hezîn û nexweş im  
Çi şeda’ê re‘ dîwarê dikêşim  
Dosîtan û yarê gemgînê di min  
Me bi qêran cehişandin şef bi şef

Ji ezel da me ji ‘işqê qedehek  
Da nebînim tu nişat û ferehek  
Zulf û xalê qeddê nûrînê di min  
Em di korî birişandin şef bi şef

9 **Heyderî** muştaqê dîdara te ye  
Harê çûn perwane’ê şem‘a te ye  
Şebr û taqet rohnîya ‘eynê di min  
Te ji **Ehmed** merrişandin şef bi şef

### 68.

mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 82

1 Derya’ê ‘işqê hate xoş dîsa ji nû bû mewc û kef  
‘Aşiq ji nageh bir ji hûş durdaneya fîncan şedef

Durdaneya qerqef helal da min ji wê husna li bal

---

8e di korî] di gorî NMMÇ.  
2b ji hûş] ji hev NMMÇ.

Xistim ji ‘eql û ‘ilm û hal hîştîm gerîbê diltelef

Hîştîm di benda muhbetê sohtim bi narê ulfetê  
Girtim ji rûyê mirwetê şedrê mukedder kir hedef

Şed wayêweyla şed hewar gedra me kir ‘işqa gedar  
Avête dil cumrek ji nar da’îm disojit min bi xef

5 Da’îm bi qêr û gazî yî têtin be cunbuş bazî yî  
‘Alem bi tîr endazî yî zîr û zeber kir her teref

Qelbê me kir zîr û zeber wirda hicabê hate der  
Bilbil dibînit her seher zulfê mu‘enber lef bi lef

Bilbil li bağan bûne cot şalûl çî xweş qanûn digot  
Qêr û şeda wan sîne şot qumrî xwendin şef bi şef

Qumrî yû baz û ‘indelîb keyfek welê danîn ‘ecîb  
Ehlê dilan dil bûn nehîb zağan li bağan bûne ref

Ref ref ji qewseynê hilal barîn li dil tîrên di al  
Bê dil kîrim reht û melal nalende wek zirna û def

10 Dengê def û zirna û ney nabên çû efğanê me key  
Dê ez bibînim sağ û hey e‘za ji yek weryane tef

Narê di nêv cergê me da geş bû ji ba’ê Serhedê  
Ya **Heyderî** ya **Ehmeda** şed qîl û qalê şed esef

---

7b şot] soht NMDH.

11a Serhedê] Serhedê NMMÇ.

69.

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

r. 83

- 1 Ela ya eyyuhe`s-saqî bi yawer badeya şeffaf  
Lebaleb zan meya baqî bi reng û rûyê mişkên naf

Ji te'sîratê 'işqê em zebûn in mişlê perwanê  
Tecawiz kir ji heddê wec'ê ma tu nîzî kon însaf

Ji van qêr û şedan belkî dibî dil sa'etek sakîn  
Enîn û ah û efğanê di bêkamê hejandin qaf

Bi van çêsmê dilê 'aşiq nihanî xûn dirêjim ez  
Bi re'y û fitweya pîrê muğan eşkê me xûnên şaf

- 5 Di babê mezhebê 'işqê li 'aşiq xew nihên ca'îz  
Helal in bade û xemrê di zerf û kase'ê eşdaf

Derîn û pir mu'emma ye şeqîl e mes'ela muşkîl  
Li ser van qîl û qalan ka xebîr û 'arif û eşnaf

Mesa'îl tê heyin reqqa 'emîqên deftera 'işqê  
Dixwazî yek bi yek helkey divêtin xoce'ê 'erraf

Gelek zuhhad û 'alim bûn cunûn û xeste'ê dêran  
Ew ê zinnarîha bestên nizanîm çend û çend alaf

Me da meyxane'ê meylek li dil da cuzbeya 'işqê  
Demadem tête canê min bi reqşan im li çar eţraf

---

2b Tecawiz] Tecawez NNMDH, NMMÇ.

4b şaf] naf NMMÇ.

5a xew] xûn NMDH.

5b kase'ê] ka'se'ê NMDH.

- 10 *Bi mestê şofîyan ma ra besî efsaneha kerdend*  
*Ne mî danend bi meqşûda min ê mehzûn ji bil keşşaf<sup>177</sup>*

Di rahê şofiyê cahil merew ya **Heyderî Ehmêd**  
Ji fi' lê şan poşîmanêş ji yezdanê bi cû eltaf

**70.**

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun

Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . -

**r. 84**

- 1 Ey gelo tîrê hebîban ma di nar in roj û şev  
Ku qulûbê me gerîban jî di ar in roj û şev

Ez nizanim ev çi top û çi tîfingî şev û roj  
Ev çi ceş û çi heşem halîmekar in roj û şev

Çi şeda û hûyêhay in ev çi coş in çi xurûş  
Çi xedengê tecerî ne çi gedar in roj û şev

Yan ji şertê sa' etê te dî li min ra bit qiyam  
Lew ji bağan tê heyahey kar û zar in roj û şev

- 5 Werne şorgul bêsebeb belgê di nazik diweşin  
Çeşmê bilbil eşkê rengîn jê dibarin roj û şev

Yan gulîstanê me borî weqtê lê çêbû xureyf  
Lew ne baz in ne gurabîn ne hezar in roj û şev

Yan me' şûq ji kevanê geđebê tîran didin  
Ey ' eceb ' aşiq ji wec' an dîn û har in roj û şev

---

10a kerdend] kerden NMMÇ.

<sup>177</sup> Bi serxweşiya şofîyan ve, me gelek kirin efsane  
Nizanin ji xeynê keşşaf bi meqşûda min a mehzûn

5a belgê] pelgê NMDH.

7a didin] diden NM.



Belkî dilber ji huner hate nîda û hêrekê  
Lew muqabil ne peya û ne suwar in roj û şev

Ey re'îsê dilberan wirda li Bagê Îremê  
Tu xudan tac û nukîsn î me hewar in roj û şev

10 Tu şehînşah î dinasim te di her hîn û zeman  
Ev çî ağa çî mulûk û xundîkar in roj û şev

Hey di bin hukmê te wer bîn sertaser kewn û mekan  
Li kinarê me nezer kî çî neçar in roj û şev

### r. 85

Te telef kir ruh û canê min di vê 'erdê gerîb  
Baz û şahîne te îm' a 'ê me xwarin roj û şev

Taze bûn cerhê me îro te gelek xwê lê reşand  
**Heyderî Ehemed** ji kerbê qêr û qar in roj û şev

### 71.

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1 Dêma mu' enber lê du gul wan şorgula girtin xûnav  
Îlan û reşmarê li mil wan sîne 'ê min kir belav

Şedrê perîşan kir du ker weqtê ji burcan hate der  
Ba herdu çavan kir nezer xalan li ser min kir silav

Min dî li ber *Burca Belek* mil dane hev zulfê xelek  
Toq û hemayîl bûne yek weryan ji ber biskan gulav

Weşyan ji qedda 'er' erî misk û zûbada 'enberî  
Teysên li dêma enwerî rengkewkebê filfil di nav

---

11b nezer kî] nezer key NM.  
4b rengkewkebê] rengşorgulê NMMÇ.

5 Filfil di nêv nûra zelal lê rast û çep qewsê hîlal  
Wan çeşm û mijganê di al şohtin li min cerg û hinav

Cerg û kezeb kir deh ker e ' enqa ye heybet ejder e  
Durdaneya gerden zer e dil bir ji min bejna zirav

Dilber bi wê qedda le'îf teb' etkubara tenşerîf  
Geh geh bi reyhanê zerîf têtin li ruhê min bi rav

Ruhê me bir serwa sehê derket ji pişta perdehê  
Çûn ' ewrî jê da der mehê ' alem bitin tîrêj û tav

Tîrêjin û tava cubhetê geş kir feşala qametê  
Lew zalima bêmurwetê reş kir di kûrê qelbê xav

10 Qelb û dil û cerg û kebed weryan ji hev şed el-meded  
Na'ête hana min ehed lew dîdebanên herdu çav

Ew dîdeban e **Heyderî** hora ku sîma enwerî  
Îro bi pencê ejderî **Ehmed** ser û pa kir alav

## 72.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . -

## r. 86

1 Qed qeweste`l-qametî be' de`l-fîraqî bî`l-lehaz  
Dûriya dîdarê to şod der derûnê men meraq  
Bendeniz bülbül gibi gece ve gündüz kış (ş)u yaz\*  
Ah û nalan lew dikêşim lerizîn Şam û ' Iraq

---

5b çeşm û] çeşmê NMMÇ.

\* Me risteyên tirkî yên mulemmê, anegorî fonetika tirkîya îroyîn sererast kir.

1c Bendeniz bülbül gibi gece ve gündüz kış (ş)u yaz] Bendeniz bülbül gibiyim gece gündüz kış (ş)u yaz NMDH.

El-meded innî mesektu`l-ħemye fî eydî`l-esed  
Dil be leb awerde, nêzî cergê ra hem mîzened  
Sen beni aslana verdin bendedir sizden sened  
Ger li min îro nepirsî me û te yewme`t-telaq

Ente fî`l-ħusnî emîrun ferre `eqlî fî hewak  
Şod wocûdem ez durexşanê cemalet zexminak  
Bak benim ħalim gorürsün olurum şimdi hilak  
Agirê `işqa te şohtim ma muruwwet bû yesaq

---

3b wucûdem] wucûdim NM.

3c gorürsen olurem] görürsün olurum NMDH.

3d yesaq] siyaq NMDH.

- 1 Piştî dûrmayîna dirêj pišta min tewan te  
Di kûrahiya dil de bû sebaba meraq û xemgîniyê dûrmayîna dîtina te  
Sibe û êvar havîn û zivistan bûm wek bilbil ez  
Ah û nalan lew dikêşim lerizîn Şam û `Iraq

Hawar! Ez di nava destên şêran de xwe diparêzim  
Dil gihîştiye dev û derbên dil heta li cegerê jî dixin  
Te, ez avêtim pêşiya şêr, lê dîsa jî spartgeha min tu yî  
Ger li min îro nepirsî hesabê min û te dê bimîne roja qiyametê

Tu di bedewiyê de şahciwan î revî eqlê min ji eşqa te  
Bedena min birîndar e ji xweşikahiya çavên ronak ên te  
Binêr! Tu halê min dibînî, ez ê niha helak bim  
Ma muruwwet bû qedexe şohtim agirê `işqa te

Mislê erxûwanî ji nû ve diherikin hêstirên çavên min  
Wenda dibe, naxûyê êdî di vê deryayê de giyanê min  
Û te bixwe jî cirîd lêda te avête nav şer ruhê min  
Dê ji vê derbê xelaşbim yane dê çêbit muħaq

- 5 Eslê hikayetê, rojeke ku bayê nesîm germ bû  
Mîn got, vê nameya xeman bide yara xûynerm  
Dibe ku ji mirovperweriya xwe bo derdê min bişîne hekîm  
Werne êşan ez ħelandim min nema şêr û tayaq

Ey saqî rabe! Ji husna hebîbê qedehek av bide me  
Cerg û dil ji tîbûnê şewitîne bûne wek kebab  
Dilê min ji ber heskirinê bi ecêbî ripreş bûye  
Ger dipirsî `aşiq im lew taqeta min bûye taq

Çi heyf ku temenê min bi dawî bû, lê min bejna dilberê qet nedît  
Çi ye ev şûrê tûj ê ku pišta min tewandiye û kiriye du ta  
Bi şûrê firqetê ve bûme serxweşê te  
Heta ruh di qalib de hebe, ez ji bo şewata wî ruhî amade me

Ya Heyderî! Hetta, ji ber derbên çekên firqetê  
Tu her daîm bi vî rengî, tîyî bi ne`reya ejderî  
Tu jî ya Ehmed! Veduxî fîncanên koçê  
Lew şev û rojan dibêjî el-fîraq û el-fîraq

Yecrî mîşle`l-ergüwanî dem´ û ´eynî mîn cedîd  
Mîşewed axir der î n derya rewanem na-pedîd  
Ruhumu ğewġaya şaldın sen dahi vurdun cerid  
Dê ji vê derbê xelaşbim yane dê çêbit muhaq

5 İ nne eşlî`l-qişsetî yewmen hereret li`n-nesîm  
Goftem î n name`ê ğemha bedeh an yarê helîm  
Belki murwet yüzlerinden derdime yollar hekim  
Werne êşan ez helandim min nema şebr û tayaq

Saqiya qum fasqinî ke`sen mîne`l-ħusnî`l-hebîb  
Cerg û dil ez teşnegî bûdend manendê kebîb  
Yuregim muħbet elinden kapkara olmuş ´acib  
Ger dipirsî ´aşiq im lew taqeta min bûye taq

Fate ´umrî ma re`eytu`l-qedde qeţ wa heşreta  
Çîst î n şimşîrê mubir kerde balayem du ta

**r. 87**

Firkatin kılıçlarıyla olmuşam sarhoşi ta  
Ruħ di qalib da hebî min hazır e ev îhtîraq

Bel mîne`d-derbî`n-neşabi`l-fîrquetî ya **Heyderî**  
To çûnîn hemware mîayî be ne´rê ejderî  
Sen de ya **Ehmed** içip sen hicretin fincanları  
Lew şev û rojan dibêjî el-fîraq û el-fîraq

**73.**

mefa´ î lun / mefa´ î lun / mefa´ î lun / mefa´ î lun  
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1 Felek dîsa bi dijwarî te narek da dilê ´aşiq  
Ji nû îro bi neyyarî hewarek da dilê ´aşiq

---

7c olmuşem] olmuşum NMDH.

8d dibêjî] dibêjin NMMC.

Dilê sihsale sergeşt e bi mestê hate govendê  
Bi pencê Rustemê Yawuz gedarek da dilê ‘ aşiq

Peyapey dağê da cergan nema min taqeta şebrê  
Bi cama henzelê zehr û zirarek da dilê ‘ aşiq

Çi rengî dê bibim şabir ji van ah û enînê dil  
Xuşûşen ‘ işqê xef bilbil hezarek da dilê ‘ aşiq

5 Bi qêrê bilbilê îro me ‘ alem anî îşanê  
Mişala kakulê reşkarê zarek da dilê ‘ aşiq

Me berda canîbê qiblê seher badê nesîm lê da  
Dema bêhna hebîbê nûbiharek da dilê ‘ aşiq

Me kêşa cedwela resmê evîna xusrewê xûban  
Reqîbê dî muxalîf rûzigarek da dilê ‘ aşiq

Bi şewqa afirtabê ra çû perwanê bi dewran im  
Disojim çeng û şehbalan mudarek da dilê ‘ aşiq

Ji ‘ işqa mehcebînê ra li deştê mişlê gerdûnê  
Li rast û çep nîgehban im gubarek da dilê ‘ aşiq

10 Bi çeşmê zahir û batîm dibînîm hûsnê dildarê  
Xiyala weşletê xoş işfîbarek da dilê ‘ aşiq

**r. 88**

Bi qeşda daneya dabê ji destê **Heyderî Eşmed**  
Verêstin baziyê şeydê qirarek da dilê ‘ aşiq

---

2b Rustemê Yawuz] Rustemê îro NMMÇ.

10a hûsnê] hûsna NMDH.

11b Verêstin] Verêtin NMDH.

## 74.

mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun

Recez --- / --- / --- / ---

- 1 Firyad ji qewsê hicretê barîn li min narên xedeng

Şed ah ji destê firqetê yekser kirim wêranereng

Yekser kirim zîr û zeber xisitm ji eqlîman beder

Ĝurbet li ser min bu keder rengzer kirim teşbîhê jeng

Rengzer kirim bêmar e dil pejmurde û gëmdar e dil

Îro ji nû tîkzar e dil bêsekne mişlê çîzê çeng

Mişlê neyê girya me tê zahir ji destê firqetê

Bağin ji tîra muğbetê yexsîr ketim destê fireng

- 5 Yexsîr di hebsa ateş im mest û xirab û serxoş im

Dilxeste 'ê zulfê reş im herdem bi min ra qal û çeng

Herdem bi vê rencûriyê ' aşiq bi nalên kûriyê

Têtin ji hier û dûriyê rahişte fincana şureng

Axir bi cama henzelê ez dê telef kim vê dilê

Peyweste mişlê bilbilê bê dil bikim efgan û deng

Deng û şeda 'ê min hene lêkin bi weqt û we' de ne

Têk şerh û metn û me' ne ne ' aşiq kirin mexmûr û beng

' Aşiq kirin mecnûn û dîn serwên qeda qamet şerîn

Sekn û tebatê min berrîn lerzende hiştim qelbê teng

- 10 Qelbê me ' işqek lê heyê rojê ji rojê zêde ye

Lew her şeda û negme ye berda berê top û tifeng

---

2a eqlîman] eqlîma NMMÇ.

7b bikim] bikem NM.

Top û tifingê ber zirav têtin ji ' işqa pîşerav  
Lew **Heyderî Ehed** hinav girtin muqabil bêdereng

**75.**

mefa' îlun / mefa' îlun / fe' îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - -

**r. 89**

- 1 Fe waweyla ji ' işqa min çi narek  
Bi min werbû ji bin şohtim bi carek

Hebîbê min ' eca'îb lê ' eyan e  
Ku min îro nehên siy yû sitarek

*Eya rîhe`n-nesîm îz nîlte yewmen  
Îla da îretî`s-selme`l-mubarek<sup>178</sup>*

Bibêje *es`ede`l-lahu mesakum<sup>179</sup>*  
Weyaxûd rojekî bêjî neharek

- 5 *Febelleğ kamîlen mînnî du`a î  
We beyyen halî ke`l-bilbil hezarek<sup>180</sup>*

Bibêjî ma di benda te birîndar  
Gerîb û jar û mehzûn û neçarek

Te lê bestin der û pacê di hebsê  
Nîgehban e ji bo rahê firarek

Ji ' işqa te hewa'iyê zeman e

---

<sup>178</sup> Ey bayê nesîm! Eger ku tu rojekî  
Bîgehêjî welatê pîroz ê aşitiyê

<sup>179</sup> Bibêje, Xwedê êvara we şad bike.

<sup>180</sup> Dûayên min bi tevahî bigehîne  
Halê min wek bilbil pêşkeşke

Di destan da nema îlla hewarek

Ûeta kengê welê dê mubtela bim  
Ji mehcûrî nehî min kesb û karek

- 10 Ji narê îştîyaqê cerg û dil çûn  
Kesê bêdil çewan têtin qerarek

Reqîbî **Heyderî** kemter nebîne  
Ela ya **Ehmeda** j medhûş û marek

### 76.

mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 90

- 1 Bilbil ji hûsna şorgulê gerçî li dil da cuzbeyek  
Lêkin ji ‘îşqa bilbilê gul dê mu‘ella rutbeyek

Pershohtina perwane’ê bo ziyeta kaşane’ê  
Lew hate dîwanxane’ê şem‘ê belavkir şu‘leyek

Filka zemanê hate saz xweş hate xoşî behrê raz  
Da dil digel badê mecaz lew Rustemî da ne‘reyek

‘Aşîq bi se‘ya şam û rûz saqî bi destûr û rumûz  
Hađir ji xemra sînesûz zergeş hilanî şûşeyek

- 5 Camek ji hûsna dilberê serçeşm e hewza kewşerê  
Bêhtir ji misk û ‘enberê xweşbûy kirin sergeşteyek

Bêhna li misk û ‘enberê bala’ê serw û ‘er‘erê  
Reftar û qeddê dilberê mehbûb kirin ew yek bi yek



Yek yek ji min girtin xweşî şohtim firaqa ateşî  
Da min şeraba bextreşî şubha ezel heq kaseyek

Cama meya destê sefid dil bir ji min kir nabadîd  
Saqî werên hel min medîd belkî şîfa bit xesteyek

Belkî me rewşen bit beden rengxweş bitin bêmareten  
Mel' ûn reqîb te' na diden kutahê dil bit zerreyek

10 Kutah bitin destê nemam medhûr û merdûdê heram  
Kaşaneya geş kir zulam reşma ye çûn wêraneyek

Ey **Heyderiyê** bêtebat nezmê te gotin deh luğat  
Şed qîl û qal û muşkîlat der şedrê **Ehmed** me' neyek

77.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun  
Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . - -

r. 91

Ger di heşrê **Heyderî Ehmed** bibîn Firdewsê 'al  
Bê te ey dêmşorgula bêçare bilbil ruh li bal  
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun  
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1 Ey dilberê şox û şepal lebkewşerê awirgezal  
Sîmgebgebê serwa feşal herdem ji wan mijganê al  
Agir didî nêv cerg û bal lê hildikî badê şimal  
Pê werdikî gaza zelal yek car te ez xistim ji hal  
Tenha gerîb û bêheval şohtim li 'erdê gurbetê

Ger di heşrê **Heyderî Ehmed** bibîn Firdewsê 'al

8a nabadîd] nabadîl NMMÇ.

10a Kutah bitin destê nemam] kutahê bitin destê gam NMMÇ.

1b mijganê al] mijgan û al NMDH.

Bê te ey dêmsorgula bêçare bilbil ruħ li bal  
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

- 2 Serwa qedê qametşêrîn perdê ji mabeynê hilîn  
Sergeşte 'ê xalan bibîn çend dağ û şîş in çend birîn  
Gem bûne lê cerd û kemîn vê ra diken çeng û qêrîn  
Firyad û efgan û enîn lew jê dibarin an û hîn  
Ev muhbet û 'eşq û evîn nar in dibînim hîrquetê

Ger di heşrê **Heyderî Eħmed** bibîn Firdewsê 'al  
Bê te ey dêmsorgula bêçare bilbil ruħ li bal  
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

**r. 92**

- 3 Horek ji husnê kamil î nûrek ji ba xwe nazil î  
Qamet ji rengê şorgul î her meh bi şewqa sunbul î  
Hûbba te kir derya kelî namê te kir 'ezman delî  
Nîşan û xalê filfilî ateş weşandin vê dilî  
Lew her bi şewtê bilbilî gulgul ji awazê me tê

Ger di heşrê **Heyderî Eħmed** bibîn Firdewsê 'al  
Bê te ey dêmsorgula bêçare bilbil ruħ li bal  
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

- 4 Qamet elifê xweşxiram mehcubhetê Yûsif ğulam  
'Işqateşê lû' lû' peyam durdane 'ê xweş deng û nam  
Sohtim sena bedra tamam hingavtim ez mişlê Hûsam  
Hîştim di nav narê ğiram wirdê me ah in roj û şam  
Lewra 'ezîzê zûntiqam da min belaya muhbetê

Ger di heşrê **Heyderî Eħmed** bibîn Firdewsê 'al  
Bê te ey dêmsorgula bêçare bilbil ruħ li bal  
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

---

4a xiram] xuram NE, xeram NMDH.  
4a Yûsif] Yûsuf NMDH.

- 5 ‘Işqa te ez rengzer kırım şubh û mesa bedter kırım  
 Ser ta qedem kerker kırım pêçam bi çolê werkırım  
 Hâlek heye lew namirim herdem di kûra agir im  
 Mestê peyala tahir im wafir birîn û şakir im  
 Xidmetgûzîn û şabir im ta weqtê ‘eşr û firşetê

**r. 93**

Ger di heşrê **Heyderî Ehed** bibîn Firdewsê ‘al  
 Bê te ey dêmşorgula bêçare bilbil ruh li bal  
 Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

- 6 Hadî nîgehdarê te bit şam û seher yarê te bit  
 ‘Alem du‘ axwanê te bit min dil bi talanê te bit  
 ‘Aşiq bi qurbanê te bit hemwar e derbanê te bit  
 Yan dost û cîranê te bit mexmûr û sukranê te bit  
 Yexsîr di zindanê te bit da’îm bikêşit zehmetê

Ger di heşrê **Heyderî Ehed** bibîn Firdewsê ‘al  
 Bê te ey dêmşorgula bêçare bilbil ruh li bal  
 Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

- 7 Xemla mubarek kar bike dîsan li bejnê bar bike  
 Manendê nûr û nar bike ‘aşiq ji nû hişyar bike  
 Nezdîkê rûyê yar bike dagê li cergan sar bike  
 Cerhê di kûr tîmar bike medhûş û mest û har bike  
 Bêhnek bi ser da xwar bike zulfê li dora cubhetê

Ger di heşrê **Heyderî Ehed** bibîn Firdewsê ‘al  
 Bê te ey dêmşorgula bêçare bilbil ruh li bal  
 Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal

**78.**

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilun

Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . -

**r. 94**

- 1 Ez ji eqlîman bi der xistim firaqa zor û tal

Dê heta kengê ji min bêtin Xudaya nale nal

*Ha ena mîttu gerîben meqsedî ey ma heşel  
Heysu`l-emru kezalîk ey şeha keyfe ihtîmal<sup>181</sup>*

Deftera husna hebîban her seher dersa min e  
Ayeta zulfan dema tê zer dibim mişlê hilal

Her bi sextê tîn diborin dem û dewranê di min  
Yek nefes bêgem nedîdem hem nebû carek wişal

5 Bêhebîb û yar û mûnis mam di nêv xelqê gerîb  
*Dilberem eşla negûyed ey cegerxûn çist hal<sup>182</sup>*

Baîinê ‘ işqê helandim gerçî zahir narî nist  
Keşf û teftîşek nekir dêmşorgula awir gezal

Çengelê ‘ işqê revandin rohaniya çavê di min  
Bê beşer şewka evînê kor e hiştim kerr û lal

Min ji fikra zulf û xalan ‘ eqlê millet berze kir  
Ez ditirsim ji hilaka dîn çikim ba mulk û mal

Ger ji qebrê rabin Loqman li min bit aşîkar  
Hezretê ‘ Îsa digel bêtin bi min nîn in mecal

10 Lew ji tîra muhbetê baîin dinalim ‘ aşiq im  
Nagihê destê hekîman lê nehên keys û feşal

Ah û nalê **Heyderî** ‘ alem ji ber sewda ser in  
**Ehmedî** perwaneweş sohtin bi şem‘ ê per û bal

---

<sup>181</sup> Aha! Bêyî ku meqseda min bê cih, ez bi belengazî mirim.  
Dema ku hal jî wiha be dê ihtîmalê (encam) çawa be, ey şeha!

<sup>182</sup> Dilbera min qet nabêje, ey cîgerxûn halê te çi ye?

79.

fa<sup>˘</sup>ilatun / fa<sup>˘</sup>ilatun / fa<sup>˘</sup>ilatun / fa<sup>˘</sup>ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

r. 95

Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê Layezel  
 ˘ Alimê geyb û şehadet padîşahê Zû`l-celal

- 1 Tu keremkarê hemîşe ekrem î Yezdan î Tu  
 Z`l-hekem kana ˘ eṭa û cûd î lew Hënnan î Tu  
 Luṭf û îhsan bêşumarî hadiyê Mënnan î Tu  
 Merhëmet bêhedd û payandawer û Deyyan î Tu  
 Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê layezel  
 ˘ Alimê geyb û şehadet padîşahê Zû`l-celal

Şin<sup>˘</sup> etê sultânê ecla çendî lewn in çend celeb  
 Cennet û nar û semawat û zemîn û roj û şeb  
*Kun* dema gotî *fekanû*<sup>183</sup> cumle ba emrê çeleb  
 Zahir û baṭin dizanî *wasi<sup>˘</sup> u`l-gufran* î Tu<sup>184</sup>  
 Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê layezel  
 ˘ Alimê geyb û şehadet padîşahê Zû`l-celal

Wahîd û Ferd î delîlêm *Qul huwe`l-lahû ehed*<sup>185</sup>  
 Piştî ferdanniyeta *zâtê Te Ellahu`ş-şamed*<sup>186</sup>  
*Nîst hingûf we zewalek kirdîgarê bêweled*<sup>187</sup>  
 Raḥîm û Reḥman Letîf û Şakîr û Muḥsan î Tu  
 Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê layezel  
 ˘ Alimê geyb û şehadet padîşahê Zû`l-celal

˘ Alimê surra di qelban î di ber ya bête der  
 Haḍîr î hindî mekanan bête nabin xeyr û şer

<sup>183</sup> Dema ku Got: Bibin! Ew jî bûn.

<sup>184</sup> Tu, yê ku efûkirina wî fireh e, yî.

<sup>185</sup> Bêje: Ew Xuda ku yek e. Qur'an: 112/1.

<sup>186</sup> Xuda, Samed e. Qur'an: 112/2.

<sup>187</sup> Bo Xwedayê ku ji dayîk nebûye, tu bi dawîbûn û wekhevî nîn e.

Zerreyek nabit nihanî ne di behr û ne di ber  
Bêhisab rûzê resan î an kesê dî canî Tu  
Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê layezel  
‘ Alimê geyb û şehadet padişahê Zû`l-celal

5 Çun tu rebbu`l-‘alemîn î têk dibin hukmê Te ne\*

Ṭa‘et û hemd û şena her la`îqê zatê Te ne  
Şeş cihat mecmû‘ê ‘alem neqş û nîşanê Te ne  
Haḍîr û ga`îb dibînî lem yezel Sultan î Tu  
Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê layezel  
‘ Alimê geyb û şehadet padişahê Zû`l-celal

Qadir û Ferd û Weḥîd Hadîşifat û Eḥed in  
Man di weşfê Te muḥeyyer çi hisab û ‘eded in  
Qedre pût û şeneman ew jî ji şewqa şemed in  
Çaresazê cinn û însan merḥemetefşan î Tu  
Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê layezel  
‘ Alimê geyb û şehadet padişahê Zû`l-celal

**Eḥmedî** bad û muhacir ma ji ewṭanan cuda  
**Ḥeyderîyê** bênewa pir ah û eḡgan û nîda  
Bêkes û han û mededha raciye ‘efwa Xuda  
Muhriḥban û karîdan î luṭfê bêpayan î Tu  
Ey qedîmê bênihayet wey Îlahê layezel  
‘ Alimê geyb û şehadet padişahê Zû`l-celal

### 80.\*

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel - . - - / - . - - / - . -

- 1 Ez nizanim vê mu‘emma`ê ji bin  
Te bi xortî ez kirim yexsîr û dîl  
Ma çi bû sûc û xeṭatîne di min

\* Ji vir şûn de, dûmahîka helbestê di NMyê de nîn e (anku ev rûpel wenda ye).

\* Ev helbest jî, di NMyê de tune ye.

Te di vê ‘erdê gerîb hîştîm zelîl

Xeste ‘ê qedda mu‘enberkakul im  
Hem ji ber şem‘a te bêçeng û mil im  
Ez ji wan çêşmê te ê reş bêdil im  
Mitt û hicran jar û pir hemm û xecîl

*Hel lena mîn weşlikum yewmen nesîb<sup>188</sup>*

Pir makedder bum ji ber vê ya hebîb  
Lew ji qelb û mîlekan bûme kebîb  
‘Alemek bêhiş kirin zar û ‘elîl

Rehmî kun ber bêhiş û sukranê ‘îşq  
Lê seraser ten wekî buryanê ‘îşq  
Bêje min ey rehnuma dermanê ‘îşq  
Înnenî şexş û gerîbun hem rezîl

- 5 Yek ji wan xalê te ger ‘alem bibîn  
Dê bibin Mecnûn û Ferhadê Şêrîn  
Ez bixwe nadim bi eflak û zemîn  
Ne bi firdews û bi xuldê selsebîl

Ger ‘efû bim ez di roja meşerê  
Heq bi min de ‘Edn û Hewzê Kewşerê  
Ez li nik xwe ger nebînim dilberê  
Bêxîlaf nar e bi min ‘Edna Celîl

Ger bibînim ez di narê dojhê  
Şed celeb bîm e ‘ezab roj û mehê  
Bête der husn û cemala te şehê  
Dê li ser min bit wekî narê xelîl

Çun wefa bim ba bi ser turba me wer

<sup>188</sup> Gelo, gihêştina we dê rojekî nesîb be?

8a Çun wefa bim ba bi ser turba me wer] Çun defa bim ta bi ser turba me wer NMMÇ.

Dûd û dûxan dê ji qebrêm bête der  
Da li ser min şehd e bê 'ışqa te her  
Piştî mewtê jî kırım zeyt û fetîl

- 9 **Heyderî Ehemed** di ber roja elest  
Ef' iyê 'ışqa te lê dil girt û gest  
Lew niha şam û seher hişyar û mest  
Ah û efgan in digel şed qal û qîl

**81.**

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun  
Remel - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

**r. 97**

- 1 Şagera 'ışqê di keffê saqî der şubha ezel  
Min ji ser destan hilanî noşî kir mişlê 'esel  
  
Fehmê dayî' bû di gavê mest û mexmûr im henûz  
Ta ebed har û xirab e dilezan fincan û mel  
  
Dem bi dem manendê ateş min ji ser ta pê disoj  
Tîr û mizraqê di 'ışqê hilweşandim en eqel  
  
Dîn û ebter bûm ji 'ışqa dêmgula qametelîf  
Çare'ê nakin bi min şed şîret û pend û meşel
- 5 Belkî ev husn û cemal bûn Şeyxê Şen'anî ku dî  
Şeml û seccade bi mey dan ta bi meqşûdê weşel  
  
Şedhezar manendê Şeyxî zulf û xalê dilberan  
Ew ji mizgeftan revandin birne ser dînê hubel  
  
Xusrewê xûban î 'alem murwetek îzharî kerd  
Ez di fermanê nivîsim bende'ê dergahê yel



Zîr û balayê me sohtin hesreta dîdarê yar  
Lew li cerhê min dewane beyt û ev şêrîn gezel

Şerbeta şafî dinoşim ez ji le' leynê tenik  
Dil dikim amancê tîran ber didem burca hemel

10 Her ji burca muşteriyê tîr û şimşîr û durexş  
Tên li canê min peyapey eşkera *beyne`l-mîlel*<sup>189</sup>

Top û mêtralosê ' işqê ez vejendim baţinî  
El-meded Şahê Buxara bazê Geylanî digel

Hilkirin bazê fîraqê per û palê **Heyderî**  
**Ehmedê** jar û muhacir dest û pa lê bûne şel

## 82.

mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun / mefa' îlun  
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

## r. 98

1 Çi xûrşîd tel' etek min dî muqabil ez munewwer bûm  
Di piştî sa' etek min dî gerîqê abê kewşer bûm

Bi ferqa qulzema rehmet bi weşla meclîsa şoşbet  
Hezar şukr û hezar minnet celîsê textê qeyşer bûm

Hezaran şukrê yezdanî me gul dî der gulistanî  
Ji min dil bir bi talanî dexîlê berkê eşmer bûm

Bi serxoşî wekî bilbil me bûsî gunceya şorgul  
Mufferreh bûm bi kamê dil şehînşahê muzeffar bûm

5 Dema min dêmê enwer dî ji le' lan şehd û şekker dî  
Şu' a' a sems û xawer dî gulamê qeddê ' er' er bûm

---

<sup>189</sup> Navneteweyî.

Ji ‘ işq û muhbet û meylê dikêşim ah û waweylê  
Wekî Mecnûn ji bo Leylê di kûh û wadiyan werbûm

Li kuh û wadî yû deştê meh û salan dikim geştê  
Ji şûntîran dem a reş tê bi tîgê firqetê ker bûm

Ji destê firqetê xişt in peyapey hatin em kuştin  
Ji yar û hogîran hiştim di ‘ erdê gurbetê zer bûm

Bi ruxzerdî yû pir alam bi dîlzexmî yû bê aram  
Di tehrîrê nifûsê ‘ am di defter da muherrer bûm

10 Ji wê rojê ve ez mest im çû perwane çira qeşd im  
Du reşmarê gedar gestim qetîlek bêser û ber bûm

Ela ya **Heyderî** rabe şeyyeahê şehîr û gunda be  
Cihan gîrdab û dolab e dibê **Ehmed** mukedder bûm

### 83.

mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 99

1 Îro li min kin şîretê rencûr û şeyda ’ê dil em  
Ez dê çî bêjim qîşsetê bê<sup>ç</sup> eql û sewda ’ê dil em

Bêfehîm û sewdayim henûz mest im ji cama sînesûz  
Çend mah û sal in çendî rûz bêweş li ber ba ’ê dil em

Ba ’ê evînê her seher têtin digel coş û huner  
Lew ez dinalim bêmefer talan û yegma ’ê dil em

Serwa sehê talan kirim şewqa mehê nalan kirim  
Şohtim ji şehbalan kirim lerezende ’ê ta ’ê dil em

---

10a qeşd im] qeşt im NMDH, mest im NMMÇ.

- 5 Ta'ê ji 'işqa dilberê ba'ê ji burca xawerî  
Teşbihê narê mecmerê sohtin heçî ma'ê dil em
- Sohtin li min qelb û cîger hicra bi xewf û pir xeter  
Zecra evînê hate ser lew her di gewga'ê dil em
- Lew her dikem ceng û qêrîn ba çeşmê ter şedrê birîn  
Durra di qelbê min şêrîn quţ kir bi xef ra'ê dil em
- Durra ji kenza Kirdîgar muhra bi şewq û şu'ledar  
Husna li bal girtim şikar berdame derya'ê dil em
- Husn û cemalek lê heye ser ta qedem wek şûşe ye  
Nûr û şu'a'ê û şu'le ye Loqman û 'Isa'ê dil em
- 10 Çibkim bi Loqmanê Hekîm şêşed wekî Mûse'l-Kelîm  
Lew merhema qelbê du nîm derdestê mewla'ê dil em
- Gerçî tu **Ehmed Heyderî** îro gerîb û kemter î  
Lêkin bi cama gewherî sulţan û Darayê dil em

#### 84.

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun

Hezec --·/· ---·/· ---·/· ---·/· ---

#### r. 100

- 1 Îsmê te ye her şam û seher wirdê zeban im  
Hubba te li min daye ku Mecnûnê zeman im
- 'Işqa te çi geddar e hinavê me dişojit  
Başin dikelit dûd e bi der tê ji dihanim
- Wirdeynê te bilbil dane ber top û tifingan  
Lew bêhiş û sergeşte û talanê gulan im

---

8a bi şewq û şu'ledar] li şewqa şu'ledar NMDH.

Husna te ye mişqalek di xûrşîd û mehan da  
Şewqa te ye cuzba ku sehergahan di can im

- 5 Nûra te ye feyyadê bila çûn jê bîna kir  
lewî û qelem û kursî yû hem 'erşê xudan im

Lewlake di heqqê te yeqînbarê Xuda got  
Eflak û zemîn dane te ey ruh û rewan`m

Dûr im ji cemala te yeqîn bêşebr û qerar im  
Ruhê m be fida`ê xakê ber pa`ê tu xan im

Yek tab e ji zulfê te yed û payê me best in  
Pabeste û gerîb mame di hebsê da nîhan im

Qurbana du çeşmê te ê şehla`ê belek bim  
Mînet bike şexsê me binasî ku filan im

- 10 E`za`ê me tîrê te ji xûnê neqqîşandin  
Rehmetke li Qîtmîrê xwe jar û netuwan im

Gerçî luqeb û navê me **Ehmed Heyderî** ne  
Kelbê li derê zana emîrê du cihan im

### 85.

mustef` ilun / mustef` ilun / mustef` ilun / mustef` ilun

Recez --- -- / --- -- / --- -- / --- --

### r. 101

- 1 Dîsan çî behs û maden e ser ta qedem wek ateş im  
Çend sûx û xeş`ê min hene gerqê di nêv xûn a reş im

Gerq im di xûn a şor û zer ew dilberê şêrînzezer

---

3b sergeşte û] sergeşte`ê NMMÇ.

7b be] bi NMDH.

11a luqeb] leqeb NMDH.

Tîr dane qewsan hate der bêşek ji ber vê serxweş im

Serxoş kirim bê ‘eql û tab hiştîm di nav zecr û ‘etab  
*Yaleytenî kuntu turab*<sup>190</sup> wellah bi van derdan reş im

Sergeşte ’ê derdê dil em efğankeşê wek bilbil em  
Dermande ’ê ‘işqa gul em dîwane ’ê wîrda geş im

- 5 Dermandeyim mişlê semek nalîn ji min çûne felek  
Şed heyf ji wan çavê belek dûr im ji hicrê bêweş im

Çavê di reş qewsê hîlal zulfê sema bedra zelal  
Li rast û çep wîrdê di al yek yek dîkin celba hiş im

Yek yek dîkin ceng û qêrîn em ‘a û cergê min birrîn  
Ruh û rewanê min firîn evreng ez zehmetkeş im

Ruhê me bir bêqal û ceng bêtop û mizraq û tifeng  
Wêran kirim bêşewt û deng bênuţq û reftar û meş im

Bênuţq û aram û sukûn qelbê kesîr çeşmê bi xûn  
‘İşqê welê reşkir derûn mestê peyala bêgeş im

- 10 Zerrîn peyala mey ji nar weqtê seher ez ‘işqê yar  
Derhal me noşî şehdê war lew dil niha çar û şeş im

Lew dil niha bû deh kerî durra cîhan lê muşterî  
Qêrek bi xef da **Heyderî Ehed** ev e wec ‘a leş im

---

<sup>190</sup> Xwezî ez ax bibûma! Qur’an: 77/40.

1a behs] bi husn NMMÇ.

7b evreng] efreng NM, NMMÇ.

9b ‘İşqê welê reşkir derûn] ‘İşqê li min reşkir derûn NMDH.

86.

fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilatun / fa<sup>ˆ</sup>ilun

Remel - . - . - - / - . - . - - / - . - . - - / - . - -

r. 102

- 1 H̄emdu l̄illah min heye yek dilberek <sup>ˆ</sup>enberşemîm  
Çeşmê şehla zulfê mişkîn hey diket <sup>ˆ</sup>ezmê remîm

Zerreyek husna şepalê bête ser ruyê zemîn

Dê cîhan çêbit seraser Cennetu`l-<sup>ˆ</sup>Edn û Ne<sup>ˆ</sup>îm

Cenetu`l-Firdewsê baqê xuld û me`wa`ê di heq

Ew li ser min dojeh in bê Ru`yeta Yarê H̄elîm

Zehr û sîma <sup>ˆ</sup>enberîn e mişkbûy sîmîn e ten

Şehriyarê şehdê xendan merhema cergê du nîm

- 5 Xusrewê Fegfûr û Xaqan Qeyşer û Noşîrewan  
Kole û lala û derbanên ji ezmanê qedîm

Cubhet û dêma mu<sup>ˆ</sup>enber qedd û balayê <sup>ˆ</sup>ezîz

Şedhezar Yûsif gulamên bê<sup>ˆ</sup>eded Mûse`l-Kelîm

Tîr û şimşîrê firaqê ez kirim zîr û zeber

Cism û canê min neman lê mewzî<sup>ˆ</sup>ê mûyek selîm

Sa<sup>ˆ</sup>eta min têne bîrê şorgula qamethêrîr

Ez dibêjim qafê ta qafê li ser min bû ceħîm

Ez ji ber fikr û xiyalê zulf û xalê <sup>ˆ</sup>enberîn

Her dibînim van cefahan sîmma weqtê nesîm

---

1a H̄emdu] H̄emdun NMDH.

2b hey diket] hey kirî NMDH.

4a mişkbûy] mişkê bûy NMDH.

9a ji] di NMMÇ.

9a <sup>ˆ</sup>enberîn] <sup>ˆ</sup>enberî NMMÇ.

- 10 Min ji ' iŝqa dilberê camek ŝeraba ateŝê  
*Qed tewekkeltû ' ela`l-lahî noŝî kir bêtirs û bîm*

Belkî derman bit li cerhê **H**eyderfîyê dilkebab  
Derd û dağê hicretê **E**hmed dinalit jê muqîm

### 87.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

### r. 103

- 1 Fehm û ' eqlê min belav kir pertewa bedra tamam  
Ah û efğan da ji min bêtin heta yewmu`l-qiyam

Rast û çep hîştîm di xûnê bêxeta û bêsebeb  
Min nezanî şahê rindan kuştina min bû meram

Şems û uxtêr bûn li burcan yan du ŝorgul bûn gelo  
Geş kirin ŝikl û feŝalê xusrewê ŝêrîngulam

Xusrewê xûban bi xef berdan ji qewseynan du tîr  
Yek li sînem yek li dil da rohniya min kir zulam

- 5 Her li burca muŝterî yî hâzîr in cohtek esed  
Lew ji tirs û heybetan ' alem li ber çêŝmê gumam

Piŝtî van cewr û cefahan ey gelo furŝet heye  
Ez muzeffer bim bi kamê dil hilînim întîqam

Ez der ağûŝ û hemêz kim rast û çep qeda herîr  
Dest û lîngan têr bibûsim bêhn bikim wîrda humam

---

9b cefahan sîmma] cefayan sîtema NMDH.

1b bêtin] bêhtin NMMÇ.

6a cewr] cûd NMMÇ.

7a Ez der ağûŝ û hemêz kim] ez diragûŝ û hemêz kim NMDH.

7b bikim] bikem NM.

Min ne sūc û ne xeṭa bûn ez di ḥalê gefletê  
Dame ber cohtê xedengan şox û şengê xoşxuram

Lew bi mişlê nay û çengê qêr û firyadê di min  
Çûn gehêştin erşê e'la geh bi roj û geh bi şam

10 Şubḥ û şaman meṭleba min bû ji yarê weşletek  
Ḥîrçetek da min hebîbê hem li dil cohtek sîham

Herkesî carek bibîne dê ji rengê **Ḥeyderî**  
**Eḥmedî** rencûr û sergerdanê xwe lê bit heram

### 88.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun  
Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . -

### r. 104

Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin  
Ez dexîlê babê Ellah im digel sūcê mezin

1 Min beden zahir we baṭîn têk ji curman kirye bar  
Min di bin barê giran eşla nehên şebr û qîrar  
Ez nizamim çend hezar in yan şîgar û yan kubar  
Tûlekî pir 'eybdar im lew dikêşim ah û zar  
Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin  
Ez dexîlê babê Ellah im digel sūcê mezin

Kelbekî pir 'eyb û pîs im mullîs û bednam im ez  
Baṭînê fi'lê xirab in eşkera îmam im ez  
Dûr û meḥrûm im ji ya qenc ya neçêbit ram im ez  
Zerreyek na'ête fikra min se'îra dîn û har

---

8b xuram] xeram NMDH.

11b sergerdan] sergirdan NM.

1a kirye] girte NMDH, girtiye NMMÇ.

1c kubar] kibar NMDH.

2b xirab in] xerab im NMMÇ.



Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin  
Ez dexîlê babê Ellah im digel sûcê mezin

Deftera min va ji sûcan yek qelem rê nîne lê  
Hem *Kirami`l-Katibîn*<sup>191</sup> jî min kirin behra belê  
Min dem û dewran biwartin her di van şolê nelê  
Ah û ah hetta wefa bim ta bi ‘uqba’ê hewar  
Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin  
Ez dexîlê babê Ellah im digel sûcê mezin

‘ Alim im zenbê keba’îr min ji dehşed zêde ne  
Ê şega’îr pê nizanim ma êdî hejmar hene  
Min dema ewwel dizanî duşmenê canê min e  
Dê çewabit halê min ey Padişahê Kirdîgar  
Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin  
Ez dexîlê babê Ellah im digel sûcê mezin

**r. 105**

- 5 Wawêweyla min telef kir can ef’ alê xirab  
Xwezuya ez weqtê ji da’ê ra dibûm bûma turab  
Min nehên taqet di dojê da şedîd bême ‘ezab  
Ez ji kerban mest û gêj im şubh û şaman bêqirar  
Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin  
Ez dexîlê babê Ellah im digel sûcê mezin

Roj û şev şermende mame ez ji van fi’lê nepak  
Mexzenê tiştê qebîh im şerim nakim hem efak  
Hem di destê nefis û şeytanî esîr im sîneçak  
Lew perîşan û xecîl im rûsiyah im şermîsar  
Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin

---

<sup>191</sup> Şiklê ku di Qur’an`ê de derbas dibe wiha ye: Kîramen katîbîn. Qur’an: 82/11.

4a ‘alim im] ‘alim em NM.

4c duşmenê] duşminê NMMÇ.

4d Kirdîgar] Girdîgar NMDH, NMMÇ.

6b şerim] şermê NMDH.

6c sîneçak] sînepak NMDH.

6d şermîsar] şermesar NM.

Ez dexîlê babê Ellah im digel sûcê mezin

Şedhezâr êş û elem çêbûn li canê **Heyderî**  
Hin ji destê hicretê hin gurbeta wek agirî  
**Ehmedî** pir hemm û gem fehm û 'eqil winda kirî  
Ma di bin emrê gerîban bêhebîb û dost û yar  
Ey Xudawendê semawat û zemîn û îns û cin  
Ez dexîlê babê Ellah im digel sûcê mezin

**89.**

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun  
Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . - -

- 1 Ey şehê serwê qedan padîşehê sîmîtenan  
Xusrewê bagê cemalê şahê şekkerdihenan

Rast e herdu nezerê çeşmê te tîr û teber in  
Lêki hîfza xwe bike ez ahê efğançekenan

Ez di fi'1 û gotinan bende'ê pîranê xwe me  
Lew dikim ruh bi fida'î xakê pa bûysîmenan

**r. 106**

Kes nebînit elem û cewr û cefa'ê dikeşim  
Ji leîfîfanê şerîn xwe nazik û bêşemenan

- 5 Ez ji te'sîratê 'îşqa te seraser agir im  
Va bi dest û pa ketim berda bêlû'lû'suxenan

Cerg û navê me ji kalînê fîraqê herrişîn  
Dil bi cokanê hewayê şahê zerrînzûqenan

Ne ji ber kerb û meraqa herdu ruxsarê te bit  
Me çi hacet ku biçirpînînin kulîlkê çîmenan

Şorgul û reyhan sinbil û şoşînê Bagê Îrem

---

1a sîmîtenan] sîmtenan NMMC.

Qedirdar in ji cemala qeddê mişkên bedenan

‘Enber û misk û gulavan çi feqîr û rebenin

Tozê ber pê Feresî sulţanê gerdensîkenan

- 10 Em ji ber tîrê firaqa te bi ah û esef in  
Eşkê xûn têtin ji çavê me bi cama sihenan

**Heyderî Ehed** ji ‘işqa dêmduwê ebr û hîlal

Bûye derwêş û şeyyahê Hind û Şam û Yemenan

### 90.

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilun

Remel - . - - / - . - - / - . -

- 1 Ger emir kî ji derê min vezerin  
Ka cihê em bînewa pêda herin

Ne ji feql û kerema zatê te bit

Em bixwe bêcan û zîr û zeber in

### r. 107

Ji ezel ta bi ebed padîşehê

Şah û sulţan û emîr û xakê ser in

Mah û xûrşîd in digel çerxa sema

Bi cemala te şeb û ro digerin

- 5 Ji kemala te du ‘alem kemilîn  
Me ne ‘ilm û ne ‘emel bêbeşer in

Cinn û îns û melek û hîr û perî

Ne bi îlhama te bit lal û ker in

Dê şikayet kim ji geyrê te bikî

Tu dizanî ji çi çeşmê me ter in

---

9b tozê] toza NMDH, nûrê NMMÇ.

1a Ger emir kî] Ger emir key NM.

Hem ji bil vê qîşseta dûr û diraz  
Em ji 'îşqê bêmekan û meqer in

Em bi de' wa vê evînê nehiş in  
Ah û efganê me şam û seher in

10 Min ji mehbûbê wişalek teleb e  
Lewma her naz û niyaz û keser in

Çav li îhsana te ye sal û mehan  
**Heyderî Ehed** ji hicranê zer in

### 91.

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 108

1 Qelb û cîger anîne xwar dîsan xiyalê dilberan  
Îro seher teşbîhê nar sohtim ji çeng û şehperan

Sohtim wekî narê seqer 'îşqê bi sextî kir eşer  
Mecnûnşifet hîştim bi der zecr û 'îtabê esmeran

Ev reng e kir zecr û 'îtab serwa qedê alîcenab  
Lew şubhetê çeng û ribab têtin fîganê ebteran

Efgan û firyadê di kûr têtin ji firqa şe' b û dûr  
Bêbejn û bala sadenûr çibkim bi 'edn û kewşeran

5 Serdane hewzê kewşerê zulfê li dora uxterê  
Nadim bi text û kîşwerê Fegfûr û rah û Qeyşeran

Sed Qeyşer û Xaqan tamam durdaneya durrên peyam

---

10a teleb e] telbe ye NMDH, NMMÇ.

1a xwar] xar NM.

3a serwa qedê] serwê qeda NMDH.

Girtin bi zagon û nîzam kuştin bi derbê xenceran

Girtim bi çengala hesin bestim li dîwana mezin  
Cewr û 'ezabek da bi min na'ête hedd û defteran

Na'ê hesab û defterê zecra ji 'işqa dilberê  
Hetta bi roja meşerê hîştim li ber dar û beran

Hetta qiyama sa'etê berdame behra hîrquetê  
Ez dê bi kî kim şikyetê ey dost û yar û hemseran

10 Ey dost û yaranê di min ev reqş û dewranê di min  
Eşkê çû baranê di min têtin ji dest neyşekeran

Şekkerzebanê dur di dev da **Heyderî** 'işqek bi xef  
Lew **Ehmedî** şedrê hedef da ber cirîd û nişteran

## 92.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . . -

### r. 109

Ellah Ellah çi xedeng in ku di qewsan 'edilandin

Ev çi top û çi tifeng in em ji xûnê xemilandin

Çi beter şam û seher weqt û zemanê me diborin

Tîr û çokanê firengî em bi şiklan bedilandin

Kê dizanit ku hewalê me gerîban weh xirab in

Mislê heddadê hehdêdê ku bi kûrî veşelandin

Dûriya zâtê nîgarî agirek da cîgerê min

Bû li min şubhê se'îrî dil û navê me kelandin

5 Naziyê şeyda hebîbê dem bi dem coş û xurûş in  
Tête gulzarê gerîban zağ û qumrî jê qelandin

Nazikê ebr û hilalqerqef meya ‘ışqê ‘eyan kir  
Mişlê derwêş û defê şofi bi cuzbê re‘ilandin

Cuzbeya ‘ışqê li min da fehm û ‘eqlê min belav bûn  
Şewt û zariyê di min îns û cenawir xecilandin

Çeşm û ruxsarê şêrnî çi dema tête xiyalê  
Ez dibêjim xişt û şimşîran dilê min heşilandin

Gerçî ez dûrim ji yarê lêki der ‘eynê yeqîn im  
Her seher topê şerabnîr de li ser min wekilandin

10 Na’ête hedd û hisabê te‘ b û cewra hicreta min  
Min bi şeyyahî alaj kir Wan û Mardîn feşilandin

Dağ û derdê **Heyderî Eħmed** di ber roja elest in  
Lew niha eħbab û hemser min bi qêran beşilandin

### 93.

mef‘ûlu / mefa‘îlu / mefa‘îlu / fe‘ûlun / mef‘ûlu / fe‘ûlun

Hezec --·/·----/·----/·---/---·/·---

### r. 110

1 Peyweste lebaleb dil ji gem sînebirîn im ey kehfê feqîran  
We ez heşretê çeşman tu hemware hezîn im her lehze û her an

Ez rûzê firaqê ta bi îr rûzê ‘eyan im Mecnûnê zeman im  
‘Eqlê me belav e lêki der ‘eynê yeqîn im dil bûye du nîman

Mişlê me xuya nabin di eqlîman û emlak rencûr û zexmînak

---

7a ‘eqlê min] ‘eqla min NMMÇ.

10b Wan] dan NMMÇ.

1a kehfê] kehf û NMMÇ.

Bi Ellahî ji hicra te hetta îro dibînîm gewğan û ‘ecîban

Her şam û seher taze ne cerh û elemê min her derd û gemê min  
Ez nabim mufereh ger di hukmê xwe bibînîm emlakê Suleyman

- 5 Sînem du xedengê cohtê qewseynê te ker kir weqtê te nezer kir  
Der rûniştin û reftar û guftarê xwe dînim zîn zexmê bi êşan

Dil şohtiyê hicra qedd û reftarê tu yim ez gemxwarê tu yim ez  
Sewda’ê du le‘ leynê bi guftarê şêrîn im ba ah û enînan

**r. 111**

Xeddeynê çû şorgul çi dema tîne xiyalê qewseynê hilalê  
Mijganê sîyeh davêjne cergê bi birîn im şed tîrê bînîşan

Manendê me bisyar û ji hicra te ‘elîl in pir derd û zêlîl in  
Lê ez bi tenê uftade’ê ‘îşq û evîn im der damê hebîban

Hêstir wekî baranê ji çavê me dibarin derdê me hezar in  
Piştî te bi şeyyahî li ser ruyê zemîn im ey mehruyê zîşan

- 10 Perwane’ê per şohtî me ez mame di gurbet der ateşê firqet  
Têkil el-eman firyad û ahan dikeşînim sergeşte û heyran

Medhûş û cunûnê hê jî mehbûban dinasî ey **Ehmedê** ‘aşî  
Ya **Heyderî** dê cerhan li qelbê te vejînim lew min daye peyman

**94.**

fe‘îlatun / fe‘îlatun / fe‘îlatun / fe‘îlatun

Remel · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

- 1 Heyata **Heyderî Ehmed** bi qurban bit di dareynan  
Ji bo wan kakulê eswed du ebrû çêşm û wirdeynan

---

4a şam û seher] seher û şam NMMÇ.

6a tu yim] tu yem NE, NMDH.

6b ba] bi NMDH.

8a bîsyar] pîsyar NE, NMDH.

Xeyala şorgulê taze li bilbil agir û gaz e  
Hero\* firyad û awaz e dişojit qelb û cergeynan

**r. 112**

Dil û cergan ezê ker kim peyanek xwê li ser werkim  
‘Elîl û bêser û ber kim ji ‘işqa zulf û xeddeynan

Ji ber ‘işqa seherzendê me dil pêket wekî fendê  
Ketim daba xeberqendê bi dest û cîd û ricleynan

- 5 Ji dest û pa kirim beste gerîb û bêkes û xeste  
Emîr e zor e serdest e kirim amancê qewseynan

Bi reş qewsan kirim tayê dikêşim wayêweylayê  
Bi efğanê me kes nayê birîndar im ji şeffeynan

Ji şeffeynan hezîn mame cunûn û fehmê winda me  
Esîrê mahê rinda me biraştim ‘eyn û lameynan

Bi le‘ leynê şekerxa ye sîmenbûy û dilara ye  
Leţîf û şox û zîba ye ‘ezîz û nûrê çeşmeynan

‘Ezîz û nazîdarê min şepal û şehriyarê min  
Ew e şebr û qîrarê min di dareyn û meqameynan

- 10 Ew e şebr û tebata min ew e ruh û heyata min  
Girîftar im necata min tîlsim e wê di desteynan

Ji destan **Heyderî** bend e di linga qeyd û peywend e  
Çewan **Ehmed** dibit zende di narê beyne nûreynan

---

\* Hero: her roj.

4a fendê] findê NMMÇ.



95.

fe' îlatun / fe' îlatun / fe' îlatun / fe' îlatun

Remel · ---- / · ---- / · ---- / · ----

r. 113

- 1 Bi derba hicretê îro *şodem pejmurde*<sup>192</sup> hale`l-llah  
Di semtê gurbetê îro de`îf im çun hîlale`l-llah

*Te`essuf mikonem hergah kî abê gurbetê çun niş*  
*Derûnim tar û mar kerde qedem manendî dale`l-llah*<sup>193</sup>

Ji kerbê te` nê naqencan dikim nefsê hilak kim ez  
Ditirsim min bikey ruswa bi an qetl û webale`l-llah

Derên tofan û girdabê muqîmê dest û pabend im  
Welê sa`et bi sa`et ez dibim wafir xiyale`l-llah

- 5 Bi heqq û hürmetê xod ya Îlahî kafe`ê mexlûq  
Gerîb im bêkes im ya reb bidey min kamê bale`l-llah

Ji bêkamê çi ruxzêrd im çi gemgîn û zêrermend im  
Hêbîbek îxtiyar kerdim ji nûra zu`l-celale`llah

Ji nûra lemyezel zat e şifet Darayê` Alemgîr  
Bi nar û nûrê zehrayê me şohtin çeng û bale`l-llah

Seraser nûrîendam e ji reşqewsan dibarin tîr  
Me dil girt û sîper da pêş meded ey bêzewale`l-llah

Ji seţhê cubhetta beyda durexşan ez kirim medhûş  
Mûqîm teşbîhê gowînê ji min tîn ah û nale`l-llah

---

<sup>192</sup> Pejmurde bûme.

<sup>193</sup> Herwext ez teesuf dikim ku ava xurbetê wekî sitrî  
Dil û hinavê min tarûmar kiriye, bejna min jî weke “dal”ê ye (xwar) wellah.

3a dikim] dikem NM.

10 Letîf û şox û rind a min zerîf û qedbilind a min  
Çira û mûm û find a min sena rast û şîmale`l-llah

Xedengê firqeta yarê di gûrbet da kirim yexsîr  
Nexaşma ateşê hicrê *‘ezabem kerde tale`l-llah*<sup>194</sup>

Bikêşe **Heyderî** şebrê ku *mîftahu`l-ferec*<sup>195</sup> şebr e  
Di piştê *‘usrî yusran*<sup>196</sup> her dişînit bêmişale`l-llah

## 96.

fa`ilatun / fa`ilatun / fa`ilatun / fa`ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

### r. 114

1 Ey şehînsah ez di Beriya Hicretê dilxeste me  
Hem ji wê rojê heta îro ji te şermende me

Şermîsar û sernîgon im rûreş û mehcûb im ez  
Pir xecîl û ustûxar im va li ber sûcê xwe me

Ger li sûcê min nezer kî dê li ser min bit ceħîm  
Wus`eta ruyê cihanê lew ji heddê zêde me

Ez di gîrdaba teheyyur da dibînim mame gerq  
Bêhewar û bêmeded çûn masiyê dermande me

5 Çav li îhsana te yim ey menbe`ê cûd û kerem  
Gerçî bedxûh û xirab im seg li dergahê te me

Min be bêkamî ji ber dergahê `alî red mekin  
Mişlê murgê ez bera`ê dane`ê candade me

---

<sup>194</sup> Wellahî! Ezabê min tal kiriye.

<sup>195</sup> Mifteya xelasiyê.

<sup>196</sup> Dijwarî, asanî. Quran: 94/5-6.

Şedhezâr camê binoşim ez ji ava kewşerê  
Bê bi destê te`y mubarek dilkul û lebteşne me

Dê çikim ba xuld û `edna bêfurûgê ruyê tu  
Hor û wildanê gulendam ez ji wan sergeşte me

Qeţ nehên sekn û tebatek serxoş im roj û şevan  
Her ji `işqa şorgulan wek bilbilê xweşnegme me

10 Negme û awazê `işq im `alemek dîwane kir  
Lew şehergahan di destek cam û destek bade me

Badeya narîn dinoşim ez ji `işqa gulruxan  
**Heyderî Ehemed** muqîmê lew cunûn û sersem e

### 97.

fa` ilatun / fa` ilatun / fa` ilatun / fa` ilatun  
Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . - -

#### r. 115

1 Ê nebêtin lê bidayet ma nihayet lê heyê  
Mustemend im yek `inayet min şev û ro telbe ye

Qulzema lebrîz nemaye em dibînin eşkera ye  
Ê ku qitrek pê gihaye ta ebed ew zende ye

Ew dibit `eynê şifa `ê radiket ismê bela `ê  
Lew diken em vê rica `ê şani`ê ruhê me ye

Ruhê min dakefte herqê lê vedan tîrêj`n û berqê  
Geh li gîrbê geh li şerqê rahiyê ahane ye

5 Ah û nalê fîrquetê ne qeyd û bendê muhbetê ne

---

7b te`y] te NMMÇ.  
8a çikim] çikem NM.  
8a `edna] `ednan NMDH.

Têk li semtê gûrbetê ne ew li ser min şehde ye

Ew dizanit ez gerîb im ‘ aşiq û sînekebîb im  
Her seher wek ‘ indelîb im dil li min şedpare ye

Her seher wek nay û çengê xweş dikm efğan û dengê  
Ah ji wec‘ a vê xedengê wey gelo nîran we ye

Ey gelo kuştim bi şûran nazikê serdarê horan  
Ez kirim behra tuyûran hey werin xweş yeğme ye

Hey werin vê kaze kazê ‘ aşiqê tenbûr û sazê  
Daye dil badê mecazê serxoş û dîwane ye

10 Serxoş im da’îm di şînê lew dikim ah û enînê  
Dûriya zâtê şêrînê hîrçeta çûn doje ye

**Ehmedî** nalên hemîşe ‘ aşiqê pir derd û êş e  
Muhmeta ‘ işqê dikêşe **Heyderî** sergeşte ye

### 98.

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun  
Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . -

### r. 116

1 Ey hebîbê qelb û ruhim serxweşê namê te ne  
Zahir û baîin ciruhim têk bi şemşamê te ne

Ku di ber payê tu xanim bo ji muhrê ra sena  
Çendî eqlîmên ku seyrê lê diket ramê te ne

Qumrî yû zağ û zügen bilbil hezar û ‘ indelîb  
Geşt û seyranên li bağê şîkl û endamê te ne

Saqiyê wirdeynê tu mey dabe cem‘a bilbilan

Lew peyapey ah û nalên gerqê alamê te ne

5 Zêhr û sîma mişlê bedrê çûn ji bin ‘ewran hilat

Ref‘î kir zulmet bi carek em di încamê te ne

Bağçeya husn û cemalê xusrewê şahan î tu

Durr û mircan misk û ‘enber xakê eqdamê te ne

Xakê payet kir muşerref zezem û herdu herem

Ne şedef hor û perî xendan û bestamê te ne

Kewşer û ava heyatê selsebîla cennetê

Lu‘lu‘ hindî cewahir dur di peygamê te ne

Qeys û Ferhadê Şêrîn î Hafîzê Şîrazî yan

Xoce‘ê Şehrê Cizîrê mestê zercamê te ne

10 Min ji cehda wuşleta te ‘umr û dewran kir telef

Fehm û ‘eqlêm berze bûn alan di qemqamê te ne

Dê heta kengê welê mehrûm ji dîdarê te bit

**Heyderî Eḥmed** be‘îdê dergê û bamê te ne

### 99.

mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun / mustef‘ ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

### r. 117

1 Şox û şepalek min heye ser ta qedem mişlê meh e

Husn û cemalek lê heye teşbîhê heyva çardeh e

Teşbîhê rojê her geş e şehzade‘ê şêrînmeş e

---

4a daye] dabe NMMÇ.

9b Cizîrê] Cezîrê NM, NMDH.

Qamet ji reyhan a reş e yan bêbedel serwa seh e

Yan şorgul e bilbil heband şebr û qerarê min revand  
Mecnûn kirim beyne`l-`îbad herdem bi kalîn im wehe

Firyad û efgan û keser têtin ji nav qelbê duker  
Ew dilbera sundus di ber yan xundîkar û yan şeh e

- 5 Ew xusrewê şahibcema ruh û heyatê min li bal  
Axir nebû carek wişal firqet li ber min perdeh e

Perdê ji mabeynê hilîn ey mahîsîma `ê şêrîn  
Cerg û dilê mecrûh bibîn heryek ji cohtek deşneh e

Cerg û dilê min bûn kebab da`îm dizîn jê xûn û ab  
`Alem li ber çeşmê xirab manendê daneyek ceh e

Manendê bedra asîman xalkewkeba nişfê cihan  
Qed`er`era şekkerdihan lebşehd û awirmîzeh e

Şed nîze û xişt û teber têtin ji destan her seher  
Kuştim bi van derbê beter dunya li ser min dojeh e

- 10 Dunya li ser min kir cehîm da min `ezabek pîr elîm  
Lew dil sehergahan muqî mefgan wekî çeng û jeh e

Zanim ji `işqê **Heyderî** sal û mehan sewdaser î  
Me`lûm ji gurzê ejderî **Ehmed** cunûn û ebleh e

100.

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun

Hezec ·---- /·----/·----/·----

r. 118

- 1 Ğema 'iřqa ħebîba min ji nû bêmar kirim îro  
Fıraqa mehcebîna min ji kerban bar kirim îro
- Ji nû berdame derya 'ê dilê sergeřte kir ta 'ê  
Çi narên qerqefek da 'ê ji xew hiřyar kirim îro
- Di xabê ez kirim řeyda girêdam ez di nêv qeyda  
Li min ev derd e kir peyda ji ruĥ dilsar kirim îro
- Bi derba muĥbetê mest im bi reyĥanê xwe ez best im  
Du mexmûr ef' iyan gestim welê ġemdar kirim îro
- 5 Welê 'iřqa me dijwar e ħebîbê min xeberdar e  
Ku 'ařiq xeste û jar e bi 'emden har kirim îro
- Bi 'emden dame girdabê li min da mewc û xîzabê  
řekerxendê 'eselxwabê di kûra nar kirim îro
- řepal û nazikê dilber xudanê qameta 'er'er  
Bi wirdê sipî yû eĥmer ji kesb û kar kirim îro
- Semaya řořin û wirdan li baġê xusrewê rindan  
Ĥelandim ez wekî findan de'îf û jar kirim îro
- Ĥelandim bařin û zahir wekî řem'a li ser agir  
Peyala badeya řahir bi ah û zar kirim îro
- 10 Zuceca badeya rengîn mufferreĥ kir dilê ġemġin  
řemala qameta řengîn fida 'ê yar kirim îro

Heyata **Ehmedî** jê ra fida bit **Heyderî** vê ra  
Seher weqtê bi fecrê ra weh ustûxar kirim îro

**101.**

fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilatun / fa<sup>ç</sup> ilun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - -

**r. 119**

1 *Ya reb an xusrewê xûban serteser nûr esti o\**

*Bazê gulzarê cemalê bêbedel hór esti o*

*Qameteş serw est û yaxûd qeddê zîba ‘er‘er est*

*Yan gulendam est o ‘arizê ateşê tûr esti o*

*Der meyanê defterê mecmû‘ê ‘alem xaş û ‘am*

*Zatê pakîzê padişah yan mahê mezbûr esti o*

*Qedr û qîmet berdewam est rewneqê dareynê heq*

*Şehriyarê mahirûyan [yan]şahê menşûr esti o*

5 *Dîde ‘ê dunya nedîde mişlê an ferxende gul*

*Hem nemîbîned bi reng û ruyê meşhûr esti o*

*Mihre gerdan noh şedef ez ‘işqê o sergeşte end*

*Hem ji husna ‘arizeş bilbil çû mexmûr esti o*

---

\* Ya Reb! Ew sultanê bedewan sertaser nûr e ew  
Yan gulzara bedewiya bêhempa horî ye ew

Bejna wê wek dara serwê ye an jî qedda wê ya xweşik erer e  
Yan gulendam e ew arizê agirê Tûr e ew

Di nava deftera tamamê alem çî xas çî am  
Zatê paqijê padişah yan meha navborî ye ew

Qedr û qîmet berdewam e ronîya herdu cihana Xuda  
Şehriyarê mehrûyan yan şahê serfiraz e ew

Çavên dinyayê kesekî wekî wî gulgeş nedîtine  
Hem jî kesekî bi reng û ruyê xwe wekî wî navdar nedîtîye



*Le 'lê leb serçeşme 'ê abu 'l-heyat û kewşer est  
Zulfê şebrengê çirağê le 'lê deycûr esti o*

*Çûnkî dêm manendê muhrê îltima ' her mîdîhed  
Çisti kar û pîşe 'ê mehtabê derxûr esti o*

*Her seher ayed bi xeşmê tîgî ra 'uryan koned  
Ger şehîd başem bi an şimşîr meğfûr esti o*

10 *Qeddê men zi în 'işqê o manendê dalê xemşod e  
Çeşmê men eşkê çû xûn hemwar e yeğmûr esti o*

***Heyderî** şeyd' esti da 'îm hem çû bilbil behrê gul  
**Ehmedî** lerzende endam mest û rencûr esti o\**

## 102.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

### r. 120

1 Ey şehînşahê mu' ezzem **Heyderî** bewwab î tu  
Bêkes û pabeste pir gem ma di nêv girdab î tu

Cerg û dil lê bûne xûn perwane 'ê şem' a te ye

---

\* Roja gerok û neh stêrk ji işqa wî sergerdan in  
Hem ji xweşikayiya rûyê wî bilbil serxweş e

Lêva wekî le' lê sor jêdera ava heyatê û kewserê ye  
Zulfên wê yên şevreng çiraya sor a şeva tarî ye

Piştî ku rûyê wê her dem wekî rojê rohnîyê dide  
Çi kar û pîşeya mehtaba nizm\* heye?

Her seher bi xeşm tê û şûrê xwe tazî dike  
Eger ez bi wî şûrî şehîd bibim ev ji mexfîreta wê ye

Qama min ji işqa wê wekî "dal" a xemxwar e  
Ji çavê min hêstirên xûnî wekî baranê dirijin

Heyderî wekî şeydatiya bilbilê ji bo gulê her dem şeyda ye  
Ehmediyê ku wesleyên canê wî dilerizin, serxweş û birîndarê wê ye

Mest û bêdil ma di qeydê çeşmê bêxewwab î tu

Carekî têkil quyûdan bîne koşa şoşbetê

Xef ji wan le' lan bibexşî sağerek şehdab î tu

Şad û xendan key bi weşlê pir şewab û minnet in

Da muşewweş bit ji şewqa ruyê çûn mehtab î tu

5 Can dikit teslîm ji ' eşqa wan du çavê te'y belek

Ez ricakar im nedî terka dilê eħbabî tu

Min ji vê ' erdê nezer kir ta wera'ê kûhê qaf

Têk dikin fexrê bi te wirdê zeban elqab î tu

Zîr û balayem ji ' eşqa te hemî weryan ji hev

Derdîmend û pir keder تنها gerîb bêxab î tu

Ĝurbeta min lê nezer ke ez çewan xistim ji ħal

Reħmekî îro li min ke *mecme' î'l-adab* î tu<sup>197</sup>

Şohtim ez narê firaqa bejn û bala ' er' erî

Bêmeded gerq im di beħrê lê dide xîzab î tu

10 Va meraqek min di dil da qet biderna'ê tucarek

Ta nebûsim asîтана kafe'ê ebwab î tu

' Erzîħala min ev e ruħ û rewan`m ya ħebîb

**Eħmedî** rencûr e da'ê dilê tijî xûnab î tu

---

3a goşa] koşa NM, NMDH.

5a dikit] diket NM.

5a te'y] te NMMÇ.

5b nedî] nedey NM.

6b dikin] diket NM.

9a Şohtim ez narê] Şohtim ez ji narê NMMÇ.

9b dide] didet NM.

11b Eħmedî rencûr e] Eħmedê rencûr NMMÇ.

<sup>197</sup> Tu, yê ku hemû edeban di xwe de dihewînî yî.

103.

mef' ûlu / mefa' îlu / mefa' îlu / fe' ûlun

Hezec ---./---./---./---

r. 121

- 1 Tîrê di gedar in ji kemaneynê du ebrû  
Hemwar e dibarin ji hilaleynê du ebrû

Geh geh diwerîn û medhûş manendê du ejder  
Qelbê me dîkin pejmurde mareynê du ebrû

Rengfaniyê şedsale me çûn ta ye li ser min  
Tîrsa du xedengê ku ji qewseynê du ebrû

Ez çûm û bi gewwaşî ketim derya 'ê ' îşqê  
Nageh bûme yexsîrê ' uzareynê du ebrû

- 5 Şem' a ji cemala qemerê şewq û sena da  
Perwane helandin ji cenaheynê du ebrû

Bilbil bi hezar rengî li ser wîrdan dibêjit  
Meqşed ev e şa bit bi wişaleynê du ebrû

Şebnalîn û kalîn im bi ro fikr û xiyal in  
Ez şohtin ji ser ta pê bi nareynê du ebrû

Yan ruhî dixwazit yan dilê xeste divêtin  
Em birne hilakeynê bi hazeynê du ebrû

Burhê bi heyat û beşerê taze we tenha  
Bo nezdîkê yezdanî çû mabeynê du ebrû

- 10 Da xaş û digel ' aman bi Dara 'ê binasî  
Nîn e me tu îlla ku di dareynê du ebrû

---

2b dîkin] dîken NM.

6a dibêjit] dibêjin NMDH.

Şed aferî ber nezmê tu ey ‘ aşiqê şeyda  
Ya **Heyderî Eħmed** li siraceynê du ebrû

**104.**

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun

Remel - . - - - / - . - - - / - . - - - / - . - - -

**r. 122**

- 1 Hû bikêşe **Heyderîya** cewherê ‘ ezman e hû  
Dem bi dem cehr û cefîya seyqelê qelban e hû

Her zeman bîne xiyalê meş‘ elek hilbit li balê  
Mujdeya qeşda wişalê kaşifê kerban e hû

‘ Erd û ‘ ezman ab û xak in îns û cin teyr û simak in  
Ger ne ew bit ev hilak in muħye ‘ê mewtan e hû

Pîşe ‘ê derwêş mudam î hû digo lefzê humamî  
Keskê kir ‘ ulya meqamî şafiyê derdan e hû

- 5 Derd û alamê ji ‘ işqê lê dide manendê berqê  
Jê dişû her êş û herqê dawiyê cerħan e hû

Her ji ‘ erdê ta sema ‘ê ta bi *Şîdrî`l-Munteha`ê*<sup>198</sup>  
Dawerê renc û şifa ‘ê ħakimê merdan e hû

Dilber û ħusn û cemalek mehşifet serwa feşalek  
Saqî yû şêrîn peyalek xeste ‘ê Loqman e hû

Xeste ‘ê Loqman divêtin merhem û derman divêtin

---

2b Mujdeya qeşda wişalê] Mujdeya qelb û wişalê NMMÇ.

5a dide] didet NM.

9b bidî] bidey NM, NMDH

<sup>198</sup> Nuqteya dawîn (dûrtirîn) a asîman. Şîklê ku di Qur’anê de derbas dibe wiha ye: *Şîdreti`l-munteha*. Qur’an: 53/14.

Dilmehê xûban divêtin cûdê *ke`l-`umman*<sup>199</sup> e hû

Cubhet û dêma mu`enber serw û sîma`ê di enwer  
Şedhezar eqlîm û kîşwer pê bidî erzan e hû

- 10 Pê didem ruh û rewanî pir dikem ah û fiğanî  
Meqşeda min asîtanî bûsî kim sulţan e hû

Serxoşê `işqa hebîbê kuştiyê tîra reqîbê  
**Heyderî Eḥmed** gerîbê dîn û sergerdan e hû

### 105.

mefa`îlun / mefa`îlun / mefa`îlun / mefa`îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

### r. 123

- 1 Ji rengê `ûd û tenbûrê ji min tîn ah û waweyla  
Hebîbê qedgula cewrê kirim Mecnûn wekî Leyla

Ĝema Leylê kirim Mecnûn ji şewqa `arizê gulgûn  
Li min qelb û ceger kul bûn fiğan û ah û zar keyla

Birîndarim ji hicranê wekî bendim di zindanê  
`Ezabek mişlê nîranê li min bîdarî kir heyla

Xedeng û tîr û mizraqan ji burcê Xusrewê Xaqan  
Ji reff û fewcê `uşşaqan yekayek dane min meyla

- 5 Heçî Xaqan û Feḡfûr in bi xişt û xencer û şûr in  
Çi zanin em weh rencûr in dirêjin eşkê xûn neyla

Sirişk û nale nalê min nebû pirsek li ḥalê min  
Gelî yar û hevalê min hewar û ahê min qeyla

---

<sup>199</sup> Wek behrê.

10b kim] kem NM, NMDH.

Di vê halê xirab im ez ji 'îşqê bêxwab im ez  
Gerîb û dilkebab im ez bi derd im bê'eded xeyla

Bibarin bê'eded xencer ji ser ta pê mekin dehker  
Ji fikrê dê biçit dilber cewaba mes'elê eyla

- 9 Li **Ehmed** agirek werkir rewanê **Heyderî** zerkir  
Cunûn û dîn û ebter kir bi çeşmanê xwe'ê şehla

**106.**

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

- 1 Eya badê nesîmê xweş hezaran merheba ehlen  
Li cerhê min hekîmê xweş ji yaran merheba ehlen

**r. 124**

Çi şêrîn peykê dildar î di ser çavê me ra hatî  
Berîd û qasîdê wîrda biharan merheba ehlen

Bibêje bo me ehwâlê şehînsahê qemerrûyan  
Çi tedbîr e di heqqê dagîdaran merheba ehlen\*

Dizanim reqş û govend û nişat e ey' eceb îro  
Xeberdar e bi ehwâlê neçaran merheba ehlen

- 5 Di hebsê mah û salan pa di qeydê girtî yû bend im  
Sirişkê ab û xûn in xe'y lê caran merheba ehlen

Çi bêjim beş û bazarê cefa û mişneta derdan  
Şeb û rojê ji bil bang û hewaran merheba ehlen

Dema rojek muşerref bê bi weşla wê şekerxûyê  
Selamê bê'eded lêkin bi baran merheba ehlen

---

2b biharan] gidaran NMMÇ.

3b Çi tedbîr e di heqqê dagîdaran] Çi tedbîr e di heqqê wan gedaran NMDH.

\* Ev malik, di NMMÇyê de cih nagre.

Ji ewwel ve bibûse ba edeb axa derêzanî  
Di pêve bêje şahê şehriyaran merheba ehlen

Birîndarê cemala te feqîrek wê zindanê  
Gerek teftîşekê cerhê di jaran merheba ehlen

10 Bi destûr û rizaya wê bixûne 'erzihala min  
Werin dîsa xwaba xundikaran merheba ehlen

Bizanim 'efw e yan *qeydî`l-heyat*<sup>200</sup> e **Heyderî Ehed**  
Cigerxûnê ji' işqa gul' uzaran merheba ehlen

### 107.

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / fe'ûlun  
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - - / · - -

#### r. 125

Yeşîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun

Remel - - · / · - - · / · - - · / · - -

1 Ey dil tu ji tîrê di firaqê we dinalî  
Yan 'işq e li te lew tu zer û mişlê hilal î  
Bêhnek ji hewar û keseran nabî tu xalî  
Yan mexmûr û medhûşê ji fêrfûra helal î  
Lew sal û mehan mehzûn û pir fikr û xiyal î  
Têkil kederê gerqê di girdaba evîn î

Yeşîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

Şêran ji cemala qemerê ne're kişandin

---

11a qeydî`l-heyat] feydî`l-heyat NMDH.

<sup>200</sup> Li ser jiyanê ye.

Tîr danîne qewseynan bi dijwarî weşandin  
Şed dane peyapey ku li ser sîne reşandin  
Endamê di yexsîran ji xûnê neqîşandin  
Ev reng e şehînşahê di eqlîmê cemal î  
Qurban diket Ferhadan li ber pa'ê Şêrîn î

Yeqîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

Halê me numayan e di vê xetî humayûn  
Her çî nezerî lê ket dinasit me cîgerxûn  
Em têk ji kevanê geşebê rencûr û zer bûn  
Minnet ji Xudê ra ku bi xeddeynê di gulgûn  
Ez kirime hewa'ê we tu mehpûsê di çal î  
Manendê Mem û bedhal û sergeşte'ê Zîn î

Yeqîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

**r. 126**

Derdê ku ji 'işqê bit gelo şebr û sukûn key  
Têtin bi şev û rojê bi zarî yû heyahey  
Bêsaqî yû dildar û bi awazê def û ney  
Zanim bi cefa û eleman terkê tu nadey  
Lew teşbîhê bilbil bêdilê wirdê di al î  
Sewdaser û sergerdan û herleħze di şîn î

Yeqîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

- 5 Hor a ku ji min dil girtî çûn şeyd û weravê  
Qamet wekî serwa ye didit bêhna gulavê  
Tensîmen e zehra ye cebîn te' n e li tavê  
Gulgebgêb e nûr jê diweşit mişlê xûnavê

---

4ê sergerdan] sergirdan NM.  
5b didit] didet NM.



Mehbûb û gulendam û dilaram û delalî  
Perwane bi dewran e li ber şewqa cebînî

Yeqîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

Îro tu dibêjî ku li bedrê du hîlal in  
Çeşmê di gezalî ne we mijganê di al in  
Reyhanê di reş şems û qemer rast û şîmal in  
Elbet ser û sîma'ê ji nûrê we zelal in  
Lew cerg û dilê min teberê şox û şepal î  
Sih sal e digel hev dikevin ceng û qêrîn î

Yeqîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

Ya **Heyderî Ehmed** tu di 'îşqê da şehîr î  
Der saye'ê wan zulfê perîşan û herîr î  
**r. 127**  
Teşbîhê Suleymanê bi kursî yû serîr î  
Wek bilbilê rezbanê di gulşen da biqêr î  
Bağê te seraser hate ser heddê kemal î  
Wirda dihebînî ew e dermanê birîn î

Yeqîn e min dil û bê mahîsîma'ê di 'uqba'ê te navê  
Duxûla xuld û firdewsê cemala 'edn û me'wa'ê me navê

### 108.

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun  
Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . - -

- 1 Ey ji ber derbê te êvaran hetanê seherê  
Dil li min tête biraştin ji fîğan û keserê

---

6b Çeşmê di gezalî ne] Çeşmê di gezal in NMMÇ.

Dil ji min bir qametê ruh û rewanê min divêt  
Tîr û qewseynê hilalê ku li burca qemerê

Qelb û navê me ji te'sîrê evînê herîşîn  
Sa'etek nîn e tebata min ji êşa cîgerê

Zîr û balayem dişojit bi cemala xwe 'ezîz  
Cumle e'za bêqerar in ji burûska kederê

- 5 Dewr û perwazê di min her lehze çûn perwane'ê  
Bi şev û ro digirim kanê şemala fenerê

Ma nizanî ku ji 'işqa te mehê bêcan im ez  
Wer bi çavê xwe bibîne kuştîyê mawêzerê

Hem ji bil cewr û cefaya te di herdu cîgeran  
Du xedengê ateşîn e ji kevanê tecerê

El-eman yexsîr kirim bêmirweta geddare har  
Min ji çavan av û xûn têtin ji zulma Teterê

Ey keremkanê keremke perdeya eyles hilîn  
Da ji şewqa te kezzeb çêtir bi'arit ji berê

**r. 128**

- 10 Gerçî sergeşte û dîn im ji hewayaya te muqîm  
Ma ji fikra me diçê qeş bi Xuda'ê neherê

**Heyderî Ehed** ji 'îşqê kê dizanît nexweş e  
Lew dibê êşa hevalan mişlê tîrê hecerê

109.

mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun / mustef<sup>ç</sup> ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

- 1 Dîsan ji re<sup>ç</sup> dê muhbetê da cerg û canê Heyderî  
Berq û burûska hîrçetê pir bûn fiğanê Heyderî
- Berq û burûskan lê vedan<sup>ç</sup> işqa hebîbê sohtî can  
Bêmuşterî pejmurde man sûk û dikanê Heyderî
- Husna hebîbê sîne şot tîr lê dibarin cot bi cot  
Lew dil bi erzanî firot da wîrdîbanê Heyderî
- Wirdê li bedra dilberê qewsê li burca xawerê  
Şubh û mesa ta meşerê zîkrê zebanê Heyderî
- 5 Zîkrê zebanê dîlfîkar durdaneya miskên<sup>ç</sup> uzar  
Vê ra dikin geşt û guzar dewr û zemanê Heyderî
- Mîşkên mu<sup>ç</sup> enber zulf û xal herdem dikin<sup>ç</sup> ezmê qîtal  
Lew bûye lê zindan û çal ev zîndeganê Heyderî
- Gazinde û loman mekin ey dositanê îns û cin  
Belkî ne însan e ji bin ev malwiranê Heyderî
- Gerçî bi şûret adem e lêkîn cunûn û sersem e  
Bêdost û yar û hemdem e **Ehmed** nezanê Heyderî
- Bêmulk û mal û bêhebîb dem şorgulê dil kir nehîb  
Bêmillat û qewm û gerîb zer bû rewanê Heyderî
- r. 129**
- 10 Dêm ayina pir şafî ye xendên gula nûranî ye  
Mişka xeten jê barî ye şekker dihanê Heyderî

---

1b Berq û burûska hîrçetê] Berq û burûskê hîrçetê.

5b Vê ra dikin] Vê ra diken NM, vê ra kin NMMÇ.

6a dikin] diken NM.

6b zîndeganê] zendeheganê NMMÇ, zendekanê NMDH.

Şox û şepalê neyşeker alal û wîrdê sor û zer  
Herdem li dêma mu‘ teber şohtin nihanî Heyderî

**110.**

fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilatun / fa‘ ilun

Remel - . . . - / - . . . - / - . . . - / - . . -

Ey mehê xûrşîd sena durra ji kenza qudretê  
Rohniya ‘erç û sema wîrda li bagê cennetê  
Merhemet ey rehnuma fîryad ji destê firqetê

- 1 Ey şehînşahê du ‘alem bû di ramê Xatemê  
Şed Suleyman û Sîkenderha di emr û xîdmetê  
Xakê eqdamê mubarek nûrê çeşmê ‘alemê  
Ne şedef hindî mekan gerq in di şewqa cubhetê  
Dawerê kewn û mekangîrê di berya Ademê  
Gulcebînê tensîmînê leşêrînê şehde lê

Ey mehê xûrşîd sena durra ji kenza qudretê  
Rohniya ‘erç û sema wîrda li bagê cennetê  
Merhemet ey rehnuma fîryad ji destê firqetê

\*\*\*

## ENCAM

Mela Ehmedê Heyderî di sedsala XXan de jiyaye. Heyderî, bi berhemên ku li dû xwe hiştiye û bi taybetî jî bi dîwana xwe ya bihêz ve di edebiyata kurdî ya klasîk de cihekî gelek girîng girtiye.

Heyderî, di dewra perwerdeya xwe ya seretayî de perwerdeyeke baş stendiye û hetta li Îranê li Bajarê Tebrîzê beşdarê bernameya perwerdeya dibistana hunerên destan bûye. Heyderî, li Îranê him li dibistana hunerên destan perwerdeyeke baş stendiye û him jî baş fêrî zimanê farisî bûye. Helbestvanê me di şerê cihanê yê yekemîn de wekî gelek Serhediyar koçî Nisêbînê kiriye û li wira dumahîka jiyana xwe di nava tenahî û bêkesiyê de derbas kiriye.

Heyderî, di salên teng û dijwar ên cumhûriyetê de yên ku li ser hemû nîşaneyên hebûna kurdan reddîye û dijberiyê gîştî hatiye danîn de û li xurbetê, di nava tenahiyeke mezin de dîwana xwe afirandiye. Dîwana Heyderî ji gelek aliyan ve mîna keke serkeftî ye. Aliyê edebî yê dîwanê jî gelek pêşketî ye û helbestvan mezmûnên nû û xeyalên teze ceribandine.

Dîwan ji aliyê ziman ve jî bihêz e. Zimanê dîwanê sivik, zelal û asan e. Di dîwanê de peyvên erebî, farisî û tirkî di nava kompozîsyonekê de hatine bikaranîn. Kurdiya dîwanê jî pirreng e. Heyderî, bereksê pêşiyên xwe di dîwana xwe de zêde cî nedaye devoka botî û hekarî.

Nusxeya dîwanê ya di destê me de ji 107 helbest û 1464 beytan pêk hatiye. Heyderî, bi hemû herfên ku di elifbêya erebî de cî digrin helbest nivisiye. Bi tevahî ji 10 cûreyên nezmê yên di dîwanê de cî girtine herî zêde şiklê xezel û qesîdeyê derketine pêş. Di dîwanê de erûz bi awayekî serkeftî hatiye tetbîq kirin. Dîsa dîwan ji aliyê qafiyê û redîfê ve jî dewlemend e.

Mela Ehmedê Heyderî, ji helbestvanên mezin ên kurd herî zêde di bin bandora Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Şêx Semseddînê Qutbê Exlatî de maye.

## ÇAVKANÎ

### Pirtûk

Abdulla, Nejat: *İmparatorluk Sınır ve Aşiret*, Weşanxaneyaya Avesta, Stenbol, 2009.

Aydemir, Yaşar: *Behiştî Divanı: Behiştî, Hayatı, Şahsiyeti, Eserleri ve Divanı'nın Tenkidli Metni*, MEB Yayınları, Ankara, 2000.

Bayrak, Mehmet: *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*, Öz-ge Yayınları, Ankara, 2002.

Bilgin, Azmi: *Ümmi Sinan Divanı*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, Stenbol, 2000.

Bruinessen, Martin van: *Ağa, Şeyh, Devlet*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010.

Celîl, Celîlê: *1880 Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması*, Pêrî yayınları, İstanbul, 1998.

Cewarî, Firîda Hecî: *Bîranînên Min*, Weşanxaneyaya Lîmûş, Yêrêvan, 2010.

Cizîrî, Melayê: *Dîwan*, Weşanên Roja Nû, Stocholm, 1987.

Cizîrî, Mela Ehmedê: *Dîwan*, wer. Osman Tunç, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2009.

Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Atatürk Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Dil Kurumu Yayınları: 517, Ankara, 2005.

Doskî, Mihemed Emîn: *Lewami 'î'l-Şehb fî şerhî Dîwanî Şemseddîni'l-Exlatî el-Qutub*, Sipîrêz, Duhok, 2007.

es-Sûyûtî, Celaleddîn: *El-lealî 'î'l-Mesnû 'a fî'l-Ehadîsî'l-Mewdû 'a*, c.1 (?, ?).

Exlatî, Şêx Şemseddînê: *Dîdarê Yar (Dîwana Ş. Ş. Qutbê Exlatî yê Brîfkanî)*, amd.

Zahid Birîfkanî, Dezgey Çap û Belawkirdnewey Aras, Hewlêr, 2002.

Firdevsî, *Şahnâme*, wer. Necati Lugal, Kabalcı Yayınevi, İstanbul, 2009.

Gölpınarlı, Abdülbaki: *Mevlana Celaledddin*, İnkılab Kitabevi, İstanbul, 1959.

İnalcık, Halil: *Şair ve Patron*, Weşanên Doğubatu, Ankara, 2010.

İslam Ansiklopedisi, MEB Devlet Kitapları, c.13.

Kahraman, Ahmet: *Kürt İsyanları Tedib ve Tenkil*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2004.

Karaismailoğlu, Adnan: "Mevlana'nın Hayatı, Eserleri ve Sanatı", *Mevlana*, amd. .

- Osman Horata, Adnan Karaismailođlu, T.C. Kùltùr ve Turizm Bakanlıđı Yayınları, Ankara, 2007.
- Kassemlu, Abdurrahman: *Özgùrlük Mùcadelesinde Kırk Yıl*, Koral Yayınları, İstanbul, 1992.
- Kıran, Eyùp: *Kùrt Milan Aşiret Konfederasyonu*, Elma Yayınları, Stenbol, 2003.
- Kocabaş, Süleyman: *Kuzey'den Gelen Tehdit Tarihte Türk-Rus Mùcadelesi*, Vatan Yayınları, İstanbul, 1989.
- Kurdistana Osmanî*, amd. Koma Xebatên Kurdî, bgst Yayınları, İstanbul, 2011.
- Kurdo, Qanatê: *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Öz-ge, Çapa 2., Ankara, 1992.
- Köprülü, M. Fuat: *Divan Edebiyatı Antolojisi*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2006.
- McDowal, Dawid: *Modern Kùrt Tarihi*, Doruk Yayımcılık, Ankara, 2004.
- Nursi, Bediùzzaman Said: *İçtimai Dersler; Münazarat*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2004.
- Nursi, Bediùzzaman Said: *Lem`alar*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2001.
- Pala, İskender: *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2004.
- Sađnıç, Feqî Huseyn: *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002.
- Saraç, M. A. Yekta: *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, 3F Yayınevi, İstanbul, 2007.
- Sühandaç, Kemal: *Büyük Osmanlı Entrikası Hamidiye Alayları*, Weşanên Komal, Stenbol, 2006.
- Şemo, Erebê: *Şivanê Kurmanca*, amd. Mustafa Aydoğan, Weşanxaneyaya Lîs, Stenbol, 2009.
- Tan, Altan: *Turabidin'den Berriyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kùltürler*, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2011.
- Ulugana, Sedat: *Zilan Katliamı*, Weşanên Pêrî, Stenbol, 2012.
- Uluslar arası Kùrt Kadın Kongresi, Edîtor: Vahit Tane, Kemal Varol, weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011.
- Varlî, Ebdullah M: *Dîwan û Jînewarîya Ehmedê Xanî*, Weşanxaneyaya Sîpan, Stenbol, 2004.

Varlî, Ebdullah M: *Dîwan û Gobîdeyê Ehmedê Xanî yêd Mayîn*, Weşanxaneyê Sîpan, Stenbol, 2004.

V.T, Mayévstriy: *Kürt-Ermeni İlişkileri*, amd. Evdila Varlî, Weşanên Sîpan, Stenbol, 1997.

Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, amd. M. Emîn Bozarslan, Gün Yayınları, Stenbol, 1968.

Xurşîd Ebullla, Helîma: *Berawirdiyeka Kêşnasî di Navbera Erûza Kurdî û Farisî*, Spîrêz, Duhok, 2011.

Yıldırım, Kadri: *Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 2010.

Zekî Beg, Mihemed Emîn: *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 2002.

### **Meqale**

Adak, Abdurrahman: “Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî”,

*Nûbihar*, c.15, j.116, Stenbol, 2011.

Alakom, Rohat: “Kürt-Rus İlişkileri Tarihinden Şemsedinov Kürtleri”, *Kürt Tarihi*,

Sayı 1, İstanbul, 2012.

Rohat Alakom, “Serhed: Welatê ku roj lê hiltê”, *Nûbihar*, j.117, 2011.

Hisênî, Selîm Ş: M: “Mela Ehmed”, *Hawar*, j.54, 15 Gulan, Şam, 1943.

Milî, Miço: “Serhedan”, *Hawar*, c.1, j.19, Avrêl, Şam, 1933.

Nursî, Ebdurrehman: “*Xîret Bikin Meyûs Nebin*”, amd. Ferhad Pîrbal, Govarî

Kurdistan, Estenbol, 1919-1920.

### **Ferheng**

Aslan, Şêxmûs: *Ferhenga Gotinên Pêşyan*, Söz Gazetecilik Yayınları, Diyarbekir, 2006.

Borak, Mustafa: *Ferhenga Biwêjan*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005.

Develioğlu, Ferit: *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitabevi, Ankara, 2003.

Îzolî, D: *Ferheng*, Weşanên Deng, Diyarbekir, 2007.



Kanar, Mehmet: *Osmanlıca Türkçesi Sözlüğü*, Çapa Dijital, (sala çapê nediyar e).

Sami, Şemseddin: *Kamûs-ı Türkî*, Çağrı Yayınları, İstanbul, 2006.

### **Çavkaniyên Dîjîtal:**


Cûdî, Reşad: *Ji Biraziyê Bedûzzeman ji bo Kurda Peyama Sedsalî: 'Xîret Bikin Meyûs*

*Nebîn'*, [http://www.ilkehaber.com/haber/beduzzamanin-yegeninden-kurtlere-asirlik-](http://www.ilkehaber.com/haber/beduzzamanin-yegeninden-kurtlere-asirlik-mesaj-gayretli-olun,-umitsiz-olmayin-21348:htm)

[mesaj-gayretli-olun,-umitsiz-olmayin-21348:htm](http://www.ilkehaber.com/haber/beduzzamanin-yegeninden-kurtlere-asirlik-mesaj-gayretli-olun,-umitsiz-olmayin-21348:htm) 27 Adar 2012.

## PÊVEK

**Pêvek 1:** Gustîla ku navê Mela Ehmedê Heyderî li ser e.



**Pêvek 2:** Sûretê Mela Ehmedê Heyderî.



( ٤٤ )

دله ایضا  
٢٦

بجری زه

حسدی


یاره بکن. دل بزجین. غم صو بھن. لیکر بشیر. شہزادیہ. نذر صادیہ. درانیہ. کاف نظیر  
 دہ خاورہ. خدا حمہ. لب کز نرہ. کردن نرہ. ننی قامتہ. مہ جہتہ. روش طلعتہ. کاکل عیز  
 کاکل رشتہ. شیرین مٹہ. طبعہ خوشہ. عشق آتشتہ. اود لبرہ. قد عر عری. زندہ السمری. قامتہ حریر  
 قامتہ کلا. خوش عادلہ. بر فاضلہ. دغادلہ. اور ہمنون. اسود عبون. طرفینی چون. شمشیر و تبر  
 نذر الرو. عالم آرد. ہر چار سو. بز نور بو. ہفتہ آسمان. کون مکان. حتی بون. حوتہ سریر  
 حر باجہا. اور قدن. دل بز عیان. من کو همان. کد کد بکد. حوی در بکد. زندہ زر بکد. قنچ بن اسیر  
 عشقہ ہبہ. دہ نغبہ. بر نالبہ. دل بغمہ. بد سر برین. جنکو قرین. نابت یقینی. دنگی کبیر  
 من از جد. مثل سیر. کزد لبر. نبرد تبر. ہر لحظک. در لنگی. نقرن دکی. شہ مثل شہیر  
 حسن جاز. نور زلال. پر مردہ حال. بست میال. کاف تباہ. صبر و حیاہ. چشم فرہ. قلب کبیر  
 قلب نفاع. کلز روباغ. شمع جہرغ. بی بون یساع. مادر نفس. مثل جرس. فریاد پس. جان در سیر

بسم ساغری. سی انوری. اسکندرہ. یا حیدری.

نظراتہ دین. کامل کرین. خدا فرین. احمد امیر.

دله ایضا  
٢٦

Pêvek 4: Helbesta 11emîn. Ev rûpel jî, ji 15 rêzan pêk hatiye.




(س)


درد ابضا  
٤٤

ظاهره هجره میندا . ان کیم ویرانه چاخ . باطن عیشنی لیدنا . لودرینم اشکی ناخ  
چشم من دایم بخونن . لی ش بر عشق داروندا . دم بدم نالین فرزوندا . پشتمه دینو صراحی  
دل من بیداره باره . بلبلم کل ناد باره . مزعنا صبر و قناره . لوت من یقین او خواجه  
بلبل مدعو شوم . جرد اجاما السم . صوفی صورا پرستم . یسین من بردو شاخ  
جسی سینه هذکر . دل بشیرن تلزکز . مرث برآه السن کیز . برت من چینه خاج  
من کلاه کسرت . هر سحر تیر و ترین . دل قلاشقی خوی لکرت . فقط من بد فرسخ  
فقتا من بردر بیره . سلا عشق میره . لاین مه شخصه بیره . یسین لستین ابرخ  
لاین مه پیری باره . بز مود بون تداره . مسله حلکه بخارده . هون بیدرین قلاخ  
ان غریبم دل بزرگ . عاشق دینه مردم . لو خرم زین زردم . شارد خواجه  
اهد نالین شمارن . روش بروش ذیره هزارن . بتر لجرده من دبارن . موصی  
. آتشی عشق هفت کیز . خیدری سینه سیر کیز .  
. احمدی نالین شبر کیز . جگرود ل خون مانه فاح .

درد ابضا  
٤٥




Pêvek 6: Rûpelek ji teqwîmnameyê




حافط خودمان بت حیدری • قیود عودا را جادب • و در آتش دهان هفت سوری • مهلتی نماند  
 مهلتی نماند جگر کو کید • جگر و تا مکار و بد • هشتاد دین حکم آسند • هان دیکت زور  
 جگر و تا مکاره او • عیارة غداره او • پرافتو سر ساره او • دایم دیاره نری عو  
 نحو سیا طفت خراب • مغرور کردن بر نحو سب • چون لا حق جور و عیب • نالین بر شاو جلد  
 بر سا حوی خستی زری • کوشتی بدر با خجری • صوفتی دناری بحری • نایسته فکری حق جلد  
 ایرود دستان ز جگر • محور مستی جا که تو • رنگ نایستی صد عامی تو • او حوی تم بنده ای عی  
 فی ظالمی کرد السیر • کر عاقبتی را جیشیر • پرورد کاره دستگیر • ستاره هفت قیاض  
 راجیشیر و قند • بانفرد لید از جلد • هر لحظه صد پرورد نک • جگر  
 هر دم بدی صد محنتی • صدایشور ز جور تمتی • هانری هانری جگر و تو • راکر لیمه  
 بونله زو مهر • هانتی بجز ز تو نبر • مقصد عینی در بر • جگر کانه دد خود طلب  
 کانه و هانومد • پابستی قید مکد • در قطره خون جگر • تن خستی هواره تب  
 سحار و مکار شجیع • ان معدنا فیل شیع • شخصی د امری وی طبع • و فرزند یانه صد جلد  
 غافل به ز پسالیم • کر طالبی بخلد  
 جز امر فرمانا حکیم • یا احمدی مکشام  
 الحظی



Pêvek 8: Rûpelek ji teqwîmnameyê





ان اردت ان تعرف قاعدة التقويم فامطرا اولها الى اسماء الحيوانات المندرجة  
 اثنا عشر خان التي اول اسمها النار و آخرها الخنزير فان كل واحد  
 من هذه الحيوانات هو حاكم لسنة التي تحف فيها اعني <sup>اعني</sup> ر و بيه حا  
 كنها اليمين فخذ اليمين في يدك ثم انظر الى جدول الاشياء يعني للحجر اعلاه  
 حروفه خمسة و حاكم سانه فلهذا مكر عن سبعة دوائر كل دائرة عبارة عن  
 اربع ارقام يكون الجهد <sup>ثمانية</sup> و عشرون حرفا اعني حروف الهجائية  
 فاعتبر كل عدد من المقرونة الارقام لكل سنة فخذ رقم السنة <sup>اختر رقم</sup>  
 الثاني و اعتبر يوم الاحد <sup>في</sup> هذه السنة التي انت فيها اعني  
 ١٤١٤ <sup>اول</sup> وهي مقبرة من اول العدد <sup>اول</sup> الارقام الاربعة و دائرة الاول  
 اعني عدد واحد و سنت الاربعة اعني <sup>١٣</sup>  
 الاحد ثم من رقم الثاني من دائرة الاول  
 سنة الى ان <sup>الاول</sup> و الاربعة  
 الاول و اذ اردت ان تعرف يوم الاربعة انت فيه و  
 هو و كرمفانه فخذ رقم التي اعتبرتها  
 يوم الاحد و علم منه <sup>الاول</sup> الى يوم الاحد  
 الذي انت فيها و يولد هذا اي يوم هو و بيه اعني <sup>الاول</sup>  
 حرفة محمد و هذه عيسى اعلمها السلام علم حسابك ما يريد من هذه  
 ٥٨٥ شوقدر سنة <sup>٥٨٥</sup>

Alice ii